Ev ferheng dê vebêjeyên Islamî yên ku herî berbiçav û yên ku bêtir têne bikaranîn, bide ber xwe, wekî rêgez û bingehên sereke yên Islamê, li gorî pênaseyên hêsan, û ravekirina hêsanbar û mîtodekî sivik. Bêyî ku em têkevin hûrguliyên cûdahiyên ku di navbera zanyaran û meleyan de hene, an cûdahiyên mezhebî, felsefî, ramanî û yên din. Ew kurteferhenge ku têgînên Islamî yên herî berbiçav radigihîne, lê ew ne ferhengeke Islamî ya mezin û berfireh a hûrgulî ye ku gelek alîyan, tefsîr û biryarên cûrbecûr bide ber xwe (pêşkêş bike). Armanca vê ferhengê tenê zimanî ye, ji bo ku têgînên Islamî yên ku di zimanê Erebî de hatine derbasî(veguhezîne)nava zimanê Kurdî, bike, da ku têgihiştina kesên ku pir bi zimanê Erebî nizanin, şiyaw bike, da ku alîkariya wan bike ku têgînên îslamî yên herî berbiçav têbigihin.

VR . 3383 – 6779 B

DEMOCRATIC ARABIC CENTER
Germany: Berlin
http://democraticac.de
TEL 0049-CODE
030-89005468/030-898999419/030-57348845
MOBILTELEFON: 0049174274278717

Democratic Arabic Center
Berlin - Germany

Ferhenga Têgînên Islamî Kurdî – Erebî
مُعْجَمُ المُصْطَلَحَاتِ الإسْلَامِيَّةُ

2023

Democratic Arab Center for Strategic Political and. Economic Studies

Ferhenga Têgînên Islamî Kurdî – Erebî

مُعْجَمُ المُصْطَلَحَاتِ الإسْلَامِيَّةُ

Dr. Safia Zivingî
Bi hevkarîya Prof. Dr. Rafik Sulaiman

الـنــــــــــاشــــــــر:

المركز الديمقراطي العربي

للدراسات الاستراتيجية والسياسية والاقتصادية

ألمانيا/برلين

Democratic Arab Center

For Strategic, Political & Economic Studies

Berlin / Germany

المركز الديمقراطي العربي

للدراسات الاستراتيجية والسياسية والاقتصاديةألمانيا/برلين

البريدالإلكتروني*book@democraticac.de*

المركز الديمقراطي العربي
للدراسات الاستراتيجية، الاقتصادية والسياسية
Democratic Arabic Center
for Strategic, Political & Economic Studies

الكتاب :

Ferhenga Têgînên Islamî

(Kurdî - Erebî)

تأليف:

Dr. Safia Zivingî

Bi hevkarîya Prof. Dr. Rafik Sulaiman

رقم تسجيل الكتاب: VR . 3383 – 6779 . B

الطبعة الأولى

2023م

رئيس المركز الديمقراطي العربي: أ. عمار شرعان

مُعْجَمُ المُصْطَلَحاتِ الإِسْلَامِيَّة

(كردي- عربي)

تأليف :

د. صافية زفنكي، بالاشتراك مع أ.د. رفيق سليمان

تختلف المصطلحات الدينية عن المصطلحات العلمية والفكرية بأن المجال الديني من أكثر المسائل حساسية عند الإنسان، لأنه يتعلق بخالق هذا الكون العجيب في تكوينه، لذا تشكِّل مفرداته تحدٍ آخر لمدى قدرة اللغة على استيعاب المفردات الدينية لما لها من خصوصيات في دقّة أبعادها المتعددة والمتشعّبة والمتداخلة. هذا المعجم الثنائي اللغة(كردي- عربي) المتوسط في حجمه، والمختصر في مواده، والمبسط في شرحه، يتضمن أبرز المصطلحات والعبارات الإسلامية وأكثرها تداولاً واستخداماً، من مثل المبادئ والأسس الرئيسة في الإسلام، ولاسيما المتعلقة بالأحكام والتشريعات، بدون التطرّق إلى التفاصيل المتعلقة بالخلافات بين العلماء والأئمة، أو الخلافات المذهبية والفلسفية والفكرية وغيرها، فهو معجم موجز وليس موسوعة إسلامية تفصيلية لعرض مختلف الاتجاهات والتفسيرات والتأويلات والأحكام، إذ يركّز على الجانب اللغوي لا الجانب الفقهي للدِّين.

Dictionary of Islamic terms

Dr. Safia Zivingi

Prof. Dr. Rafik Sulaiman

Religious terminology differs from scientific and intellectual terminology in that the religious field is one of the most sensitive issues for humans, so its vocabulary constitutes another challenge to the ability of the language to absorb religious vocabulary because of its specificities in the accuracy of its multiple, complex, and overlapping dimensions. This bilingual dictionary (Kurdish-Arabic), medium in size, concise in its contents, and simplified in its explanation, includes the most prominent Islamic terms and phrasesو so the most widely circulated and used. such as the main principles and foundations of Islam, especially those related to rulings and legislation, without addressing the details related to the differences between scholars and imams, or the doctrinal, philosophical, intellectual, and other differences. It is a brief dictionary and not a detailed Islamic encyclopedia to present the various trends, interpretations, and rulings. It focuses on the linguistic side, not the jurisprudential side of religion.

Diyarî

Em vê xebatê diyarî bapîrê meyê mezin Muhmmed Mulla Zivingî, ku bi dersdana xwe ya dadrêsîya Islamî li bajarê Sêrtê, navdar bû, dikin. Lê mixabin ew di çil salîya xwe de kur(nabîne) dibe. Loma ew ji mirovan dûr diçe, û vedigire gundê Zivingê.

Em ve xebata piçûk diyarî giyanê wî yê pak û canê her du kurên wî re : Mella Ahmedê Zivingî, û kalikê me Mulla Îbrahîm dikin.

Em ji Xwedayê herî berz û mezin hêvîya erêkirin û pejirandinê dikin.

Pêşgotin:

Di şopanina ramana saxlem de, tê xwestin ku mirov bi awayekî guhpêdanî bala xwe bi fokusî (bi taybetî) têgihiştinî û biwarî (peywendêtî/çarçoveyî) bide zimên , ji bo ku mirov bikaribe wê li ser bingehên dirûst(zelal) têbigihe û fêmbike, ji ber ku bêjeyên nezelal hiş û ramanên mirov tevlihev dikin.

Mirov dikare pirsgirêkên olî wek meydanên hevpar di nav komên cûrbecûr ên civakên me de bipejrîne(bihisibîne), ku ew ne tenê pabend in bi komekê taybet ve, wekî ku di pisporên din de diyar dike. Ew dikeve di mijara rêûresmên olî yên rojane de. Herweha, ev mijar bala kesên têkildar ji bo bêtir pêzanînê(hişmendîyê) ji ferman û hînkirinên ola Islamî fêr bibin, dikşêne û ji bo têgihştina aliyên olî yên rengereng; ji beşên civakê yên rengereng, û bi rêya çavkanîyên cûrbecûr yên çapkirî, bihîsbarî(bihîstwerî), dîtbarî û elektronî. Ji ber vê yekê, me tercîh kir ku em bala xwe bidin li ser vê qadê, ku di civakên me de cihekî girîng û hestiyar digire.

Tişta ku em dilgerm(teşwîq)kirine ku em vê ferhenga olî ya Islamî biafrînin, ewe ku bi saya ezmûnên me yên ku me di dema danîna çend ferhengên pîşeyî de ku dikevin di mijara (meydana)pisporiyên me de , an jî elaqedarên bi xebatên me re (ku bi saya wan me ezmûn afirandîye); me çend ferhengên sêzimanî danîne(nivîsandine), (Ingilîzî, Erebî û Kurdî), Ji ber ku zimanê Ingilîzî, zimanekî serdest e di nav piranîya zanistan de, ji ber vê yekê ji bo ku em bikaribin zimanê Kurdî wek zimanekî zanistî (zanyarî) pêşkêş bikin, em dê vê projeya xwe ya zimanî û ferhengî bi pêşxin da ku em têgînên Islamî ji zimane Erebî derbasî(veguhêzin) zimanê Kurdî. Ji ber vê yekê, ev ferheng dê ferhengeke duzimanî be, ji ber ku zimanê Erebî zimanê Quranê ye, Hedîsên Pêxember û piranîya şîrovekirina Islamî ye.

Ev ferheng dê vebêjeyên Islamî yên ku herî berbiçav û yên ku bêtir têne bikaranîn, bide ber xwe, wekî rêgez û bingehên sereke yên Islamê, hin peyvên Quranê yên herî zêde ku têne bikaranîn, nemaze yên ku bi biryar û qanûnan re têkildar in, li gorî pênaseyên hêsan, û ravekirina hêsanbar û mîtodekî sivik (bi rengekî hêsan). Bêyî ku em têkevin hûrguliyên cûdahiyên ku di navbera zanyaran û meleyan de hene, an cûdahiyên mezhebî, felsefî, ramanî û yên din. Ew kurteferhenge ku têgînên Islamî yên herî berbiçav radigihîne, lê ew ne ferhengeke Islamî ya mezin û berfireh a hûrgulî ye ku gelek alîyan, tefsîr û biryarên cûrbecûr bide ber xwe (pêşkêş bike).

Armanca vê ferhengê tenê zimanî ye, ji bo ku têgînên Islamî yên ku di zimanê Erebî de hatine derbasî(veguhezîne)nava zimanê Kurdî, bike, da ku têgihiştina kesên ku pir bi zimanê Erebî nizanin, şiyaw bike, da ku alîkariya wan bike ku têgînên îslamî yên herî berbiçav têbigihin.

Vê ferheng ji bo kesên ku ji Islamê çavnebar in, ku jê ditirsin ku bi zimanê Kurdî belavkirina perwerdehiyê dibe sedem ku nifşên pêşerojê ji zimanê Erebî, ku ew zimanê Qur'ana Pîroz, hedîsên Pêxember û dadrêsiya îslamî ye, nezan bimînin. Ev ferheng dixwaze bi amûrên zimanî yên ku di têgihiştina têgînên Islamî de jê re dibin alîkar hêzdar bike. Ji ber ku dema ku mirov bi zimanê zikmakî fêrî her qadê dibe, ew alîkariya wî dike ku bi zelalîtir fêhm bike û asîmîle bibe. Ev dikare bibe sedema bandorek bihêztir û têkiliyek rastir.

Yek ji wan zehhmetîyên danîna vê ferhengê ewe, ku hişyarî di hilbijartina bêjeyên guncan de tê xwestin, Li gorî taybetmendîyên rêgezên zimên, ji hêla morfolojî ve, pêdivî ye ku mirov di hilbijartina formên guncan de dîqatê bike, wek mînak, cûdahîyek mezin di navbera van herdû formên jêrî de:

(Taybetmendîyeke Xwedêdar e), taybetmendîyeke ji hêla Xwedayê Mezin ve, û (Taybetmendîyeke Xwedayî), ku taybetmendîyeke xwedayî ye.

Her weha, yek ji taybetmendîyên zimanê Erebî beşkirina (tesrîfkirina) pênaskirinên wê yên cûrbecûr in, ku zêdekirina her herfê, dibe sedema guhertina wateyê, nimûne wateya gotina(قتَل = kuşt) ji wata gotina (قاتَل) ciyawaz e, wateya wê ewe ku du teref di şer de beşdar dibin, lê ew ne bi wateya kuştina xedir tê; ku yek teref wê yekê ji yê din veşêre.

Her wusa, gotina(zalim: neheq) cudayê ji gotina(zellam : ango gelek zalim e) , herweha nimûneyên din ên morfolojî(peyvsazî) hene ku wateyên wan je hev cûda tên; li gorî avakirina bêjeyê an forma wê.

Peyv bixwe li gorî çerçuva (konteksta) xwe tê guhertin, ji ber vê yekê me carinan peyv di çerçuva ayeta Quranê peyvê anîyê ziman da ku wateyê rasttir ragihînin. Mînak: hevwateyên beramberî gotinên mîna xapînok, durû, derewker û munafiq, di zimanê Kurdî de pir hindik in. Wusa jî: mir, kuşt , kuça dawî ...

Ji bo vê jî pêwîstî bi pêşxistina ferhengeke hevoksaziyê ya kurdî ku zaravayên cuda yên kurdî tê de cih digire, heye, da ku ji vê dewlemendiya zimanî sûd werbigirin û li şûna paşguhkirina wê veberhênan bikin, ku dibe sedema windakirina wê.

Ji bo hemwateyên din dibe ku rastûdirûstî(wirdîtî, dîqat) pêwîst bibe di hilbijartina pila(dereca) guncan de ji bo wateyê. Em li vir îddîa nakin ku zimanê Kurdî ji hêla peyvsazî û ferhengî ve belengaz e. Belê, ew di hin waran de dewlemend xuya dike, lê dibe ku ew di peyvsazî û wateyên xwe de li deverên din hejar(nedar, kêm) xuya dike. Jiber her zimanek teybetmendîya wê heye .

Pirsgirêkeke wusa heye ku di ne wekhevî û hevwateya peyvan de bûye sedema peydakirina berztirîn zehhmetî di danîna vê ferhengê de, ji bilî vê yekê jî, têgehên

Islamî dikarin di xwe de çend wate, şîrove û mercan hilgirin. Gelek ayet û bêjeyên Quranê hene ku bi çend wateyan(maneyan) tên(xwe destnîşandikin), loma divê wergêr di navbera wan de hilbijêr(hişyar) be. Ji ber vê yekê, werger di xweza xwe de ne azad(sînor kirîye)e. Ew di rewşên weha de tixûbdar û netewaw e (nekemilandî ye). Mînak pir in, hetta di yek "Sûretê " Qur'ana Pîroz de, ku têde peyvên wekî "Al-Hemd", "Al-Rehman" û "Al-Rehîm" ên ku gelek dewlemend tên dîtin ku ew tenê di beşên wergerên cûrbecûr de ta endazeyekî hatine wergerandin.

Gelek bêjeyên sereke hene, wekî: "Rehman, Zekat, Umrah, Tajwîd, ji bilî Xwedê ti hêz û quwetê din tune ne" ku wergerandina wan li ser zimanên din ne hêsan in ku bêne wergerandin.

Di Derbarê rêkûpêkkirina rêbaza peyvên vê ferhengê de, me tercîh kirîye ku em peyvan li gorî alfabeya Erebî saz bikin. Ev ferheng bi taybetî jibo kesên ku zanîna wan bi zimanê Erebî kême, hatîye amede kirin, ji ber ku ew zimanê Qur'ana Pîroz e ku Misilman wê dixwînin. Sedema duyemîn ji pejirandina vê rêbazê ewe, ku bêserûberîya nivîsandina bêjeyên Erebî li ser tîpên Latînî de, encam dide. Lewma me peyvên vê verhengê li gorî alfabeya Erebî polîn kirine. Dûv re me di pêveka vê ferhengê de fihresa(rêzara) termên ku di vê ferhengê de hene, li gorî rêzkirina(polînkirina) alfabeya Latînî ji bo kesên ku bi zimanê Erebî nizanin, danîye.

Di derheqê deng û herfên Erebî de yê ku zimanê Kurdî ji wan bêpar e, me tîpên din danîne da ku wan valahîyên ku ji ciyawazîya(ferqa)pergala deng û alfabeyan di piranîya zimanên cîhanê de derdikevine holê, dagirin. Wek:

ḥ : ح - ẕ : ذ - ż : ظ

ŝ : ث - ṡ : ص - ḍ : ض

ţ : ط - ẍ : غ -` : مهموز

خ : x - ش : ş - ʻ : ع

ـــَــ : e ـــُــ : u ـــِــ : i


Wek ku li vir tê destnîşankirin hinek sîmbol mîna "fethehê" (ـَـ) wek(a) tê nivîsandin, û tîpa (a) bi dubarkirina wê (aa) tê nivîsandin, lê me ji bo fethehê(e) nivîsandîye, û ji bo (a)me yek carê tîpa (a) me tercîh kirîye; ev jî ji ber du sedema ye: ew guncawê nivîsandina Kurdî ya bi tîpên Latînî û qanûnên navneteweyî ne, ku ew sîmbolên tevlihev (hevdûdanî) red dikin ku ew ji du tîpan pêk tên(zêdeyî yek tîpê) lê her bi yek dengî têne dengkirin.

Her weha me nivîsandina peyvê wek ku ew tê bilêvkirin, ne wekî ku tê nivîsandin, li ber çavan girtîye, nemaze yên ku bi amrazên niyasê re eleqedar in, ji ber ku hin ji wan têne bilêv kirin û hin jî nayên bilêv kirin. Mînek dîn heye (" ة ": ta

'girêdayî), ew wek (t)ê di nava hevokê de tê bilêv kirin, lê ew di dawîya hevokê de mîna (h)ê tê gotin(bilêv kirin).

Hêjayî balkişandinê ye ku me dawiya peyvan bi guncav teşkîl nekiriye, Ji ber ku peyv li gorî cihê xwe hevoksaziya xwe diguherîne, lewra dema ku cîhê peyvê diguhezîne, ji bo kesên ne-erebî axêver re tevlihev dibe ku peyv xwedî wateyek din e, Ji ber vê yekê, taybetiya van ferhengên ji bo ne-erebîaxêvan ew e ku dawîya peyvan nehatine teşkîlkirin.

Em hêvîdikin ku vê ferhengê karîbe têgînên îslamî yên herî berbiçav pêşkêşî zimanê Kurdî kiribe û têgihiştina wan di nava gel de yên ku bi zimanê Kurdî diaxifin, hêsantir kiribe.



Mella Ibrahîmê Zivingî

1908- 1995



Mella Ahmedê Zivingî

1893-1971

Destpêkirin:

Ez vê ferhengê diyarî giyanê bapîrên me yên ku jiyana xwe di xizmeta ola îslamê de terxandine, dikim. Papîrê me yê mezin Mela Mihemed Zivingî, ku bi kûrahiya zanîna xwe di zanistên Şaerîatê de navdar bû, ew bavê du kuran bû, yek ji wan: Mella Ahmedê Zivingî ye, yê ku Dîwana Mellayê Cizîrî şirove kirîye. Ew yek ji damezrînerên yekem ên ewqafên Islamî li Cizîrê ye. Herweha, ew yek ji endamên damezrînerê tevgera(komeleya) Xoybûnê bû. Kurê wî yê din ku dibe kalikê min, navê wî Mella Ibrahîm e ku mellayê Mizgefta Mezin a Qamişloyê bû.

Em ê bi kurtî kurteyekî li ser jiyan û hewildanên wan pêşkêş bikin, ji ber ku hûrgulîyên jiyana wan di pêşgotina pirtûka " El-‘eqidu C-cewhrî fî Şirhi Dîwani Cizîrî " ya ku ji hêla Mella Ahmedê Zivingî ve hatîye nivîsandin, hatîye behs kirin. Di wê pêşgotinê de, birayê wî, Mella Ibrahîm, agahî yên berfireh li ser ravikên(koka) mallbata Zivingî, jînnama Mella Ahmed, û berhemên wî yên berbiçav, anîne ziman.

Nîşanbilind(Zaniyr) Mella Mihemed Zivingî Behtî Paloyî, ku navê wî ji çiyayê Palo ku dikeve li bakurê Dîyarbekirê, hatiyê.

Piraniya xwendina wî di dibistana (Nurşîn) de bû, ev yek ji dibistanên mezin ên Kurdistanê ye, di sedsala nozdehan de ji aliyê şêxê naskirî bi (Sîda) (Ebdulrehman kure Mella Mehmûd Teqî) ve hatiye damezrandin.

Piştî ku bawernama xwe di zanistên şerîatê de werdigire, ji Mella Ebdulqehar El-Zuqidî, Ew dest bi mamostetîyê dike, ew dibe mamosta li dibistana (Rehîmiyê) li bajarê (Sêrtê), ku tê de gelek alimên navdar xwendine, wek: mamosteyê wî Mela Hesen El-Muftî. Mella Mihemed di Sêrtê de zewicî.

Tê zanîn ku wî nêrînên xwe di marîjûyên hin destnivîsên zanistî(di çend zanistan) de anîye ziman(nivîsandiye). Ev yek dibe sebeba rakêşana xwendekarên zanyariyê yên her çar aliyên Kurdistanê da ku li ser destên wî pewerde bibin û zanyarîyê kombikin. Ew xwedanê jînnameke paqij bû, ji alîyê civakê ve dihat heskirin, xwedanê zanîsta berfireh bût(jêhatî bû), herweha ew xwedanê cihekî bilind ê olî û civakî bû. Hejayî gotinê ye ku ew ji kesayetîyên herî berz di gelek mijaran de dihat naskirin.

Lêbelê, wî ji sedema xwendina zêde ya berdewam, ronahîya herdu çavên wî di çil salîya xwe winda dike, loma ew ji bajarê Sêrtê bardike û berê xwe dide gundê Bnirvê ku ew gund dibû navenda belavkirina zanistê, û li wî gundî bi cî dibe û li wir bi çavên xwe yên kor bîst û sê salan mamostetîyê dike. Piştre vedigire gundê xwe yê bi navê Zivingê ta ku koça dawî dike .

Tê gotin li vir ku Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî (1876- 1960), yek ji navdartirîn alimên çaksazîyên dînî û civakî yên dema xwe, Ew carekê li herêma Butan derbas bû, li Zivingê sekinî û ket mizgefta ku Mela Mihemed lê dima. Bedîuzzeman dibêje ku wî dît ku ew na bînê. Wî hinek pirsên zanistî jê kirin. Mela Mihemed bersivên baş da wî. Bedîuzzeman got: Min nizanîbû ku li herêma Bûtanê alimekî bi vî derecê zane heye.

Piştî mirina Mella Mihmed, kurê wî Mella Ahmed Zivingî meşa bavê xwe didomîne. Ew di sala 1893ê de, li bajarê Sêrtê ku dikeve rojhilatê Diyarbekirê li Tirkiyê, ji dayîk dibe. Ew kesayetîyekî zanyar û xeyalberfireh ; yekta berbiçav(pirzane) dihat naskirin. Li ser destên wî pir alim, mele, mamoste û xwendekar derçûne(ma'azûn bûne). Ew di alîyê civakî de xwedanê helwestekî berxweder bû li hemberê diyardeyên paşverûtî, nezanî û neheqiyên eşîrîtîyê û parêzvanê kesên hejar bû. Ji sedema van helwestên hanê(sedema pirsgirêkên eşîrtîyê), ew mecûr dibe ku koçberî cizîra Sûrî bibe. Lê ew her rêçika xwe ya zanist û zanînê didomîne û berxwedana xwe ya li hemberê zaliman dewam dike û alîkarîya kesên hejar dike. Ew di heman demê de jî bi berxwedana xwe ya li dijî dagirkerîya Fransîyan, dihat naskirin. Ew bi tiwana û qabîliyeta xwe ji bo komkirin û çoşkirina gel dihat nas kirin. Ev bû sedemeke berbiçav ku rayedarên Fransî wî li ber çavan bigirn, wî tehdît bikin, bitirsînin û wî gelek caran sirgûn bikin, lê van hemî hewldanan nikarîn wî bêdeng bikin.

Her çend Fransa hewl dida ku nîşanî cîhanê bide ku armanca hatina wê ji bo rojhilatanavîn ewe ku alîkarî û pêşveçûna gelên wê û kes înkar nake ku dema Fransî li Sûriyê bûn, ku nêzîkê 25 salan(çaryekiya sedsalîyê) desthilata wan dewam kirîye, ku wan di wê serdemê gelek pêşketin, geşedan û projên avakirinê yên cûrbecûr de pêkanîne, belkî ji ber vê yekê ye navê wa bi Erebî kirine" Isti'mar" (jinûveavakirin:kolonyalîzm), bo nimûne. Tê dîtin ku piraniya bajarên Cizîra Sûrî ji hêla Frensîyan hatine damezrandin, û balafirgeha sivîl, embarên genim, û yên din. Lêbelê, ji alîyek din ve, Feransîyan li hemberê gelên wê herêmê , zor û zordarî dikirin. Li herêma Cizîrê şoreşa Bayandur, yek ji nimûneyên hevgirtina neteweyî ye di nav gelên wê herêmê de. Feransîyan di navbera Misilman û Xiristiyanan fitne drust dikir. Frensîyan Xiristiyan di pir waran de ser Misilmanan re digirtim û dixwestin ku bi rêya mezheb û etnîsîteyên cûdare wan nêzîkê xwe bikin û wan ji bo xizmeta berjewendîyên xwe yên kolonyalîst bikar bînin. Fransa roleke xirab di mesela têkçûna tevgera Xoyebûnê de, ku Mella Ahmed Zivingî yek ji endamên wê yên damezrîner bû. Loma ew gelek caran ji hêla Frensîyan ve(ji ber helwestên wî yên dijî-Fransîyan) hatibû tehdîd kirin ku wî ji Cizîrê derxînin. Fransa roleke gelekî xirab di pirsa dûrkirina serokên Xoybûnê ji sînorê Sûriyê de, lîstîye; bi îdiaya ku ew gefê li ser ewlehîya Tirkîyê çêdikin. Frensiyan di destpêkê de çavên xwe ji çalakîyên tevgera Xoybûnê digirtin, piştre wan Kurd wekî kaxazekî bikar anîn, ku ji bo bi Tirkan re peymanên çareseriyê çêdikin

Xebatên Wî: Piştî serxwebûna Sûriyê ji dagirkirina Fransî, biryar hate standin ku li bajarê Qamişloyê karekê Muftîtîyê bête kirin, ku ew ji hêla taybetmendîya xwe ya siyasî, aborî û civakî ve xwedanê cihekî ciyawaz bû, û ji ber durustbûn û rastbûna Mella Ahmed Zivingî, beryara erkpêdana Muftîtîyê ji bo wî tê standin.

Tê gotin ku di wê demê de li Qamişloyê, tenê mizgefteke piçûk hebû ku ew jî bi tepek û axê hatibû avakirin. Lêbelê, ew serdikeve(karibû) ku di nava demekî kurt de mizgefteke mezin li Qamişloyê avabikin, Di heman demê de, karîye civakên xêrxwazîyê jî ava kir. Herweha, bi avakirina dikanên bazarganîyê ji bo mebesta ku piştgirîyê bide civakên xêrxwazîyê û kar li ewqafê misuger bike, alîkarî daye pêşxistina karê Ewqafê. EW di encama karê xwe yê durust û berketî de tê xelatkirin ku ew çavdêrîya tevahîya" ewqafê Cizîrê" bike, û ew dibe egera(sebeba) ku beşê ewqafê serkeftî û bilind bibe û di pêşveçûnê de rola xweya erênî di xizmeta karûbarên mirovî û civakî de bilîze. Di wê heyamê de, pênc mizgeft hatin avakirin. Ji ber vê yekê, ew yek ji damezrînerên yekem ê ewqafê îslamî li wê herêmê bû.

Lê xebat û erkpêdanên wî yên pir û zêde jî, nikarîn xebatên wî yên zanistî di wêja(edebiyeta) kurdî de rawestînin, ji bo armanca vê yekê wî gelek pirtûk di mijara ziman û fiqhê de wergerandîye. Ji bilî zimanê Kurdî, wî bi çend zimanan din wek: bi Erebî, Tirkî û Farisî jî dizanîbû, nemaze, xebata wî ya mezin a şîrovekirina dîwana Mella yê Cizîrîé, yê ku bi nave "El-‘eqidu C-cewhrî fî Şirhi Dîwani Cizîrî)".

Wî di roja duşemê(6-12-1971 ê) de koça dawî kirîye, û li gundê "Tel Merouf"ê li Cizîra Sûrîyê hatîye veşartin.

Bapîrê min, Mella Ibrahîm Zivingî, melayê Mizgefta mezin bû ku li ser destên Mella Ahmed li Qamişloyê hatibû damezrandin. Di wê mizgeftê de pirtûkxaneyek hebûye ku têde pirtûkên herî baş ên ku hem Mella Ahmed û hem jî Mella Ibrahîm komkiribûn, peydadibûn, lê piştî ku Mella Ibrahîm li Qamişlo di roja 31ê Tîrmeha 1995ê de, diçe li ser dilovaniya Xwedê, piraniya wan pirtûkan hatine windakirin(bi riya diyarî, û firotin re).

- Awirek li ser taybetmendiyên weazên(xutbeyên) olî yên Mella Ahmed Zivingî:

Me mella Ahmed Zivingî di pirtûka wî ya bi navê "El-‘eqidu Ccewhrî" de bi şêwazê edebî naskirîye. Em dê vê pêşgotinê di mijara termên îslamî de bi rêya ravekirina mîtoda Mella Ahmed Zivingî di çerçuva gotinên(xutbên)înê de. Ango, wek çawa me berî niha helbesta Mella yê Cizîrî tehlîl kirîye, em ê li vir vegotina wî ya olî analîzbikin, da ku em raman(fikr) û şêwaza wî di warê olî binasin.

Mella Ehmedê Zivingî çira ronahî û zanînê bû, û ew di reftar û rûmeta xwe de pêşeng bû, berî ku ew di axaftin û mantiqî xwe de, waîzvan be.

Xutbeyên wî yên olî bi rêbazên kevneşopî di xutbeyên wî yên olî de dihatin bikaranîn; çi di warê aranjêrê û çi di warê dabeşkirinê de dişopînin, lêbelê li wir taybetmendiyeke wî ya ciyawaz di şêwaza olî de heye.

Mella Ehmedê Zivingî di weazên xwe yên olî de xwe dispêre mantiq û aqil. Loma rêbaza Mella Ahmed Zivingî sivik bû û zimanê wî hêsan bû ku li ser bingeha nîqaş û pêbawerkirinê, hatibû avakirin.

Ew tenê di sînorê pêşkêşkirina ferman û qedexeyên ku di Islamê de hene, nedima, lê berevajî wê yekê, ew piştgirê rêbaza razîbûnê bû. Ew piştgirê fikr û raman û bawerîya bi evîn û rêbînê bû, û bi zor û tirsandinê nebawerbû; di çerçuva bikaranîna rêbaza hevgirtina yekbûyî de, di kiryarên perestiyê de ku Xweda yê mezin ew di Islamê de ferz kiriye ku rojîgirtina laş(fîzîkî) û rojîgirtina giyanî (exlaqî) û her weha zekat jî heye, zekata maddî û zekata exlaqî jî heye, û bi heman awayî ew aliyê giyanî yê Hecê nîşan dide. Ango divê malê hecî ne ji dravê qedexe (heram) be, û divê bi dilxwazî be…. Wî herdem di navbera aliyên maddî û manewî (exlaqî) têwerdan(li nav hevxistin) dikir, ji ber ku ew hevdu temam dikin û hewcebûna wan di pratîkê de bi hev heye.

Mînak, em di destnimêjê de dibînin ku av wesîla destnimêjê ye di Islamê de, ji ber ku av kereseteke(madeyeke) paqijkirinê ye, ku bi wê mirov şûştina deverên herî berbiçav ên laş dike, pêşî şûştina destan, ku ew destan ji her tiştên qedexe safî dike, şûştina dev ku paqijkirina dev ji hemû gotinên xirab paqij dike, û heman tişt ji bo paqijkirina guh, ku têde bihîstinên xirab paqij dike. Her wusa, destşûştina zindan ku ji her tiştên qedexe û şermazar, paqij dike. Heman tişt ji bo paqijkirina enî û serî jî derbas dibe, ku ev safîkirina hemî tiştên qedexekirî yên ku di hişên mirovan de derbas dibin, dike û şûştina lingan, ji bo paqijkirina mirova ji rêçikên xirab yên rojane yên qedexekirî, paqij bike.

Li nik me hin destnivîsên xutbeyên olî yên Mella Zivingî hene, ku li ser bûyerên Islamî; xutbeyên ku bi Hecê re, li ser meha pîroz a Remezan û Leylet el-Qedrê, têkildar in.

Girîngiya van xutabên olî di rastiyê de diyar dibe ku ew beşek ji mîrata ne guhêzbar(ne maddî) a Cizîra Surî ye, ku ji hêla olî, etnîkî û çandî ve dewlemend e, ku di çerçuva asta vegotina olî ya ku di salên pêncî û şêstî bi gelemperî sedsala bîstan de dihatin xwendin, û bi taybetî şêwaza vegotina olî ji hêla Mella Ahmed Zivingî ve.

Em dikarin di çerçuva van xutbên wî de, rewşa rêbaza wî ya nerm, bibînin ku rêbaza wî li ser bingehê qayilkirinê tê xuyakirin; ku gereke mirov ji hev bi zimanekî hêsan têbigihîjin, ji ber bihîzerên wî ji temenên rengereng û astên çandî û zanistî yên cuda ne, mîna hemî xutbên olî, ji ber ku armanca wî ew bû ku, bandoreke erenî li ser wan çêbike, raman û adetan biguherîne û tevgerê derman bike.

Xutbeya Arafatê yek ji girîngtirîn şêweyên nîqaşa olî ye di civaka Islamî de, ji ber taybetmendiya we ya ku wê ji weazên olî yên din vediqetîne. Ew di salê de carekê tê pîroz kirin; ku ew di roja Arafatê de tê li darxistin. Ew roj tevaviya misilmanan li her deverên erdê li hev komdike, wekî rêûresma Hecê ye ku ew xwedanê pîroziyeke taybet e di asta têkiliya Misilmanan bi Xwedê re. Ew perspektîfeke dinyayî ye li ser asta tevahiya Misilmanan (ku ew roj mîna konferansekî salane ye li ciyayê Arafatê("Çiyayê Arafeh") tê li darxistin ku li wir hemî nijadên erdê ji Misilmanan li hev dicivîn.

Mella Zivingî sekinandina hecî di roja Arafatê de mîna ku di roja vejînê (qiyametê)de ji bo hesab, dibîne.

Wek nimûne Mella Ahmed Zivingî ya qanehkirina mejî bikaranîye, ji bo ku pêwîstiya çûna(pêkanîna) hecê ji bo kesên ku dikarin heçê bikin, ferz bike, weha dibêje"Hecê ji bo Mala Xwedê bikin berî ku laşên we qels bibe, dravê we nemîne, û muhletên (mirina) we nêzîk bibe. Hecê pêk bînin û xemsarîyê nekin û çûna Hacê sal bi sal paş nexin, ji ber ku garantîya meselê tûne ye, û hûn nizanin dê sibê çi dibe, ji ber vê yekê derfetê ji dest xwe bernedin, da ku hûn poşman nebin di dema poşmanî feydê nede.

Di nav xutbeyên wî yên ku di derbarê meha pîroz a Remezanê dixwend, wusa gotîye:

Demên meha Remezanê, demên hêja û biha ne, cinku rojî him şênberî û him jî giyanî ye. Şêwaza wê ya berbiçav dûrketina ji xwarin, vexwarin û têkiliya zayendî ye, ji derketina rojê heya roj diçe ava. Derbarê giyanê wî yê exlaqî de, ew dûrketina ji guneh û qedexeyan, pêkanîna peywiran, parastina xwe û ziman ji pisiyê, û dûrketina ji tiştê ku Xwedayê bilind aciz dike. Lê yê ku ji bo rojîyê xwarin û vexwarinê digire, lê ji bo gunehên xwe rojî nagire, ew dê ji bilî westîn û zehmetiyê ji rojîya xwe nebîne.

Di nava rêbazên wî yên qanihkirina hewcedarîya rojîyê de:

Ew diyar dike ku Islam ola rihetî û hêsanîyê ye. Gotina wî ya herî berz eve:

"Xwedê bar zêdeyî qeweta ti keseî nadîye. (لا يكلف الله نفساً إلا وسعها)". Cinku Xwedê dem li ser perestina xwedayî, bêhnvedanê, û xebatê dabeş kirîye. Xwedê hin demsal ji bo perestina Xwedayî terxan kirîye. Di vê jiyanê de karkerê jêhati bi ser dikeve, ye xemsar kar winda dike. Remezan yek ji demsalên karên qenc e.

Ji ber ku ev demsal bi xêr û bereket e, Xwedayê bilind Qur'ana pîroz ji bo rêbîna mirovan diyarkirîye. Mirov bexteware e ku dilê xwe bi ava tobe û poşmaniya ji tiştên ne paqij, paqij bike ku dev ji guneh û xerabîyê berde, û serdaniya qadên zanist, weaz û rêberiyê dikin. Wan bi birayên yên bawermend re bazarganî kirine û ronahîyê ji bo roja qiyametê ronî dike .

Wek mînak, wusa dibêje: Gelî bawermendan, wextê xwe vala winda nekin, lê pê ewle bin ku hûn jê (qezenc) serfiraz derkevin, û xwendina Quranê zêde bikin, ji ber ku ew behara dilan e, paqijkirina çavan û dermanê giyanê ye. Jiyan bi sînor e û mirin dê were.

Mebesta wî bikaranîna termên jîngehê ewe ku sûdên Remezanê bi civaka çandinî razî bike. Herweha, peyvên bazirgan, û yên qezencvan jî bikaranîne da ku van koman ji pêdivî, sûd û girîngiya van fera'yza qane bike; bi karanîna peyvên wan ....

Meyla wî bêtir ji bo xwestinê bû ne ji bo dijwarê bû.

Bi dîtina Mella Ahmed Zivingî her tişt zekata wê heye, zekata laş rojîgirtine, û rojî jî ji bo bawermendan dibe mertal û keleh li dijê agir.

Rêbazên kanîkirinê, ew in ku behsa qezencên ferayzên islamê û feydeyên wê yên maddî û manewî bikin.

Wî pir daxwaz dikir ku her kesê ku bi laş û dravê xwe, berî dawiya jiyanê, hecê bike. Li ser wê yekê pêxember (silave Xwedê lê be) dibêje :

Kî here hecê, dê rûreş nebe û bêedebî neke, ew dê vegere wekî roja dîya wî ew anî dinyayê. (من حج لله فلم يرفث، ولم يفسق رجع كيوم ولدته أمه).

Her wusa, gotina Pêxember: (Hac tiştê ku berî wê bû wêran dike). Had hedîsên din ên ku Hec û xelata wê teşwîq dikin.

Her wusa, Pêxember dibêje: (Hec tiştê ku berî wê bûne, wêran dike). Herweha, hedîsên din ên ku Hec û xelata wê teşwîq dikin, hene.

Zivingî pir daxwaz dikir ku roja Erefê rojî bigire, ji ber vê yekê wî digot: Bizanin ku rojîgirtina li roja Arafeyê yek ji baştirîn parastin e, ku pê re guneh û kiryarên xirab bêne paqij kirin.

Di derbarê rojiya roja Erefatê de, wate gotina wî eve: Xwedayê bilind gunehan di sal berî wê û sala piştî wê de efû dike .

(إني أحتسب على الله أن يكفر السنة التي قبله والسنة التي بعده)

Pêxember Xwedê got: "Kesek di roja Erefatê de di dilê wî de bi qasî zerekî(atomekî) baweriya wî bi Xwedê ve habe Xwedê wî bibexşîne." Mirovek got: Ji mirovên naskirî re, Ya Resûlê Xwedê, bi gelemperî an ji hin mirovan re? Wî got: "Ew bi gelemperî hemu mirovan e."

Ew wusa feydeyên rojiyê dinirxîne:

Di rojiyê de şehrezayiya olî, şehrezayiya bijîşkî û şehrezayiya civakî heye. şehrezayiya olî ji bo rêgirtina li hesreta (daxwazin) maddî û psîkolojîk, serbilindiya

dorpêçê, û şehrezayiya bijîşkî ku zikê xwe rehet bike, ji hedîsa Pêxember re dibêjin (صوموا تصحوا): (rojîyê bigrin; hunê sax bibin). ya civakî, ku dewlemend û xizan di êşa birçîbûn, bêparbûn û tengasiya psîkolojîk de wekhev êş dikişînin, da ku êşan parve bikin, ku dewlemend debara xwe li hewcedaran belav bikin. Wî ji Misilmanan xwest ku di vê mehê de kêfê nekin; gereke ew pêşîn xebatê bikin, dûv re jî îbadetên xwe bikin da ku nêzîkê Xwedayê bilind bibin.

Ji vegotina hedîsên ku fezîlet û xelata rojiyê destnîşan dikin eve ku du şahîyên rojîgirtinê hene, şahîya yekem: dema ku mirov rojiya xwe vedike û şahiya duyem dema ku ew bi Rebbê xwe re hevdîtinê çêdike. Hedîsek din: "Li cennetê du deriyên bi navê El-Rayan hene. Tenê yên ku rojiyê digirin dê têkevin hundurê wê, û di dema ku ew têkevin hundurê wê, derî tê girtin."

Adet û exlaqê teşwîqker:

Xutbeyên olî bi pirsên ewlehiya nodal, ewlehiya ramanî (fikrî), û çaksaziya tevgerî re girêdayî ne. Axaftina olî armanc dike ku nirxên geşedanê yên ku endamên civakê ji bo çaksazî û avakirinê daxwaz dikin, nas bikin. Mînakên pêşkeftina nirxên civakî (wekî tevgera baş, hevkarî, hwd.)

Du celeb xutbeyên olî hene: Xutbeyên dinyayî û yên dawînî(axiret).

Mella Zivingî di xutbeyên xwe de, daxwaza pêkanîna erkên olî dikir, wî di her gavê de, dixwest ku mirov bi helwestên exlaqî leyeq tev hev bigirin. Li ser pirsa pêkanîna Hecca ferzbar, wusa exlaqiyeta wê ya jêrîn destnîşan dike:

Karên qenc bikin , berê ku mesele ji destê we derkeve zû bilezînin û hûn bêçare û poşman dibin, û di riya Xwedê de xerckirin, û qenciyê bikin, çimkî Xwedê ji qencîkaran hez dike (إن الله يحب المحسنين).

Mirov dibîne ku ew xwedanê rêbaza pêbawerkirinê(îqnakirinê) bû, di dema ku wî mirov di rêçika exlaqên baş şîret dikirin.

Şîreta wî di derbarê Hecê de, wusa ye : şert û mercên exlaqî yên heccê ew in ku divê mirov ji dirava xwe ya helal û niyeta xwe ya qenc Heeca xwe çêbike, û bi dilxwazî. ji ber ku ew lêçûnek e ku pê re qencî, bereket tê. Ku divê Heca wî ne ji diravê neqanûnî be (heram be) , wî digot pewiste ku mirov dest ji guneh û pevçûnan berdin. Devê bizanibin ku Hec ne ji bo kêf, û gerandin, û bazirganiyê ye, lê ji bo xatirê Xwedê û serdana Pêxemberê wî ye.

Heman şîretê ji bo rojîya roja Arafayê dibêje, û wî şert dikir ku ew rêzikên exlaqî pêk bînin:

Rojî gunehan radike û dibore, ji ber vê yekê Mella Zivingî digot: Ji vê fersendê sûd werbigirin, Xwedê rehma xwe lê we bike, û vê qezencê ji destên xwe winda nekin,

kirinên xwe sererast bikin, û guh bidin gotinên xwe heya ku hûn biserkevin û pejirandin û nêzbûna Xwedê misuger bikin(bistînin).

Bi minasebeta hatina meha Remezanê ya pîroz, ku ew ji misilmanan re dibe mêvanekî hêja, û wî ji misilmanan xwest ku ji mêvanperwerîya xwe re rêzdar bin, erkê xwe li hember wî bikin, ji gunehan poşman bibin, û ji kiryarên xirab veqetin, ji ber ku Xweda yê bilind ev meh kirîye meha rehmê, borîn û bexşînê; ango kirinên qenc di wê mehê de pir dibin, her weha kirinên xirab jî pir dibin.

Ew di nava fezîletên meha Remezanê de têne hesibandin, wek parastina ziman ji derew û şûjinê, parastina çav û guh ji nihêrîn û guhdarkirinê, parastina zik ji xwarina tiştên qedexe û gumanbar û parastin ji hemî lebatên(hastên) ji gunehan. Ne ku bi mijarên dinyayî re mijûl bibe, lê di heman demê de ku xwe di vî mehê de xwe bi îbadetê terbiye bike.

Wî rojiya mirov teşwîq dikir ku paqij û baş be, û ew êşa cîranê xweyê belengaz hîs bike ... Ne ji Islamê ye ku ew zikê xwe ji xwarina rojîyê dagiire û ziman bi bêedebî û axaftinên pîs bike. ... Rojîgirtin ji bo laş werzîşî ye û ji giyan re jî rehetîye. Yê ku rojî digire, ew fêrî sebir, bîhnfirehî û hêza biryardariyê dibe, û ew dihêlê ku ew kirina qenciyê bike û ji tiştên qedexekirî dûr bikeve. Bang li bazirganan dike ku xapîne û bêbextîyê nekin û divê karmend erkên xwe bi cih bînin û berjewendiyên mirovan têk nebin.

Heman tişt ji bo mezinahîya Leylet el-Qedr derbas dibe, wî pêkanîna rêûresmên taybet yên vê şevê wek şeveke taybet bi kiryarên baş destnîşan kirîye, ji ber ev şev ji hezar şevan çêtir e.

Şêwaza wî palpişta xwe danîye li bingeha dijberî û bereweriyê ye, da ku cudahîyê di nava herdu dîmenan de çi erênî û çi neyînî berz bike ji bo mebesta pêbawerkirinê (eqnakirinê).

Mirov dikare hêjayên exlaqî yên ku Mella Ahmed Zivingî di dema ku wî ji bo bicîhanîna ferayzeyên sereke yên Islamî bang dikir; di nimêj, û rojî û Hecê de: bilezkirina kirinên qenc, xerckirina ji bo Xwedê, dilsoziya durustî û paqijiya bazirganiyê û çêkirina drav, hiştina pîs û gunehan, û dûrketina ji gengeşîyan, ezberkirian ziman xwe ji derew û şûjinê, parastina çav û guhan ji nihêrîn û guhdarkirinê, parastina zik ji xwarina tiştên qedexe û gumanbar û parastin ji hemî lebatên(hastên) ji gunehan. Ne ku bi mijarên dinyayî re mijûl bibe, lê di heman demê de ku xwe di vî mehê de xwe bi îbadetê terbîye bike. Bang li bazirgan dike ku xapîn û bêbexî ye neke û ji karmendan dixwaze ku erkên xwe bi cih bînin û berjewendiyên mirovan têk nebin.

Bi gelemperî, wî herdu biwar(warên) rastehev û têkilhev digert, wî rica dikir ku peywirên Islamî, bi kirinên qenc temam bêne kirin, û ji xerabî û gunehan dûr bikevin.

- Dua (Daxwaz):

Ew armancên dinyayî û dawîyê li hev tîne.

Lê wî duayên axîretê ji duayên dinyayî bihtir dikir.

Mînakên duayên wî ku xutbeyên xwe di demsala Hecê de diqedandin:

Xudayê me, Hecek bêkêmasî (pir baş) bide me, û hewildanên(lêgerîna) me hêjayî bawerbar bike, û bazirganiya me têk nebe, û rêyên başî û bextewerîyê ji me re hêsan bike, û di parastinê de dilpakiya me dide, û karûbarên dinayê di çavên me de piçûk bike, û êşên axîretê di dilê me de mezin bike, heya ku em bi we re hevdîtinê bikin û hûn ji me razî bin, ey herî dilovanê dilovanan.

Ew jî tê de:

Ya Xuda, kirinên me bicîh bike, gotinên me rasterast bike, gunehên me bibaxşîne û qusûrên me bi kerem û comerdîtiya xwe veşêre, ey Xêrxwaz û Dilovan.

Ji duayên wî di meha Remezanê de:


Xudayê me, Rojiya me, û hemî kirinên me qebûl bike. û xema meya herî mezin ji bo bexşandin û razîbûna te bide, û armanca dawîn a dexwaza me ew e ku em xwe bisipêrin yên din, ji xezeba te çi hewce dike xilas bibin, û ku tu me ber bi riya zanîna xwe ve bike, ey Dilovanê Dilovîn û Dilbirehîm.


Xudayê me, Kî ji me qenciyê dike, wî bi kerama xwe zêde bike, û yê ku di nav me de zalim be, wî bibexşîn û bexşandina dilovanî ya xwe bide wî.

Wî di xutbeyên xwe yên olî de, tenê li ser rewşên olî dixwendin, û wî dua ji bo warên siyasî nedikir, ji bo parastina serokê welat û dewlemendî û pêşkeftina welat ji ber şehrezayiya serok welat dua ne dikir, wekî ku bi gelek weazvanan re ye. Daxwaze weazvanan ne ji bo sererastkirina serdest û balê bikişînin ser kêmasiyên ku welat dikişîne ye, wan bi piranî dua ji bo serketina gavên wî yên dadperwer didan, dikirin. Wî xwe ji durûtiyê dûr dixist, nemaze di wê serdema aloz a dîroka Sûriyê de; di navbera salên 1950 û 1960ê (an) de, ku bi darbe, alozî û nearamiyê dihat naskirin.

Tê xwestin ku li vir bête gotin ku çapkirina pirtûka (El-‘eqidu Ccewhrî fî Şirhi Dîwani Cizîrî) di dema Komara Erebî ya Yekgirtî de hatîye redkirin. Ji bo vê pirsgirêkê Mella Ahmedê Zivingî kurtenamekî ji bo kesayetîya Serokomarê wê demê re, dişîne. Ango ji bo serokê Komara Erebî ya Yekgirtî, serok Cemal Abd An-Nassir re. Mella Ahmedê Zivingî di wê kurtenamê de li ser dozê Kurd û çanda kevnar a Kurdan, û girîngiya helbeste Mella yê Cizîrî di weja klasîka kurdî de balê dikşîne. Di encamê de serok Abd An- Nassir(1958) bi çapkirina vê pirtûkê razî dibe. Mella Ehmedê Zivingî

xwedanê rêbaza mantiqî û argûmana maqûl bû ku fikr û ramanên xwe bi mirovan û civakê bide pejrandin(qebûlkirin).






خطبة رمضان (١)

ايها المسلمون قال الله تعالى في كتابه الكريم فبشر عباد الذين يستمعون
القول فيتبعون أحسنه أولئك الذين هداهم الله وأولئك
هم أولوا الألباب ويقال رسول الله صلى الله عليه وسلم
كل أمتي يدخلون الجنة الا من أبى اي امتنع قالوا ومن
يأبى يا رسول الله قال من أطاعني دخل الجنة ومن عصاني
فقد أبى ايها المسلمون ان الله تعالى رضي لنا الاسلام
دينا واختار لنا صفوة خلقه نبيا ورسولا وأكرمنا
بالايمان وشرفنا بأن جعلنا من أمة القرآن فبين
لنا رسول الله صلى الله عليه وسلم طريق الفوز والفلاح
وسبيل السعادة والنجاح فأرشدنا وهدانا الى الطاعة
التي يحبها الطائعين ويكافئ المخلصين ويضاعف
ثوابه على الحسنين وشريعته صلى الله عليه وسلم
شريعة يسر وسهولة فلم يكلفنا الله بها بما لا
نستطيع عمله فقال تعالى لا يكلف الله نفسا الا
وسعها فقسم لنا الاوقات الى اوقات للعبادة
واوقات للاستراحة فمن الزمان ما هو موسم للعمل لله
والاجتهاد ومنه ما هو زمن للنفس يصرفه المرء
في الراحة والرقاد وما ذلك الا رحمة بنا واستثارة
لهممنا فجعل لبعض العبادات مواسم معينة يربح فيها
الجد العامل ويخسر الكسلان العاطل وها

(٢)

نحن الآن ايها المؤمنون قد دخلنا في موسم من مواسم
الخيرات من تاجر فيه مع مولاه الغني الكريم بعزيمة صادقة
ونية خالصة كانت تجارته مباركة رابحة
يوم القيامة مع الذين أنعم عليهم من النبيين والصديقين
والشهداء والصالحين وحسن أولئك رفيقا ومن تهاون
فيه وتكاسل وضيع أوقاته ما بين نوم وكلام ولهو
ولعب واشتغال بما لا فائدة فيه يوم القيامة فقد
ضل ضلالا بعيدا وخسر خسرانا مبينا الا ان هذا موسم
مبارك ميمون أنزل الله فيه القرآن هدى للناس وبينات
من الهدى والفرقان فيا سعادة من اغتنم هذه الفرصة
نطهر قلبه بالتوبة والندم على ما فات وعزم
على هجر الذنوب والموبقات ورضي بطاعة الله
فيه جليسا وبذكر الله أنيسا وتردد على مجالس
العلم والوعظ والارشاد وتاجر فيها مع اخوانه المؤمنين
واقتبس منها انوارا تنير طريقه يوم العرض على رب
العالمين ايها المؤمنون لا تضيعوا هذه الاوقات
سدى بل احرصوا ان تخرجوا منها رابحين فأكثروا
من تلاوة القرآن فانه ربيع القلوب وجلاء الابصار
وشفاء لما في الصدور وداوموا على قيام هذه
الليالي الفاضلة فان العمر محدود والاجل يأتي



Ferhenga Têgînên Islamî

(Kurdî - Erebî)

(أ)

(ئیمامەکانی فەرموودە) zanyarên pêşeng ên hedîsê **: 'a'immet al-ḥedîŝ أئِمَة الحَديث**
Zanyarên mezin ên hadîsê. Zanyarên rasterast, di mijarên nivîsên olî de û bîranînek wan a xurt "bihêz" di mijarên nivîs û zanista Sunnetê "zanyariyên kevneşopiyên Pêxember" de pispor (baş fêrbûne).

teyreyên belawela(belav) **: ababîl أبَابِيل**

Ji gelek aliyan ve li dû hev diçin. (105: 1-5)

(ڕێپێدانە) destûrê dide**: 'abaḥa (yubîḥ) (يبيح) أباح**

(ڕێپێدان) destûrdanîn, çêkirina qanûnî : **ibaḥeh إباحة**

revendin : **ibaq :إباق**

Xulam bêyî sedemek rewa direve.

(نوێکاری) nûvekirina olê : **ibtida‘ ابْتِدَاع**
Nûbûn nîşanî tiştên ku Pêxember (Muhemmed nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) an jî hevalên wî nekiriye, nemaze di pratîkên îbadetê de bi taybetî. "bid‘eh" bibînin.

(لومپ) birrîn : **abter الأبْتَر**
Yê ku bîranîna wî ji çêtirîn dunya û axretê ye hatî yê birrîn, û dûndana wî ya nêr hatîye qutkirin.

(ئیبتیهال) spertekirin . daxwazî : **ibtihal اِبْتِهال**
Xwedabangî (du'a) bi wateyê ku ji bo alîkarîya rênîşandanê û dilpaqîyê dikin. (Li Quranê binihêrin, 3: 61.)

(تووشبوون) ezmûnên : **ibtila' ابْتِلاء**
Ceribandina baweriya kesek yan bi tiştên baş an xirab . (Binêrin Qur'an, 18: 7, mînak.)

(هەتاهەتایی) herdem **: 'abed أبَد**
Berevajiyê wê "berwext, serdem, demî". Ew dema bêdawî nîşan dike.

(ڕاست) mirovên rastdar **: 'abrar (tek. berr(un) (بر)أبْرار**

Îbrahîm : **Ibrahîm إبْرَاهيم**
Ew Peyxamber bû, û ew tê bavê Pêxemberan tê hesibandin. Ew e yê ku xwedamend(pût) şikandiye, û ew e yê ku bi fermanê Xwedayê mezin hatiye Mekkeyê. (Al-Qur’an, 22: 26-27), (Al-Baqarah 2 : 130, 135).

sûreya Îbrahîm : **'Ibrahîm (sûreh) سُورَة إبْراهيم**
Ev sûreyê 14ê ji Quranê ye, ku sernavê wê ji navê Pêxember Îmbrahîm tê nagkirin. Ew mijûl bû: baweriya bi koka xweya mezin, wehî, wezîfe, yek-xwedayî, vejîn, hesab û xelatê heye. Di sûretê de çend rastîyên bingehîn hebûn, ku ya herî girîng ji rastiya yekîtiya peyam û peyamberan, yekîtiya vexwendina wan û rawestana wan li rex yek milêtî li pêş nezaniya derewîn a ola Xwedê li cîh û demên cûda bû. Rastiya kerema Xwedê ya li ser mirovahiyê diyar dike û

înkarkirina piraniya mirovan jê re bi înkar û kufr in .

((نادروستە (بێ بڕوا)) ji bo betalkirinê **: 'abţala (yubţil) (يُبطل) أبْطل**

Ew ji bo Ku tiştekî an hin çalakîyan betal bike, wek nimêj(linimêj), rojgirî, danûstendina bazirganî ... hwd. wekî mînak ken(pêkenîn) di dema nimêjê de.

(پوچەڵکردن) betalkirin . hilweşandin : **ibţal إبْطال**

Li 'abţel (yubţil) ê binêrin.

xulamê ku ji xwedanê direve **: 'abiqآبِق**

Xulamekî ku ji sedemeke ne rewa ji axayê xwe direve.

(ڕابگەیەنن) ragihandin **: 'ablexe (yublix) (يبلّغ) أبلغ**

Ji bo ku peyamê ragihîne.

iblîs إبْليس

Cinna ku guh nedaye Xwedayê Mezin û ji rehma wî hatiye dûr xistin(avêtin). Ew Iblis bû ku hiştiye Adem û jina wî Hewwa (Hewa), silava li ser wan be, ku xwe nêzî dara qedexekirî bikin. Daku Şeyitanî bibînin. Binêrin Qur'ana pîroz (2 : 30-39. 15 : 30-40)

(گەشتیار) rêwîtkar : **ibn as-sabîl اِبْن السَّبيل**

Di Qur'anê de ev term ji bo kesên rêwî tê gotin ku pêdiviya wan bi alîkarîyê ye heye. Ew ji heşt sinfên ku heqê xêrê misuger dikin, pêktê ku zekatê bidin vî kesekî (Li Quranê binihêrin, 8:60).

kurê Meryem : **ibn meryem ابْن مَريَم**

Navê wî yê temam "Isa bin Maryam" e, ji ber ku ew bê bav bû.

xercek **: îtaweh (خَراج) إتاوَة**

Draviyeke ku ji bo serwerîyê ye wekî delîlê radestbûnê an wekî bihayê ewlehiyê tê. Ew ya ku wekî nefret tê dîtin.

(بەدواکەوتن) yê ku tê şopandin : **ittiba' اتّباع**

Li pey yên din . Ew bi gelemperî ji bo şopandina hînkirin an rêgezên hin zanyar an serokên olî ye tê bikaranîn .

(دوای خۆشەویستیەکە) şopandina daxwazîyên xwe : **ittiba' al-hewa اِتباع الهوى**

Musilman li pey hînkirinên olê, li pey xap û daxwazên xwe nagirin. (Binêrin li Quranê 6:56).

(لە خوایە بترسن) ji Xwedê bitirse : **itteqî-Allah اِتقِ الله**

Ev vegotinek ku bi gelemperî di gotinên Islamî de tê bihîstin (mînak, hînkirinên Pêxember Muhemmedî (nimêj û silavên Xwedê lê be) û hetta di danûstandinên rojane de ta roja îro.

(بۆ ترس) tirsa ji Xwedê : **itteqe (yetteqî) (يتّقي) اتّقى**

Ji Xwedê bitirsin û parastina xwe ji agirê dojehê bikin, û ji xezeba Xwedê û cezakirinê wî , bi îbadet kirin. (Li Quranê binihêrin, 2: 203 û 5: 92).

(پشتبەستن) girêdayî . bawerî : **ittikal اِتّكال**

Gotinek bi gelemperî tête vegotin ji bo destnîşankirina hiştina tiştan di destê Xwedê de tê bikar anîn. Bi navgîniya hevoka (tewekkel 'ala-llah) ye ku bi wateya,"bi Xwedê bawer be" tê.

(زەکات دەدات) heqê drav bide(heqdana dravê)**: 'ata (yu'tî) az-zakahالزكاة (يؤتي)آتي**

Ew dana dayîne jibo belengazan. Dravkirina zekatê yek ji wan pênc pileyên "stûnên" Islamê ye. Ew li ser teserûf, mal û stokan, û her weha hilberên çandiniyê tê dayîn.

(کاریگەری) şopîn : **'aŝer (al--) الأثَر**

Car caran, ev peyv ji bo vegotinên kevneşopiya Pêxemberîyê (nimêj û silavên Xwedê lê be) an gotinên hevalên wî, tê bikar anîn.

(گوناهی) guneh, kirina çewt : **iŝm (kom. 'aŝam) (آثام) إثم**

Her karê hînkirinên îslamê binpêdike.

(دوازده) dozdeh : **iŝna 'eşeriyyeh اِثنا عشرية**

Mezhebek ji Şîyan ku baweriya xwe bi diwanzdeh "imam" heye.

(زۆر خوێ) pir şor û pir germ **: ujaj أُجَاج**

{هَٰذَا عَذْبٌ فُرَاتٌ وَهَٰذَا مِلْحٌ أُجَاجٌ}. [52 :25 Al-furqan] .

(دەرئەنجام) encambûn (kêşandin) : **'ijtihad اِجْتِهَاد**

Ew behsa hewildanekî dadrêsekî jêhatî dike ku meriv dadrêseke qanûna dadperwerî ya dadrêseka ku rastîyê derxîne holê an ew li ser bingeha delîlên ku di Qurana pîroz û Sunnetê de hatine dîtin, dike. cihê fermanên zelal yên darizandî tune ye.

(خەڵات) salix û xelat **: 'ajir (kom. 'ujûr)(أجُور) أجِر**

Di wateya normal de, peyv bi wateya dayînê tê an drav ji bo karûbarê ku hatine pêşkêşkirin. Lê di wateyeke giyanî de wê xelatê ji Xwedê distîne.

(پاداشتی گەورە) xelata bêjimar. Ji wan qut nebûye **: ajirun ẍeyr memnûn أَجْرٌ غيرُ مَمْنُون**

{لَهُمْ أَجْرٌ غَيْرُ مَمْنُونٍ} ango : xelata bêjimar , ji wan qut nebûye . (Al- inşqaq : 25: 84 . At-tîn 4 :95)

(پاداشت) xelat û tazmînat **:'ajir (al--) waŝ-ŝewab الأجِر والثَّوَاب**

Xelat û berdêlên ku Xweda ji Musulman re ji bo her karekî qenc daye, di nav de jî redkirina kiryarên gunehbar.

destûr dayê : **'ijazeh إجَازة**

Di çarçoveya olî de, ev tê wê wateyê ku xwendekar destûr biriyê ku tiştên wî ji zanyarên taybet in (şêxê wî) fêr bûye, ku ew fêr bike.

wexta diyarkirî **: 'ajel (kom. 'ajal)(آجَال)آجل**

Têgeha îslamî ku di dema mirinê (kesê)de vedibêje. Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de di bêje ku ew ê dema mirinê naguhere, (Ji ber vê yekê, mirov nikare wê biguherîne).

(کۆدەنگی " تەوافوقی") lihevhatin : **'ijma‘ إجمَاع**

Lihevhatina hemî an piraniya dadmendên pêşeng ên li ser hin mijaran ne . Ew yek ji çavkaniyên bingehîn ên daraza îslamî tête hesibandin.

(تەوافوقی ناوخۆیی) lihevhatina hunderî(veşartî) : **'ijma‘ ḍimniyî إجْمَاع ضُمني**

Mesele gava ku hin zanyar nerînekî diyar dikin û bi berfirehî tête belav kirin. Lêbelê, zanyareke nûjen xwe dijberî wê nake.

(تەوافوقی ئاشکرا) lihevhatina eşkere : **'ijma‘ ṡerîḩ إجْمَاع صَرِيح**

Ew gava ku zanyar bi eşkereyî li ser mijarekê li hev bikin.

(کۆدەنگی سکۆتی) lihevhatina bêdengiyê : **'ijma‘ sukûtî إجْمَاع سُكوتي**
Lihevhatina nerînê ji nerazîbûnê nabe.

(" بێگانەکان " بێگانە) beyanî . xerîb **: 'ajnebîy (kom. 'ajanib)(أجانب) أجْنَبي**
Gotineke ku kesek ji jinan re qedexe ye. Ji ber vê yekê, divê ew bi wê tenê nebe.

yekdar **: aḥed أحَـــد**
1-Yek. Ew bi cewherê xwe an bi taybetmendiyên xwe nayê qiyas kirin.
2- Ji xwedê pê ve tu xwedê tune ye.

Uḥud أُحُد
Çiyayek li derveyî Medîneyê ye, musilmanan di sala 3ê hijrî de şerê xwe yê duyemîn ê mezin li dijî Qurayş-paganî ya Mekkê pêk anîne. artêşa Qureşî ku ji 3000 zilaman pêk dihat bi serokatiya Ebû Sufyanî êrişî arteşa musilman a ku hejmara wan nêzî700 ta1000 mêrî bû. di destpêkê de şer baş derbas bû, lê musilmana şer ji du sedeman winda kirin. Pêşîn, nêzîkê pêncî tîrekvanî (remecî) şîretên Pêxember Muhemmedî paşguhdar kirin û cihên xwe berdidin terk (dikin), û vê yekê hişt ku musilman neçar bimînin ku encam bide. Duyem, 300 kesên dirû xwe ji qada şer xwe şûnve dikşînin û bazdidin. (Li Qurana Pîroz binêrin, Al- 'Imran (3): 121-128, 140- 180.

'aḥdeŝe (yuḥdiŝ) (يُحْدِث) أَحْدَث
1- Çêkirina kiryarekî an kirina tiştekî ku dibe sedema nepoxa rîtuelî, mîna derbasbûna bayê di nimêje de .
2- nûkirin : Di derbarê olê de tiştekî bikin ku Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be), ve nehat hînkirin an çavdêr kirin . (Binihêrin "bid‘eh").

Ahadîs **: Ahadiŝ أحَاديث**
Pirrjimara Hedisê, ku bi wateya kevneşopên Pêxemberê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) tê , û derheqê rêwerz, gotin, kirin û tevgerên Hevalbendan ku bi taybetî ji hêla wî ve hatine pejirandin.

(قۆرخکردن) yekdest (yekparêzî) : **iḥtikar احْتِكار**
Di hêla Islamê de yekdestdariya xwarinên bingehîn qedexe dike.

xwîna hişk(mastkirin) : **iḥtilam احْتِلام**
Xwînek ku ji sedema rabûna zayndî û avêtina şîrê mêr çêdibe. Ev hewceyê şuştina tevahiya laş e berî ku meriv nimêj bike yan jî xwe bi Quranê ve girê bide yan jî ayetên ji wê bixwîne.

ji bo Xwedê : **'iḥtisab إحْتِساب**
Tiştê qenc ji bo Xwedê bêyî ku mirov li benda xelata kesekî bisekine, bike.

pêşîgirtin : **iḥtiyaṭ احْتياط**
Ji tirsa ku guneh bikeve, wê tiştek werê kirin an jêgirtin.

'iḥram إحْرَام
Rewşek ku hecîyekê Mekkeyê hin rêzikan digire, mîna ku kincê "hhram" li xwe bike û dev ji kiryarên qedexekirî yên wekî zayndî, nêçîrkirin, bîhnxweş kişandin û birrîna porê (qut bikin)berde.

(خێرخوازی) **'iḥsan إحْسَان**
1- xêrxwazî :Qencî û xweşikî ji yên din re bike an jî bi kerema xwe nîşanî wan

bike.

2- di awayê çêtirîn de tevbigerin: Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) bi vê gotinê dizanibû û digot: Wekî ku hûn wî dibînin, ji Xwedê re biperizin û heke hûn wî nabînin, lê ew we dibîne. "

sersaxiyên dilsoz : **'ahsene-llahu 'eza'akum أَحْسَنَ اللهُ عزاءكُم**

Gotineke ji mirovekî xemgîn ku ji Xwedê dipirse da ku wî rihet bibîne

astengkirin : **'iḥṡar إحْصار**

Nebûna pêkanîna hecê "ji ber mercên nediyar derbas dibe. (Qur'an, 2: 192).

zewacê tevlihev : **'iḥṡan إحْصان**

Di Qurana pîroz de gelek wateyên wî hene; Dibe ku ew pak be, ew dikare bi azadî, zewacê bike. Li gorî 'iḥṡanên di Sunnetê de, ew di tevahîyê de, bêyî hûrgulî tête destnîşan dike, ji bilî yên di hin hadîsan de. Di cezayê zinayê de, cûdahî di navbera "keçik" û kesê zewicandî de heye.

parastin . qenc be : **'aḥṡene (yuḥṡinu) (يُحْصِن)أحْصن**

Ji bo ku xwe ji têkiliyên cinsî yên neheq(neyasayî) biparêze.

zewicî :**'uḥṡine (yuḥṡinu) (يُحْصِنُ) أُحْصِنَ**

Zewacê nîşan dike, (Li Qur'anê binêrin, 4: 25.)

biryar : **'aḥkem (tek. ḥukim) (يُحكِم) أحْكم**

Di îslamê de ast û celeb û rêzikname hene, ku li gorî wan her kiryar darizandî dibe: mecbûrî (fardd / wajib), bi tundî tête pêşniyar kirin (sunnet), dilsoz, (mustahabb), ne lihevhatî / (mekrûh), qedexe ye (hheram).

pir pesnê hêja : **'Aḥmed أحْمَد**

Ev yek ji navên Pêxember Muhemmed e (nimêj û silavên Xwedê lê be). Ïssa (silava Xwedê lê be) hatina wî bi vî navî pêşbînî kirîye. (Li Quranê binêrin, 61: 6).

(زيندووكردنەوەى شەو) dereng bimînin : **'iḥya' al-lyel إحْياء اللَّيل**

Di şevê de şiyar dimînin jibo bawerî û pêkanîna.

(زيندووكردنەوەى مردووان) çandina axa virikî : **'iḥya' al-mewat إحْياء المَوات**

Li gorî hin dibistanên zagona Islamî, tê wateya amadebûna gelek axa ne xwedan ji bo karanîn, wek rûniştinê, kolan, an çandiniyê, bi çandkirina dara an çêkirina qenciyekî. Bi kirina vê yekê mirov dikare xwediyê erdê be.

(براى شيردان **)** birayê hevê şîr : **'ax bi ar-reḍa'eh أخ بالرَّضَاعَة**

Lêkerekî bêteref; bi wateya dana tiştek baş(xêr) an xirab (şerr)tê, kîjan hêja ye. Ji ber vê yekê, di dema ku em bixwazin spasiya kesekî bikin, divê em bêjin: "Bila Xwedê te baş xelat bike." "jezak Allahu xeyran."

baca parastinê : **jizyeh جِزيَة**

Baca ku ji hêla welatiyên ku ne-musilman ve ji bo Dewleta Islamî ji bo parastina wan tê dayîn . "Ahil z-zimmeh" bibînin.

Jeferî: **Je'ferî جَعفري**

Ew li dûvçûnerê mezhebê Şîya ne ku dibêjin ew li pey mela Je'fer As-Sadiq, ku dibe neviyê Îmam Elî, pismamê û zavayê Pêxember Muhemmed, diçin.

mûçe . diravdan : **ju'el(kom. ju'ûl) (جَعل) جُعول**

(رۆب) **jilbab (kom. jelabîb) (جَلابيب) جِلباب**

Ew ji bo cilekeke ku vekirî ye û bi gelemperî li ser cilên derveyî tê li xwekirin. (li Qurana kerîm binêrin , 33: 59).

(لێدان . قامچی) lêdan . qamçî : **jeldeh (kom. jeldat)(جَلدات) جَلدة**

Di cezayê lêdanê de, ew bi gelemperî li gurî celebê sûcê tê pîvandin, wekî 80 an 100 qamçî .

(دانیشتن) rûniştin : **julûs جُلوس**

Di nimêjên ferz de, ev helwesta ku mirov çokên xwe xwar dike û li ser lingên xwe rûdine, lingê xweyê rastê bi awayekî rast hildigire, û tiliyên wî dikevin li ser erdê (bi erdê ve dikevin). Qurrika wî bi tevahî li ser lingan dimînin.

rûmet, mezinahî : **jelîl (al-)الجَليل**

Taybetmendiya xwedayî. Mezinahiya Jelalata Wî ya bêhempa.

Jumada Yekem : **Jumeda al-ûla جُمادى الأولى**

Navê meha pêncemîn e ji salnameya îslamî.

Jumada Duyemîn : **jumada aŝ-ŝaniyeh جُمادى الثاني**

Navê meha şeşemîn e ji salnameya îslamî. Navekî din; jumada al-axir .

(پەیوەندی سێکسی) karê cinsî : **jima' جِماع**

Karê cinsî dibe sedema "nepakbûnê", loma tê xwestin ku mirov tevaviya laşê xwe bişû, heta di rewşa ku avika mêr di bûyera razana jinûmêr de neyê-avêtin.

koma, civatin : **jema'eh جَماعة**

Di dema ku nimêjker digihin hev, peyva"Selat al-jema'eh" (nimêja bi hevre); civata musilmanan. . . hwd tê gotin.

jema'eh 'udûl جَماعة عُدول

Ev gotin ji bo mirovên dilovan yên musilman ên ku erkên xwe yên olî dişopînin û xwedanê dilsoziya exlaqî ne, tê gotin.

jemerat teşrîq جَمرات التَّشريق

Jemerata rojên sê teşrîq (Al-Soghra "piçûk" , Al-Wusta "navîn", û Al-Kubra "mezin") Hecî piştî rakirina yekem (piçûk) a hramê wê diavêje.

kolana keviran : **jemerat (tek. jemreh)(جَمرة)جَمرات**

Ev têgeh ji bo wesifkirina(slûxdana)sê stûnên ku bi keviran hatine çêkirine. (Mekkeh al-Mukerremehê) Komirê germ spî (ew simbola şeytan e). Li ser wan cihan, her hecî heft keviran davêje her stûnekî; Di wê demê de ew dibêjin "Allahu akber ".

kolona keviran a piçûk : **jemreh (al-) aṡ-ṡuẍra الجَمرة الصُّغرى**

Stûna sêyemîn a Hecê tê kevirkirin(bi avêtina heft keviran), yek bi yek, wekî beşek ji rêûresma Hecê. Ew herî nêzîk ê mizgefta Al-Xif li Mina ye, ji ber vê yekê jê re cîhan"dunya" tê gotin.

kolona keviran ya Eqebeh : **jemret al-'Eqebeh جَمرة العَقَبة**

Hecî di wê Roja Qurbanê de(roja Cejna Qurbanê)bi kincên xwe yên Ihramê kevirê xwe davêjin. Dikeve dawiya Mina.

kolona kevir ya navîn : **jemreh (al-) al-wusţa الجمرة الوسطى**

Stûna duyemîn a Hecê tê kevirkirin (bi avêtina heft keviran, yek li dû yê din, li ser wan Stûnan) wekî beşekî rêûresmên Hecê.

(کۆ بوونەوە) berhev kirin : **jem' جَمَع**

Girêdana du nimêjan bi hev re (nîvro û esrê "paşê nîvro" an rojavabûn û êvara dereng) nimêjkirina wan li dûvhev.

(دواخستن کۆ بکەوە . کۆکردنەوە درەنگ) berhev kirina dereng : **jem' ta'xîr جَمع تَأخير**

Di çarçoveya nimêjê de, bi wateya kirina du nimêjan di heman wext de, wek tevlîhevkirina nimêja nîvro bi ya esrê re di dema nimêja esrê de, yan jî tevlîhevkirina nimêja evarî (muxrib) û nimêja şeviyê (eşa) di dema nimêja şeviyê de .

(کۆکردنەوە بەرەو پێشەوە) berhev kirina pêşve : **jem' teqdîm جَمَع تَقْديم**

Di çarçoveya nimêjê de, ew bi wateya tevlîhevkirina du nimêjan di heman wext de, tê, wek tevlîhevkirina nimêja nîvro û esrê di dema nimêja nîvro de, yan jî tevlîhevkirina nimêja evarî (muxrib) û nimêja şeviyê (eşa) di dema nimêja evarî de .

(نوێژەکان کۆ دەکاتەوە) du nimjên hevbeş : **jem' ṡelat جَمع صَلَاة**

Berhevkirina du nimjan . "Jem' " binihêrin.

(کۆکراوەی قورئان) berhevkirina Qur'ana pîroz : **jem' al- Quran جمع القُرآن**

Xelîfe Usman ferman da jibo yekbûna xwendina Qur'anê li gorî çîna Quraîş. Kopîyek ji Mushefa fermî ji bo parêzgehên emparatoriya Islamê tê şandin. (32 koçberî).

(هەینی) Înê : **jumu'eh (al-)الجُمعة**

Roja Înê, rojeke taybet de di Islamê. Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) em agehdar kirine ku Adem di vê rojê de ji dayikbû ye û di vê rojê de çûye bihuştê.

sûreya înê : **jumu'eh (sûreya-) سُورَة الجُمعة**

Ev sûreya Qur'ana 62 (an)ye, ku sernavê xwe ji peyva ku dikeve di ayeta 9-ê de, digire, Ew sûreya çaremîn e ji Musabihat e, ku bi pesnê Xwedê dest pê dike. Ew ji musilman dixwaze ku dest ji kar berdin û xwe baştir ji bo bîranîna Xwedê di dema banga nimêja înê de vale bikin. Sûret qala bendên nimêja înê dike.

(گشتی) komek ji xelkê : **jumhûr جُمهور**

Ev têgeh ji bo piraniya zanyaran(zanistan)tête bikar anîn.

(جەنابە) pîsîyê mezin : **jenabeh جَنَابة**

Rewşa nepakiye ku ji encama cinsîyet(zayendî) an xewnek şil. Bi vê rewşê re, nabe ku

Musilmanek destê xwe bide Qur'anê an wê bixwêne, eger ew tevaviya laşê xwe neşuştibe.

di rewşek berbiçaviya rîtualek girîng de **: junub جُنُب**

Kesê ku nepakiya wî hebe - bi wateya ku xwedan cinabe be. Jin û mêr ji sedema têkiliya zayendî(kirinrazana /cinsî) bicenabin. Jinek jî di dema mehane de an xwînrijandina piştî zayînê bicenab dibe. Ev sedemên gelemperî yên nepakiyê ne, ku di pirtûkên fikrê de jî wekî bûyerek mezin(hadîs akber) têne binav kirin. Tê xwestin ku mirov tevaviya laş xwe bişû, û bêyî wê yekê destûr nayê dayîn ku jin û mêr destê bidine Quranê an bixwênin, nabe derbasî nava mizgeftê bibin an jî nimêjan bikin.

(گوناه) guneh **: junaḥ جُناح**

Ev peyv bi gelemperî bi gotina neyînî "la"(na) re tê dîtin:"la junah" ('guneh tune...)

(پرسه) binerdkirin (cenaze) **: jenazeh (kom. jena'iz)(جَنائز)جَنازة**

Gotineke ji bo merasimê cenazê tête bikar anîn .

behişt **: jenneh (kom. jennat)(جَنات) جَنة**

Cîheke ji bo yên ku bi yekîtiya Xwedê û hemî Pêxember û peyamberên wî bawer dikin, herweha ji bo yên ku jiyana xwe rast birêve dibin, hatiye misugerkirin. Di behiştê de heşt dergeh hene, ku her yek ji wan dergehan yanzdeh dergeh heye. Navên heşt derîyan ev in: Deriyê Baweriyê, Deriyê Cihadê, Deriyê Kazmîn, Deriyê Reyan, Deriyê Du Dûban, Deriyê Xêrxwaziyê" sedeqeh", Deriyê Tewbê, Deriyê têkiliyê(girêdanê : "as-sileh").

baxçê (n) ya Edenê **: jenneh / jannat ‘edn(جنّات عَدن)جنّة**

Li gorî hinik xwendevanên şîroveker peyva "Edenê" bi wateya "zindîbûn û herheyî/hermanîyê tê."

cinn **: cinneh (tek. cinniy) (جني)جِنة**

Tiştên ku ji alîyê mirovan ve nayîn dîtin. Cûdahî di kokê de wusa xuya dike: Xwedê mirov ji herrîyê afirandî ye û cinn ji agir çêkiriye" (Sûreya 55: 14-15) Di vê sûretê de nîşana duyem heye ku cinn guhdarîya xwendina Qur'ana pîroz û pejirandina Islamê dike. Di nav wan de Musilman û Kuffar hene.

sûreya cinn **: jinn (sûreya-) سُورَة الجِن**

Ev sûreya 72(an) ya Qur'anê ye, ew bi vî navî hatiye ji ber têde behsa danasandinên cinn û merc û mezhebên wan tê kirin.

(جيهاد) şerekê pîroz e **: jihadجِهاد**

Li ser riya Xuda, bi taybetî di teşeya şer de, hewlek mezin tê dayîn.

(جيهادى خۆ) kontrolkirina derûn/nefs **: jihad an-nefs جِهاد النفس**

Xwe kontrolkirina ku zorê dide xwe ku karên baş(qenc) bike û xwe ji yên nerast(çewt) dûr bike.

xwendina bi dengê bilind **: jehr bi-lqira'eh جَهر بالقراءة**

Xwendina ayetên Qur'anê di dema ku mirov şipya(sekinandî)nimêjê dike (bi rojavabûnê re, êvara dereng û berbang) bi dengekî bilind tê xwendin.

nimêja bi dengê bilind **: jehrîyeh (ṡelah -) جَهريّة الصَّلاة**

Nimêja Qur'anê bi dengê bilind tête xwendin, berevajî "siriyê", ku Qur'anê bi bêdengî

dixwêne, tenê kesê ku wê dixwîne wê bibihîze. Ew nimêjên ku di şevê de pêk tên (di dema ku roj diçe ava, êvara dereng û sihara sibê de)

dojeh . cehnem **: jehennem جَهنم**

Ev peyv li gelek beşên Qur'anê tê dîtin ku ew wekî ceza ji bo kesên ku rastiyê red dikin û şer wê dikin tê gotin. (Li Qur'anê binihêrin, mînak, 2: 206.)
Di rastiyê de, ew yek ji astên dojehê ye. Heft astên agirê hene:
1- Al Hawiyeh . 2- Sa'yîr. 3- Jehîm. 4- Seqr. 5- Hutemeh. 6- Laza. 7- Jehenem.

qanûn, destûr **: jewaz جَواز**

Bi wate çê dibe tê . "Ja'iz" bibînin.

Judî جودي

Cihê ku keştiya(gemiya) Nûh li ser wî bicîh bû ye. Ciyayê Jodi dikevê herêma Butanê li Tirkiyê, ku dikeve nêzîkî sînorê Tirkiyê, Sûretê û Iraqê. (Li Qurana Pîroz binêrin, Hud : 44).

(ح)

mehana jinê (kinc) : **ḥa'iḍ حَائِض**

Jinên ku dikevin cilan (dewra mehê)de di ji wan nayên xwestin ku nimêj bikin, rojîbigre an destên xwe bidine Qur'anê. Ew tenê dikarin wê ji bîroka xwe bixwînin, Têkiliya zayendî di heman demê de(mehana jinê) qedexe dike.

hecî :**(kom. ḥujjaj**) **ḥajj(حجّاج) حَاجّ**

Ew mirovên ku di meha Hecê de, diçin hecê li Mekkê.

parêzvan : **ḥejib (kom. ḥujjab) (حُجاب)حَاجِب**

Di dîroka Islamî de, kesên ku dibine mêvanên kesayetîyên xwedî hêz û desthilat, ew ji alîyê hajib ve tête kişf kirin(kontrolkirin).

qedexekirin **: ḥaşa lillah حَاشا لله**

hemşîre : **ḥaḍineh حَاضِنة**

Şîrdaya zarokan: Jineke ku şîr dide zarokan din. Ango Jinek pitikek din şîr dide.

parastvan : **ḥafiż حافظ**

Ew bi wateya bêje ya peyva'parastvan tê, lê di nivîsarên îslamî de ev peyv bi gelemperî ji bo kesê ku tevahiya Quranê an hin ayet ezber dike, tê gotin.

(ئەفسەری قورئان) ezberkerê Quranê : **ḥafiż al-qur'an حافِظ القُرآن**

Ev bêje di cîhana Islamî de ji bo kes ê ku Quranê ezber kiriye û ku ew dikare wê ji bîroka xwe bixwîne.

şopgirt sînorên Xwedê : **ḥafiż li-ḥudûdi-llah حافظ لحدود الله**

Şopgirtina sînorên Xwedê , û pêkanîna emirên Xwedê.

paqij : **ḥafiż li-ferjih حافظ لفرجه**

Ev bêje tê vê wateyê kesê ku endamê xwe yê jêr diparêze (ji kirinên gunehkar e), ku taybetmendiyek ji bawermendek baş e(Qur'an, 23:5)

Sûreya rastiya neçar **: ḥaqqeh (sûret al-)سُورَة الحاقّة**

Ev Sûreya 69(an) a Qur'anê ye, ku ji ayeta destpêkê û ayetên duyemîn û sêyemîn hatîye standin, û dûv re ravekirina vê rastiyê: Pêdivî ye ku heqîqet serdest be û şopdarên derewan winda bibin. Piştî vegirtina nimûneyan (ayetên 4-12ê), Qur'an qala bûyera bêserûber (Roja Vejînê)dike û ya ku ji dilxweşiyê tê ji bo bawermendê an "yê ku di destê xwe yê rastê de tomara xwe distîne" û belengaziya kesên kafir yên ku tomara xwe bi destê xwe yê çep digirin "(Jimar 13-37ê), Ev bi erêkirina rastiya peyama Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ku rê nade "bi navê Xwedê ti gotinên xeyalî(îcad) bike" û encamên wêyên girane hene eger ew wê bike (ayatên 38-52ê) .

salek derbas bû : **ḥale (yeḥûl) al-ḥewl حال (يحول) الحول**

Di dayîna sedeqan de, em her dem wek şert dibînin ku 354-roj ji sala heyvê derbas bibe.

(دووگیان) dûcan/ zikpirî **: ḥamil حامِل**

Berevajî jinên din, serdema bendewariyê (iddeh) ya jina ducanî ya berdayî ye zayîn e, hingê (iddeh) dawî dibe. Tenê wê hingê ew dikare bizewice. Ducanî dibe ku bibe hincetek rewa be ji bo şikandina rojiya Remezanê.

bîranîna Quranê **: ḥamil (kom. ḥemelet) al-qur'an حامِل (حملة) القُرآن**

Ew Kesê ku bi ezberkirî bi Quranê dizane. Ev gotin ji gotina "HafiZ"kêmtir tê bikar anîn.

şikestina sondê **: ḥaniŝ حانث**

Kesê ku soz xwe bi Xwedê re pêk nayîne .

diyarî . xelat : **ḥubus حُبُس**

Xelat a ku ji bo armancên taybet an ji bo komên mirovan tê dayîn.

qedex kirina (asteng kirina) mîrasê : **ḥejb حَجب**

Yekî ji mîrasê asteng dike. Di Zagona Islamî de hebûna kesekê ku herî nêzîkî kesê mirî ye ferz dike, nimûne, ew dikare pêşî li mîraseke (têkiliyekî)din bigire.

veşartina(nixumandina) laş : **ḥijab حِجاب**

Li gorî hînkirinên îslamî, jina musilman a mezin divê, bi kêmayî, tevahiya laşê wê, ji bilî rû û destên wê di hebûna zilamên xerîb (muhrem) de bêveşartin. Ji bo biryarên di vî warî de Quranê, 24: 31, 60; û 33: 59 binihêrin).

parêzvan . danasîna mêvanperwer : **ḥijabeh حجابة**

Di dîroka Islamî de, kesên ku dibine mêvanê kesayetîyên xwedî hêz û desthilat wek Xelîfê an hakimdarekê, ew ji hêla Hajib ve tête çavdêrî.

hec :**ḥec حج**

Hec, bi wê wateyê tê di dema ku mirov diçe hecê li Mekkeyê û cihên pîroz li Hîjazê, di Erebistana Siûdîyê de . Hacî, stûna pêncemîn a Islamê ye, ew erkeke li ser her musilmanê ku bikarbe ji hêla aborî û fîzîkî ve serdanîya wê bike, bi kêmanî yek carî di jiyana xwe de. Ji bo Hecî heyamek taybet heye, nemaze yek hefte ji roja 8-ê mehê ya Islamî ya Zul Hicceh-ê heya roja 13-yê wê mehê di salnameyaheyvê a Islamî de.

sûreya hecê : **ḥec (sûret al-) سُورَة الحَج**

Ev sûreya 22ê a Quranê ye, Sernavê wê behsa ayetên ku qala emrê Xwedê ji Pêxember Ibirahîm re dike ku mirov serdana Mekkê bike bi bîrannîna(ayetên 26-33) destkeftiyên giyanî û jiyanî. Ayetên ku bi piranî yên ku xweza mucîzeyî ya Quranê îsbat dikin, têne xwendin, di derheqê agahdariya li ser pêşketina fetusê mirovî di ayeta 5ê de ye. Ew behsa şer dikin da ku xwe biparêzin û ji bo parastina baweriya xwe û malên cihêreng ên ku Xwedê diparêzin (mizgeft, dêr, kinîse) (ayetên 39-40ê).

hecca piçuktir : **ḥejj 'aṡẍer حَجّ أصغر**

Ew behsa" umreh "ê dike , ku mirov dikare di her demê salê de, wê bike.

tenê heca kesan : **ḥejj al-ifrad حَجّ الإفراد**

Tenê kirina (pêkanîna) Hecê, ne ya pêşîn e û ne jî bi "Umreh"ê re têkildar e.

hecca Mekkê : **ḥejj al-beyt حجّ البيت**

Heca Mekkê, çûyîna mala (Xwedê), (Ke'beh a ji bo Hecê).

hecca kêfê **: ḥejj at-temettu‘ حَجّ التمتّع**

"Umreyek"ê dikin û dûv re cilên xwe yên normal diguhêrin da ku heya roja heştemîn a meha Heccê ji bo ku bi jiyana normal şa bibin. Dûv re ew "Ihram" ê dîsa li xwe dikin da ku dest bi rêûresmên(birêkûpêk) Hecê bike.

hecc û 'umreh bi hevra : **ḥejj al-qiran حَجّ القُرآن**

Çûna "Hacc"ê û hem jî "umreh"ê bi hev re bêyî ku kirasê (ihramê) veguhêzin.

hecca pak : **ḥejj mebrûr حَجّ مَبرور**

Hec ewe ku hacî hemî rêgezên rast ên Heccê têde dibînin, di nav de rêûresm û reftar ku

têde binpêkirin tune ne.

daxuyaniya bêkêmasî ya qanûnî : **ḩejr حَجر**

Daxuyaniya kêmasîya qanûnî ji bo mezinan. Ji ber vê yekê, dibe ku ew, wekî mînak, kiryarên wekî firotin, kirîn, dan, an bexşandin neke.. . . hwd .

ḩujjeh (kom. ḩujej) (حُجج) حُجة

1- Delîlên berbiçav(tekez): Delîlê argûmanê(nîqaşê) ya ku dijber derdikeve.

2- desthilat, hêz, di dema ku mirov emaje bi kesekî dike, ev vegotin, peyv bi wateya desthilatê di qada fêrbûna taybet de, tê.

pêdiviyên bingehîn : **al-ḩejjeh al-aśliyeh الحجّة الأصلية**

Ew behsa qanûna zekatê dike ku Şeri'eh pêwestîyên pêkanîna pêdivîyên bingehîn wekî îstîsna dibîne.

xatirxwasta hejjê: **ḩiccet al-wade' حِجة الوداع**

Xatirxwestina dawîn ya Hecê ku têde Pêxember Muhemmed gotina giştî pêşkêş kiriye. Pêxember Muhemmed ev Xutbe- bi navê (Xutbetul Wida') berî wefatbûna xwe, daye. Vê xebera ku tê de Peyxemberê Xwedê(silav û bereket li ser wî be), piştrast dike ku wî ol temam û sazkiriye.

ḩijr حِجْر

Ev navê cihekî kevirî ye ku ji bo gelê Semûdê hatibû avakirin ku guhnedidan Xwedayê mezin, û ji tirsa birûsk, erdhej û bahozan li çiyayan xanî hatibûn çêkirin, lê Xwedayê Bilind ew bi qîrînekî hilweşand in. Sûreya 15 (an) a Quranê pîroz.

sûreya al-hijr : **ḩijr (sûret al-) سُورَة الحِجر**

Ev peyv di ayeta 80ê-(an)de ku ji sûreya 15ê-(an) a Qurana Pîroz e hatîye girtin. Mîna gelek sûretên din ku çîrokên cûrbecûr yên pêxemberên Xwedê jî têne vegotin. Di vê sûretê de, me di derheqê melekên ku çûbûne serdana Pêxember Ibrahîm û jê re behsa jidayîkbûna kurekî, di wî temenê wî yê mezin de dikirin (mizgînî didane) wî. Wan ji re behsa çarenûsa gelê Lot û jina wî jî kiribûn. (51- 75).

ragihandina bêtiwana(bêbawerîy) qanûnî : **ḩejere (yeḩjur) (يحجُر)حَجَر**

Xuyakirina bêserûberiya yasayî ya kesê. Bê guman, ev tenê dikare bi riya dadgehekê bêkirin.

dorpêçkirîna Ismayl : **ḩijr 'isma'îl حِجر إسماعيل**

Ew devera ku dikeve bakurê rojavayê Ke'beh-yê ku ew bi dîwarekî wek forma nîv-zîvrînok e ... Li Mekeyê, wî ew li vî cîhî anîne xwarê, û ew bû niştecîhê wan, û gava Hacer mir(koça dawî kir), Ismayîl ew li ser wir veşart. Ew li dora wê dorpêç kirin û ne di hundurê wê de.

(بەردی رەش) kevirê reş : **ḩejer (al-) al-aswed الحَجَر الأسْوَد**

Kevirê kevnar ê li quncika bakurê Ke'beyê ye ku nêzîkê deriyê ku ji wir derê dorpêçê ("Tewaf") ê Ke'beyê dest pê dike. Mirov di dema dorpêçê (çûnzîvrînokê) de, gerek her ku derbas bibe, hewl bide wê maç bike, destê xwe lê bike, an jî bi kêmanî bila bala wî bikşîne.

odeya(jûra) Pêxemberî : **ḩujreh (al-) an-nebewîyeh الحُجْرة النَبويّة**

Odeya ku em têde dikarin gorên Pêxemberê (nimêj û silavên Xwedê lê be) û hevalên wî

Ebû Bekir û 'Umer bînin. Bi eslê xwe, ev yek ji wan jûreyan bû ku Pêxember (silava Xwedê lê be), lê dijiya .

sûreya jûreyên : **ḥujurat (sûret al-) سُورَة الْحُجُرات**

Ev sûreya 49 (an) ye, ev peyv ji ayeta 4ê (an) hatîye wegirtin ku têde behsa odeyên taybet yên ku Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) û jinên wî lê dijiyan li tenişta mizgefta wî li Medîneyê, dike.

Di vê sûretê de gelek rêgezên girîng ên reftara civakî têne pêşkêş kirin, di nav wan de awayê guncan ji bo xîtabkirina Pêxemberê Xwedê, teqezkirina çavkaniyên nûçeyan kontrol bikin, peydakirina aşîtîyê di navbera bawermendan de, rêzgirtin bo kesên din, û ji paşgotinê û sîxuriyê dûr bikin.

rijandina xwînê . kehfan : **ḥijameh حِجامة**

Karkirina pizîşikîyê li welatên musilman serdar bû ku di hin perçeyên laş de birînên piçûk çêdikirin û piyalek bikar bînin da ku 'xwîna xerab' derkeve.

(ماوەی ماتەمینی) heyama sine . behî şînî : **'iḥdad / ḥidad (إحْداد) حِداد**

Nîşandana Xemgîniyê li ser miriyan wek rêzgirtineke û neretayî (adetan an rêgezan) ye . Di Islamê de divê yek ji sê rojan bêtir şînîyê neke, lê ji jina jinebî tê xwestin ku şînîyê ta çar meh û deh rojan bike, di vê demê de ew ji wê tê xwestin ku diqata xemil û tevgera xwe bike. Binêre '"iddet al wefat".

nepakbûna mezin : **ḥedeŝ akber حَدَث أكبَر**

Nehatiya mezin ferz dike ku Musilmanek tevaviya laş û serê xwe bişo, berî ku ew nimêjê bike an dest bi Quranê bike. Ev cenabe (nepakî) ji karê razana jinûmêr, avêtina avikê, xewnên mehane yên jinan, an xwînherkandina piştî zayînê, çêdibe.

nepakbûna piçûk : **ḥedeŝ aŝẍer حَدَث أصْغَر**

Wateya nepakiya piçûk ev e ku kes nikare nimêjê bike an dest bi Quranê bike, tenê piştî ku mirov xwe desnimêjiyê bike. Ev çelebê nepakîyê di dema ku mirov diçe serşokê û destê xwe dide perçeyên laşê xwe yê taybet, an di dem ku ew bayê di bin xwe de berdide û xwe, birîn dike, çêdibe.

vegotina Hedîsê : **ḥeddeŝe (yuḥeddiŝ) (يُحدِّث) حَدَّث**

Ji bo vebêja hedîsê , Hedîsa pêxember ragihîne an vebêje.

cezayê diziyê : **ḥeddu as-serrqeh حَدُّ السَّرِقة**

Ger dizî di bin hin mercan de were îspat kirin, destê wî yê rastê tê jêkirin (5: 37-38) . Adeta qutkirina destê mirov dizek berî Islamê jî hebû, û vê adetê di Islamê de jî dewam kir, lê di bin hin mercan de, û derfet heye ku ger diz poşman bibe, ew were bexşandin.

cezayê serxweşiyê :**ḥeddu aş-şurb حَدُّ الشُّرب**

Di Qur'anê de destnîşan kir ku ew guneh e, lê Qur'anê ji bo vexwarina meyê tu ceza nedaye, û çavkaniyên Hedîsê behsê ti rastiyên bi belge nekirine ku ew bikar bînin ku cezayê vexwarina meyê di dema Pêxember de qanûn bikin. Wusa dixuye ku Sehabî bi ramanên xwe re li ser mijarên ku ne di Qur'anê de ne jî di Sunnetê de nehatine behs kirin xebitîne. (5 /90)

{ يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا إِنَّمَا الْخَمْرُ وَالْمَيْسِرُ وَالأَنصَابُ وَالأَزْلاَمُ رِجْسٌ مِّنْ عَمَلِ الشَّيْطَانِ فَاجْتَنِبُوهُ لَعَلَّكُمْ تُفْلِحُونَ}

سزا بۆ ناوزڕاندن . cezayê devavêtinê :**ḥeddu al-qeẓf حَدُّ القَذف**

Tometbarkirina mirovan bi kirina (avêtin) zînayê an hevzayendîyê, ew wek gunehek

mezin tête hesibandin. Ev tomet bihayê wê/wî îşkenceye di axîretê de, lê li vê dunyayê cezayê wê /wî heştê qamçî ye, û şehadeta wan nayê qebûl kirin, û ew ji mirovên bêexlaq tên dîtin, û eger ti delîl di destên wan tune be, tomet li ser wan tê îsbat bikin . Binihêrin: Sûreya An-Nur (4-5, 23-25)

xwendina bilez : **ḥedr حَدر**

Şêwaza xwendina Qur'anê bi rengek zûtir ji gelemperî, lê bêyî ku tiştek bête paşguhkirina ji rêbazên bilêvkirina rast . ("tajwîd"). "tertîl" bibînin.

Hedîs (kevneşopiya Pêxemberî) **: 'aḥadîŝ (tek. ḥedîŝ) (أحاديث) حديث**

Raporeke di derheqê Pêxemberê xwedê (silava Xwedê lê be) de ye, ka çi digot an çi dikir, an tiştên ku wî dipejirandin an nepejirandin. Rastiya Hedîsê bi pêbaweriya bêje(an) ve girêdayî ye.

çîroka buxtanê : **ḥedîŝ al-ifk حَديث الإفْك**

Gotinên nerast û derew yên ku hinek mûnafiqan(derewçî) di derheqa Aişehê, jina Pêxember (Xwedê wî pîroz bike û silava bide wî) de hate çêkirine, îdîa ku wê zina kirîye. Qur'an bêsûciya wê ji vê buxtanê re ragihandî ye, û Xwedê Musilman ji dubarekirina wê re hişyar kirine. (Li Qur'an binêrin, 24: 11-20).

Hedêsê baş : **ḥedîŝ ḥesen حَديث حَسَن**

Di zanistiya Hedîsê de, ev term ji bo danasîna naveroka nivîsa(metna) hedîsê ya ku xwediyê taybetmendiyên taybet e, wek zincîreke pêbawer a çîroknûsan û pejirandina mentiqî tê bikar anîn.

Li gorî asta pêbaweriyê, ew wek hedîseke ras têdîtin, lê hinkî lawaz e, û bi çend awayên pirjimarbar e. Ev hedîs piştî "sehîh : rastî", di pela duyemîn de li gorî pêbawermendiyê tête hesibandin.

Hedêsê restî **: ḥedîŝ ṡeḥîḥ حَديث صَحيح**

Hedîsek ku mercên ji hêla pisporan ve hatine danîn, wekî Hedîsa Musnadê domdar ya ku nayê qutkirin, pêk tê, ji hêla rêzeyek domdar a bêjerên naskirî yên pîvana exlaqî û bîra xurt ve tê vegotin.

Hedêsê qels : **ḥedîŝ ḍe'îf حَديث ضَعيف**

Ev bi wateya ku li wir guman heye ku bêjer bîroka wî xerab e an ji tunebûna durustî êş dikişîne. Ji ber vê yekê rastdariya nivîsê dikeve di cihê tometdarîyê de.

Hedêsa delal : **ḥedîŝ ‘ezîz حَديث عَزيز**

Ev Hediseke Pêxemberî ye ku ji hêla du kesan ve hatîye vegotin û ji du kesên din ve hatîye bihîstin.

Hedêsa xerîb : **ḥedîŝ ẍerîb حَديث غَريب**

Hedîsek xerîb tê dîtin, eger naveroka nivîsêt nediyar(nivîsa wî nenas be), an ew ji bêjerkî(çîrokbêjekî) din hatibe wergertin.

Hedêsa pîoz : **ḥedîŝ qudsîy حَديث قُدْسي**

Ew e ku Pêxember(nimêj û silavên Xwedê lê be), li ser Xwedayê mezin vegotiye. Rêza (pileya) wê di navbera Qur'ana pîroz û hadîsê rûmet de tê .

Ew şîret û bîranînê peyda dike, û wateyên wê pîrozkirina Xwedê, rûmetkirina wî û bilindkirina wî dikin ku li ser hertiştî re ye.

Hemû hedîsên Qudsî rast nayên hesabkirin, hin ji wan di warê zincîra veguhastinê de çêkirî û lawaz in li gurî teşeyên vegotina wê.

Hedêsa domdar : **ḩedîŝ mutteŝil حَديث مُتَّصِل**

"Hedîsa" domdar ew hedîsek xwedanê zincîreke domdar a çîrokbêjan e.

Hedêsê bi gelemperî têne ragihandin(diruste) : **ḩedîŝ mutwatir حَديث مُتواتِر**

Hedîseke di pileya herî rastîn û durustî de ye, û ew hedîsa ku ji hêla komek çîrokbêjan ve di zincîreke pêbawer de hatiye vegotin ku girêdayî zincîreke hevgirtî ye.

Hedêsê şandin : **ḩedîŝ mursel حَديث مُرسَل**

Hadîsê ji hêla bêjerê nifşê duyemîn ve ji Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) re hate vegotin bêyî ku navê bêjerê nifşê yekem (hevalê Pêxember nimêj û silavên Xwedê lê be) were destnîşan kirin.

Hedêsê jêgirtîyê(qutkirî) : **ḩedîŝ merfû' حَديث مَرفوع**

Hedîsek ku ji Pêxember re(nimêj û silavên Xwedê lê be), tête diyar kirin, lê naye îspat kirin ku zincîreyek domdar a çîrokbêj(bêjerê) heye.

Hedêsê navdar : **ḩedîŝ meşhûr حَديث مَشهور**

Hedîsên Pêxemberî di her astê rêzika hedîsê de ji kêmayî ve ji alîyê sê kesan ve hatine behskirin.

Hedêsê veqetandinî **: ḩedîŝ meqţû‘ حَديث مَقطوع**

Hedîsek ji aliye "tabi‘iyî" (şopînerê nifşê duyemîn ê Islamê ve) hatîye şandin.

Hedêsa ne girêdayî : **ḩedîŝ munqeţi‘ حَديث مُنقَطِع**

Ew ji zincîra vegotina qutbûyê. Ev hedîs ji zincîra hevgirtinê qutbû ye, ku qaşo ew ji hêla Suhabîk (hevalek) wî ve hatîye vegotin; li deverekî an li deverna hatibe vegotin, da ku yê di her yekê de têk diçe bêtirî yekê neke û yê ku têk diçe ne di destpêka zincîra veguhastinê de ye.

Hedêsa hatîye çêkirin : **ḩedîŝ mewḑû' حَديث مَوضوع**

Hedîsên Pêxemberî ku ji hêla vegêrvan ve hatîye çêkirin û bi derewîn bi navê Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) hatîye belavkirin. Ev gunehek giran e.

Hedêsê rawestandinê : **ḩedîŝ mewqûf حَديث مَوقوف**

Ew tiştên ku ji Suhabiyan(hevalên) wî hatine gotin an tevgerên wan û mîna wan re tê vegotin, li cem wan diqede(radiweste) û jê wêde naçe cem Resûlê Xwedê.

qedexe . berevajiyê wê helal e : **ḩeram حَرام**

1-Ew çalakiyek an kirina ku ji hêla Xuda ve hatîye qedexekirin û ew tiştek neqanûnîya wê di Qur'ana Pîroz de û ne di hînkirinên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) de heye.

2-Pîroz kirin: Ev wate di vegotinên wekî "al-beyt al heram" (Mala pîroz : Ke'beh) û "aş-şehir al heram" (meha pîroz) de, tê dîtin.

baweriya dijminane : **ḩerbiy حَربي**

Kafire dijminane. Di Islamê de kafirek wek ku bi musilmanan re di rewşek şer de ye, tê dîtin.

dizîya rêyê bilez : **ḩirabeh حِرابة**

Diziya rêyên sûcek, wek mezintirîn guneh tê hesbandin. Dest û lingê diz dikarin werin

qutkirin(birrîn), an jî ew dikare cezayê mirinê bê cêkirin. (li Sûretê Ma‘ideh: 33 binihêrin).

îstîsna . ji bilî : **ḥerej حَرَج**

Ev peyv bi gelemperî ji bo kesên awarte(taybet)di Quranê de tête dîtin, wek nexweşan ku ji biryarên taybet têne awartekirin(îstîsna). (Li Qur'anê binêrin, 24: 61).

tîp / deng : **ḥerf (kom: ḥurûf) (حروف) حَرف**

Di pirtûkên rêziman ên Erebî de û di tejwîd (fonetîkên Qur'anê) de peyv ji bo hem forma nivîskî ya deng û hem jî ya dengî(bilêvkirin) tê bikar anîn, ji ber ku di navbera deng û temsîlên nivîskî yên wan de bi Erebî di astek lihevhatî de ye.(Sûreya Hec : 11)

du dengên wekhev : **ḥerfan mutejanisan حَرفان مُتجانسان**

Du dengên wek 'hev' in heke ew ji heman deverî bin; di dema lêvkirinê de li hev tên hilberandin, mina: t / û / d / .

du tîpên nêzî hev : **ḥerfan muteqariban حَرفان مُتقارِبان**

Ger herdu deng dikarin nêzî hev bin, û taybetmendiyên dengkirina wan nêzî hev bin, wek / q / û / k /.

şirovekirina şaş : **ḥerrefe (yuḥerrif) (يُحرِّف) حَرَّف**

Di dema ku bi zanebûn wateyeke çewt an şirovekirineke derew li nivîseke pîroz bête kirin.(An-Nisa' (4) : 46).

dengê ji zengeloka tê : **ḥurûf al- ḥelq حُرُوف الحَلْق**

Di dengên Quranê de, ev peyv ji bo dengên ku di zengelokê an nêzî wê têne hilberandin(bilêvkirin) : " H, E . X. Q. … Bi Erebî : ق ، خ غ، ع، هـ، أ

dengdar : **ḥerekeh (kom. ḥerekat) (حَرَكَات) حَرَكَة**

Di "Tejwîd"ê de: term bi wateya tîpê an dengdêra kurt yan jî dengdêra dirêje tê. Ji ber vê yekê, dengdêr dikare, wek mînak, dirêjahiya 4 an 5 herekatan hene.

qedexe kirin : **ḥerreme (yuḥerrim) (يُحرِّم) حَرّم**

Ew neqanûnî ye (ne yasayî ye). (wek mînak li Qur'anê binihêrin, 27: 91 û 2: 275).

mizgeftên pîroz : **ḥerem (al--) الحَرَم**

Ev peyvê bi gelemperî ji bo vegotina mizgefta pîroz ya Mekkeyê an ji bo mizgefta pîroz ya Medinê tête bikar anîn. Ev peyv dikare behsa herêmekî û mizgefta Pêxember a pîroz bike. Ev peyv bi wateya ku ev derdora van herdu mizgeftan qedexe ye û nabe ku mirov nêcîrê di sînorên wan de bike.

tiştên pîroz : **ḥurmah (kom. ḥurumat) (حُرُمات) حُرْمة**

Tişta ku ji hêla olê ve hatîyê pîroz kirin.

qedexeya demkî : **ḥurmeh mu'eqqeteh حُرْمة مُؤقّتة**

Mînakek ji vê qedexe ye ku bi xwişka jina xwe re bizewice. Lê di bûyera veqetîna ji jine (an mirna wê), wê hingê qedexe êdî betal dibe. di hin mijaran de peyv bi wateya "behan"ê jî tê.

ḥerûriyeh (tek. ḥerûriyî) (حَروريّ) حَروريّة

Ev peyv ji bo kesên ku ji rê derketine (xewarij) an komeke taybet re tête bikaranîn.

perçek . kombûnek : **ḥizb (kom. 'aḥzab)(أحزاب) حِزب**

1-perçek . Ev peyvek bi wateya perçe "juz' " di Qur'anê de tê bikaranîn. Ji ber vê yekê Qur'an ji 60 perçî pêk tê.

2-Kombûnek (Partî). Di wateya xwe ya gelemperî de peyv bi wateya partiyekî an komekî tê.

hesabkirin. berpirsiyarî : **ḥisab حِساب**

Roja qiyametê wekî "yewm al-hisab"(roja hesabdayînê) tête navkirin .

pîvana rast "durist" : **ḥusban حُسْبَانِ**

{الشَّمْسُ وَالْقَمَرُ بِحُسْبَانٍ}(5:55)

berçavderbasî : **ḥisbeh (al--) الحِسبة**

Hisbeh peyvek e ku ji hêla hiqûqnasên berê ve tê bikar anîn da ku karê rêkxistina cîhê bazarê ya ku desthilatdariya îslamî pêradibe, wesif bike. Herweha, Kontrolkirina bazarê li gorî rêgezên olê dike, di nav de lêpirsîna pîvana tiştan(wezna tiştan). Islam hisbehê pêwîst dibîne ji bo parastina bazareke adil û birêkûpêk.

: **ḥesbiy-allahu we ni'me al-wakîl حسبي الله ونعم الوكيل**

Cîgire Xwedê besî min e, û çêtirîn (wekîlê) .

Ev dua ya misilmanê mezlûm e di dema ku ew di rewşeke dijwar de be an di bin tehdîtê de be, ji bo ku li alîkarî û piştevanîyê ji Xwedê wergire.(Quranê , 3: 173).

çavnebarkirin : **ḥesed حَسَد**

Kesekî / a ku ji ber bereketek taybetî hesûdî dibe, û hewl bide ku wî ji wê başî û bereketê dûrbide. Ev helwest bi tundî ji hêla Islamê ve tête şermezarkirin. (li Qur'anê binihêrin 113: 5).

beşî : **ḥesen حَسَن**

Di zanistîya Hedîsê de, ev term ji bo danasîna nivîsa(metna) Hedîsê ya ku xwediyê taybetmendiyên taybet e, tê bikar anîn, wek zincîreke pêbawer a çîroknûsan(bêjer) û mentiqê pejirandî.

hevaltîya xweş : **ḥusn al-mu'aşareh حُسن المُعاشرة**

Jiyana adil û baş bi hevalan re.

bawerbixobûn(xûrewişt baş : **ḥusn al-xuluq حَسن الخُلق**

Kesayetîya exlaqî û tevgera baş.

merîfet : **ḥeseneh (kom. ḥasenat) (حَسنات) حَسَنَة**

Ji bo ku tiştek baş were xelat kirin an jî dev ji tiştek çewt an xirab berde. (Li Quranê binihêrin, 6: 160).

baştirîn : **ḥusna (al-) الحُسنى**

Bi gelemperî ev peyv di hevokan de tê bikar anîn "Navên hêjayên Xwedê ne", gelek caran ew bi wateya navên Xwedê yên çêtirîn tê . ji ber ku ew taybetmendî yên Xwedayê mezin e.

du tiştên baştirîn : **ḥusneyeyn (al-) الحُسنيَين**

Ev du encamên şûndor(alternatîf) ên ku şervanê musilman ji bo doza Xwedê di qada şer de pêkanîye. Du tiştên baş hene(piştre derbasî behiştê dibin) serkeftin li dijî neyar an şehadet di qada şer de.

(کۆبوونەوە) civandin (kombûn) : **ḥeşr (al-) الحَشْر**

Vejîn û berhevkirina hemî xelkan di Roja dawî(qiyametê) de.

beşa kombûnê : **ḥeşr (sûreya-) سُورَة الحَشر**

Ev sureta 59ê a Quranê ye, ku Ew ji peyveke ku di ayeta duyemîn de ye, hatîye

bikaranîn. Ev sureta behsa komployên ku Cihûyan li dijî Musilmanan li Medîneyê amede dikirin, dik. Têde navên Xwedê û taybetmendiyên wî yên mezin hene.

(دایەنگا) lênêrîna zarokan (kreş) : **ḥeḍaneh حَضانة**

Xwendina zarokan ji perwerdê, xwarin û cilubergan (kincan).

rûniştin (mayin) : **ḥeḍer (al-) الحَضر**

Niştecîbûna cîsînorkirî(diyarkirî) an niştecîbûna dirêj, berûvajîyê mirovê ku rêwîtiyê (sefer) dike. Ev yek ji bo "nimêjê" û "rojiyê girînge, wekî kurtkirina nimêjêyên ferz û şikandina rojiyê.

astek ji dojeheyê : **ḥuţmeh الحُطْمَة**

Asta heftemîn û kûr ji agirê dojehê tête heye, Li vê derê dê munafiq((durû) bijîn. Ya herî xerab a afirîneriya Xwedê durû ne, çi ew mirov bin, çi jî cin in, ji ber ku ew bi zimanê xwe Xwedê û Resûlê wî "qebûl" dikin, lê ew bi kirinên xwe vê "qebûlkirinê" înkar dikin. (Al- Hemzeh : 4).

hetîm : **ḥeţîm (al-) الحَطيم**

Dîwarê nîv-dorpêç e, ewe ku hijra Ismayîl dorpêç dike (devera vekirî ya ku tevaviya Ke'beyê tekûz dike û beşek jê tê hesibandin). Tê xwestin ku mirov di dema Tewafê (dorpêçê) de li derûdora wê bimeşe.

parastina herdem : **ḥefîż (al-) الحَفيظ**

Taybetmendîya xwedayî, Parastvanê rast yê bûnerên(afirander/mexlûqat) wî.

parastina olê : **ḥefîz ad-din حِفيظ الدين**

Mafê parastina olî. / mafên olî.

(هەڵگرتنی پەیمانەکە) girtina sozê/ mana li ser sozê : **ḥifż al-'ehd حِفظ العَهد**

Sozgirtin. Wefadarîya sozê an sozek an peymanek(rêkeftinek).

parastina laş ji zayendî yê neqanûnî : **ḥifż al-ferj حِفظ الفَرج**

Parastina endamê cinsî li hember tacîza zayendî ya neqanûnî.

(هێشتنەوەی زمان) girtina ziman : **ḥifż al-lisan حِفظ اللِسان**

Parastina zimên ji bo gotinên çewt û xirab neaxife.

(هێشتنەوەی پارە) parastina milkî/Darayî **: ḥifz al-mal حِفظ المال**

Mafê parastina milk.

(خۆپاراستن) parastina jiyanê . : **ḥifz al- nefs حِفظ النَّفْس**

Mafê parastina jiyanê .

ḥeqq (al-) الحَقّ

1-Rastîya bilind. Taybetmendiyeke Xwedê ye. Ew Kesê ku hebûn û rastîya xwediyê înkar û bi guman nakin.

2- Rastî . Ev peyv dikare wekî lêkerekî were bikar anîn ku ew bi wateya 'rast' (ne şaş) tê.

3- Maf . Wekî mafê dêûbavan ku li ser zarokên wan heye.

devehê çar salî : **ḥiqq (ḥuqûq) (حَقّ)حُقوق**

Devehekî nêr e ku çar salîya xwe dagirtî ye û deveha mê bi navê hiqqeh tê gotin. Ev peyv bi gelemperî di hejmartina "zekat"ê de tête bikar anîn.

(مافی مرۆڤ) mafê mirovan : **ḥeqq al-'insan حقّ الإنسان**

Wek mînakî, dema ku kesek dizîya mirovekî dike, ew ola xwe binpêdike. Xweda dikare

mafê mirovê ku hatîyê dizîn, efo bike . Xwedê dikare sûcê berê biborîne, lê divê perçeyek ji malê ku hatîye dizîne li xwedîyê wî vegere, da ku ew bibe poşmanîyeke tubê.

mafê Xwedê : **ḥeqq allah حَقّ الله**

Ev bi wateya erkê me li hember Xwedayê mezin tê, Wekî nimûne kirina nimêjan û dana sedeqan bo belengazan, û temaşekirina fermanên din ên Xwedê(bicîh bînin).

(مافی کۆیلەکە) mafê mirov : **ḥeqq al-‘ebd حَقّ العَبد**

Mafê mirovan e, bi exlaqî an madî ve girêdayî ye.

(مافی دڵنیاییەوە) mafê teqeziyê. baweriya bêkêmasî : **ḥeqq al-yeqîn حَقّ اليَقين**

Bawerî piştî ezmûnkirina(ceribandinê) tiştekî tê.

(مافی هاوسەریی) mafên zewacê : **ḥuqûq az-zawjiyîeh حُقوق الزَّوجيّة**

Maf û erekên mêza û nêrza li hemberê hev .

(دادوەری باڵا) dadgerê bilind : **ḥekem (al-) الحَكَم**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Hakimê(serwerê) mutleq.

biryara yasayî : **ḥukm (al-) aş-şer'iy الحُكم الشَّرعي**

Dadrêsaziya şerî‘etê an biryara şerî‘etê li ser van çelebên jorîn tên dabeşkirin: wek: (ferz ayn "mecbûrî") : mîna nimêjê, ferz kifayê: mîna nimêja cenazê), pêşniyazkirî lê ne mecbûrî (wek nimêja Sunnet, xêrxwazîyê), ew pêdivî ye, lê ne mecbûrî ye (nimêja Inê), qanûnî û destûrî (zewac) ye, bêalîye, mehkûmkirî, red kirin lê ne qedexe ye(wekî cixarekêşê), qedexe ye (wekî zînayê).

biryara peywirê : **ḥukm teklîfiy**î **حُكم تَكْليفي**

Kombûnek (lihevgihanoke) qanûndanera ye, ji bo şopînerên olê ku bi tiştekî bikin, an nekin(ji kirinê), di formeke daxwazbar an bijarbar de.

biryara manedar : **ḥukm weḍ‘iyî حُكم وَضعي**

Zagon/ rêgezeke çêkirî ya mirov yeî. Pir caran ev term bi "hukmek qanûnî" (qanûn an rêgezek olî) re dijî ye.

(دانایی) hişmendî **: ḥikmeh (kom. ḥikem) (حِكَم)حِكمة**

Dema ku em qala fermanên olî dikin, dibe ku em ravekirin an sedemên 'gengaz'î pêşkêş bikin.

herî aqilmend(hişmendî) : **ḥekîm (al-) الحَكيم**

Taybetmendiya xwedayî. şehrezayîya bê sînor.

qanûn, destûr : **ḥill حِلّ**

Ev peyv ji bo hevwateya "helal" tê bikaranîn, lê ew kêm tê bikar anîn . Ew di Quranê de çend caran hatîye behs kirin. (Binihêrin, mînak. 5: 5)

li derveyî perestgehê **: ḥill (al-) الحِل**

Çêdibe(destûr heye) ku mirov nêçîrê li derveyî sînorên Mekkê an Medînê, bike.

(حەڵاڵ) destûrî . yasayî . qanûnî **: ḥelal حَلال**

Di Islamê de, her tişt qanûnî ye, eger ew ji hêla olê ve eşkere û nehişkirî nehatibe qedexekirin.

(سوێند خواردن) sond bixwe **: ḥelefe (yeḥlif) (حَلَف)يَحْلِف**

Divê Musliman ti carî ji bilî Xwedê pêve , sondê nexwe.

rakirina perçekî laş : **ḥelq حَلْق**

Rakirina perçekî ji her deverê laş.

rakirina perçê pubîkê : **ḥelq al-‘eneh حَلْق العَانَة**

Rakirina perçê pubîkê sunnet e.

kesînîtî : **ḥulûl حُلول**

Bawerî heye ku Xwedê di laşek mirovî de, mîna Issa an Ali ibn Ebi Talib heye, lê ev yek nakokîyê li hemberê perwerdehiyên Quranê (wek mînak, li Quranê binihêrin 6: 1 03 û 42: 11).

xwen ، mezinbûna laş: **ḥulum (al-) الحُلُم**

1- Xewn
2- Gihîştina fîzîkî . bibînin "bulûgh".

bîhnfirehî . dilovanî : **ḥilm حِلم**

Dilovanî û bexşandin li ser kiryarên çewt ên kesên din.

dilpakî : **ḥelîm (al-) الحَليم**

Ew taybetmendiyeke Xwedayî ye ku ew her gav li şaşiyên evdên(xulamên) xwe dibore, ew tu carî bi lez wan cizanake. Gunehên wan derbas(efo) dike.

bêje: "Al-hamdu lillah" : **ḥemdeleh حَمدَلة**

Bibêjin: Hemd ji Xwedê re. Gotina vegotina ku tê wateya "spasîyê ji Xwedê re dikim ".

Xudan pesnê xwe bidin, spas ji Xwedê re : **ḥemdu (al-) li-llah الحَمد الله**

Ev gotineke spasdarîkirina Xweda ye ku pir caran ji hêla Musilmana ve tê gotin. Spasdarî ji bo hemî ji bo tenduristiya ku wî daye. Ji ber vê yekê, ew carinan bi wateya "Ez baş im" di bersiva "Hûn çawa ne", tê bikar anîn, herweha, ew piştî xwarinê an vexwarinê tê gotin. Pesnê Xwedê dide. Divê li ser her demê û bi taybetî jî piştî pişkînê were gotin. ew (yê ku guhdarî dike) divê bersiv bide. bi gotina "Yarhamuka Allah", (Xuda bi te dilovan bike).

Ji bo pesnkirinê an spasîyê : **ḥemide (yaḥmed) (حَمِدَ)يَحمَد**

Bi wateya lêkerê ye, û ev jî wek iştîqaq(jê derivîn) rast e: Hemed, Muhemmed, Mehmûd, Ehmed.

hergav-pesindar : **ḥemîd (al-) الحَميد**

Pesn û spasdarîya Xwedê ji bo bereketa wî ya bêhempa. Taybetmendîya Xwedayî mezîn ji bo kerema wî ya bêsînor e.

ḥemzeh حَمْزة

Ev navê mamê Pêxemberê Xwedê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) e, ku ji cesareta wî re; di qada şerê parastina îslamê û musilmanan de li Mekkê û li çend warên cengê yên din, navê "asedu-llah" ('şêrê Xwedê') jêre digotin. Ew di şerê Uhudê de li Medînê ku gora wî li wire, şehîd bû ye.

devera parastî : **ḥima (al-) الحِمى**

Henbelî : **ḥenbelîy (kom. ḥenebileh) (حنابلة) حَنبلي**

Ew di Islamê de yek ji dibistanên sereke yên ramanê ye, ew ji hêla Ahmad bin Henbel ve hatîye damezrandin. Piştgirê Imam Ehmed ibn Henbel e (m. 855), ew zanistekî navdar ê fiqheyê ye ku yek ji çar dibistanên mezin ên sunnî yên şerîeta Islamî ye.

(شكاندنى سوێندەكە) şikandina sondê : **ḥeneŝe (yaḥneŝ) . ḥinŝ al-yemîn حِنث اليمين (يَحنَث)حَنَث**

Ew kesê ku bi derew bi Xwedê sondê dixwe, ew tiştek nekir, û wusa ew sozê dişkîne.

Henefî : **ḥenefiyy (kom. 'aḥnef) (أحْناف) حَنفي**

Ew piştgirê dibistana imam Ebû Henîfeh el-Nu'manê li ser şerîeta Islamî, ku ew yek ji çar dibistanên mezin ên Sunî ye.

ḥenîf . rastîn : **ḥenîf (kom. ḥunafa') (حُنفاء)حَنيف**

1-Yek ji dibistanên bingehîn ên ramanê ye di Islamê de, ku ji hêla Ebû Henifeh (mir. 767) zanyarekî navdar ê fiqheyê ye) hatîye damezrandin.

2-Rastîn : Di Quranê de gelek ayet têne dîtin ku Pêxember Ibrahîm (nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) wekî "Henîif" tê pênas kirin û bi wateyê ku ew di rêya rast bû .

rastdarî : **ḥenîfiyyeh (al-) الحنفيّة**

Bi gelemperî ev term di dîroka îslamî de behsa baweriyên berî Islamê di yekperestiyê de li Nîvgirava Erebî.

newala Huneynê : **ḥuneyn حُنيَن**

Ev newaleke dikeve di navbera Mekkê û Ta'îfê de ku şerekî giran bi serokatiya Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) li wê deverê di navbera musilmanan û keferan encam daye. Di vê êrîşa mezin de , musilmanan serdikevin û dijmin bi tevahî têk diçe. Li Qur'ana Pîroz binêrin ', At-Teubeh (9): 24-25.

Hewa : **ḥewwaحَواء**

Ew Jina Adem bû, aşitî li ser wan be, ku gelek zarokên wan hebûn. Her cara ku ew diwelidî, zarokê cêwî tanîne jiyan. yek mêr û yek jî jin bûn. Her cêwî, cêwiyê din dizwwicand in. Du kurên wê yên herî navdar hebûn: Habil û Qabil bûn.

ḥûriyeh حُورية

Keçike ku ji hêla Xwedeyê bilind ve hatîye afirandin, lê ne ji nijada(dûndana) Adem e, (silav Xwedê li ser wî be), Ew li biheşte hatîyê afirandin û hevaleke bêkêmasî ya mirovan e di axiretê de. Bedewîtîya wê nedîtbar û bêhempa ye.

dilxaz : **ḥewarîy (kom. ḥewariyûn) (حَواريون) حَواري**

Bi gelemperî, ev term ji bo şagirtên Pêxemberê Issa (silav Xwedê li ser wî be)tê bikaranîn.

destşoya dubare : **ḥewḍ (al--) al-mewrûd الحَوض المَورود**

Ev ew rûbar(çem)ê taybet yê ku Pêxember(nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) amaje di dema axiretê de, pêkirîye. Hin zanyar dibêjin ku ew çemê Kewserê ye ku di Sûreya 108ê de, di Qurana Pîroz de hatîye behs kirin.

selek . hêz : **ḥewl حَول**

1-Salek : Em wê pir caran bi gotina "Hale 'eleyhi al-Hewl : حال عليه الحَول" dibînin, di dema ku salek ser wê derbas dibe; sala heyvê ya"zekat" ê ji bo hin tiştan hewce dike.

2-Hêz, jêhatî : Binêre "la Hewla wela qiwweh illa bi-llah: لا حول ولا قوة إله إلا الله " , li binî.

dibêjin: "la Hewla wla qiwweh illa bi llah "**: ḥewqeleh حَوقلة**

Dibêjin: Ti jêhatî û ti hêz wek wê tune ye ji bilî alîkariya Xwedê pêve.

"لا حول ولا قوة إلا بالله".

(شەرم) fedîkar : **ḥeya' حَياء**

1- fedîkar : Berevajî yê wêrekîyê.
2-Tirsa ji şermiyê. Hesteke ku dihêle mirov xwe ji kiryar û gotinên çewt dûr bide; Ew dişibe tirsa Xwedê.

jiyana dunyayê : **ḥeyat (al-) ad-dunya حَياة الدنيا**

Jiyana li vê dinyayê, jiyaneke derbasbar û demkî ye, ev dinya jiyaneke ku divê mirov xwe têde ji bo roja dawîn amede bike, wek kirina karên qenc û xwe ji karên xirab dûr bixe.

(مێهەنگ) mehane jinê : **ḥeyḍحَيض**

Dewra heyvê ya jinê . Hatina dewra xwîna bi rêkûpêk heyvane ya jinê, çend rêbaz hene ku divê jin wan di dema dewra mehane de bişopîne, Mîna nabe ku ew nimêj bike an rojîye bigire.

(هەمیشەیی) herheyî **: ḥeyî (al-) الحَيّ**

Taybetmendîyeke Xudayî ye . Yê ku destpêk û dawîya wî tune ye.

bilez li serketinê! **: ḥeyî ‘ela-felaḥ حَيّ على الفَلاح**

Beşek ji "banga nimêjê", ji bo ku bîne bîra bawermendan ku pêkanîna nimêjê tê wateya serkeftinê.

rabin li nimêjê **:ḥeyî ‘ela ṡ-ṡelah حَيّ على الصَّلاة**

Yek ji armancên banga nimêjê ewe ku dema nimêjê li bîra Bawermendan bîne.

(خ)

dawiya Pêxemberan **: xatem al-' anbiya' / an-nebiyyîn خاتم الأنبياء/ النبيين**
Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) wek Pêxember ew dibe dawîya zincîra peyamberên ku ji hêla Xwedê ve hatine şandin de. Ji ber vê yekê edî ti Pêxember piştî wî re tune ye. (Li Qur' anê binêrin, 33: 40).

dawîya Pêxemberîtiyê **: xatem an-nubuwweh خاتم النُبوّة**
Nîşanek taybet di navbera milên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) de hebû, ku ew Pêxemberê Xwedê ye ku ev yek ji hêla hin pirtûkên pîroz ve hatîbû behskirin.

(خۆبەدەستەوەدان) dilnizm . bindest . radest **: xaşi‘ خاشِع**
Ji taybetmendîya mirovê bawermendê baş ewe ku dilnizm be û li nimêja xwe bişavtî û bindest be. (Li Qur'anê binêrin, 23: 2).

(دەزگیرانی) destgirtî **: xaţib (kom. xuţţab) (خُطاب) خاطِب**
Zilameke daxwaza destê jinekê dike.

jina mêrxas **: xaţibeh خاطِبة**
Jineke alîkarîya mirovan dike ku bûkan ji bo wan di pêşerojê de bibîne.

(نزم) ne bilind **: xafiḍ (al-) الخافِض**
Ew ji taybetmedîyên Xwedayî ne. Ew dijberî bilindayî ye. Ewe yê ku hêzdaran dadixîne û mezinkaran (serbilindan) rûreş dike. Berevajîya wê Al-Rafi‘ (bilindekar), Ew e yê ku xulamên xwe(bendewarên xwe) bi îbadetê bilind kiriye, pila wan bilind dike û wan li hemberê dijminên wan serdixe û wan ceza dike.

(نەمرد) ne mir **: xalid خالِد**
Mirovê pak dê di behişt de dimîn. Mirovê gunehkar(xirab) dê di agirê (cehnemê)de dimîne.

daxwaza xul‘ **: xale‘et (tuxeli‘) (تُخالِع)خالَعت**
Jinek dikare bi navgîniya ku jê re "xule‘ " an "muxale‘eh" tê gotin e xwe ji mêrê xwe bide berdan. Di vê peymanê de, dibe ku jin neçar bimîne ku nextê mêrê xwe bide û razî bibe ku lêçûnên din jî bide.

(دروستکەر)afirîner **: xaliq (al-) الخالِق**
Taybetmendîyeke Xwedayî ye. Ew kesê ku ji nebûnê her tişt û her kes afirandî ye. (Li البارئ) 'Bari' binihêre).

(بەدکاری)giyanên mêr û jinên xirab **: xubŝ (al-) wa al-xeba'iŝ (الخَبائث) الخُبث**
Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) ferman da musilmanan ku hergav bikevin destşokê ji van giyanan xwe biparêzin.

pîser **: xebîŝ خَبيث**
Car carinan, ev peyv "xebîŝ" ji bo şeytan tê bikar anîn.

bi yekcarî hatîye ragihandin **: xeber al' -aḥad خَبَر الآحاد**
Hedîseke ku ji hêla yek çîrokbêjî ve hatîyê ragihandin, wekî xebereke dijberî "xeber mutewatir" (ku ji hêla pir kesan ve hatîyê raporkirin).

(هەواڵ) rapor . Hedîs **: xeber (kom. axbar) (أخبار) خَبَر**
Her çend ev peyv tenê bi wateya rapor an agaheke nû tê, lê nivîsên pisporan wekî çav li

hev kirinê têne nivîsandin, "hedîs" ya Pêxember Muhemmed(nimêj û silavên Xwedê lê be) .

raporeke baş pejirandî. nûçeyên pirjimar **: xeber mutewatir خبر مُتواتر**

Raporek an kevneşopek ku ji hêla pir hejmarek veguhêzin ve(çîrokbêjê) hatine rapor kirin. raporteke dirust (pêbawer)e.

(شارەزا) herî zaniyar **: xebîr (al-) الخَبير**

Taybetmendîyeke xwedayî ye. Kesê ku bi esrarê her tiştê û karan veşartî dizane.

bobelat . gendelî : **xebal خَبال**

Xirabîya ku dibe sedema aloziyê.{لَوْ خَرَجُوا فِيكُمْ مَا زَادُوكُمْ إلاَّ خَبَالاً}:(Tewbeh: 47)

dawiya Pêxemberan **: xetm an-nubuwweh خَتم النُبوة**

Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) wek Pêxemberê dawî ye ji zincîra Pêxemberan û peyamberên ku ji hêla Xwedê ve hatine şandin de . Ji ber vê yekê piştî wî pêxember tune ne. (li Qur'anê, binêrin 33: 40).

qedandina Qur 'anê **: xetm al-qur'an خَتم القُرآن**

Temamkirina xwendina Qurana pîroz.

kiryarên paşîn **: xewatîm al-' a‘mal خَواتيم الأعمال**

Ya herî paşîn di jiyana mirov de.

ayetên dawiyê **: xewatîm as-sûreh خَواتيم السُورَة**

Ayetên dawîn ên Sûretê ji Quranê, mîna du an sê ayetên paşîn a Sûreya 2ê(Al-Beqereh), ku pir tête pêşniyar kirin ku ew li fejrê û berî çûna tavê ji hêla musilman ve were xwendin.

(خەتەنەکردن) sinetbûn **: xitan خِتان**

1- Jêkirina cermê serê kîr , di Islamê de lazime hemî mêr xwe sinet bikin.
2- bi gunehan xîyanetê bi xwe re dikin.

(باجی زەوی) baca axê **: xeraj خَراج**

Baca ku ji bo xezîneya Muslimanan ye; ku dive ji dahatên axa kesên ku ne musilmanan vergî bê standin. Ev yek mafên wan ên wekhev di qanûna Islamî de misoger dike.

baca misoger **: al-xeraj bi-ḍeman الخَراج بالضَمان**

Bingeha qanûna îslamî li ser mafê vegerandina her veberhênanê(estismarê) piştî wergirtina berpirsiyariyê tê avakirin. Ji ber vê yekê, qezencî li gurî sermayeyê(mûlkîyeta) xwedanê mal û berpirsiyariya wê.

xezrej (al-) الخَزرَج

Yek ji du eşîrên Ereban ên sereke bû li Medînê di dema Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê be) de.

tarîreşîya heyvê **: xusûf خُسوف**

Di dema tarîreşîya heyvê de nimêjên taybet bi tarîreşîya heyvê re tenê kirin.

(ترس) . dilnizm . bindestî **: xuşû‘ خُشوع**

Helwesta ku divê mirov di dema nimêjê û du'a yê de nîşan bide.

tirsa ji Xwedê **: xeşyet allah خَشيَة الله**

Pîrokirina Xwedê û tirsa ji cezayê wî.

Xidr **: Xiḍr (al-) الخِضر**

Zanyarên musilmanan dibêjin: eve navê mirovê zanistê ku di Sûreya şikeftê de di

Qur'anê de tête dîtin, Pêxember Musa xwestîye ku ji wî fêr bibe. (li Qur'anê, binêrin 18: 66-83).

destgirî(dergistî) . veguhistin **: xiţbeh خِطبة**

Destxwestina kesekî ji bo zewacê.

(گوناه) gunehkirin **: xeţî'eh (kom. xeţaya xeţî'at) (خَطيئة(خَطايا/خطيئات**

Tiştekî ku ji hêla olê ve hatîye qedexekirin.

(خوتبه . قسه) gotar . axaftin **: xuţbeh (kom. xuţeb) (خُطْبة (خُطَب**

(وتارى هەينى) gotara înê **: xuţbet al-jumu'eh خُطبة الجُمُعة**

Gotara ku Imam wê di nimêja roja inê de ji bo civatê pêşkêş dike. Dûv re du rikehên nimêje têne kirin.

gotara hewcedarîyê (dawetê) **: xuţbet al-ḥajeh خُطبة الحاجة**

Li "gotara nîkahê" binihêrin. Li binî.

(وتارى جەژن) gotara cejne **: xuţbet al-'îd خُطبة العيد**

Ew gotara ku di roja cejna fitrê an cejna qurbanê de tête xwendin.

(وترى هاوسەرگيرى) gotara zewacê **: xuţbet an-nikaḥ خُطبة النِكاح**

Peyamek ji bo merasimê dawetê de têtê dayîn.

(وتارى ماڵئاوايى) gotara xatirbûnê **: xuţbet al-weda' خُطبة الوداع**

Gotareke ku ji hêla Pêxemberê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ve di roja nehan a hecê de li Arafayê ji bo elaleteke mezin ku ta roja îroyîn jî ti hejmar ji heciyan wek wê elaletê komnebûn li cem hev. Ew axaftineke (daxweyanî) berfireh bû, di navde gelek pirsgirêkên din jî hebûne, yekîtiya mirovahiyê û wekheviya wan di çavê Allah(Xwedê) de.

(ئۆراتۆر) axaftvanê giştî **: xeţîb (xuţuba') (خَطيب (خُطباء**

Ev Peyv bi gelemperî ji bo kesê ku xutbeya Inê dide, têtê gotin.

(دەزگيران) jina destgirtî **: xeţîbeh خَطيبة**

Mêza ya destgirtî(Jin girêdaye) lê hîn ne zewicîye. Li gorî şerîeta Islamî, hevalbendê wê di her warî de 'xerîb' tê hesibandin.

pêlaveke sivik **: xuff (kom. axfaf) (خُف (أخفاف**

Ev mîna goreke ku ji çerm hatîyê çêkirin, mîna pêlavan.

(خوارەوە) nizm : **xefḍ خَفْض**

Bi nerm û dilovanî.

(Aş-Şu'era' 26 : 215) {وَاخْفِضْ جَنَاحَكَ لِمَنِ اتَّبَعَكَ مِنَ الْمُؤْمِنِينَ}

aramî : **xemeṡe خَمَص**

xul' خُلع

Ew Şêwazeke ku têde jinek bi mêrê xwe re rêkeftinê dike ku xwe ji wî ve bide berdan.

(نەوەى) nifşê dî **: xelef (al-) الخَلَف**

Nifşên ku piştre hatine.

xilafebûn **: xilafeh خِلافة**

Xîlafet di serokatiya civaka îslamî de wekî serwer. Di aslê xwe de, ev yek bi wateya xilafeta Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) di serokatiya civaka musilman de, hatîye nivîsandin.

(جێنشين) **xelîfeh (kom. xulefa'**) (خَليفة (خُلفاء**

1-Xelîfe: Bi eslê xwe, ev ew kesê ku xelîfa Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) kirîye. Dûvre, ev term ji bo hemî serokên Dewleta Islamî, heya dawî serwerên Osmanî, hatîye bikaranîn.
2- Cîgir, serwer: Di Qur 'an de, ev peyv ji bo cîgir tête bikaranîn, ew kesê ku li ser erdê hukumdarîyê dike, ango wusa jî dikarin dibêjin, ew kesê ku nûnerîtîya Xwedê li ser erdê dike. Ji ber vê yekê Xwedê Adem wek nûnerê"xelifeh" erkpêdankirîye. (li Qur'anê binêrin , 2: 30). Her wusa jî Dawid jî erkpêdankirîye (li Qur'anê binihêrin , 38: 26).

Xelîfê rast **: xelîfeh (al-) ar-raşid الخليفة الراشد**

Yek ji wan çar xelîfên ku piştî mirina pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) xîlafet bi rêvebirîye(girt ser xwe).

xelîfên rastîn **: xulefa' (al-) ar-raşidûn الخلفاء الراشدون**

Xelîfên rastîn (11-40.H): Ew çar xelîfe yekem in ku şûna Pêxember, nimêj û silavên Xwedê lê be girtine. Ew ev in: Ebû Bekir Al-Siddiq, ‘Umer bin Al-Xettab, ‘Usman bin ‘Affan û ‘Ali bin Abi talib.

forma fîzîkî **: xelq خَلق**

Şêwaza parçeyên cûda yên laş. Ew dikare bi wateya xuyangiya gelemperî ya kesekî be.

bawerbixobûn . xûrewişt : **xuluq (axlaq) (أخلاق) خُلق**

Di Islamê de gelek hedîs hene ku behsa moralê qenc dikin, di nav de: Yên herî baş ew mirovên ku moralê Islamê hildigirin .«إن أحسن الناس إسلاما أحسنهم خلقا»
Ew dibêje: "ew bawermendên herî baş, ew in ewe ku xwedanê moralê herî baş in." «أكمل المؤمنين إيمانا أحسنهم خلقا».
Wî di Pêxemberê di gotara xêrxwaziyê de got: (Ez hatim şandin ji bo ku moralê rûmetdar temam bikim) « إنما بعثتُ لأتممَ مكارمَ الأخلاق ».

(هاوڕێکەی خوا) hevalê Xwedê **: xelîl allah خليل الله**

Ev sernavê Pêxember Ibrahîm bû. Têgîna "Xelîl" têkiliyeke hevgirtî (nêzîk) nîşan dide.

cihê veşartî **: xelweh (kom. xelawî) (خَلاوي) خَلوة**

Carinan, ev peyv amaje bi herêmek(cih) rûtin dike(mîna mizgeftê tête hesibandin, ji bo hînkirina olî têbikaranîn).

bi tenê, tenêbûn **: xelweh (kom. xelewat) (خَلوات) خَلوة**

Bi wateya dema ku mirov bi tena xwe bimîne, tê. Mînak, di Islamê de qedexe ye ku zilamek bi jina xerîb re bi tenê bimîne.

vexwarinê mêst **: xemr (kom. xumûr) (خُمور) خَمر**

Çi vexwarina ku jehrî an serxweşî jê çêbibe, jêre dibêjin"alkohol=El-xemir), ev yek ji bo her musilmanî qedexe ye ku meriv bixwe vexwarinê an jî bi wê kar bike (wek kirînê û firotanê û barkirinê).

vejîn **: ximar (kom. xumur) (خُمُر)خِمار**

Celebek ji sernixumandinê(Hîjabê)ye ku rûyê xwe dinixumîne, ji bilî çavan, berevajîyê sernixumandina giştî (Niqab), ku tevahiya rû û çavên dinixumîne. (li Quranê binihêrin, 24:31 . (Binerin. "niqab").

(پێنجەم) ya pêncemîn **: xumus (al-) الخُمُس**

Ew dayîna ji pêncan yekê dravê ye ji tiştikên ku di Qur'ana Pîroz de hatîyê behs kirin û ev yek bû ye pirsgirêkeke rasteqîne di navbera Sunnî, civak û Şîyan de, ji ber ku Sunnî bawer dikin ku ew dayîna wê tenê di rêya xenîmeta şer de ferz e, di heman demê de Şîya bawer dikin ku berpirsiyariya wê dikeve li ser hemî pereyên çavkanîyan salane yên ku zêdayî pêdiviyên kesên musilman e. (li Quranê binêrin 8:41).

bê zayend **: xunŝa (kom. xenaŝî)(خناثي) خُنثى**

Ew kesê ku nikare zayenda xwe biçespîn , ji ber hebûna endamên mêr û jin, an jî yek ji wan nayê diyarkirin.

gumanbar . dilxirab : **xennas خَنّاس**

Ew ji taybetmendîyên şeytan in.

dijberên serhildêr/derveder **: xewarij (al-) الخَوارج**

Ev gotin ji bo kesên ku îslamiyet binpê kirine, hatîye bikaranîn û wan dervederan(xewarij) ji bilî îslamê baweriyeke derewîn afirandine, ku ne beşek ji Qur'ana Pîroz an jî hîndariya Pêxemberê (nimêj û silavên Xwedê lê be) Xwedê, bû.
Di dîrokê de, ew ji komeke fanatîk yên musilmanan bûn, wan digotin xelîfe Ali bin Abi Talib, Muawiyeh û yên din kafir bûne û divê we bêne kuştin. Ew berpirsiyarê kuştina xelîfeyê çaremîn Ali (Xwedê jê razî be) ne.

karê qenc : **xeyr (kom. xeyrat) (خَيرات) خَيّر**

Peyv bi wateya baş û baştir(çêtir): baştir, serkeftî.

nifşê çêtirîn **: xeyr al-qurûn خَيّر القُرون**

Baştirîn nefiş: peyva "Qurûn" bi wateya 'sedsalan' e tê , lê "Hedîs" a ku dibêje: "xeyr al-qurûn qarnî summe al-lezîn yelûnehum, summe al-lezîn yelûnehum":
(خير الناس قرني، ثم الذين يلونهم، ثم الذين يلونهم), wusa hatîye wergerandin: "Nifşê çêtirîn yê min e, paşê yên jêrîn û yên din" .

Poz . bêvil **: xeyşûm خيشوم**

Di fonetîka Quranê de, ev term amaje bi poz dike; du dengdar li wir têne hilberandin: m û n.

şev û roj : **al- xeyţu al-abyeḍ we al-aswed الخيطُ الأبيض والأسود**

bêbawerî . ne dilsozî . bêbextî **: xiyaneh خِيانة**

Ev peyv ji bo xapandin, binpêkirina peyman û têkbirina bawerîyê, tê bikaranîn.

binpêkirina peymanê (sozê) : **xiyent al-‘ahd/ al-' amaneh خيانة العهد / الأمانة**

Di "hedîsê" de ev yek ji çar nîşanên kesê durû(mûnafiq) ye.

(د)

(ئاژەڵەکانی زەوی) selawanê zimînê: **dabbetu-1-arḑ دابة الأرض**

Dewerek ji erdê derdikeve û bi mirovan re bipeyive. Xuyangiya wî dê yek ji nîşanên sereke ya hatina Roja Dawî be.

(خانووی پاش ژیان) cihê paşîn **: dar (ad--) al-'axireh الدّار الآخرة**

Jiyana dawîn .

(ماڵی بەدبەختی) cihê tengasiyan û dilêşê **: dar al-ibtila' دار الابتلاء**

Nîşan dide li vê jiyanê, ku yek bi berdewamî bi keremet û neyarên Xwedê tê ceribandin. Bawermendê mezin dê bi berekêş, bîhnfireh di rûyê êşê de spasî nîşan bide.

mala îslamê **: dar al-islam دار الإسلام**

Herêmên di bin desthilatdarî û serweriya Îslamîye de.

(ماڵی مانەوە (هەتاهەتایی) cihê nemirbûn(herheyî) **: dar al-beqa' /al-xulûd (الخُلود)دار البَقاء**

Jiyana dawîn tê wateya herheyî , berevajî vê cîhana ku jiyan demkî ye.

(ماڵی لەناوبردن) cihê wêrankirin. Cehenem : **dar al-bewar دار البوار**

(ماڵی جەنگ) cihê cengê (sewaş) **: dar al-ḥerb دار الحرب**

Deverên dijminayetî, di bin serweriya Islamê de ye.

kursîyê xilefetê **: dar al-xilafeh دار الخلافة**

Kursîyê xelîfê hakim, paytexta dewletê ye.

jiyana herheyî ya bêdawî **: dar al-xuld دار الخُلد**

Jiyana li jêr bi vî rengî tê gotin ji ber ku jiyan li wir bêdawî.

(ماڵی ئاشتی) cihê aşîtiyê **: dar as-selam دار السَّلام**

Cihê Bihuştê ye. Lê ev term ji alîyê musilmanan ve hatîyê bikar anîn da ku nav li hin cîhan bidin.

(ماڵی پەیمان) cihê bi peyman : **dar al-‘ehd دار العِهد**

Deverên ku ne-musilman ên ku bi Dewleta Islamî re peymaneke aştiyê girêdane.

("ماڵی شانازی " فیڵ) cihê serbilindîyê (xapandin)**: dar al-ẍurûr دار الغُرور**

Ev cîhan, cîhaneke winda dibe û dibe ku ew ne rast be.

(ماڵی بارنیارد) cihê mirinê **: dar al-fena' دار الفَناء**

Ev cîhan ku jiyan wê demkî ye, berevajî jiynana dawîn a herheyî ye.

niştecihê herheyî **: dar al-qerar دار القرار**

cihê dilxweşîya herheyî **: dar an-na‘îm al-muqîm دار النعيم المُقيم**

Nîşana Bihuştê ye ku li wir bawermend bi dilxweşîya bê dawî şa dibe.

(ماڵی کۆچبەران) cihê koçberiyê : **dar al-hijreh دار الهِجرة**

Bajarê el-Medineh al-Munewwereh (Medina) ê ku Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) piştî sêzdeh salan ji de'wê, bêhêvî û tirsê ji Mekkê koçber dibe.

gazîvan : **ad- da‹iy الداعي**

gazvaniyê Islamê **: da‘iyeh (kom. du‘at) (دُعاة) داعية**

Kesekê ku gazî Islamê dike, nemaze di nava kesên ne musilman de. Lê ev jî bi wateya her kesê ku dikare xizmeta ola bi Musilmanan jî bike.

daniq **: daniq (kom. dewaniq) (دوانِق) دانِق**

Parçeyekî piçûke ji "dirham" (1/6 dirham). Ji alîyê mecazî ve, ev bi wateya pereyê piçûk (mîna penizê) tête destnîşankirin.

Pêxember Dawid **: Dawûd داوود**

Pêxember Dawid ê ku bi Jalot re şer kiriye û ew kuştîye. Ew jî qiralê Îsraêliyan bû ku Zabur wê yekê eşkere dike. Binêrin Qurana Pîroz, (38): 17-26.

Mesîhê derewîn **: dejjal (ad-) الدَّجّال**

Jê re "Mesîhê dejjal" tê gotin. Li gorî kevneşopîya pêxemberî, dê mesihayek derewîn li nêzê dawîya cîhanê xuya bike. Ew ê hin kiryarên awarte bike ku dê alîkarîya wî bike ku gelek şagirtên xwe bicivîne û gelekan ji rê derxîne û winda bike .

sureta dûman (an mîj)**: duxan (sûrtat ad-) (سُورَة)الدُخان**

Sureta 44ê a Qurana Pîroz e. Yek ji nîşanên nêzîkbûna roja Dawîn e, ku li wir derê cûreyekî dûmanê (mîj) xuya dike, û ew dê çarenûsa kafirên serhişk, û bawermendên ku ji Xwedê ve ditirsin (hejmar 40-59) bêne diyar kirin.

der'u al-ḥudud biş-şubuhat دَرْءُ الحدود بالشبهات

Ti ciza ji bo pîvanên gumanbar tune ye.

derzîy (**kom: durûz**) **(دروز) دَرزي**

Bawermendîyeke naskirî ye bi veşartina bawerî û kiryaran, Li şopdarên vê perizîneke li Lubnan û Sûrîyê hene.

dirhem(derahim) (دراهم) درهم

Ew perê zîve ku bi sedsalan ji hêla musilmanan ve hatîye bikar anîn. Peyv ji drachma Yunanî pêk tê. Di wateya giraniyê de jê re dibêjin 1/12-yê "ûqiyeh" (ûsek). Niha, Hin welatên Ereban hîn jî vê peyvê ji bo pariyên xwe bikar tînin wek, (Emiratên Yekbûyî yên Erebî û Marokoyê.

daxwazî , dua (ji Xwedê re) tê **: du‘e'(kom .ad‘iyeh)(أدعية) دُعاء**

duaya vekirinê **: du‘a' al-istiftaḥ دُعاء الاستفتاح**

Di duayên ferzê de piştî "tekbîr" a yekem tê dua kirin. Li dû wê Sureya El-Fatiheh (beşa vekirinê ya Qurana pîroz di destpêkê de) tê xwendin .

duaya radestkirinê **: du‘a' al-qunût دُعاء القُنوت**

Di "duaya Witir" de tê gotin, nimêja paşîn a ku di şevê de tê nimêjkirin.

bang kirin . vexwendin **: de‘a (yed‘û) (دعا)يدعو**

Wekî termek olî, vexwendina mirovan bo Islamê yan jî riya Xwedê re.

(بانگهێشتکراو) gazî, vexwendî **: de‘weh دَعوة**

Gazîkirina mirovan ji Xwedê re an Islamê, an jî olek.

de‘weh (kom.de‘ewat / ad‘iyeh) (دعوات . أدعية) دَعوة

Duaên devkî ji Xuda re kir.

vexwendinek ji Xwedê re. gazî Allah **: de‘weh'ila Allah دَعوة إلى الله**

Islam û hînkirinên wê di nav mirovan de belav bikin.

(دۆعا چەوساوە) gazîya bindestan bikin : **de‘wetu al-meżlum دَعوةُ المَظلوم**

(پێدانی زەکات) dayîna zekatê :**defi ‹az-zekat دَفع الزكاة**

bi bez daketin jêr Erfat: **ad-def ‹u min ‹Erfat الدَّفْعُ من عرفات**

binerdkirinî **: defn دَفن**

Kesek mirî hate binerdkirin .

(بەڵگە) delîl : **delîl l (kom. adilleh) (أدلة) دليل**

Tiştek ku rastiya dozek (îdîayê) îspat dike.

(بەڵگە) birêvebirin : **delîl (kom. adilla') (أدلاء) دليل**

Serpereşt. Ew Mirovê ku xelkê ji bo kirina tiştekî şîret dike(bi rêve dibe).

wateya nîvistokê : **delalet an-naṡṡ دلالة النصّ**

Her kesê ku ji Qur'anê an hînkirinên Pêxemberê Xwedê fêhm dike (nimêj û silavên Xwedê lê be).

kêmbûna rojê : **duluk دُلُوك**

Di dema ku Roj xwe paşde dikşîne.

(خوێنی فدیە) xwîna lêborînê . rijandina xwînê : **demm fidyeh دم الفِديَة**

Ji bo gunehekî an xeletiyeke olî, ajalek wek qurban tê pêşkêşkirina, wekî winda kirina hin rêûresmên Hecê, an kirina tiştekî qedexe(ku divê neyê kirin).

xwîna paşîn : **dem an-nifas دَم النِّفاس**

Xwîna ku piştî zayîna zarokê tê, ew wek xwîneke necis(ne paqij) tête hesibandin. Loma nabe ku Jina musilman di wê demê de nimêj bike, nabe rojî bigire û dest li Quranê neke, ta herkandina xwînê bi tevahî raweste, û tevaviya laşê xwe di serşokê de şûştibe .

cîhan . jiyan : **dunya دنيا**

Jiyan û karûbarên cîhanî û madî, li hemberê karûbarên jiyana herheyî û olî .

cîhanî : **dunyewî دنيوي**

Karên cîhanî û jiyanî, li beramberî karûbarên jiyana dawîn û olî.

xwedênenasî : **dehriyeh (ad-) الدهريّة**

Felsefeke ku hebûna Xwedê înkar dike, ew tenê bi heyberên(bûnerên) maddî bawer dike .

(خولانەوە) zivirandin : **dewaran دَوَرَان**

Bihev re girêdayî. Di zanista prensîban de, têkiliya bi hev re girêdayî, ewe ya di navbera sedema sereke û hakimadrîyê de ye: eger ehtiyaca yekê bi a din hebe, ew dê çewt be.

(ئایین) ol : **dîn(kom .adyan) (أديان) دين**

Rêbaza têkliyên(danûstandinê) di jiyan û xwebawerbûnîyê(exlaq) û hînkirinên olî de.

deyn : **deyn(kom .duyûn) (دُيون) دَين**

Pereyekî deynkirî ye ji kesekî an jî kesekî heqkirî ye ku wan peran bistîne.

dadger : **deyan(ad--)الدَّيّان**

Dadger. Ew kesê ku li gurî çalakiyên wan ji alîyê dadgerî ve têne xelat kirin an jî ceza kirin.

dînar(kom .denanîr) (دنانير) دينار

Perezêr ji alîyê ji hêla Musilmanan ve di dîrokê de hatîyê bikar anîn. Di dema niha de, ew peredînar li hin welatên Ereban (Iraq, Urdun, Kuwayit, Tûnis) tê bikar anîn.

tomargeh **: dîwan(kom .dewawîn)(دواوين) ديوان**

Ew bi wateya tomargeha fermî tê. Ew di dîroka îslamê bi wateya "rêveberî" an "wezaretê" hukûmetê hatîye bikaranîn. Wek mînak "dîwana Leşkeran" berpirsiyarê beşê hukûmî yê "esker" (leşker, tomarên wan, û mûçeyên wan bû)

dravê xwînê **: diyeh(kom .diyat) (ديات) دِيّة**

Dravê ku kujer bi zanebûn an bi xeletî, wekî tezmînata ziyanê dide malbata kesê ku li ser destên kujer hatîye kuştin.

(ذ)

sûrê bayî : **ẕariyat (sûret aẕ-) سُورَة الذَّارِيَّات**
Ev Sûreya (51)ê ya Qur'anê ye, ji peyva ku di ayeta yekem de hatîye, hatîye girtin. Ev Sûre qala pirsgirêka vegerandina roja qiyametê dike , û li ser yekbûna Xwedê dipeyive, û ew her weha behsa mêvanê Ibrahîm ji nav milyaketan dike, û çîroka Mûsa(silava Xwedê li wî be), ew li ser miletên ku dijberî Pêxemberên xwe bûn, mijûl dibe, û fermanê dide Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) ku di tengasiyan de bi sebir be.

kesayet : **ẕat ذات**
Ew pir caran behsa taybetmendiyên xwedayî dike.

gengeşa lihevhatina di navbera du mirovên de : **ẕat al- beyn ذات البين**
Bi gelemperî, em vê termê di vegotinên mîna "islah zat al-beyn" (çêkirina aştiyê) di navbera du kesan de bi nakokî de dibînin.

heyîn . bûnan . kesbûn . hebûn : **ẕat – al- allah ذات الله**
Ev gotin hebûna(heyîn) Xwedê destnîşan dike.

bîranîna xwedê : **ẕakir ذاكِر**
Mirovekî ku Xwedê bi rûmet pesn dike û "zikr" û Qur 'anê ji nûve dixwîne.

du qayiş (du kember) : **ẕat an- nitaqeyn ذات النطاقين**
Jineke bi du qayişan(qarîşan) e . Ew behsa Asma 'keça Ebû Bekir (Xwedê jê razî be)dike. Ew behsa bûyera ku Asma têde kembera xwe dike du parçe, û bi parçekî tûrikê xwarina ku ji bo Pêxember û ji bo bavê wê re amade kiribû şeva çûyîna wan a Mekkê ve girêda.

(سەربڕین) qorbantî . serjêkirin : **ẕebîḥ ذبيح**
Ev gotin bi wateya gurandî "serjêkirî"tê . Ew îşaretê bi Ismaîl kurê Pêxember Ibrahîm dike. Ew behsa çîroka Ibrahîm dike ku tiştek nemabû ku bavê wî (Ibrahim) wî li ser emrê Xwedê bike qurban.

(قوربانی) ajelanê gurandî : **ẕebîḥeh (kom. ẕebe'iḥ) (ذَبائح)ذَبيحة**
(هۆکارێک . بەهانە) sedemek . hincet : **ẕerî'ah (kom. ẕera'i') (ذَرائع) ذَريعة**
Mirov Hincetekî derdixe ji bo ku tiştekî bike.

(یادکردنەوە) bîranîn : **ẕikra ذكرى**
nizmbûn : **junaḥ aẕ-ẕl جناح الذُّل**
hemwelatiyê parastî : **ẕimmiyy (kom. ahliẕ-ẕimmeh) (أهل الذمّة) ذميّ**
Welatiyek Xirîstiyan an Cihû di Dewleta Islamî de .

gûnehkirin : **ẕenb (kom. ẕunûh) ذُنب (ذُنوب)**
Guneheke, ji bo her kesê ku berevajî yê hînkirinên olî kar dike.

mezinahî û rûmetdar : **ẕû aj-jalal wa al-ikram ذو الجلال والإكرام**
Taybetmendiyeke xwedayî ya Xudayê mezîn û comerd e.

ẕû al-ḥijjeh ذو الحِجّة
Meha donzdehê ji salnameya Islamî, wekî meha heciyê tête zanîn.

ẓû al-xuleyfeh ذو الخُليفة
Ciheke ku çend mîlan dikeve başûrê Medînê li ser riya Mekkê ku hacî ji Medînê bi çilubergê xwe ve berû Mekkê ve bi rêve diçin.

Zul-fiqar **: ẓû al-fiqar ذو الفقار**
Navê şûrê Pêxemberê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) e. Hinek dibêjin ev navê şûrê Ali bin Abi Talib (Xwedê jê razî be)e, ku pismam û zavayê Pêxember bû.

bi du strûhan **: ẓû al-qerneyn ذو القَرنين**
Navê zilamekê Xwedê ye ku em di Quranê de çîrokeke kurt li ser wê dixwînin (Sûrta 18: 83-98). Yek ji mezintirîn serwerên dîroka kevnar e. Ew bawermendek rastîn bû. Hinik zanyaran ew bi Alexanderê Mezin re naskirîye.

ẓû al-qi‘dah ذو القِعدة

Meha yazdehê ji salnameya îslamî.

ẓû al-kifl ذو الكِفل
Ew Pêxemberk bû, hin dîrokzan bawer dikin ku ew di Cihûdayê de Ezekiel bû. Zul-Kifl her roj sed nimêj dikir, û berî ku ew kefaleta gelê xwe bike, piştrast dike ku ew dê bi dadperwerîyeke adil di nava wan de bi rê ve, ji ber vê yekê wusa kir, lewra wî jê re digotin Zul-Kifl, û navê wî di çend cihan de di Qurana Pîroz de tête gotin . (21: 85-86; 38:48, 2: 280)

mirovê xwedanê du ronîyan **: ẓû an-nûreyn ذو النورين**
Ev işaretê bi xalifeyê sêyemîn "uthman ibn 'effan' dike, ku ew bi du keçên Pêxemberê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) re li peyhev zewicî ye.

Yunus **: ẓû an-nûn ذو النون**
Yunus Ibn Metta wek Pexember li nik Cihû, Xiristiyan û Musilman tê dîtin. Quran Yunus wekî peyxemberê rastîn ê Xwedê dinirxîne, ku ew carekî dest ji erkpêdana xwe berdide, ji sedema dijwariya karê bawermendiyê. Di dema ku ew bi gelê xwe re di gemîyê de di derya de bû, Xweda li hemberê wî hêrs dibe û gemiya wan binav dike û gelê wî avêtiye nava deryayê(behrê).
Lê masiyek mezin(hotek)li ser emrê Xwedê wî dike di tarîya zikê hotê de û ew di tariyê zik de dimîne, da ku wî bi edeb bik û wî bi mucizekî rizgar dike. (çîroka wî di Qur'anê de bibînin, 37: 139-148; 21: 78-88).

têkildariya bi xwînê(merov): **ẓewû ar-rḥem (kom ẓû ar-rḥam)** ذَوو الرَّحم
Xizim an têkiliya xwînê.

Xizm , mirov **: ẓewû al-qurba ذوو القُربى**
Kesên ku têkiliya wan(bi hev re) bi rê ya xwînê re çêdibe ye an bi rêya pêwendîyê re.

(ر)

(میانگیری بەرتیل) navbeynkarê bertîlê : **ra'iş رائش**
Yê / a ku navbeynkariyê di navbera kesê bertîldan û bertîlxwer de dike . ew mîna herduyan gunehkar e.

(وشتر سواری) siwarbûna devehê(hoştirê) : **raḥileh راحلة**
Ew deveheke mêzaye ji bo siwarbûnê tê bikar anîn .

(ڕەزاک) pêşkêşvanê herî baş : **raziq (ar-) ar-rezzaq (رزّاق) رازِق**
Taybetmendiyeke Xwedê ye. Xêrdanê her bûnerî li ser vê gerdûnê, Dana xêrên bê sînor.

bertîldar : **raşî (ar-) الراشي**
Kesê ku bertîlê pêşkêşî kesek din dike, hevkarê sûc e, ku ew gunehekî mezin e, bertîldar û bertîlxwer sûcdar e.

(شوان) kesê berpirsiyar : **ra'î (kom. ru'at) (رُعاة) راعي**
Ew kesê ku dibe berpirsiyarê kesên din, bav, hukumdar hwd: kesê berpirsiyar .

(ڕەتکەرەوە) nepejirandin, red kirin : **rafiḍeh (tek. rafiḍîy) (رافِضي) رافِضة**
Têgîneke ku ji bo Şîyên ku mafê xelîfeyên yekem ên xîlafetê red dike, tê gotin, tê îdia kirin ku Elî (Xwedê jê razî be) xelîfeyê yekem ê Pêxember bû, nimêj û silavên Xwedê lê be.

(بەرزکەرەوە) hilgir : **rafi' (ar-) الرافِع**
Taybetmendiyeke Xwedê ye .Yê /a ku cihê wî bilind dike an fermanên bi pêktîne.

xwînerê sihêr : **raqî (ar-) الراقي**
Ew kesê ku ayetên Qur'anê dixwîne û li ser nexweşan ji bo armancên dermankirinê, dua dike.

(چۆکدان . ئەژنۆ) çokdanîn : **raki' راكِع**
Di nimêjê de ew kesê / a ku di rewşê xwar (bowsê) de ye. "Ruk'eh" (binihêrin) bibînin.

veşartî . astengkirin : **rane رانَ**
Tiştên ku dilê wan vegirtin ji gunehbûn wan. (83:14).

keşê dêrê : **rahib (kom. ruhban) (رُهبان) راهِب**
Her çend dibe ku peyv bi gelemperî wekî "rahîb" were wergerandin, lê di têgînên Islamî de tê gotin ku ew behsa keşekî Xiristiyanan dike ku li dêran jiyanek dilsoz dijiya.

ceribandin : **rawede راوَدَ**
12:26) (Ew hestan radike

ragihînerê Hedîsê : **rawî (kom. ruwat) al-ḥedîŝ راوي الحديث**
Ew kesê ku Hedîsên Pêxemberî dibêje.

herî dilovan : **re'ûf (ar-) الرَؤوف**
Taybetmendiyeke Xwedê ye. Ew kesê ku herî dilovan e.

(بینین) dîtine : **ru'ya رُؤيا**
Bi gelemperî, xewneke baş, xewn ji şeytan, û dîtina ji Xwedê.
(li Quranê binihêrin, 37: 60. Ji bo 'xewnê', li Quranê binihêrin, 1 2: 43).

dîtina baş : **ru'ya ṡaliḥeh رُؤيا صالِحة**
Dîtinek ku wateya wê dikare rast be.

dîtina heyva nû **: ru'yet al-hilal رُؤيَّة الهلال**

Ji ber ku salnameya Islamê li ser bingeha meha heyvê tê desnîşankirin, ji bo diyarkirina destpêka mehê, girîng e ku mirov li heyva nû binhêre .

durûtî . xwenîşandan **:re‹a' رِئاء**

Ne rastîbûn, ne ji bo Xwedê ye.

(قازانج بەخش) qezencî . berjewendî . zêdebûn **: riba رِبا**

Her zêdebûna(qezenc) li deyn hatîye dayîn, û Islam vê qezencê qedexe dike. (Li Quranê binihêrin, 2: 275-276).

(قازانجی فرۆشتن . ڕیبا فرۆش) qezenca firotinê : **riba al-bey‘ ربا البيع**

Têde keresetek (ma'adek)li hemberê ya din tê veguhestin, lê nirxê wan ne wekhev û ji kêmanî ve radestkirina keresetekî dereng dikeve. Ji bo ku em ji qezenca firotinê dûr biçin, divê danûstendina tiştan(keresetan) li her du aliyan wekhev (bi heman rengî û bihayî (nirxî) û bilez (bê derengî) be.

rîba pêşîn an dereng **: riba al-nasiyeh ربا الناصية**

Ew zêdebûna sermiyane ye ya deynekî ye an deynekî mayînde ye.

Xwedî / xwedan **: rebb (kom. 'arbab) رَبّ (أرباب)**

Ev peyv di Quranê de hem di formên yekjimar û pirjimar de tê dîtin. Ew bi wateya xwedê an Allah tê bikaranîn û herweha ew ji bo xwedan û birêz (seyda) jî tê bikar anîn.

li sersekinî : **ar-ribaţ الرِّباط**

Parastina sînorên axa musilmanan: Parastina sînorên musilmanan ji êrişên mimkun ji alîyê dijminan ve . Ev teşê(çeleb)bawermedîyê hêjeyî rêzgirtinê ye.

qezencî(têkildarîya qezencî) **: ribewî (bey') ربوي**

Tiştên ku li gurî rêgezên feqîtîyê in li ser ribayê(qezenc) tene firotanê , ku cûrbecûr ji hêla dibistanên şerî'eha(qanuna) Islamî ve têne destnîşankirin: Tiştên ku bi firotin û bi pîvanê têne firotin, wek xwarinê û di nav de zêr, zîv, dirûvên kaxezê, tiştên xwarinê wekî genim, birenc , ciyê, xurma, xwê… hwd.

Xudan . serwerî **: rubûbîyeh رُبوبيّة**

"rebb" bibînin. Ev term carinan bi xwedayî "ulûhîyeh" re tê berevajîkirin.

Rebi'ya Dîn **: rabî‘ al-' axar رَبيع الآخر**

Navek din ji bo ("rabî ' asanî" ango buhara duyemîn), meha çaremîn di salnameya îslamî de .

Rebi'ya yekem **: rabî‘ al-awwal رَبيع الأوّل**

Meha sêyemîn a salnameya îslamî. Meha ku Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ji dayik bûye bi îhtîmalek mezin di meha donzdehemîn a sala 570 mîladî de ye.

Rebi 'ya Duyemîn **: rabî‘ aŝ-ŝanî رَبيع الثاني**

Meha çaremîn di salameya îslamî de .

girtî :**retqun رَتقٌ**

Qefilandî, Morkirin, Girtin .(21: 30)

rettele (yurettil) رَتَّل (يُرتِل)

Qurana Pîroz bi baldarî bixwînin. "rertîl" bibînin.

(لەرزین) hejendin **:rejje رَجَّ**
(4 : 56 Al-Waqi‘eh) { إذا رُجَّتِ الأرضُ رَجّاً }
(تکایە . هیوا) hêvî **: reja' رَجاء**
Daxwazî ji bo çêkirina tiştek baş an jî hêvîkirina tiştek baş.
rejeb رَجَب
Meha heftemîn a salnameya îslam ye. Di vê mehê de bû ku "al-isra' û mi'raj "pêk hatîye.
gûneh . gemar . nefretkirin . gumandarî **: rijsun رِجْسٌ**
Di çavê Xwedê de ew tiştê herî nefretbar e, ku lê pêşîgirtin tê xwestin. (Qur'ane bibînin, 5: 90).
{إِنَّمَا الْخَمْرُ وَالْمَيْسِرُ وَالأَنْصَابُ وَالأَزْلاَمُ رِجْسٌ مِنْ عَمَلِ الشَّيْطَانِ} ' (المائدة 5 : 90)
rej‘eh رَجعة
1-betalkirina berdanê : "raj'îy (telaq)رجعي طلاق" li jêr.binihêrin.
2-Veger, guhertina fikr .
betalkirina berdanê **: rej‘îy (ṭelaq) (طلاق) رجعي**
Jinberdan: ew di cara yekem û duyem de tête betalkirin; ango jina berdayî dikare di dema bendewarîyê de vegere cem mêrê xweyê berê (sê "heyamên mehane") . Lê ew ne mumkin e ku ew di cara sêyemîn de piştî serdema bendewarîyê, li mêre xwe vegere. Ew tenê dive ji nû ve bizewice û eger ew ji mêrê xwe yê nû veqete, dikare li mêrê berê vegere û dibe ku ew piştî cara sêyemîn êdî li wî venegerin. ev biryar dijberî "berdana tevgerandinê."طلاق الباعث
çîrokbêjên(bêjerên) Hedîsê **: rijal al-ḥedîŝ رِجال الحديث**
Ew li hemî mirovên ku di veguhestina Hadisên Pêxemberî de beşdar bûne vedigere. Zanîna di derbarê wan de ji bo asta rastbûna wê alîkariyê dide destnîşankirin.
(بەردباران) kevirdikin **: rejim رَجم**
Avêtina keviran Li ser mirovan an tiştan.
(دەرەوە) derketî (derveyî) **: rejîm (ar-) الرَجيم**
Ev peyv ji bo wesifkirina şaytanê ku ji kerema Xwedê hatîye dûrkirin, tête bikaranîn , ji sedema rabûna(serhildana) wî li hemberê Xwedê û emirên wî.
texmîn **: rejim bi-L-ẍeyb رَجِم بالغيب**
pêşdîtin . pêşgotinî
(سڵاوەکە بگەڕێنیتەوە) vegerandina silavê **: redd at-taḥîyeh ردّ التحية**
Quran Musilmanan fêrdike ku ji wan tê xwestin ku ew bersiva silavê bidin; dive bersiva silavên wan çêtir bin . Li Quranê binêrin. (86: 4)
zikê zayinê **: reḥim (kom. arḥam) (أرْحام) رَحِم**
Xizmtiya(Mirovatîya) xwînê. Binêre "zu ar-rehim ذو الرحم"
(میهرەبان) herî dilovan **: reḥman (ar-) الرَحمن**
Taybetmendiya xwedayî: ew behsa tevaviya dilovana wî li ser vê gerdûnê dike, di nav de kafir jî tê de, û ev nav an rengdêr tenê bi Xwedê re tê bikar anîn, berevajî piraniya taybetmendiyên din ên ku dikarin bi yên din re bêne bikar anîn.

sûreya dilovan : **reḥman (sûrtat ar-) سُورَة الرَحمَن**

Ev sûreya 55ê a Quranê ye, ku ji peyva yekem a ku di sûreyê de hatîye girtin. Ew behsa xweşîdanên(bereketa) Xwedê ji bo mirovan dike,û herweha behsa însan û cinan dike, û delîlên xwedayî yên ku li ser erd û ezmanan hene vê yekê zelal dike.

dilovan : **reḥmeh رَحمة**

Ev peyv ne tênê bi wateya dilovanîyê, lê ew herweha bi wateya dilnermiyê, lênêrîn û ..hwd tê.

(میهرەبان) dilovan : **reḥîm (ar-) الرحيم**

Taybetmendiyek Xwedê ye. Ew kesê ku ji bawermendan re dilovaniyek taybetî nîşan dide. (kom: "rehman").

(مۆڵەت) destûr : **ruxṡeh (kom. ruxeṡ) (رُخَص) رُخصة**

Destûr, destdan. Mînak, nexweşeke ku destûrnameya şikandina eftara remezanê pêre heye, ku ew dikare piştre wê rojîyê bigre.

(شل بێت) nerm . sist : **rixw رِخو**

Di dengsaziya Qur'anê de, dengek dema ku derdikeve, hewa wê tê girtin (bi tengaviyekî kêmbar) ku rê dide derbasbûna hewayê û hereketekî "sist" diafirine, wek nimûne (s.z).

(پۆشاک) cilê bedena (lihev pêçeyî) jorîn : **rida' ('ardiyeh) (أردية) رِداء**

Cilubergeke ku ji hêla hacîyan(mêran) ve ji bo ku perçeyê jorîn yê laş pê binixumîne, tê bikaranîn, li hemberê "izar"ê ji bo perçê jêrîn.

(سڵاو بکە) silavveger : **redd as-selam ردّ السَّلام**

Di Islamê vegerandina silavê erke .

paşvexistin . redkirin : **riddeh رِدّة**

Mirovê ku xwe ji Islamê bi mebesta bêbaweriyê qut dike, û ew dikare bi gotin, kirin, bawerî an gumanbar e; ew sûcekî mezine .

debara jîyanê : **rizq (kom. 'arzaq) (أرزاق) رِزق**

Bi gelemperî, têgîn di çarçoveya darizandinên Xwedê de ji bo afirandina hêza wî tê bikar anîn, ji ber ku ew peydakerê rastîn e.

xerabî : **reẓîleh (kom. reẓa'il) (رزائل) رَزيلة**

kiryarê gunehbar.

peyam . name : **risaleh (kom. risalat) (رِسالات) رِسالة**

Peyama Xwedayî, ew nameya ku Xwedê peyamberên xwe pê erkpêdankiriye ku ew nama di nava mirovan de ragihîne.

(پەیامبەر) agehbir . peyamber : **resûl (kom. rusul) (رُسُل) رَسول**

Di warê olî de, ev bi gelemperî behsa Pêxemberê ku ji hêla Xudayê mezin ve ji bo miletekî an jî ji bo tevahiya cîhanê hatîye şandin, dike wek mînak di doza Pêxemberê îslamê (nimêj û silavên Xwedê lê be)de ku Xwedê ew di seranserê dîroka cîhanê de ew bi Pirtûkên xwe ve ji bo yekparêziyê (Tawheîd) ji bo mirovan û cinan şandîye da ku bo wan jiyana pêkvejiyan ravebike. Musilman ji hemî Pêxemberên wekî Pêxember: Nûh , Ibrahim, Musa , Dawud , Issa ,aştî li ser wan hemîyan be, û nemaze Muhemmed, qebûl dikin û bawer dikin (Wî pîroz bikin û silavan bidine wî). (Mursallen bibînin)

rêya rast : **reşed رَشَد**

Rêya rast an çalakîya rast .
al-kehf:10 ((إِذْ أَوَى الْفِتْيَةُ إِلَى الْكَهْفِ فَقَالُوا رَبَّنَا آتِنَا مِن لَّدُنكَ رَحْمَةً وَهَيِّئْ لَنَا مِنْ أَمْرِنَا رَشَدًا

hişmendî : **ruşd رُشْد**

Ev peyv bi gelemperî bi wateya "sinn ar-ruşd سن الرشد " tête û bi wateya temenê gihayeyî an berpirsiyarîya qanûnî tête destnîşankirin.
Di wateya rastdariyê de tê bikaranîn.

(رێنوێنی) rêber : **reşad رَشاد**

Di Qur'ana an de, heya gotina " sebîl ar-reşad : rêya rêberiyê " (bibînin, 40:29)
Di Qur'ana an de, heya gotina " sebîl ar-reşad : rêya rêberiyê "heye. (bibînin, 40:29)

(پێگەیشتوو) herî rast e . gihîştî : **reşîd (ar-) الرَشيد**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Yê ku di biryar û kirinên xwe de şaş nabe û yê ku kesên din bi rêve dibe.

bertîl : **reşweh رَشوة**

Dana Para an tiştekî ji bo kesekî bi armanca ku sûdê an xizmetekî bi dest bixe. Di îslamê de bertîl bi tundî hatîye şermezarkirin. Bi rastî, Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) bertîlda, bertîlxwar(wergir) û navbeynkar şermezar kirîye.

razîbûn . xweşbîn : **riḍa رِضا**

Ew kesê ku bi rewşa xwe û qedera xwe razîye.

vexwarina hemşîran : **riḍa‘ رضاع**

Dayika ku zarokeke din ku ne zarokê wê ye, pênc an bêtirî pêncaran wê zarokê bi şîrê xwe bide, bi vê yekê ew zarok bi hev re dibin bira.. Ji bo vê yekê zewaca wan dê encamên qanûnî bide. Xwişk û birayên yên ji hem şîrê nikarin bi hev re bizewicin .

yek-care şîrdan : **reḍ‘ eh (kom. reḍ ‘at) (رَضعات) رَضعة**

Vexwarina şîrê normal yekcar e. Her cara ku jinek şîrê xwe dide zarokekî, ji vê re " red'eh= şîrdan " tê gotin. (li "rida' رضاع Binihêrin").

riḍwan رِضوان

1- Kêfxweşbûn, têrbûn: Pir caran, ev term îşaretê bi bereketa xwedayî dike. Bi gotinên din, ew îşaretê li ser razîbûna Xwedê ji kesekî dike, ku divê razîbûna Xwedê armanca dawî be ji bo tevger û kirinên kesê bawermend.
2- Radwan: Navê milyaketê ku berpirsiyarê parastina "bihiştê"dike .

Xuda bi wî razî be : **reḍira allahu' anhu رضي الله عنه**

Pir caran ev hevok piştî bîranîna navên hevalên pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) tê gotin.

(بروسكه) sûreya gûrijî(qûrî) : **re‘d (sûreya-) رعد(سُورَة)**

Ev Sûreya 13ê ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji peyva ku di ayeta 13ê de hatîye dayîn, digire. Ew li ser mijarên yeketiya Xweda û roja qiyametê dike , û şerê li dijî pir-xwedêtiyê(muşrikan)diyar dike, li ser mijarên bi nîzama civakî ve girêdayî, disekine, herweha ravekirina rastdarî û mezinahiya Qur'anê, bihuşt û ecêbên wê, li ser pesnê gûrijî, û gotinên pêşiyan da ku rastiyê ji derewê nas bikin, dike.

berpirsiyar : **rei‘رعي**

Kesê ku berpirsîyarîya alîgirên xwe dike.

gel : **re‘îyeh رَعيّة**

Mirovên ku di bin berpirsîyarîya kesekî diyarkirî de, çi serwer be, bav be an dayîk be. (li "Ra'î " binihêrin).

rakirina tûnebûnî (derxistina zehmet) : **ref‘ al-ḥaraj رَفع الحَرَج**

Rakirina sedema tengasîyê, wekî destûra şikandina rojîyê di meha remazanê de, eger ew kes nexweş be an di rêwîtiyê de be.

pîsêtiyê . xerabî : **refeŝ رَفث**

Qebhet bi wateya " pîsêtiyê tê û kiryara cinsî tê," ku ew hemî di dema Hacê de qedexe ye. (Li Quranê binihêrin, 2: 197.)

"qirrik" : **reqebeh رَقبة**

Keseke ku navê wî bi piranî di çarçova rizgarkirina xulaman de tê destnîşankirin. Loma peyva " 'itq reqebeh" an "fakku reqebeh" ji bo rizgarîya xulamekî têbikaranîn.

ruq‘a: رُقعة

Ew daçekekî Bankê ye ku di serdema îslamî de dihat bikaranîn. Ew fermaneke dravdanînê bû ku mirov malê(dravê) ji emanetê bikişîne.

çavdêrî -temaşekirin : **reqîb (ar-) رَقيب**

Taybetmendîya xwedayî . Ew e yê ku bi berdewamî kontrolê(şopandinê)dike.

nîvêşt .tamîmeh : **ruqyeh (kom. ruqa) (رُقى) رُقية**

Xwendina ayetên Quranê û / an duayên pêxemberî bi mebesta başkirina mirovan ji nexweşiyên giyanî û laşî. Li ser vê yekê sûreyên Quranê hene ku ew jî bi taybetî ev in: SûreyaTamîma: Kursî (2: 255), û du surên (el-Mu`wezetin) 113 û 114.

parzûna xezîneyê : **rikaz (kom. 'arkizeh) (أركزة) رِكاز**

Xezîneyên siruştî an veşartî yên ku li axa yekî hatine dîtin, di nav wan de kenz û kevirên hêja jî hene. Li ser van "zekaya" hin rêzikname hene.

lêvekirin : **rek‘eh (kom. rek‘at) (رَكعات) رَكعة**

Di nava "nimêjê" de pêkanînek heye ku tê kirin wek: rawestandin, xwexwarkirin, sicûd û rûniştin.

lêvekirin : **rukû‘ رُكوع**

Rukû' di "Selat" (nimêjê) de bi wateyê: Kevîyên destan bidin ser çokan û pişta xwe rastbihêlin. Divê çavên mirov li ser devera eniya sucûdê be.

kevirê bingehê . stun : **rukn (kom. arkan)(أركان) رُكن**

Hêmana piştgiriyê ya avahiyekî ku bêyî wê dîwar hildiweşe. Ev têgeh di gelek mijaran de bi wateya tişteke pir bingehîn tê , wekî "arkan al-islam : stûnên Islamê", " arkan aS-Selat : stûnên nimêjê ". . .hwd.

qozîya(goşeya) Yemanî (başûr) : **rukn (ar-) al-yemanî رُكن اليماني**

Quncikeke ku dikeve başûrê Ke'beyê; başûrê kevrê reş(Hacer el-Eswad). Gava ku mirov dorpêçê(tewafkirin) dike, ew wê hingê dest bi dua'ayan dike heta ku ew digihîje Kevrê Reş.

remezan : **remeḍan رَمضان**

Meha nehan ji salnameya Islamî, meha rojiyê ye. Ev meh cara yekem di Qurana Pîroz de hatîye xuya kirin. (li Quranê , 2: 185 Binêrin). Ew di wê mehê de dikeve şeva qedr(Hêzê) (li ليلة القدر binihêre). Di wê mehê de şerê Bedrê rûda ye û musilman di wî

şerî de ser dikevin. Herweha di wê mehê de Mekka ji hêla Mihemmed ve (nimêj û silavên Xwedê lê be) tê rizgarkirin .

meşa bilez(sivik) : **remel (ar-) الرَمَل**

Meşa bi lez di sê rêzên yekem ên dorpêçê "tewafê" de; li dora Ke'beyê ku bi rengek bilez mirov dimeşe, tê kirin, lê ew meşa bilez tenê ji zilaman tê xwestin.

hilweşîn . xerabûyî : **remîm رَميم**

(Yasin : 78) {من يحيي العظام وهي رميم}

avêtina keviran : **remî ac-cimar رَمِي الجِمار**

Avêtina heft keviran li ser stûna 'jernreh' ya li Mina di hecê de.

tirsnak : **rehbeh رَهبة**

Ew behsa têkiliya musilmanekî bi Xudê re dike, ev term bi wateya tirsa ne(neguhdarîya) ji Xwedê,tê.

keşetî : **rehbaniyeh رهبانيّة**

Ew kesê ku jiyana xwe dide xwedê. Ev têgeh bi gelemperî di xiristiyanetîyê de tê bikaranîn. (Qur 'an, 57: 27).

malbet . xizan : **rehţ رَهْط**

{ تسعةُ رَهطٍ }: ango: neh malbat. (An-nemil 27: 4)

berdêl (misuger) : **rehn (ruhûn)/ rihan (رهون/ رِهان) رَهَن**

Sozgirêdanî: Tişteke ku deyndar di dewsa deyndê xwe de li nik deyndêr (xwedanê mal) dihêle ji bo vegerandina deyn.

ewlekarî, soz : **rihan(rehîn) (رَهين) رِهان**

Sozgirêdanî: Tişteke li nik xwedanê malê tê girtin, wek nimûne, ji bo ewlehiyê ew tişt deyndêr li nik xwe dihêle.(aţ-ţor:21).

agahdayina Hedîsê : **riwayat al-ḩedîŝ رِواية الحديث**

Yek ji van zanistên ku ji miletê Islamê re bêhempa bû. Ew lêkolîneke berfirehe di derbarê hedîsên Pêxember de, di derbara zincîra vegotin û nivîsê de di binê Sind û Al-Metn de. Ew ne tenê di çerçuva veguhestin û ramanê de dimîne, lê belê ew li ser têgihîştina her tiştê ku Peyxember ji Xwedê wergirtîye, tê rawestandin. ew gelek celeb wê hene.

canê dilsoz : **rûḩ (ar-) al-amîn الروح الأمين**

Giyanê pêbawer: Ev term behsa serokê mela'akan Gabriel dike, ku peyamên Xwedê ji bo peyamberên veguhestîye(anî ye).

giyan : **rûḩ (kom. 'arwaḩ) (أرواح) رُوح**

Li gorî hînkirinên îslamî, giyan na mire, ji ber ku ew di roja qiyametê(vejînê)vedigere.

Rewda pîroz : **rewḑeh (ar-) aş-şerîfeh الرَوضة الشريفة**

Rewda pîroz: Ew navê sûreya pîroz e di Mizgefta Pêxember Muhemmed de ku ew dikeve di navbera guristana Pêxember û menbera wî de. Di Hedîsê de hatîye gotin ew bexçeyek ji bihiştê ye.

giyana pîroz : **rûḩ al-qudus رُوح القُدُس**

Ew behsa serokê mela'akan Gabriel dike.

Romayî, Bîzant **: rûm (ar-) الرُوم**

Roman û Bizantî: Di dîroka îslamî de, ev peyv ji bo Romayiyan, nemaze ji bo gelên Bizantî yê rojhilatê tê bikaranîn.

sûretê romê/romiyan **: rûm (sûret ar-) سُورَة الروم**

Ev Sûreya 30ê ya Qur'anê ye, yekem ayetên sûriyê ye ku serketina Romayiyan li hemberê Farisan diyar dike, piştî têkçûna wan bi çend salan ku di dawiya serê Sasanî-Bizantîyan de di navbera salê 602ê-628ê de rûda ye.

vegotin **: rewa (yerwî) (يروي)رَوى**

Ew bi wateya ragehandinê di derbarê hedîsên Pêxember de tê.

(دووڕوویی). durûtî(pêşandana çêkirinê) **: riya' رِياء**

Pêşkêşkirin: kirina tiştekî ku baldariya mirovan dikişîne, ne ku Xwedê razî bike. Ev rewş bi wateya "şirkil as-sxer: bawerîya piçûk " tête hesibandin, Ji ber kiryar bi vê kiryarê ortaxan(şirîkan) bi Xwedê re çêdike.

(بای بەهێز) bayê dijwar : **riḥun ṡerṡer رِيحٌ صَرْصَر**

(بای تێکدەر) . bayê wêranker : **riḥun ‹qim رِيحٌ عَقِيم**

(ز)

(سوڕانەوە) pêşçavkirin . zivirandin **: zax̌e زاغ**
(زیناکار) zînakar **: zaniy/eh (kom. zuneh) (زُناة) زاني**
Ew kesê / a ku têkiliyeke cinsî ya neqanûnî pêk tîne, çi mêr be an çi jin be, çi zewicî be û çi jî nezewicî be.

(زاهید) zahid**: zahid زاهِد**
Ew kesê / a ku jiyanek asêtî (asetîkî) jiyan dike. (li "zuhd" binihêrin). Jiyana kesekî wusa li vê dunyayê rêwîtiyeke ji bo jiyana herheyî ye. Çiqas bar sivike be, hewqasî rêwîtî hêsantir û ewletir dibe.

dibistana mizgeftê **: zawiyeh زاوية**
Dibistana mizgeftê: di welatên Islamî de, hinik mizgeftên piçûk li nêzî / an li ser gora "Walî" hatibûn çêkirin û ji bo hînkirinê dihatin bikar anîn, ligel xanîyekî pabendî(girêdayî) wê. Gelek caran ew bi fermanên sufîtîyê dihat parastin (domandin).

parêzvanên (cerdevanên=nobetgirên) dojehê **: zebaniyet jehennem زبانية جَهَنّم**
Nobetgirên cehnemê: mela'akên(ferîşteyên) berpirsiyar cezayê di derheqa gunehkaran û kafiran de li dojehê dikin

Zebûr **: zebûr (az-) الزبور**
Mezamîr: ew pirtûka ku ji bo Pêxember Dawûd hatîye şandin.

derkirin : **zejreh زَجْرة**
sûreya xemilandinê **: zuxruf (sûret az-) (سُورَة)زُخرُف**
Ev Sûreya 43-ê ya Quranê ye, Navê wê ji ayeta (35ê) hatîye girtin, û ew li ser giringîya Qurana Pîroz radewiste, û di derbarê Pêxemberê Islamê de dibe, (nimêj û silavên Xwedê li wî û malbata wî be) û her weha behsa delîlên yekperestiyê, bereketên Xwedê yên li ser mirovahiyê, û şerê li dijî pirrperestiyê û kevneşopî û gotinên derewîn, dike, wekî bêbaweriya ji keçan, û herweha ew qala çîroka pêxemberên berê û miletên wan dike, û ew pirsgirêka vegerê ravedike, û xelata bawermendan û çarenûsa kafiran eşkere dike.

sujjada belavkirî : **zerabiyu mebŝuŝeh زَرابيُّ مبثوثة**
dara Zaqqum **: zeqûm زَقوم**
Celebeke ji dara nefretê ku ew wek firavê (xwarinê) di Dojehê(cehhnemê)de bi wê bêbawer û gunehkaran didin xwarin. (wek mînak, li Quranê 37: 62-65; 44: 43-46 binihêrin)

paqij be **: zeka (yezkû) (يزكو) زكا**
xercên bacê / baca **: zekat زَكاة**
Zekat ji pênc stûnên Islamê yê sêyemîn e. Ew bi wateya paqijkirin, zêdekirin, an çandinên baş tê. Ew di Şaeriyayê (ol)de wek baca olî ye li ser Musilmanên dewlemend ku malê wan sînorê lêborînê (nisab)derbas dike ku rêjeya wê ku Şaeriya(Şaerîet) destnîşan dike. Bi vî rengî, bac ne li ser dahatê tê nirxandin, lê ew li gurî demekî diyarkirî ku têde Musilmanek esulên wergirtîye. (divê roja zekatê ji bo hesabê malên

zekatê ku salane tê dayîn bê diyar kirin) Li gurî mîqdarê nisabîyê, piştî hewcedariyên normal ên xwedanê mal. Ew rêja zekatê ji hêla Xwedê di Qurana Pîroz de li ser Musilmanên dewlemnd ji bo feqîran ferzkiriye. Ew li ser drav, ajal(selewan), hilberên çandinî, mîneral, sermaya ku di pîşesazî, karsaziyê de, hatîye ferzkirin. Rêjeyên danê li gurî cidabûnên xwezaya mal tên nirxandin. Sûdmendên Fona Zekatê li gurî Qur’ana Pîroz (9:60), ew kesên belengaz, hewcedar in, musilmanên ku ji nûve derbasî êslamê bûne, herweha rêwîyên ku di tengasiyê de ne û girtîyên zindanan.

: zekat al-fiţr زَكاة الفِطر

Baceke piçûk e ku ji hêla her musilmanî ve di dawîya Remezanê de,tê dayîn. Ew her sal carekî di dawîya remezanê de berî cejnê tê dayîn. Ew Sedeqe ku divê mirov wan di her salê de, bide, eger ew ji "nisabê" derbas bike. Rêja wan ji sedî du û nîv e.

zakata genim **: zekat al-ḥubub زكاة الحُبوب**

Zekat li ser genim , nîsk, darê….

zakata kenz **: zekat al-Ma‘adin زكاة المَعادِن**

Zekat li ser kenz "hesin"..

zakata fonan **: zekat al-Mal زكاة المال**

Beca dewlemendên Musilman; Musilman divê ji 2,5% ji parê xwe bide, eger li jorî nisabê be, ew jî ji bo kesên civakê yên feqîr, belangaz û hewcedar e .

zakata zêrên(xezînê**): zekat al-rikaz زَكاة الرِكاز**

Zakat li ser xezîneyên / kevirên hêja yên ku ji hêla kesekî ve hatine dîtin.

(زەكاتی بازرگانی) zakata bazirganî **: zekat al-tijareh زَكاة التِجارة**

Zakat li ser milkê bazirganî ye di projekî karsazî an bazarganî.

Zekerîya زَكريا

Navê Pêxember, bavê Pêxember Yehîya (Yûhenna) û parêzgerê Meryem li Qur'anê, 3: 37-41 û 19: 2-15 binihêrin).

zekka (yuzekkî) (يُزكّي) زَكّى

1- Dayîna zakatê: Dayîna baca zakata belengaz a mecbûrî, ku wekî xêrxwazî an zakatê tê naskirin.
2- Ew ji kesekî re şahidîyê dike: ji bo kesekî diyar bike ku ew baş e, an pesnê wî bide, ji ber vê yekê, "zakka nafsehu" bi wateya ku ew îdîa dike ku ew ji yên din başir an çêtir e.

(بوومەلەرزە) erdhejî **: zelzeleh زَلْزَلَـــــة**

Erdhejî yek ji navên roja qiyametê ye. Li Sura 99ê ya Qurana Pîroz binihêrin.

sûreya erdhejê **: zelzeleh (sûret az-) سُورَة الزَلزلة**

Ev Sûreya 99ê ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji peyva ku hem di forma devkî û hem jî di ayeta yekemîn de tê, digire . Ew li ser bûyerên ku di Roja Vejînê de û her tiştê ku li ser rûyê erdê diqewime, radewiste, û her weha behsa derketina xelata mirovan û ecêbmayîna mirovan di wê rojê de dike, û dîtina wan ji kiryarên wan an kirinên wan re, yên ku di tomargeha wan de hatine tomar kirin.

nêzîkî **: zulfeh زُلْفة**

(تیر) tîrên(tîr) **: 'azlam (tek. zelem)** (أزلام**)زلم**

1- Pirbûn1- Pirbûna pişkan. Tîr ewe ku daran dibirre ku Ereban ew jibona birrînê bikartanîn, nemaze di qumarê de.

2-Pûtan.Tiştên ku ji aliyê pûtperestan ve têne perizîn(parastin).

sûreya koman **: zumer (sûret az-) سُورَة الزُمَر**

Sûreya El-Koman: Ev Sureya 39ê ji Quranê ye, navê wê ji ayeta (71ê) hatiye girtin, û jê re Sûreya(xûref : odên) jî tê gotin. Ew qala banga yekbûna Xwedê û dilsoziya bawermendan(îbadetê) dike, û sûre behsa mijara vegerandin (qiyamet), xelat û cezakirin û jûreyên Cennetê dike, ew behsa girîngiya Qur'ana Pîroz, û çarenûsa mirovên dike, û ew pirsgirêka poşmaniyê nîşan dide û deriyên wê ji bo kesên ku dixwazin li Xwedayê bilind vegerin, vekirî ye.

zemzem **: zemzem زَمزَم**

Bîra/kanîya zamzama pîroz di Mizgefta Mezin a di Mekkê de. Tête gotin ku ew kanîya avê ya yekem bû, di dema ku Ismayil zarok bû, ev kanî li ber lingên wî derketîye(av jê ji kanîye herikîye). Bavê wî, Pêxember Ibrahîm wî dayika wî Hajer re bicîh dihêle û li ser fermanên Xwedê, ew kanî tê herikandin. Li wê çolê Hacer ji bo kurê xwe(Ismayil) li avê digere, û bi fermana Xwedê ew av ji binê lingên wî derdikeve. Eve eslê rastîya kanîya Zemzem, ku muilmanan ava wê pîroz dibînin.

(ساردی سەخت) serma dijwar : **zemherîr زَمهرير**

heresy . nûhî **: zendeqeh زَندقة**

Nakokiya nêrînên(dîtinên) olî bi hînkirinên Islamê re.

(بێباوەڕی) bêbawer **: zindîq زِنديق**

Bêbawer, ewe yê ku baweriya xwe bi Xwedê û peyamerên Wî nayîne. An jî ew ên ku fikir û baweriyên berevajîyê hînbûnên îslamî, belav dikin.

zînbûn, zînayîn **: zina زِنى**

Di şertên Islamî de, her kiryarek zayendî (cinsî) di navbera mêr û jinê de derveyî zewacê, ew wek zinayê tê hesbandin. Ew yek ji gunehên mezin tê hesibandin, Cezayê wê bi kesên têkildar re girêdayî ye, ka ew zewicî ne (seyib) an nezewicî ne an ne tementije (bikr)ye.(An-nûr : 2)

bêparbûn . bêhalîbûn . hişkbûn **: zuhd زُهد**

Jiyana bi rêçikên herî hêsan û bi hewcedariyên herî hêsan .

(هاوسەرگیری) mehrî **: zewaj زَواج**

Zewac "sunnet" e ku ji bo parastina kesan ji têkiliyên zayendî yên neqanûnî bi tundî tê pêşniyar kirin.

(زەواجکردنی خۆشی) zewaca kêfê (demkî) **: zewaj al-mut'eh زَواج المُتعة**

Ew zewaceke ji bo kêfê ye, ew zewac bi demkî tê lidarxistin û divê di peymana zewacê de dema dirêjahîya wê bê diyar kirin. Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) vê zewacî ne şa'arayî(rast) hisabkir.

zewaca veguherînê berdêlê(berdêlîyê) **: zewaj / nikaḩ aş-şixar زَواج/ نِكاح الشِغار**

Zewaca bê qelen, ew zewaca du mêr welîya xwe(keça xwe an xwişka xwe) li hev berdêlî dikin, bêyî ku heqê qelenê(mehir) "sedaq" bide. Ev yek di Islamê de qedexe ye, Ji ber ku ev yek mafê bûk û azadiya wê di hilbijartinê de binpêdike.

(نەمانی خۆر). vemirandina rojê **: zewal aş-şams زَوال الشَّمس**
Nava rojê: di dema ku roj xeta herêmî (mehelî)derbas dike. Di wê demê de nabe ku musilman nimêj bike, ev qedexe ye. Nimêja nîvro ("Selat az-Zuhr") piştî vê yekê dest pê dike.

(جووت) cot **: zewj (kom. 'azwaj) (أزواج) زَوج**
Yek ji hevseran: Ev peyv di Quranê de ji bo jin an mêanr tê bikar anîn. Dûvre, mirovan ev peyva "zewceh" : ji bo armanca ku zayenda jinê ji mêr bê cuda kirin, hatîye bikaranîn. (wek mînak, li Quranê, 11:40.binihêrin).

(هەڵە . درۆکردن) derewîn, çewtî **: zûr زور**
Cewtî, ev gotin bi gelemperî bi peyva "qewl" ('gotin') an "şehadeh" ('şahidkirin') tê bikaranîn; bi wateya xapandin an şahidiya derewîn tê naskirin , ku her du kiryar jî bi tundî ji hêla Islamê ve têne şermezar kirin.

mezheba Zaydî **: zeydîyeh زَيديّة**
Mezhebekî Şîyî ye: ew îdîa dikin ku ew li dûv Zayid bin Alî bin Husein li şûna kurê Jafer El-Sedîq, dimeşin(jê re digotin Je'ferîyeh). Ev mezheb bi taybetî li Yemenê belav bûye.

ẕimmeh ذِمّة
Termekî bingehîn e ku di karên Fîqhê de cih digire, ku bi têgihîna berpirsiyariyê re têkildar e. Dibêjin deyn di stuyê kesekî din de cih digire, eger ew deyndarê kesekî din be. Ev deyn mafê(mustehiqê) wî kesê pêwendîdar re.

(س)

se'ele (yes'el) (يَسَأل) سَأل

1-Ew dipirse: Bi gelemperî, mebesta wî pirs e. Di wateya teknîkî de ev gotin bi wateya pirsê di forma lêpirsînê de tê, wek mînak di gorê de an di jiyana paşîn de.
2-Parsekî : Ew di Islamê de wekî kiryar tê şermezar kirin, çimkî gunehbar e. Birastî, Pêxember Mihemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ew kên ku bê hewceyî parsekîyê dikin, hîşyar kirine ku vê yekê nekin.

(پرسیارکەر) parsek . pirsker **: sa'il سائل**

Ew dikare bi wateyên din li gurî çerçuveya hevokê bê.

şivankirina sêlwanan **: sa'imeh (kom. sewa'im) (سوائم) سائمة**

Di hesabkirina zekatê de (baca zekatê) ew li gurî xwedîkirina ajalan a cihêreng ku ew ji hêla xwedan wan ve têne xwarinkirin, tête pî van din.

sajid (kom. sujjed) (سُجَّد) ساجِد

sextebûn . "Sujûd" ê bibînin

(جادووگەر) sêrbaz **: saḥir (kom. seḥar) (سحّار) ساحِر**

Sêrbaziya reş dikin . Binêre "sihr سحر".

Sara **: Sareh سارة**

Navê jina Pêxember Ibrahîm (nimêj û silavên Xwedê lê be) û dayika Ishak e. Navê wê di Quranê de nehatîye bibîranîn. Li ser soza xwedayî ew dibe ku dayîk, tevî pîrbûna wê. li Qur'anê binêrin, 11: 69-73.

wextê vejîn **sa'eh (يوم)الساعة**

Samerî **: Samirîy (as--) السامري**

Ev peyv di Qur 'an de, îşaretê bi kesên Israyilî dike ku wan şopînerên Mûsa di nebûna wî de, xapandine, da ku ew parastina golikê zêrîn bikin. (Li Quranê binihêrin 20: 85-91.)

(پرسیار) pirs **: su'al سُؤال**

Pir caran ev yek îşaretê tişeke forman ji lêpirsînê dike .

sûreya Saba' **: seba' (sûret –) سُورَة سَبأ**

Ev Sûreya 34-ê ya Quranê ye, Ew aliyek ji jiyana Pêxember Sulêman e, silava Xwedê lê be. Her ew weha behsa hin bereketên îlahî dike, û banga fikirîn, ramîn, bawerî û çalakiya rast dike. Bajarê Seba' ji mirovên Yemenê (ayet 15) hatiye standin. Ew dewlemend bûn û wan jiyanek xweş derbas dikirin, û axa wan bi Bendava Ma'rib baş dihat avdan. Lê ew ji Xwedê dûr ketin, loma ew bi zehmetiyan hatine cezakirin (ayetên 15-19ê). Ev wekî dersekî ji bo bawermendan di her demê de.

sedema (dexstinê)**: sebab (kom. asbab) an-nuzûl النزول (أسباب) سبب**

Ev bûyera ku di wê demê de ayetên Qur'anê pîroz hatine şandin. Ravekirina bûyerên bi vî rengî ji bo eşkerekirina rastîyê, gaveke girînge.

(Al-kehif : 84-85) .{وَآتَيْنَاهُ مِنْ كُلِّ شَيْءٍ سَبَبًا فَأَتْبَعَ سَبَبَاً}

rûmet kirin . bilindkirin (Allah)**: sebbaḥa (yusabbiḥ) سبح (يسبّح)**
Xwedê ji her kêmbûnê bilindtirbûyê.

bilindkirina Xwedê **: subḥan-allah سبحان الله**
Nêzîkî hevwate "Rûmet ji Xwedayê min re".

rûmet û pîrozkirina wî **: subḥanehu wa ta‘ala سُبحانه وتعالى**
Yek ji gelek awayên rûmetkirina Xudayê Bilind. Ew bi wateya "Rûmeta Xwedê ya jorî tê. Ew ê dûrî kêmasiyê.

subḥanek-allahumma سُبحانك اللهمّ
Rûmetdar tu Xudayê minî.

tisbeh **: subḥeh (kom. subeḥ) (سُبَح) سُبحة**
Rêzeka ji morîkan , hejmara wê bi gelemperî 33ê an 99h morîke ku Musilman wê ji bo duayan bi karbînin, wekî "subhana llah :Rûmet ji Xwedê re ", "al-hamdu li-llah :Hemd ji Xwedê re" û "allahu akber : Xwedê Mezintirîn e". Ew sunnet e di dema ku her musilman wê 33 caran bêje, nemaze piştî"nimêjê". Dûv re dibêjin: "la ilaha illa-Allah : Ji Xwedê pê ve tu xwedayê din tune " ku wê ta sed100 carî bixwêne.

rê (sedema) Xuda ye **: sebîl allah سَبيل الله**
Vegotina: "fî sebîlillah" (Ji bo Xwedayê Mezin).

du derketin(ji bin çûn) **: sebîlan (as-) السَبيلان**
Ev behsa herdû endamên destava picûk(mîz)û destava mezin(stûle) dike; ango di dema ku tiştek ji van herdû endamên jorîn derbikeve, ji mirovê musilman tê xwestin ku xwe carek din paqij (tahir)bike Ji ber mirov wek ne tahir tê dîtin

sedemên bandorbar **: sebr wa taqsîm سَبر وتَقْسيم**
Di zanistîya Prensîbên Qanûna Islamî de, ev term bi wateya debaşkirina sedemên bandorbat tê destnîşankirin.

heft rêsaz (awa)**: seb'et 'aḥruf سبعة أحرُف**
Pisporên xwendina Qur’ana Pîroz dibêjin: bêjeya ku ji hêla Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be.) ve hatîye bikaranîn, behsa form û newekhevîyên xwendina Quranê di her heft 'zaravayan' de dike. Ev newekhevî mirov dikare ji hejmareke kêm de ji peyv an komên peyvên ku di Quranê de hene, bibêje.

dubarebûna heftcarî **: seb' (as-) al-meŝanî السَّبع مَثاني**
Lêveger ew destpêka vekirina Sûreya Quranê ya ku ji heft ayetan pêk tê ye, û ew 17 caran di pênc nimêjên rojane de tê xwendin. Musilman gelek caran vê sûreyê ji bo helkeftinên pîroz dixwînin(vedibêjin).

veşartina endamên laş yên taybet **: setr al-‘awreh سَتر العورة**
Ew endamên laş in yên ku dive mêrza an nêrzayên musilman wan di hebûna beyaniyan de an dema pêkanîna nimêjen pêwîst de, veşirin. ("ewreh "binihêrin).

îbadeta astengdar e **: sutret al-muŝellî سُترَة المُصلّي**
Tiştê ku li ber perestgehê tê girtin da ku ew rasterast li pêşiya wî nekeve. Ew dikare dîwarek, stûnek an jî laşê ku bi bilindahîyeke guncaw xwe bigire,(biqasî gavlingekî)be.

Yek carekê sextebûn **: sejdeh (kom. sejdat) (سجدات) سَجدة**
"sujûdê سجود" bibînin.

sûreya sejdê (tewandinê)**: sejdeh (sûrtat as-) سُورَة السَجدَة**
Ev sûreya 32 ya Qur'anê ye, behsa yekdestdariyê meziniya Qurana Pîroz dike, di derbarê ayetên Xwedê de, rûmet ji wî re be, li ezman û zemîn, û rêveberiya wî ya di vê dinyayê de, û der jê afand ya vê dinyayê din, û li ser roja Vejînê de, û ew behsa dîroka lsraêl û çîroka Mûsa (silavên Xwedê li ser wî be) dike, û mizgîniya bawermendên li Bihiştê, û gefa gewiran bi agir.

xwendina sejdê (tewandinê)**: sejdet at-tilaweh سَجدة التِلاوة**
Mirov sujde dike dema ku hin ayetên Quranê teybet têne xwendin . Di Qurana hindik de çend cih hene ku sujdê tê pêşniyar kirin .

sejde kirin **: sejede (yesjud) (يَسجُد) سَجد**
Sejde di îslamê de(sexhdarî) ewe di dema ku musilman enî û pozên xwe di nimêjê de datînin li ser erdê, û di heman wext de jî ew dive dest û tiliyên ling û kabokên xwe bi sivikî bigihînin erdê.

cilka nimêjê : **sujjadeh (kom. sejajîd) (سَجاجِيد) سُجادة**
Musilman vê sicadê ji bo nimêjê bikartînin, bi gelemperî tê xwestin ku cîhê nimêjê paqij ("tahir")be. Bi xwezayî, mirov dikare li ser her tiştî nimêjê bike, ta li ser erdê tazî jî, di dema ku mirov bizanibe ku ew cih paqij e.

sujûda jibîrkirinê **: sujûd as-sehw سُجُود السَهو**
Du sujûd berî dawiya "nimêjê" têne çêkirin, di gava ku yek di dema nimêjê de hin xeletiyan(şaşiyan) bike.

sujûda sipasdarîyê **: sujûd aş-şukur سُجود الشُكُر**
Dema ku mirov nûçeyên baş dibihîze, wek nimûne, ew ji Xwedê re sujûda sipasdarîyê dike.

zemîna heftemîn : **sijjîn سِجِّين**
{ كَلا إِنَّ كِتَابَ الْفُجَّارِ لَفِي سِجِّينٍ}83:7

zayendî di navbera mêza de: **śiḥaq سِحاق**
Kiryara zayendî ya di navbera jinan de . Ev yek di îslamê de bi tundî tête red kirin , û ew wekî gunehê mezin tête hesibandin.

qezencîya neqanûnî **: suḥt (kom. asḥat) (أسحُت) سُحت**
Tiştek ku kes bi navgînên neqanûnî qezenc dike. (Al-Ma'deh (5): 42)

(جادوو) . sêrbazî : **siḥr سِحر**
Sêrbazîya (sêrika) reş a ku sêrbaz bi gelemperî wê bi armanca parastina mirovî ji xerabîyê, çêdike, da ku tiştên zirarbar bi mirovan bike û herweha aramanca wê ewe ku kiryarên ne asayî pêk bîne. Islam sihrê qedexe dike.

(جادووگەر) sêrbaz **: seḥereh (tek. saḥir) (ساحِر) سَحَرة**
Ew kesên ku karên sihrê reş dikin. (li "sihr"ê binihêrin).

xwerna paşivê **: suḥûr سُحور**
Xwarina ku musilmanek beriya nimêja sibehê dixwe û tê xwestin ku ew di wê rojê de rojî bigire, û heya ku mimkûn be ku ew paşîva xwe dereng bike, da ku barê rojiyê li ser wî kêm(sivik) bibe.

dûrbike : **suḥqan سُحْقًا**
(11 : 67 Al-Mulk) . {فَسُحْقًا لِّأَصْحَابِ السَّعِيرِ}

Hêrsa Xwedayî **: sexeţ -allah سَخَطُ الله**
Xweda ji kesên ku fermanên wî bicî nayîn an ziyanê didine kesên bêguneh .

pêşîlêgirtina karan (pêşîlêgirtina gunehan)**: sedd aẕ-ẕera'i‘ سدّ الذرائع**
Rêgirtin li rêçikên neqanûnî. Carcara, qanûn dikare çalakîyeke destûrî qedexe bike, ji ber ew dikare bibe sedema kiryarên neqanûnî.

dara Sînorê(tixûb)**: sidret al-munteha سِدرة المُنتهى**
Dareke dikeve jorê ezmanê heftemîn nêzîkê bihûştê ye, ango dara li kêleka textê Xwedayî ku tu mirov nikare di ber wê re derbas bibe. Ev dara di Quranê de, di Sûreya 53ê: Ayatên 14ê û 15ê de tête behs kirin, Qur'an di wê çerçevê behsa hilkişîna Pêxember ber bi ezmen ve dike(duayên Xwedê û aşîtîya wî li ser be), ew wekî "Meraj" tête binavkirin.

parêzvanên Ke'beyê **: sedenet al-beyt / al-ke‘beh سَدَنة البيت (الكَعبة)**
Ew kesên ku berpirsîyarîya Ke'bê dikin û li wê dinhêrin. Bi fermî, tenê kilîta Ke'bê li nik malbatekî heye, ku Pêxember (Xwedê wî pîroz bike û aştiyê bide wî) berî 1400 salî ew kilît radestî wê malbatê kiribû**.**

bifirehî û tengahî **: serra' (as--) waḍ-ḍarra' السَّرّاء والضرَّاء**
Bi wateya "di bin her şert û mercî de"tê. (Al-‘Imran "3": 134)

serav(dîtina derewîn) **: as-serab السَّراب**
(39 :"24" An-Nûr) . {وَالَّذِينَ كَفَرُوا أَعْمَالُهُمْ كَسَرَابٍ}

navik **: surreh سُرّة**
Navika zik: ew sînorê jorîn e " ji perçeyên taybetî". Wek mînak, ji bo "edebeta" mêran, ew divê laşê xwe ji navikê heya çokan binixûmînin, û ev ya hedî herî kêm e ku divê ew berî nimêjê veşêrin.

nimêja veşartî **: sirriyyeh (śelah -) سِريّة (صَلاة)**
Ev gotin du nimêjên rojane destnîşan dike: Zuhr (nîvro) û Asr (şûnda paşîn). Bi wateya peyva veşartî "nihînî" tê. Nimêjkar Quranê bi rengekî bêdeng ku yên din nebihîsin, dixwîne.

: serîyeh (kom. seraya) سريّة (سرايا)
1- Artêşeke piçûk bû ku ji hêla Pêxember Muhemmed ve hatîbû şandin, dibe ku Xwedê wî pîroz bike û aramiyê bide wî, ji bo cîhada ku ew bi xwe têde beşdar nebûbû, şandiye.
2- Keçika xulam: ew ji hêla axayê ve wekî jineke kolê tê nirxandin(dîtin). Ji ber vê yekê têkilî qanûnî ye, ji ber ku divê zarokên wê, zarokên rewa bin.

se‘a (yes‘a) سعى يسعى
1-Meş: meşa di navbera Safa û Merweh (heft carî) de wekî beşek ji rîwayetên 'umreh û hecê. Di her alî de dimeşin.
2- Karkirin ji bo şopandina karekî , an ji bo peydakirina debara jiyanê .

zina . na yasayî(ne şer'iy) **: śifaḥ سِفاح**
Ji bo zaroka ku bavê xwe nas nake, jê re dibêjin "kurê sifahê" (derveyî zewacê çêbûye).

xweşandin : **sufûr سُفور**

Bi gelemperî, jin rû û serê xwe eşkere dike an qaîdeyên cilûbergê Islamî paşguh dike. Ev yek bi gelemperî bi "hîjabê" re tê berevajîkirin.

bêaqil : **sefîh (kom. sufeha') (سُفهاء) سَفيه**

Car caran, ev peyv bi wateya " rûreş" tê. (An-Nisa' : 5) , (Al- 'A‘raf : 55).

xwîn rijandin, kuştin : **sefk ad-dima' سَفك الدِّماء**

Bi gelemperî, ev yek îşaretê bi kuştina bêheq an bi komkujîyê dike.
(Li ' sefeḥ ' bibînin).

(ئاودان) . avdanîn : **siqayeh سِقاية**

Ev yek behsa peydakirina avê ji bo heciyan dike ku ji hêla Mekkiyan ve dihat peydakirin.

(دۆزەخ) . cehneme : **seqer سَقَر**

Navekî dine ji agirê cehneme yê.

Seqifeh السقيفة

Piştî wefatbûna Pêxember, hevalên wî li Saqîfayê li Medîneyê ji bo armanca ku dilsoziya xwe bidin Ebû Bekir, kom dibin.

(سەرخۆش) . serxweşî : **sukur سُكر**

Bi gelemperî ew bi rêya vexwarina şerabê(meyê) çêdibe.

rawestan : **sekteh (kom. sektat) (سَكتات) سَكتة**

Di "tejwîd"ê de, ev bi wateyê tê ku mirov hilma xwe bi kurtî, bêyî ku nefesa xwe bistîne, radwestîne. Ev nakokî bi "rawestandin"ê re çêdibe.

aramî : **sekîneh سَكينة**

Hestê aşîtî û aramiyê an şopandina rewşek weha, ji ber hebûna Xwedê bi awayekî berbiçav. Binêrin Qurana Pîroz, At-Tewbeh (9): 26, 40, Al-Feth (48): 4, 18, 26.

aşîtî (silav) : **selam سَلام**

Ew di Islamê de têgehekî sereke ye, ku peyva îslam û musilman pêve girêdayî ye. Yek ji taybetmendiyên Xwedêgiravî "as-selam" e, û yek ji navên cinnetê "dar as-selam" e. Herweha ev gotin ji bo silavkirin, xatirxwestin û bi dawîkirina "nimêjê tê bikar anîn. Gotinek heye ku di dema ew ji bo behskirina Pêxemberan û milyaketan (silevên Xwedê li wan bin) tê kirin, ev gotin li ser wan tê dubare kirin.

deyn : **selaf سَلَف**

Peyva "selaf" bi rastî wateya deyn tê ku ti qezencî nagihe mirovê deyndêr. Di wateya berfireh de, ew deynên demkî yên diyarkirî ne, ango deynên kurt, navîn û dirêj in.

pêşiyên me (dapîr û bapîr)(bav û kalên) baş **selef (as-) aṡ-ṡaliḥ السَلَف الصالِح**

Bi gelemperî ev têgeh ji bo her sê nifşên yekem ên musilmanan tê bikaranîn, ango, ji bo nifşên destpêkê yên musilmanan bi sehabî(haval) û şopîner re tê gotin. Her çend ew bi wateya bav û kalên dîndar an nifşên berê tê. Gotina "bav û kalan" bi peyva "xelef" re an nifşê (salaf: nifşek) paşîn re tê berevajîkirin.

nifşên destpêkê . bi sunnetê Pêxember Muhemmed dişopînin : **selefî سَلَفي**

Bi gelemperî gotina selefî ji bo wesfikirina nifşên destpêkê yên musilmanan tête bikaranîn , nemaze hevrêyên peyxemberê Xudê û yên ku li pey wan. Di serdema niha, ev term carinan ji bo danasîna musilmanan yê ku pirtûkên sunnetê yên Pêxember

Muhemmed û As-Selaf as-Salihîn, ji hevrêyên rastdar ên Muhemmed, tête bikaranîn(nimêj û silavên Xwedê lê be).

nekarîna kontrola mîzê **: seles al-bewl سلس البَول**

Nekarîna kontrolkirina mîzê , nemaze derketina dilopên mîzê.

avkaniyek li buhiştê**: selsebîl سَلسَبيل**

Ew bi wateya "riya lêgerînê" tê. Li Qur’ana Pîroz, (Al-insan "76": 18 binêrin) .

desthilatdarî **: sulţan سُلطان**

Desthilatdarî an kontrola li ser kesan . Bi vê wateyê em pir caran vê peyvê di Qur'anê de dibînin.

sultan **: sulţan (kom. selaţîn) (سلاطين) سُلطان**

Ew bi wateya 'desthilatê' an "hukumdarî" tê.

silav li ser we be **: asselamu 'elayikum السَّلام عَليكم**

"Silava Xwedê li ser we be". Silav ji musilmanan re ye. Bersiva vê silavê jî eve " û Silava Xwedê û dilovaniya Xwedê û berekatên wî li ser we be.

silavkirin **: selleme (yusellim) (يُسلِّم) سلّم**

Bi wateya silavkirinê tê, ku dibêje: "asselamu 'eleykum".

xwe radest kirin **: selleme (yusellim) amreh (يسلّم) أمره سلّم**

Bi wateya ku mirov xwe di destê yekê din de berde, tê. Bi gelemperî ew carna, bi wateya ku dive mirov çarnivîsa xwe bi hêvîya Xwedê ve bihêlê, tê. Bi wateya: Xwe radestkirina xwestina Xwedê tê.

Suleyman **: Suleyman سُليمان**

Pêxemberê Islam û qiralê aqilmend e. Ew kurê Pêxember (û padîşah) Dawûd bû, (aşîtî li ser herduyan be). Wî bi qasî cîl salan hukumdarî li bakûrê rojava yê kendava Erebî kirîye. Xweda yê berz gelek hêz da wî, da ku ew bikarbe kontrola bayê, danûstandin bi çûk û mîrok û heywanên din re, bike û hêz da wî ku kontrolê li ser cinnên xirab jî çêbike. Li Qur’ana Pîroz binêrin , Al-Anbiya (21): 79-82, An-Naml (27): 15-44, Saba (34): 12-14, Saad (38): 30-40. Li Murselîn binêrin.

guhdarî kirin û bawerî pêkirin **: sem‘ (as--) waţ-ţa‘eh السَّمع والطَّاعة**

bexşîna Islamî **: semaḥet al-islam سماحة الإسلام**

Lêborîna îslamî: îslam şopinderên xwe ku di têkiliyên xwe de bi kesên ne musilman re lêborîn (dilovan)bin . (Wek mînak, li Quranê, 60: 8-9. binihêrin) Ew rastîya îslamê ya nermok a ne tevlihev destnîşan dike.

semi‘a-llahu li-men ḥemideh سمع الله لمن حَمَده

Xwedê dengê kesên ku li wî guhdar dikin, dike. Bi gelemperî, ev gotin her Musilman di nimêje de , di dema ku ew serê xwe bilind dike, dibêje.

hemû guhdarî kirin **: semî‘ (as-) السَّميع**

Taybetmendiyeke Xwedeyî ye. Yê ku her tiştî dibihîze, di heman demê de çiqas deng nizm jî be.

(ئاگرى دۆزەخ) . agirê dojehê : **semum سَمُوم**

(Aţ-Ţur 52 : 27) .{ فَمَنَّ اللَّهُ عَلَيْنَا وَوَقَانَا عَذَابَ السَّمُومِ}

semma (yusemmî) (يُسمي) سمّى
1-Dibêjin: "bismillah" : Ev kurt e ji bo "Bi simillah بسم الله"e , ango "Bi navê Xwedê."
2-Bi nav kirin : Dana nav ji bo kesekî an tiştekî.

zincîra vegotina Hedîsê **: sened al-ḥedîŝ سَنَد الحَديث**
Zincîra vebêjên hedîsê: Her bêjer wê bi bêjerekî ve girêdide heya ku zincîra veguhastinê bigihêje şopîner an hevalan (Sihhabîyan).

temenê bilûx(gihiştinê) **: sinn al-bulûẍ سِن البُلُوغ**
"bulûẍ"ê bibînin.

temenê dagirtî(qanûnî) **: sinn at-teklîf سِن التَكليف**
Temenê ku mirov têde bi zagonî û olî berpirsîyar dibe.

temenê cûdabûnê **: sinn at-temyîz سِن التَمييز**
Termekî dine ji bo mezinbûnê .

temenê pjekbûnê(têgihştinê) **: sinn ar-ruşd سِن الرُشد**
Mezinbûn: Ew temenê ku mirov têde ji hêla derûnî an zêhnî ve tête kemilandin.

adetên Pêxember Muhemmed **: sunneh (kom. sunan) (ج: سُنَن) سُنَّة**
Hemî adab û neret (adet) û kevneşopîyên Pêxember Muhemmed, Xwedê wî pîroz bike, ku ne tenê di pirtûkên Sahih Bukhari û Sahih Muslim de tomar bûne, lê her weha ew bi rê mirovên zindî re jî ku ev kevneşopî û adet hatine veguhastin. Ew ji kesên wê hingê ve heya yên noka ve tên veguhestin.
Tevî ku Sunnet bi taybetî tenê pabendî adetên peyxemberê Xudî ne. Ew di heman demê de adetên nifşa yekem ji musilmanan jî li temsîl dike. Wan îslam rasterast li nik Pêxember naskirine, ne ji pirtûkan fêr bûn û ew tiştên ku ew jê fêrbûne, gihandine nifşên din.

sunneta kevneşopiyênPêxember **: sunneh teqrîrîyeh سُنّة تقريريّة**
Ev raporên han îşaretê bi raporên ku behsa karvedana Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) di dema ku tiştek di hebûna wî de dihat kirin, dike, wekî nimûne pejirandin (erêkirin) an red kirinê wî ji bûyer(kiryar)tiştan re destnîşan dike.

sunneta rêzbirêz **: sunneh ratibeh (kom. sunan rewatib) (سُنَن رواتِب) سُنَة راتِبة**
Nimêja Sunnetê ya ku berî û / an piştî pênc nimêjên ferz ên rojane ku bi rêkûpêk têne kirin: du "rek'eh" berî "sibehê", du an çar berî "nîvroyê" û du piştî wê, çar berî "Asrê", du piştî "mexribê" û du jî piştî "şîvê".

kevneşopiya pratîkî **: sunneh fi‘lîyeh سُنَّة فَعليّة**
Ev yek axftin û kirinên Pêxemberê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) tînê.

kevneşopiya devkî (gotinekî)**: sunneh qewlîyeh سُنَّة قَوليّة**
Ew amaje bi gotinên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) dike.

sunnet tekez kirî **: sunneh mu'ekkedeh سُنَّة مُؤكَّدة**
Kirinên Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) yên ku ji hêla wî ve hatibûn erêkirin û bi çavdêrîya wî jî hatibûn kirin.

komkirina Hedîsan **: sunen سُنَن**
Peyva sunan, pirjimar e "sunneh". Ew bi gelemperî bo sunnê tête bikar anîn. Lê di warê terminologî de, ew ji bo hin pirtûkên taybet an berhevokên kevneşopên Pêxemberî yên ku ji hêla hin zanyaran ve hatine berhev kirin, tête bikaranîn. Bi taybetî, pirtûk li gorî

mijarên "fiqh" hatiye amadekirin: paqijkirin, nimêj, rojî, danûstandin. . . .têne polîn kirin.

komkirina Hedîsê Ibn Majeh **: sunen ibin majeh سُنَن ابن ماجة**

Komik ji "Hedîsên" ku ji hêla Imam Ebû Abdullah Muhemmed ibn Majeh (273 A.H.) ve hatîyê berhev kirin.

komkirina Hedîsê Ebû Dawûd **: sunen abî dawûd سُنَن أبي داود**

Komik ji "Hedîsên" ku ji hêla Imam Abu Dawûd alSijistani (275 A.H.) ve hatîyê berhev kirin. "Sunan" bibînin.

komkirina Hedîsê Tirrnizî **: sunen at-tirmiẕîy سُنَن التِرمِذي**

Komik ji " Hedîsên" ku ji hêla Imam Ebû Isa Muhemmed atTirrnizî ve hatîyê berhev kirin (279 A.H.).

komkirina Hedîsê Al-Nesa'î **: sunen an-nesa'îy سُنَن النَسائي**

Komik ji " Hedîsên " ku ji hêla Imam Abu Abdu R-Rehman an Nesa'i (303 A.H.) ve hatîyê berhev kirin.

sunî **: sunnîy سُني**

Ew behsa her şopa ji şopên Pêxember Muhemmed çi peyv an kirin be, dikir, ji mijarên bingehîn û karên rojane heta pirsgirêkên sereke yên wekî reftara wî ya di şeran, jiyana, civak û darayîyê. Ev kom pirraniya musilmanan temsîl dike.

tîr (tîrkovan) **: sehm (kom.' ashum) (أسهُم) سَهم**

Pişkeke ji bo belavkirina xenîmetên şer tê parkirin, termê "sehm"ê bi wateya ku pişka(parvekirina) her şervanekî destnîşan dike, tê. Hejmara pişkan(parveyan) bi wê ve girêdayî ye; ka şervan endamê peyade ye an pêşbazkar e.

(لەبیری بکەم) . jibîrbûn(ji bîr kirin) **: sehw سَهو**

Di bingeh de, ev peyva bi wateya "guh nedayê"tê, lê ew ji bo paşguhkirina tiştek bêhemdî jî tê bikaranîn. Ger ev di dema nimêja birêkûpêk pêk de were, ew dikare bi pêkanîna "sujûda as-sehw: secda jibîrkirinê " bête serrastkirin.

:siwak سِواك

Parçeyeke ji şaxekî darê ku jê re arak tê gotin, wekî firça paqijkirina diranan tête bikaranîn.

sûr **: sûreh (kom. suwer) (سُوَر) سُورَة**

Sûreya Quranê, ya ku ji sûreya 114ê pêk tê. Hemû sûreyên di Quranê de, bi "bismelah" dest pê dikin, ji bîlî "Tewbe" 9ê.

suretên medineh **: as-suwar al-medeniyeh السُّور المَدَنِيَّة**

Ayetên ku piştî koçberiya Medîneyê hatine eşkere kirin. Ew bi banga cîhad û şer, û behskirina biryarên ferz û yasayî tête taybetmendî kirin.

suretên mekkeh : **as-suwar al-mekkiyeh السُّور المَكيَّة**

Ayetên ku li Mekkê hatine eşkere kirin, ango berî koçberiya Medîneyê, sûreyên Mekkî banga yekdestîya safî û baweriya bi vejîn û hesabê qiyametê û Bihuşt û Dojehê dikin. Ew qala miletên berê dike, û ayetên wê kurt in.

(خراپ). xirab . gûnehkirin **: seyyi'eh (kom. sayyi'at) (سَيئات) سَيئة**
Ew berevajî "heseneh ye : kirina qenc") bi gelemperî bi wateya çi kesê ku kirina tiştekî xirab (çêkirina gunehekî) bike, tê. Li gorî hedîsê, ger her kesê ku behsa kiryarekî xerab neke, Xwedê ji bo wî qenciyeke bêkêmasî nivîsiye, heke wî tiştekî xirab kiribe, Xwedê ji bo wî tiştekî xerabekî nivîsandîye.

(ژياننامه). jînenîgarî : **sîreh سيرة**
Nivîsarên hevalên Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) di derbarê wî de, kesayetiya wî, çîroka jiyana wî, berhev kirine û şêwazên birêvebirina rewşên cûda ya jiyana wî jê re "Sireh" tê gotin. Jînenîgarî ji bo Musilmanan çavkaniyek ye ku xwe dispêrin jiyan û pirsgirêkên xweyên rojane. Berhevnameyên biyografiyê yên navdar ên Sirah-ê At-Teberi, Ibn Ishaq, û Ibn Hisham in.

rojnama Pêxember **: sîreh (as-) an-nebewîyeh السِيرة النبويّة**
Çîroka jiyanê ya Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be), ku divê bi "Hedîsê" Pêxemberî re neyê tevlihev kirin.

şûrê Xwedê **: seyf allah سَيف الله**
Ev sernavek e ku pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ji bo zîrekîya leşkerî, ew diyarî rehevalê wî, Xalid ibn al-Welîd kirîye, ku li ser destên wî gelek serkeftinên mezin li dijî Bizûntiyan, hatine kirin. Ev sernav ji hêla Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) ve ji wî re hatîye dayîn.

(ش)

vexwarina meyê(şeraba serweşîyê) : **şarib al-xemr شارِب الخمر**
Ew bi wateya kesê ku şeraba meyê vedixwe, tê. Ew jî dikare bi wateya kesê ku şerabê pêşkêş dike, tê.

zagonsaz : **şari‘ (aş-) الشَارِع**
Zagonsazî di Islamê de Xwedê , û Resûlê wî ye, nimêj û silavên Xwedê lê be.

Şafi‘îy شافعي
Şopindarê imam aş-şefîyî ye, ku serdarê yek ji çar dibistanên mezin ên şerîeta (qanûna) îslamî ye, ku li başûrê kendava Erebistana Erebî, Misir û başûrê rojhilatê Asiyayê belav dibe.

şahîd : **şahid (kom. şuhûd) (شُهود) شاهِد**
Ew kesê ku tiştekî dibîne an jê re şahidîyê dike.

şam (aş-) الشام
Di dîroka Islamî de, ev peyv amaje bi herêmeke naskirî ku îro bi navê Sûrî, Lubnan, Fîlîstîn û Urdunê têne naskirin.

(گومان) . guman : **şubheh (kom. şubuhat) (شُبهات) شُبهة**
Guman, carna ew rewşeke gumanbar e, ev têgîn bi wateya têgihiştina çewt tê bikaranîn.

(بەهێزە) . xurt . hêz : **şedîd شَديد**
Di akustikên Quranê de, deng di dema derketina wê de disekine. Mînakên van tîpan ev in: / d / û / t /, ew bi rawestandinê tê naskirin.

(خراپەكارى) . nebaş . xirab : **şerr (kom. şurûr) (شُرور) شَرّ**
Tiştekî xirab e û qedexe ye di olê de.

vexwarina mestê(şerabê) : **şurb al-xemr شُرب الخَمِر**
vexwarinek mestê . (li "xemr" binihêrin).
Vexwarina şerabên serweşîyê(kohol) . (li "xemr" binihêrin).

sûreya xweşkirinê : **şerḥ (sûret aşl-) سُورَة الشَّرح**
Sûreya 94ê ji Quranê ye. Ev sûret behsa diyariyên Xwedayî dike, (bihnferehiyê, danîna gunehan û bilinkirina navê pêxember di teşahûdê de, têne gotin), ku di wê hingê de rojên zehmetîyan tîne bîra xwe. Ev dilnermiyek e ku mizgîniya wî bi rakirina astengiyên ku pêşwîya wî, dike û teşwîqkirina parastina Xwedê ye dike.

şer‘ (aş-) الشَرَع
Ev avahîya qanûnî ya îslamê ye. Ev peyve bêtir di "sherî'ehê" ye de tête bikaranîn .

qanûn kirin, rêzandin : **şere‘e (yeşre‘)(يَشرع)شَرع**
Ji bo dana fermanekî an qanûnekî.

qanûnî . dadmend : **şer‘îy شَرعي**
Qanûnî ye li gorî "şarî 'ehê" (qanûna Islamî).

zagon . mafdar . qanûn **: şerî‘eh (kom. şara'i) (شَرَائع) شَريعة**

Ev peyv amajê bi rêbernameya Xwedayî dike, wek ku di Qurana Pîroz de û sunneta Pêxember Muhammed (nimêj û silavên Xwedê lê be) hatîye ku ew hemî aliyên bawerîyên Islamî, di nav de bawermendî û kiryarên jiyane vedihewîne.

("هاوبەش " هاوبەشەكان") . hevpar **: şerîk (kom. şuraka') (شُركاء) شَريك**

Ew di wateya olî de, bi wateya ku kesek an tiştek bi Xwedê re bibe ortax(biperizin).

(مەرجەكان). şert û merc**: şerţ (kom. şurûţ) (شُروط) شَرط**

Tişta ku di peymanê de hatîye erê kirin.

xwedakperest. pirrperestî : **şirk شِرك**

Pir-xwedêtiyê . Pirrperestiyê . Perestina mirokî an tiştekî ji bilî Xwedê.

pirrperestîya piçûktir **: şirk aṡ- ṡẍer شِرك أصغَر**

Ev bi wateya şirîkatîya neyekser bi Xwedê re tê, wek sondxwarina bi yekî din ji bilî Xudê an kirina kirinên xwebexşane ji bo razîkirina xelkê di şûna razîkirina Xwedê de.

pirrperestîya mezin **: şirk akber شِرك أكبَر**

Perestina Xwedê bi kesên din re. Ew jî duakirina ji bo (ewliyan' : kesên pîroz) û mirovên din ên dilpak(ên ku wefatbûne), ne, ew di wê bi bawerîyê de ku ew dikarin ji bo wan navbeynkarinê di nav wan û Xwedêbikin. Islamê prensîbên navbeynkariyê di navbera Xwedê û xizmetkarên de red dike(nas nake).

pir-xwedak(rêveberîya pirrperestî) **: şirk at-teṡerruf شِرك التصرُّف**

Dabeşkirina desthilatiya(an hêzê) kesan bi Xwedê re an îdiyakirina hebûnên hêza wan ku bi Xwedê re tevhev digerin.

pir-xwedêtîya(pirrperestîya) veşartî **: şirk xefîy شِرك خفي**

Kiryareke ku mirov têde şirîka bi Xwedê re çêdike, bêyî ku Musilman pê agehdar bibe, wek sondxwarina ji bîlî Xwedê an kirina kirinên qenc ku ji hêla mirovan ve têne pesindan kirin, di şûna ku riza Xwedê bipirse.

pir-xwedêtîya(pirrperestîya) bi adet**: şirk al -‘adeh شِرك العادة**

Parastina adetên xurafeyên ne-Islamî, wekî bawerkirina bi sihrê.

pir-xwedak . pirperestî **: şirk al-‘ibadeh شِرك العِبادة**

Bawerbûn bi şirîkbûna kesan bi Xudê re, wek duakirin li ser goran an goristanên (ewliya') an xwestina alîkariyê ji mirîyan, bêy ku nasnama wan an cihê wan li nik Xudê, destnîşankiribe, di nav de Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be).

pir-xwedak(pirrperestîya zanîndar **: şirk al -‘ilm شِرك العِلم**

Ev îdîa dike ku hin mirov, wekî Pêxember, imam an mirovên pîroz(oldar) xwedîyê zanîna "xeyb"e (yê nedîtî); anku ew bi tişen ku em nikarin bibînin, dizanin. Lê pêxember bi xwe tiştekî ji nedîtîyê(xeybê) ji bilî tiştên ku xwedê ew pê agehdarnekirine, nizanin. Di derbarê Qur'anê de, ew tenê bi rastîya "mifteyên xeyb"ê(nedîtîyê) dizane, lê ew pir bi taybetî danbisînor e. Kesek din bi wan nizane. (Quran 6:59).

şe‘ban شَعبان

Ew meha heştê ya salnameya îslamî ye, ya ku li pêşîya meha Remezanê dikeve.

awayên(ahengên) olî : **şe‘îreh (kom. şe‘a'ir) (شَعائر) شَعيرة**

sûreya helbestan : **şu‘era' (sûret aş-) سُورَة الشُعراء**

Ev Sûreya 26ê ya Quranê ye, Ew qala çîrokên Pêxemberên Xwedê dike, yek ji wan yên herî berbiçav di vê sûreyê de çîroka Mûsa ye, pevçûnên wî bi Faraon re û serpêhatina wî li hemberê sêrbazên Misrê, ku wêyekê hişt ku ew bi ola Mûsa Pêxember bawer bibin. Di nav pêxemberên din de yên ku çîrokên wan bi gelên wan re di vê sûreyê de hatine behs kirin, ev in: Ibrahîm, Nûh, Hûd, Saleh, Lût û Şwayib.

şw‘eyb شُعيب

Pêxemberek ji alîyê Xwedayê mezin ve ji bo gelê Midyan ve hatî şandin, lê wan ew red kir, ji ber vê yekê Xwedê Teala wan di erdhejê de helak kir û hilweşand. Li Murselînan binhêrin. Li Qur’ana Pîroz, Al- A'raf (7): 85-93, Hûd (11): 84-95 binêrin .

şixar (nikaḩ aş-) (نِكاح) الشِّغار

Lihevhatina zewaca bihevberdêl. "nikah aşixar".

pêşîgirtin : **şuf‘eh شُفعة**

Pêşengî di milkîyê, bi gelemperî cîran.

(مامناوەند " شەفاعەتكار") . navbeynkar : **şefî‘ شَفيع**

1- Ew kesê ku ji bo yên din navberîyê dike.
2- Ev bi wateya nimêja du rak 'eh ye ku berî nimêja şevê "witr"tê.

(نێوەندگر) . navbeynkar . navgînker : **şefa‘eh شَفاعة**

Navbeynkarîya ku yek di şûna kesekî din de bi desthilatdarîyê re dikeve, dike.

navbeynkirina mezin : **şefa‘eh (aş-) al-kubra الشَّفاعة الكُبرى**

Navbeynkarîya ku Pêxemberê Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) di roja qiyemetê bi navê tevahiya mirovan, dike, di dema ku hemî Pêxemberên din bi vê yekê narabin.

(ڕوناكی) . ro avayî : **şefeq شَفَق**

Ronahîya nerm (bi gelemperî sor e) ku yek wê piştî çûna rojê, di ezman de dibîne. Dema nimêja êvarê bi çûna şefeqa şevê re, dest pê dike .

(لێو) . lêvî : **şefewîy شَفوي**

Ev bi watey ku deng bi girtina herdu lêvan re an diranên jorîn ku digihine lêvên jêrîn, tê çêkirin. Dengdarên Erebî yên levî ev in: m, b, f.

(سوپاسگوزار) . pir spas : **şekûr (aş-) الشَّكور**

Taybetmendîyeke Xwedayî ye. Yê / a ku kêmtirîn karên qenc ji karên pak ji bawermendên xwe dipejirîne(qebûldike)û wan li ser karên wan xelat dike.

sûreya rojê : **şems (sûrtat aş-) سُورَة الشَّمس**

Ev sûreya Qurana 91 ê ye, ku sernavê xwe ji peyva ayeta yekemîn digire. Ev Sûret li du babetan radiweste, ev in: Helwesta giyanîya mirovî, û tiştên ku Xwedê ji başî, xerabiyê, rêber û xeletiyê jê re kirîye. Mijara zorbatîyê li Semûdê ku guh nedan Pêxemberê Xwedê, loma ew bi dijwarî hatine cezakirin.

şehadeh (aş-) الشَّهادة
Daxuyanîya şehadetê ya ku (Ji xwedê pê ve tu xweda yê din tune, û Muhemmed xulam û peyamnêrê wî ye)

îfada derewîn **: şehadet az-zûr شَهادة الُزور**
Sonda derewîn yek ji gunehên herî mezin e. Ew hînkirinên Quranê ya dad û dadperwerîyê binpê dike. Ew tekêz dike ku rastîyê bêje, ta ku ew li dijî xizmên herî nêzîk jî be .(Li Qur'anê binihêrin, 4: 135) Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) bi tundî li dijî wê hişyarî daye.

du şehidî **: şehedetan (aş-) الشَّهادتان**
Ew şahidiyê dide ku (1) Ji xwedê pê ve tu xweda yê din tun ye û (2) ku Muhemmed peyxemberê Xudê ye.

Meha pîroz.**:şehir (aş-) al-ḥeram (kom. al-aşhur al-ḥurum)** (**الشَهر (الأشهر الحُرُم**
Meha pîroz: mehên ku têde nabe ku Musliman dest bi şer bikin, ev in: Zul-Qi 'deh, Zul-Hijjeh, Muherram û Rejeb (meha 11, 12, 1 û 7-ê salnameya Islamî ye). Ev kevneşopî berî Islamê hebû û di mîrata Islamî de mabû, mebesta wê ew bû ku bihêle hecî, bazirgan û kesên ku dixwazin kirînê bikin bi ewlehî xwe bigihînin cihên îbadetê û sûkan û bi aramî vegerin.

şehîd **: şehîd (aş-) الشَّهيد**
Taybetmendîyeke Xwedayî ye. Yê ku çavdêriya kiryar û helwestan(tevgeran) dike.

şehîd **: şehîd (kom. şuheda') (شُهداء) شَهيد**
Her kesê ku di riya Xwedê de tê kuştin, ew şehîde. Herweha, termê şehadetê di Hedîsan de dirêj dibe ku herkesê ku qurbanên karesatên xwezayî û kesên ku dema namûs an milkê xwe diparêzin dimirin, ew şehîd tê hesbandin. (Ji bo rewşa kategoriya yekem), (li Qurana Pîroz, 3: 169-171 binihêrin).

şewwal شَوّال
Meha dehan di salnameya îslamî de. Roja yekem di meha "" îd al-fitr "ê de(Cejna dawîya rojîyê).

şêwirmendî : **şiwra شورى**
Şêwirmendî girînge di hikûmeta Islamî de. (Li Quranê, 42: 38ê binêrin).

sûreya şêwirdariyê **: sûreya (şiwra (aş-) سُورَةَ الشورى**
Ev Sûreya 42ê ji Qur'anê ye, ew qala mesela wehyê û têkiliya pêxemberên xwedê lê be dike(silave li ser wan be) behsa delîlên eşkere yên yekdestîyê dike. Ew li ser mesela vegerê û çarenûsa kafiran di Roja Vejînê(qiyametê) de diaxive, herweha ew komek lêkolînên exlaqî dide berxwe.

zanyar an mamosteyên olî **: şeyx (kom. şuyûx / meşayix)** (**شَيخ (شُيوخ / مَشايخ**
Zanist an mamostê olî, bi eslê xwe, ev peyv wateya mirovekî pîr tê, lê di edebiyata olî de ew bi gelemperî ji bo zanyarekî olî ye. Di hin mijaran de ew bi wateya 'mamoste', di şûna şagirt / xwendekar, tê.

Iblîs(Dêw) **: şeyţan (aş-) الشَيطان**
Xwedê ew li ser pozbilindîya(serhildana) wî reşkirîye(nifir kiryê), û wî biryar girtiye ku ew bibe sebeba her kes rêya xwe şaş bike û rê bide mirovan ku karên

xirab bike.

şî‘îy (kom. aş-şî‘eh) (شَيعة) شَيعي

Bi gelemperî peyva Şîa amajê bi dozdehemînê dike, ji ber ku ew koma herî hejmarbar e. Şîa dibînin ku Ali ibn Ebi Talib û yanzdeh kure-imamên wî (ji jina wî Fatimeh ku dibe keça Pêxember Muhammad), ku ew li gurî nivîsara xwedayî, piştî mirina Pêxember, ew dibine lêvegerê(serhêlê) sereke ji bo musilmanan piştî mirina Pêxember, û ew ji wan re dibêjin immam ku divê tenê li gorî fermanên Pêxember werin şopandin; li gurî Hedîsên Pêxember Muhemmed(nimêj û silavên Xwedê lê be).

(ص)

Sabîayan **: ṡabi'eh (aṡ-) aṡ-ṡabi'ûn (الصابِئون) الصابِئة**

Komek ji mirovên ku bawerîyê bi stêrkan tînin û wan bawerîyê bi Milyaketan tînin. Di Quranê de, ew bi Xiristiyan û Cihûyan re têne komkirin. (Li Quranê binihêrin, 69: 5).

bîhnfireh **: ṡabir صابِر**

Ev têgeh ji bo kesê ku bi bîhna fireh dikare karesatan derbas bike re, tê gotin.

sûreya sad **: ṡad (sûreya -) سُورَة الصاد**

Ev Sûreya 38emîn e a Quranê ye, Navê wê ji ayeta yekemîn hatîye girtin, Ew li ser mijara yekdestdariyê û cîhadê ya li dijî pûtperestan, pêşdîtina Peyxember, Xwedayê wî û malbata wî ya pîroz radeweste. Her weha behsa dîroka Pêxemberên Xwedê, wekî Dawud, Sulayman, ayub, aştî li ser wan be, dike. Ew behsa danustandina kafiran di Roja Vejînê(qiyametê) de û axeftina wan bi hev re di Dojehê de, dike. Herweha, ew mijara afirandia mirov û sujuda milyaketên jê re dike

(ڕاستو دروست) . rastdar **: ṡadiq صادِق**

Kasê ku rastiyê vedibêje.

Yekîneka pîvandina zuwa di îslamê de **: ṡa' (kom. aṡwa')(أصواع) صاع**

Yekîneka pîvandina zuwa. Pîvaneke di dema Pêxemberê Pîroz de ji bo pîvandina xurma, ciye(cê) û tiştên din dihat bikaranîn. Ji bo genim, bi qasî 2,172 kg e.

zilamê balîne **: ṡaḥib al-ḥût صاحِب الحوت**

Ew îşaretê bi Yonis dike. "Zu AN-Nun" bibînin.

sûreya rêzan **: ṡeffat (sûrta aṡ-) سُورَة الصافات**

Ev Sûreya 37emîn a Qur'anê ye, ku navê xwe ji peyva ayeta yekemîn digire. Ew li ser komên milyaketên bawermend û komek ji cinan û çarenûsa wan, û di derheqê înkar û tunekirina Pêxemberan û sererastkirin û cezakirina wan di Roja Vejînê de diaxive. Her weha ew li ser dîroka Pêxemberan, aşîtî li ser wan, radeweste, bi kurtî, wek Pêxember Nûh, Isahaq, Mûsa, Harun, Elias, Lot, û Yunus, ku ronahiyê li ser Pêxember Ibrahîm, çêdike, û dîtina wî di xewnê de ku ew kurê xwe serjê dike .

(ڕاستو دروست) . mirovê qenc, rastdar **: ṡaliḥ (kom. ṡaliḥûn) (صالِحون)صالِح**

Bi gelemperî ev têgeh ji bo destnîşankirina kesê oldar tê bikaranîn.

ṡaliḥ صالِح

Navê Pêxemberekî ye. Ew ji bo mirovên Semûdê ku li bakur-rojavayê kendava Erebî dikeve, hatîye şandin. Ji sedema ku wan guhên xwe ne dane wî, ew hatine qirkirin. Ta roja îroyîn jî, kevneşopên kevirên xaniyên wan têne dîtin(hene). Li Qurana Pîroz, AI-'Araf (7): 73-79, At-tewbeh (11): 61 -68, AŞ-Şu'era' (26): 141 - 159, An-Nemil (27): 45 -53 binêrin.

herî bîhnfireh : **ṡebûr (aṡ-) الصّبور**

Taybetmendîya xwedayî, ew kesê bihnfireh ku heya bi gunehkaran re jî, şaş nabe(sebrbar e) .

têkildar . reheval . hevkar : **ṡeḥabeh (tek. ṡeḥabîy) (صَحابي)صَحابة**

Hevalên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) in; ango, musilmanên ku bi wî re hevdîtin kirine. Gelek ji wan pêre şer kirine û parastina wî kirine, û berpirsîyar bûn ku peyama wî piştî mirina wî bi rêve bibin.

(دروستی) . rastbûn : **ṡiḥḥeh صِحة**

Di zanistêya bêjeyên Hedîsê de, ew diyar dike ka hedîs rast e an na.

şeş pirtûkên rastîn : **ṡiḥaḥ (aṡ-) as-sitteh الصِحاح السِتّة**

Ev têgeh ji bo berhevokên herî naskirî yên "ahadîsê" (kevneşopî) yên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) tête bikaranîn: al-Buxarî, Muslim, at-Tirmizî, an-Nea'iy, ibn Majah, abu Dawûd, û ibn Henbel .

tomarkirina kirinên : **ṡeḥîfat al-a'mal صحيفة الأعمال**

Tomargeha kiryarên: Tomarkirin ji bo her kesî tê tomarkirin(hilanîn), lewra ew kiryar û gotina her kesî li her cîhî û di her demê de tomar dike. Di Roja Dawî (qiyametê) de dê rêzara tomarkirina her kesî were pêşkêş kirin.

pirtûkên pîroz an tomar : **ṡuḥuf (tek. ṡeḥîfeh) (صَحيفة) صُحُف**

Di Sûreya (18-19: 87 de) ev têgeh ji bo pirtûkên ku ji bo pêxemberên Xwedê hatine şandin.

pirtûka rastîn : **ṡeḥîḥ (kom. ṡiḥaḥ) (صِحاح) صَحيح**

Pirtûkeka ji Hedîsên Pêxemberî ku ew li ser bingeha rêgezên pir hişiyabar hatine komkirin; wekî pêgavên moxilkirin û tewsîqê wekî "Sehîh albuxarî" hatîye berhev kirin.

pirtûka rastîna Al-Buxarî **ṡeḥîḥ al-buxarî صَحيح البُخاري**

Pirtûka Hedîsên Pêxember ji hêla al- Imam el-Buxari (810-870ê koçberî) hatîye berhev kirin, li gurî rêgezên wî yên pir hişyabar(hişkbar) ji bo pêdeçûnên tewsîq û wajokirinê(tesdîqkirinê). Bi xwezayî, tiştê ku em di pirtûka wî de dibînin, ji çend heban pêk tê, ew tenê pareçekî biçûke ji van hadîseyên ku wî lêkolîn li ser wan kirîye, temsîl dike. Ev pirtûk, ji pirtûkên pirr hişyarbar(hişkbar), ji hedîsên bexemberîyê tê hesbandin, jiber rêçika berhevkarîya wê ya herî rastîn.

pirtûka rastîna Al -Musilm : **ṡeḥîḥ muslim صَحيح المُسلِم**

Pirtûka hedîsên(çavlêkirina) Pêxemberî ji hêla Muslim (820-875ê koçberî) ve hatîye nivîsan din(li gurî rêgezên wî ya hişk di mijara pêgavên tewsîq û kontrolkirinê de. Pirtûka wî ya ku ji çend pirtûkan pêk tê, ew tenê temsîla parçekî piçûk ji hedîsên ku wî ew kontrol kirine, dike.

du pirtûkên rastîn : **ṡeḥîḥan (aṡ-) الصَّحيحان**

Ew du Hedîsên berhevkirî ne, ku ji hêla almam el-Buxarî ve hatîne berhev kirin

("Sehîh albuxarî") û ya din jî ji hêla Muslim ("Sehîh al- muslim")ve hatîye berhev kirin.

destpêka serdema Islamê **: ṡedr al-'islam صَدر الإسلام**

Destpêka serdema Islamî: bi gelemperî, ew behsa dema Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) dike.

cihêz . mehr **: ṡedaq صَداق**

Drav(Perê) an dîyaryeke ku ji aliyê zava ve ji bo bûkê tê dayîn, ku bi gelemperî di peymana zewacê de tête diyar kirin. Pir caran, mirov mîqdarek pare wek ("muqeddam aS-Sedaq"(cihêza derhal) û mîqdarek mû'eccel "mu'exxer aS-Sedaq "(cihêza paşînde) diyar dike.

cihêza paşandî **: ṡedaq mu'ejjel صَداق مؤجَّل**

Beşik ji mehrê ye ku zava dide bûkê, di dema ku bûk ji mêr wê tê berdan, bi gelemperî ni gotina "dana paşandî=ṡedaq mu'ejjel" tê bi navkirin.

cihêza derhal **: ṡedaq mu'ejjel صَداق مُعَجَّل**

Mehrê ku zava di dema dawetê de dide bûka xwe. Ew bi gotina"muqaddam aSSedaq" tê bi nav kirin.

ku rast were dîtin **: ṡedeqe (yeṡduqu) صَدَق (يصدُق)**

Gotina Ku divê mirov rast bibêje, vegotina rastiyê (ne ya derewîn) û dirustbûn di kar de ; ango kiryarên mirov rastîye wî diyar dike.

ṡidq صِدق

1-rastî : dijberîya nerastîbûnê(nerazîbûnê) ye.
2- rastîbûn : gotina rastiyê.

mirovhezî . xêrxwazî **: ṡedeqeh (kom. ṡedeqat) صَدقة(صَدقات)**

Li gurî Islamê, her karekî qenc ku mirov arîkarîya mirovek din bike, wê hingê ew mirovê xêrxwaz dê xelatekî ji Xwedayê wergire. Mîna dayîna pare/drav an tiştek din ji bo hewcedaran.

(خێرخوازی بێ کۆتایی) . xêrxwaziya bêdawî **: ṡedeqeh jariyeh صَدَقة جارية**

Xêrxwazîya ku bandora wan her dem berdewam dike (jî bo demekî dirêj), wek ewqaf û belavkirina zanebûna kêrhatin .

(ڕێگای ڕاستەقینە) . riya rastîn **: ṡiraţ (aṡ-) al-musteqîm الصِراط المُستقيم**

Rêya rastîn a ku dibe sedema razîbûna Xwedê.

pira teng **: ṡiraţ (aṡ-) الصِراط**

Pireke dikeve li ser agirê Dojehê(cehnemê) ku divê her kes piştî vê duniyayê, derbas bibe. Bi bawerî û kirinan ve girêdayî ye, hinek dê wê zû derbas bikin, yên din jî dê wê hêdî hêdî derbas dikin. Hin ji yên din dê sernekevin, û ew dikevin nav agir. Li gurî Hedîsan ev ji şûr tengtir e, û ji porê ziravtir e(wusa tê vegotin). Quranê pîroz, Meriyem (19): 71. bibînin.

:al-ṡerf الصرف

Firotina zêr/ zîv, diravan di şûna nirxa dravî(neqdî) de. Di Zagona Islamî de ev bazar divê tenê di heman demê de, bête kirin, ji bo bibe distur .

xwelîya paqij **: ṡe'îd ţeyîb صَعيد طيّب**

Toza paqij: ew toza ku di dema digihêje erdê, li devereke din belav dibe ku hîna

nehatiye qirêj kirin. Ew dikare ji bo avdestiyê (avdestiya ziwa û sembolîk) were bikar anîn.

(گوناهێکی بچووک) . gunehek piçûk : **ṡeẍirreh (kom. ṡeẍa'ir) (صَغائر) صَغيرة**

Bi gelemperî gunehên ku bê qesd(mebest) ji hêla kesekî ve têne kirin ku ew bi xweza xwe ve ne sûcdar in. Ji bo wan cezayên diyarkirî tune ye. Eger ew zirarê nedin kesên din, wê hingê ew dikare "istixfara= bexşandinê (lêborîna) xwe ji Xwedê bixwaze, Ev bes e ku wê ji tomara karên xirab derxe.

sûreya rêzan : **ṡeff (sûrtat aṡ) سُورَة الصَّف**

Ev sûreya 61ê-a Quranê ye, û navê wî ji ayeta 4-ê tête wergirtin, “Ew diyar dike ku Xwedê ji yên ku ji bo wî wek avahîyeke hevgirtî hewl didin, hez dike mîna ku ew avahiyek zexm bin. Di we de em li ser Pêşbînîkirina Pêxember Issa (nimêj û silavên Xwedê lê be) dixwênin ku Pêxember Muhamed dê piştî wî re xuyabike, ku navê wî Ehmed e . (Ayeta 6) .

giravên Safa û Merweh : **ṡefa (aṡ-) we al-merweh الصَفا والمَروة**

Girên kevirî yên ku dikevin li nik Mizgefta Hoyê li Makkeh(Al-Mukerremeh) qedir giran ku û di navbera wan de hecî "sa'î"heye (mirov di dema dua yê de heft caran dimeşe). Di navbera du xalên de tê xwestin ku mirov (ji bo demek kurt) pêngavên xwe zûtir bike. Ev jê re " Seyî " tê gotin. (li"Se'yسعي " binihêrin). li Qur’ana Pîroz, Al-Beqereh (2)binêrin.

(تایبەتمەندیەکانی کاراکتەر) . taybetmendiyên tîpan : **ṡifat al-ḥurûf صِفات الحُروف**

Taybetmendiyên dengan: Taybetmendiyên ku dengan ji hev cuda dikin, wekî devkî, bê deng, diranokî, bê deng, dirûv, zirav .

Sefer : **ṡefer صَفَر**

Meha duyemîn di salnameya îslamê de

bijartina Xwedê : **ṡefîy allah صَفي الله**

Mirovê ku bi taybetî ji hêla Xwedê ve hatinê bijartin da ku bextewariyên taybet werbigirin, wek Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be). Ew yek ji navên Pêxember "al-mustefa" (yê bijartî) e.

(ڕاستو دروستی) başî : **ṡelaḥ صَلاح**

Ev peyv carcaran bi wateya başîyê tê .

qenciya xizman : **ṡilet ar-reḥim / al'-arḥam صِلة الرَّحِم/ أرحام**

Li ser têkiliyên baş ji aliyê bav û dayikê ve.

(نوێژ)nimêj : **ṡelat (kom. ṡwlewat) (صَلَوات) صَلاة**

Ew bengeha duyeme di îslamê de piştî şehadadê. Di Islamê de pênc mêjên rojane yên mecbûrî hene, ew ji komên sabit ava dibe wek polînkirin, rika'at, sicûd, rawestandin, runîştin….

duayên Ibrahîm yên pîroz : **ṡelah (aṡ-) al-' ibrahîmîyeh الصَّلاة الإبْراهيميَّة**

Dabeşkirina duyemîn a duayên "teşehhud"ê, ku wusa"allahumma Sallî 'ela seydina Muhemmed we 'eli seydina Muhemmed. kema Sellayta 'ela Ibrahîm we 'eli seydina Ibrahîm.. . . dest pê dike.

nimêja ji bo şêwirmendiyê : **ṡelat al-istixareh صَلاة الاِسْتِخارة**

Ev ji du "ruk'eh"an pêk tê. Ev nimêja berî ku hûn tiştek girîng bikin, wek destpêkirina peymanek an zewacê, tê pêşniyar kirin . . . hwd, ji ber ku ew rengeke ji lêgerîna şêwirmendîya xwedayî ye

nimêja daxwaz kirina baranê : **ṡelat al-istisqa' صَلاة الاستسقاء**

Ev nimêj bi du rukehan têne kirin; bi mebesta ku Xwedê baranê bide.

nimêja terawîhê : **ṡelat at-terawîḥ صَلاة التَّراويح**

Nimêjên taybet in yên ku di meha Remezanê de piştî nimêja êvarê ya dereng, têne kirin .

ṡelatul tesbiḥ صلاة التَّسَابيح

Ew bi du teslîman e, bi çar rekatan dibe, bi yek an jî du teşahhudan, an bi du silavan.

nimêjê dilxwazîyê : **ṡelat at-teţewwu‘ صَلاة التَّطوّع**

Nimêjên ku musilman zêdetirî yên ku dîn ferz dike, têne kirin. Têghekî din heye, ew jî dua "nafileh"ê ye.

nimêja şeva derengî : **ṡelat at-tehejjud صَلاة التهجُّد**

Nimêjên dereng, bi gelemperî ev nimêj di êvara dereng de ji aliyê bawermendekî dilsoz ve, têne kirin.

nimêja înê : **ṡelat al-jumu‘eh صَلاة الجُمُعة**

Nimêja înê ji gotarê dest pêk dike, piş re du "rak'eh" hene. Her çend beşdarbûn mecbûrî ye, lê eger zilamek nexweş be, ew ji Nimêjê tê efo kirin, (ew ji bo jinan ne mecbûrî ye jî).

(نوێژی کۆمەڵەیی) . nimêja civatî : **ṡelat al-jema‘eh صَلاة الجَمَاعة**

Pêşkêşkirin nimêja (ferîza : mecbûrî) bi komekî re. Ne tenyê (ne bi tena xwe). Ji ber ku xêra wê mezintire.

nimêja binerdkirin(nimêja cenaze) : **ṡeletul jenazeh صلاة الجَنازة**

Nimêja cenaze tenê li ser laşên misilmanan têtе destûr kirin. Ev nimêj tenê di rewşa sekinandinê de tête kirin, û bi gelemperî yekser beriya veşartinê. Ew ji çar tekbîran bê sujebûn an tewandin pêk tê.

(پێنج نوێژەکە) . pênc nimêjên : **ṡelewat (aṡ-) al-xems الصلوات الخمس**

Nimêja rojane ya birêkûpêk yên ku di demên diyarkirî de ji hêla Misilmanan ve têne kirin (Fajr, Zuhr, Asr, Mexrib, Işa).

(نوێژی ترس) . nimêja tirsê şervanan : **ṡelat al-xewf صَلاة الخَوف**

Ev bi wê wateyê tê ku di dema ku şervan nimêjan di qada şer dikin ku ew yek dikare metirsîya dorpêçê li ser şervanan ji hêla dijminan ve çêdike. Di vê pêvajoyeke de, çend gav ji bo xweparastinê hene(têne xwestin) . (Li Quranê binihêrin, 4: 102).

nimêjê sunnetê : **ṡelat as-sunneh صَلاة السُّنَة**

Ew behsa nimêja Pêxember Muhemmed (seilava Xwede lê be) berî û piştî nimêjê dike. Carinan, jê re "sunneh ratibeh" (sunneya bi rêkûpêk) tê gotin.

(نوێژی خۆرهەڵات) **ṡelatul şuruq صلاة الشُّروق**

Nimêjê ji du an çar Rak'ata ne ku Ew di demeke kin de piştî derketina rojê bi

hindikî tê nimêj kirin.

nimêja pêşîn a rojê : **ṡeletud-ḍuḥa صلاة الضُّحى**

Nimêja ku piştî derketina rojê û beriya nîvro tê kirin. Saetên serê sibê. (Li Sura 93-an a Qurana Pîroz binhêrin).

ṡelat (aṡ-) 'ala an-nebîy الصَلاة على النَبي

Ji bo pêxember dua bikin "Sella (yusellî)" ela annabîy. "

(نوێژی جەژن) . nimêja du cejn : **ṡelat al' –îdeyn صَلاة العيدين**

Her du cejn(eyîd "al-fitr" û "ad-dha" ku nimêjên wan yên taybet hene. Dane nimêj ji du rek'an tê, digel gelek tekbîrê di rewşa seknandinê de, piştre li peyî wê gotar tê.

(نوێژی لە دەست چوو) . nimêja jidestçûnê : **ṡelat fa'iteh صَلاة فائتة**

Di dema ku nimêja ferzê (mecbûrî) di wextê xwe de ji ber hin sedeman pêk nehatiye. Ew wekî deyn tê hesibandin, loma divê mirov vî deynî di zûtirîn dem de li ser xwe rake.

(نوێژی / تاک) . nimêja bi tenê : **ṡelat al-ferd صَلاة / الفَرد**

Bi gelemperî, ev yek tenê behsa pêkanîna nimêjên ku bi gelemperî li civînê têne kirin, dike.

nimêja mecbûrî : **ṡelat al-ferḍ صَلاة الفَرض**

Her pênc nimêjên rojane.

nimêjê şeva dereng : **ṡelat al-qiyam صَلاة القيام**

Nimêjên vebijarkî yên ku ji hêla hin kesan ve di derengê şevê de têne kirin, lê dê baştir be eger ew nimêj di nîvîya sêyeka şevê de bêne kirin. Hin deman, ev term bi wateya "Selat at-terawîh" tête bikar anîn.

nimêjê tarîreşê : **ṡelat al-kusûf wa al-xusûf صَلاة الكُسوف والخُسوف**

Nimêja li gorî bakirina tavê (kusûf) an heyvê (tarîreşa tavê : xusûf) têne kirin. Di vê "nimêjê" de pêvajoyên taybet li ber çavan têne girtin.

(نوێژی شەو) . nimêjê şavê : **ṡelat al-leyl صَلاة الليل**

Ev bi gelemperî behsa nimêja vebijarkî (nafileh) dike ku mirov wê di şevê dike. Dema herî baş, sêyeka dawî ya şevê ye.

(نوێژی نەخۆش) . nimêje nexweşan : **ṡelat al-merîḍ صَلاة المَريض**

Ew li gorî xweza nexweşîyê ye. Ji bo mirovê nexweş çend destûrnameyên taybet ji bo"nimêje" hene(têne dayîn), wekî rûniştin an dirêjkirina li ser kêlekê, piştê di şûna seknandinê de.

(نوێژی سەفەر) . nimêjê rêwîtiyê : **ṡelat al-musafir صَلاة المُسافِر**

Mirovê rêwî dikare çar "rek'eh" bi du re'ketan "rakê" kurt bike, û nimêja nîvro û esrê û nimêja êvarê bi şev re li hev rûnên bi dereng bike yek.

nimêja mecbûrî : **ṡelat maktûbeh صَلاة مَكتوبة**

Pênc nimêjên rojane yên ku divê ji hêla musilman ve were dîtin.

nimêja mecbûrî : **ṡelat maktûbeh مَكتوبة صَلاة**

Pênc nimêjên rojane yên ku divê ji hêla musilmanan bêne kirin.

nimêjê şeva dereng : **ṡelat an-nafileh صَلاة النافلة**

"li Selat-te- tewu'y الطوعي صلاة" binihêrin." '

nimêjê witr (hejmarên yekane)**: śelat al-witr صَلاة الوتر**

Nimêjên ku di dawiya şevê de têne kirin, bi gelemperî ji yek ruke'ye an sê ruke'yan pêk tên; ji vir navê "witir"tê .

(نوێژی ناوەڕاست) . nimêja navîn **: śelat (aś-) al-wusţa الصَلاة الوسطى**

Ev yek behsa nimêjên navîn ("fejr") an nîvro ("esrê") dike. Ew herdu bi girîngiya xwe ya taybet têne xêz kirin. Wata navgînîyê ewe ku nimêjên piştî barkirina rojê û dawîya êvarê piştî nîvro tê. Berî nîvro nimêja sibehê û nîvê şevê tê û dû re jî tav û nimêja êvarê ya dereng tê. (Li Qur'anê binêrin, 2: 238.)

agirbest(rawestandina şer) Hudaybiyeh **: śulḥ al-ḥudeybiyyeh صُلح الحُدَيبيَّة**

Peymana (lihevhatinê) ya ku di navbera Pêxember (silava Xwede lê be) û Meckiyan de li Hudaybiyeh li nêzîkê Mekkê di sala şeşan a Hijrî de hatîye çêkirin. Ev peyman rê li ber belavbûna îslamê vedike. Surat al-Fath (Sûara 48-ê ya Qurana Pîroz). Xwedayê banî ew bûye bi "Feth al- Mubîn " binavkirîye (ango serkeftina eşkera). Li Qur’ana Pîroz, AIFath (48): 1-4 binêrin .

Xwedê pîroz û silav li ser wî bike **: śella-llahu 'alayhi wa-sellemصلّى الله عليه وسلّم**

Ev gotin pir caran ji alîyê mirovê musilman ve di dema ku behsa pêxember Muhemmed tête kirin, tête bikaranîn. (Li Quranê binihêrin, 33: 56.) Carcara, ev gotin ji bo 'eleyhi-sselam "kurtir dibe (silav li ser wî be).

jibo pêkanîna nimêjê **: śella (yuśellî) ‘ala an-nebîy صلى (يُصلّي) على النبي**

Jibo pêkanîna nimêjê li ser Pexmber, gotina "Sellallahu eleyhî we sellam" (silava Xude li ser wî be) an "allahumma Salli 'allah ela seydina muhemmed" ….

herheyî **: śemed (aś-) الصَّمَد**

Yek ji sîfatên nût û nehan ên Xwede yê. Wateya Bawer, Berfireh, û herheyîyê ye. Ew behsa yek yê ku her afirander berê xwe didine wî tenê ne tu kesî dîn . (Li beşa 112ê ya Qur'anê binihêrin).

Xûdayê putî **: śenem (kom. aśnam)** (أصْنام) **صَنم**

Ew xûdayê putîye yê ji alîyê pûtperestan ve dihat bikar anîn.

trumpêt **: śûr (aś-)الصور**

Trumpa pifdayî ya teqînê (ji bo cara duyem) ji bo ragihandina roja dawî (qiyametê). (Li Qur-anê 6:73; 18:99; 20: 102; binhêrin...).

Sufî **: śûfîy (kom. śûfiyyeh) (صُوفية) صُوفي**

Ew Mirovê ku jiyanek sade û bi dilsozî re ku li paqijiya giyanî digere, dike.

(ڕۆژوو) . roju **: śewm صَوم**

Rojî ew rawestandina ku mirov têde xwe ji xwarin, vexwarinan û têkiliya cinsî berî sibehê mehrûm dike (bi qasî 2 demjimêran beriya sibehê) heya barkirina rojê. Herweha, mirovên nexweş, rêwî û jina ducanî ji girtina rojîyê hatine efo kirin. (Li Sûra El-Beqereh: 184-185-187 binêrin).

(خۆبەخشی ڕۆژوو) rojiya xwebexşan **: ṡewm at-taţawwu' صَوم التطوّع**
Rojên rojîya xwebexşane ew rojên ku mirov wan derveyî meha Remezanê bi dilxwazî, digire. Tête pêşnîyar kirin ku ev rojî di rojên diyarkirî, mîna Duşem û pêncşemê de bêne girtin.

(ڕۆژوو) . rojî **: ṡiyam صِيام**
Li ' ṡewm: roju ' binihêrin

:ṡiyam dawûd صيام داوود
Ewayên rojîya pêxember Dawûd e (silave Xwede lê be) rojîya rojên alternatîv ên her dem).

rojiya berdewam **: ṡiyam ad-dahr صِيام الدّهر**
Bi wateya ku her roj, rojîya rojên salê ye, ango: bi roj rojî be û bi şev muftir be.

(پاراستنی شەرەفمەندانە") . parastina rûmetdar **ṡiyanet al-'irḍ صيانة العِرض**
Parastina rûmetê(şerefê) û parastina jiyana xwe wekhev in; Kî kesê ku kesekî êrîşkar bikûjie ji bo ku ew rûmeta xwe biparêze, ew wekî karekî parastinê tê dîtin.

(ڕاوکردنی دەریا) . nêçîra deryayê **: ṡeyd al-beḥr صَيّد البحر**
Di dema ku ajalek di avê de wek nêçîr bê girtin. Ev nêçîr dive di serdema Ihram de be, berevajîyê nêçîra giştî.

(ڕاوکردنی کێوی) . nêçîra çolê **: ṡeyd al-berr صَيّد البَر**
Ajaleke ku bi nêçîrê tête girtin. Lê di dema heccê de qedexe ye ku hhacî di "ihram"ê de nêçîra heywanan bikin. Ger ew wiya bike, wê hingê ji wî tê xwestin ku heywanekî bi bihayê wê li Mekkê bike qorban an jî xwarinê bide çend mirovên belengaz an çend rojan rojî bigirin. (Li Qur` anê, 5: 95 binêrin).

(ض)

sûreya rojhilat : **ḍuḥa (sûreya aḍ-) سُورَة الضُحى**

Ev sûreya, hejmara 93ê ye ji Qurana pîroz, sernavê xwe ji peyva yekem ji ayeta yekemîn digire. Di vê beşê de, Xwedê Pêxember şîret kirîye ku ew : dilovanîyê li mirovên bêdêubav(yetîm)bike, û kesên parsik acîz neke, û li ser qencîyên Xwedê biaxife.

(زیانبەخش) **.** zirar : **ḍarr (aḍ-)الضَّار**

wendabûyî . şaşeytî . bê armanc : **ḍallu(n) (kom. ḍallûn) (ضالون) ضال**

Kesê " dal" yê ku rêya xwe winda dike , an jî bi rengek çewt diçê.

(گەرەنتی) **.** misoger : **ḍamin ضامِن**

Ew kesê ku berpirsîyarîyê hilde li ser xwe ku bawer dike ku ew kesê misuger e, dê tişta ku ji wî tê xwestin, pêk bîne.

(زیان) . zirar : **ḍerer(kom .'aḍrar) (أَضْرَار)ضَرَر**

Islama li ser peyrewên(şopînerên) xwe ferz dike ku ziyanê nedin yên din.

daxwazkirin ji Xwedê : **ḍere'e(yeḍre')'ila-llah إلى الله (يضرع)ضرع**

Nimêjê bi dilovanî û dilnizmî ji bo Xudê.

hewî : **ḍerreh(kom . ḍera'ir) (ضرائر) ضَرّة**

Jineke din ku ji bo mêrekî ku zêdetir ji jinekê hebe.

ḍerûreh(kom . ḍarûrat) (ج: ضرورات) ضرورة

aḍ-ḍerûrat tubîḥu al-meḥżûrat :الضَّرورات تُبيحُ المَحظورات

Destûra ku pêwestîyê dide qedexeyan.

Pêdivîyên neqanûnî dike yasayî. Wek mînak, di dema ku mirovek ji sedema birçîbûnê mirinê bibîne, wê hingê dikare xwarineke qedexe bixwe da ku jiyana xwe biparêze.

pênc tiştên bingehîn : **ḍerûrat(aḍ-)al-xems الضَّرورات الخمس**

Pênc tiştên bingehîn ên ku ji bo mirovahiyê têne bikaranîn wek: jiyan, ol, mejî, rûmet, xwedan. Em dikarin bibêjin ku ev kêmtirîn mafên mirovan temsîl dike. Yek ji armancên sereke yên qanûna Islamî ewe ku parastina van mafan bike.

(مەزار) . mezel : **ḍerîḥ (kom .aḍriḥah) (أضرحة) ضريح**

Bi gelemperî, ev têgeh behsa gorên mirovên salih û taybet dike, mîna mirovên navdar ('awliya' S-salihîn), cuda ji "qebir = goristanên giştî.

(گومرا) **.** şaşî : **ḍelal ضَلال**

Ne şopandina rêya rast a ku ji hêla olê ve hatîye destnîşankirin.

wendakirin : **ḍelle (yeḍill) (يضلُ) ضلَّ**

Rêçeke din ji bilî rêça ku Xwedê ji bo mirovatiyê danîye, dişopîne.

(ط)

ţa'yf الطائف

Ew Bajarê ku Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) qesda(serdanîya) wî kirîye, ku ew pêncî milî dikeve rojhilatê Mekkeyê, li wir Pêxember Muhemmed, piştî sala duyemîn a berî koçberiyê ku da'awa wî ji hêla Quraiş-ê Mekkeyê ve hatibû red kirin. Li wir li wî didin û perîşan dikin. Li wir jî ew şermezar dibe (rûreş dikin). Di rêwîtiya xwe de di dema ku ew vedigerê Mekkê, Xwedayê bilind jê re eşkere dike ku her çend xelkên Taîf wî red bikin, cinn dê wî qebûl bikin. Dûv re Sura Al-cinn hat diyar kirin.(Surya 72ê) jê re hat eşkere kirin.

سُورَة الطارِق (-şûret aţ) ţariq : sûreya stêra ronahî

Ev Sûreya 86ê ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji peyva ku dikeve di ayetên yekem û duyemîn de werdigire. Di wê de, Xwedayê bilind bi Tariq sond dixwe ku ew stêrka ronahîyê ye ku di tariyê de diberiqîne, û rastîya veger û Roja Vejînê nîşan dide, û ew giringîya Qurana Pîroz destnîşan dike.

طاعة (طاعات) (ţa‘at .kom) ţa‘eh : gûhliber. karê qenc . (گوێرایەڵی)

Ew behsa kiryarên ku bi guhdariya emrên Xwedê hatine kirin, dike.

طاف (يطوف) (yeţûf) ţafe : zivirandin . dorpêçkirin . (سوڕانەوە)

Ku biçin dora Ka'beyê. dorpêçkirina Kebeyê heft caran wekî kiryarek perestî tê hesibandin.

طاغوت (طَواغيت) (ţewaẍît pi) ţaẍût : yên derewîn

Xwedakê derewîn, her tişta ku ji bilî Xwedayê rastîn, biperizin, ji re zalim tê gotin, ango hemî xwedakên derewîn: wek, şeytan, pût, kevir, tavê, stêrk, milyaket…

طالِب (طَلَبة العِلم) al-‘ilm (ţelebet .kom) ţalib : lêgerîna zanînê . (قوتابیانی زانست)

Bi gelemperî, ew daxwazkarê zanîna olî ye.

طالوت ţalût :

Xwedê Qral Şaûl ji bo lsrayîliyan hilbijartîye da ku bi Galut şer bikin. (Li Quranê binihêrin 2: 241, ….., 251.)

طاهِر ţahir: nemaze, bi pak . (پاک)

Mirov pakij tê hesbandin, eger li ser wî: mîz, gû(pîsî), û xwîn li ser laşê wî tune be an ew di rewşeka ku "gusl : şûştin" hewce dike de, be. Ev têgeh li ser tiştên din jî dibe, wek cil û berg, cî ku mirov "nimêj"ê li ser wan pêktîne.

طَريقة صُوفيّة ţerîqeh şûfîyeh : awayê Sufî

Pergala sofîtîyê: Wekî Neqeşbendî, Qadriyêh , Tîjanîyeh. . . hwd.

طَلاق ţelaq : berdan . dabeşkirin . (تەڵاق)

Di Islamê de dabeşkirinî(jinberdanê) wekî xirabiyeke pêwist tê hesbandin an wekî çareserîya paşîn tê hesibandin. Ango piştî ku mêr û jin her tiştî biceribînin, ji bo ku di nav wan de hakemiyet, û lihevhatin çêbibe, lê ti encamê nede.

sûreya dabeşbûnê (berdanê . veqetandinê)**: ţelaq (sûret aţ-) سُورَة الطَّلاق**

Ev Sûreya 65ê-(an) a Qur'anê ye, navê wê ji ayeta yekem tê, û ew qala jinberdanê û hûrguliyên pê ve girêdayî dike. Ev yek jî mezinbûna Xwedayê mezin û rawestana pêxemberê wî yê birûmet destnîşan dike, (duayên Xwedê û silavê wî li ser wî û malbat û hevalên wî be), danêrê xelata rastdar, û cezayê gunehkaran.

jinberdana bêveger. berdena paşîn **: ţelaq ba'in طلاق بائن**

Berdana (Veqetîna) dawîn: piştî wê hingê jin nikare li mêrê xwe yê berê vegere. Ew tenê bi rêkeftineke nû dikare li mêr xwe vegere, an ew jin divê bi zilamekî din re bizewice an piştî ku ew bi mêrekî din re bizewice, wê hingê eger ew jin xwe ji zilamê duyemîn bide berdan an eger ew bimire, di wî wextî de jin dikare li mêrê ewleyî veger. (li "Beynûneh kubra" û "beynûneh suxra" binihêrin).

ţelaq al-jelab طلاق الجلاب

Yek ji pratîkên bazirganî yên pêşîn ên Ereban: Gava ku bazirganan bi hatina karwanan dibihîstin, ew ji bajêr derdiketin da ku bi karwan re bicivin ji bo ku tevahîya barê mal ji wan bikirin; armanca wan ew bû ku piştre wî malî li sûka bajêr bi bihayekî bihatir bifroşin. Lê Pêxemberê Pîroz ew yek qedexe kir, loma wî gazî firoşkaran kir ku malê(tiştên)xwe di hundirê sûkê û di jîngehekê pêşbaz(baştir) de bifroşin.

: ţelaq rej'îy طلاق رجعي

1- Berdana vegerbar . hevberdanê revokbar: Di vê rewşê de, mêr û jina wî ya berdayî dikarin bêyî ku bi hev re bizewicin (bêyî peymana zewacê ya nû) li hev vegerin. Ev yek piştî " dabeşkirina yekemîn" an "dabeşkirina duyemîn" berî derbasbûna demê bendewariyê'"iddeh" tête kirin.

2- berdana bêserûber. hevberdanê nederbasdar: Hevberdana ku prênsîbên "Sunnetê" binpê dike, wek berdana jinê zêdeyî carekî di dewra mehane(heyîvane) de.

berdendina(veqetîna) rast **: ţelaq as-sunneh طلاق الُسُنَّة**

Berdana rast: Li gurî hînkirinên pêxemberê Xwedê, nimêj û silavên Xwedê lê be: Divê berdan di dema dewra hatina xûnê de nebe, divê ew ji xwînrijiyê bêpar be (mînak: piştî zayînê), bi şertê ku wî bi wê re di demê dewra xûnê de bi wê re cins nekiribe û ew berdan vegerbar be, divê mêr zêdeyî yek berdê(telaqê) nede, divê berdan jibo sedemek maqûl bimîne.

berdana yekcar **: ţelqeh (kom. ţelqat) (طَلَقات) طَلَقة**

Hevberdana yekcar: Musilman dikare sê caran berdê bide. Piştî du berdên pêşîn, jin û mêr dikarin piştî sê dewrên xûnê (mehane) li hev vegerin . (li"telaq rej'îy" û "telaq ba'in" binihêrin طلاق رجعي، طلاق بائن ").

berdena sêyemîn **: ţelqeh ŝaliŝeh طَلَقة ثالثة**

Piştî berdana sêyemîn zilam ji jin xwe tên berdan, ku ew edî nikarin li hev vegerin. Ew dikarin li hev vegerin, eger jina berdayî bi mêrek din re bizewice û xwe ji wî berdan, an ew mêr bimire, wê hingê jin dikare li mêrê xwe yê yekem vegere. Di her halê de peymanek zewacê ya nû hewce ye.

berdena duyemîn **: ţelqeh ŝaniyeh طَلَقة ثانية**

Berdana jinê di cara duyemîn de, ev tê vê wateyê ku mêr dikare jina xwe vegerînê; piştî dabeşkirina wê yekem di dema benda "eddeh", dûv re jî dîsa wê berde. ew berdan dikare were qedaxkirin.

berdena yekem **: ţelqeh 'ûla طَلَقة أولى**

Berdana jinê di cara yekem de, ew berdan dikare were qedaxkirin (qedexebare).

ţuma'nîneh طُمأنينة

1- Hestkirina aştî û aramîyê.

2- Nimêjkirina bi baldarî, hêdî, û ne bi lez.

(مێهەنگ) . kinc . mehane **: ţemŝ (aţ-) الطَّمث**

Dewra hatina xûnê ya jinê(ya mehane) birêkûpêk.

sûreya Ţa-ha **: ţahe (sûret -) سُورَة طَه**

Ev Sûreya 20ê-a Qur'anê ye, sernavê xwe ji ayeta yekemîn, Ta-ha werdigire, wî behsa mezinahîya Qur'ana pîroz û taybetmendiyên Xwedayê bilind kirîye; li ser di derbarê çîroka Mûsa (silava Xwedê lê be), vegerê û rewşên Roja vejînê rawestî ye, û her weha qala çîroka Adem û Hewa li bihuştê dike û ev bûyera daketina wan li ser rûyê erdê, wekî şîret bo hemî bawermendan hatîye kirin.

xwe paqijîya nimêjê **: ţuhr طُهر**

Dema ku nabe jin nimêjê bike.

pak kirin **: ţehareh طَهارة**

Cihê ku mirov dikare nimêjê bike û destên xwe bavêje Qur'anê. Herweha ew ji bo destnîşankirina paqijiya exlaqî jî tê bikar anîn. (Ango, paqijîya fizîkî û exlaqî).

zîvronîkkirin (dorpêçkirin) **: ţewaf طَواف**

Dorpêç Zîvronîkkirina Ke'eba pîroz. Tewaf bi komandî bi heft caran tête çêkirin, piştî wê hingê, mirov divê nimêjê bi du rek'etan bike û tê tercîhkirin ku nimêj nêzî Meqam al-Ibrahim be. Tewafa al-Ifadeh li jêr bibînin .

ţewaf al-ifaḍeh طَواف الإفاضة

"Tewaf" a Hecê di roja dehemîn a meha Hecê de tê kirin.

Ew stûnekî bingehînê "Hecê" ye. Navê wê yê din" Tewaf az-ziyareh: Zîvronîkirina serdanîyê" ye.

(زیوکردن) . dorpêça(zîvronîkirina) serdanê **: ţewaf az-ziyareh طَواف الزيارة**

Hacî di roja dehemîn de ji "Tewafê" ji meha Hecê, hecê dike. Ew stûnekî(parçekî) serkeye ji "Hecê"

zîvronîkirina (dorpêça) hatinê **: ţewaf al-qudûm طَواف القُدوم**

Dorpêça "tewafe" hacî piştî hatina Mekkê.

dorpêça xêr- xweşîyê : **ţewaf al-weda‘ طَواف الوَداع**

Zîvronîkirina(tewafa) hacî berî ku ew ji Mekkê derkeve .

bila Xwedê bihişta bide **: ţûbî طُوبى**

Gotina ku teşwîqkirina mirovan dike ku ew tiştekî bikin an tiştekî pêşkêş bikin, da ku bihuştê misuger bikin.

çiyayê Sîna : **Ţûr (jebel aţ-) (جَبَل) الطُّور**

Ev navê çiyayê Sînayê ye, ku di wê hingê de îlhama Tewratê û deh fermanên(şîretên) din ji Xwedê ji bo Pêxember Mûsa, (silava Xwedê lê be), hatine şandin. (Qur’ana Pîroz 20:23 , 52)

sûreya çiyayê Turê **: Ţûr (sûret aţ-) سُورَة الطور**

Beşê 52ê ji Qura'anê, ew ji gotina ku di ayeta vekirinê de hatîye, tê. Ev beş bi kurtahî wusa tê vegotin, "Hemî nîşanên Xwedê, tevî wehî ya berê jî, ew diyar dike ku encamên bêkêmasî yên kiryarên xirab û kiryarên baş bê hisab derbas nabin: Çawa mirov dikarin înkar û paşguh kirina peyama wehîyê bikin?"

bîhnxweş . mîsk **: ţîb (kom. ţuyûb) طيب (طيوب)**

Pêxember(Xwedê wî pîroz bike û selamê lê bike) ji bîhnxweşîye hezdikir .

pêşbînîya xirab **: ţiyereh طِيرة**

Geşbînî û reşbînî di (dîtina) Islamê de, hatîye qedexe kirin, ji ber ku divê musilman tenê bi Xwedê bawer bike

(ظ)

(نادادپەروەرانە) . zordar : **żalim ظالِم**

(ئاشكرا) . eşkere **: żahir (aż -) الظاهِر**

Taybetmendîya xwedayî, Xwedê bi bûnerên xwe û kiryarên wan re zelaltirîn e, ji ber ku ew hemî delîl û nîşanên mutleq ên hebûna wî ne.

mezheba diyar: **żahir al-meẓheb ظاهِر المَذهَب**

Hukmê xuyadar ji bo rêbaza bawermendîyê. Ya ku wek dibistana ramantîka taybetî tête fêm kirin.

xuyî **: żahiriyyeh (aż-) الظاهريّة**

Alîgirên dibistana ramantîkê yên ku bi wateya rastîn a şerî'eta(zegona) Islamî û hînkirinên wê ve girêdayî ne.

(نادادپەروەری) . zordarî **: żulm ظُلم**

Ew behsa her cûreyê neheqî, mêtîngerî an zordariyê dike ku mirovan ji mafên wan qût dike an jî erkên xwe bi wan re pêktîne.

Neheqî û zordarî di Islamê de qedexe ye, heta dema ku Musilman bi ne-Ew zordarîyê û danustandina ne adil qedexe dike, heya ku ew ne Musilman be; neyar jî be. Zordarî berevajî "'adil" dad û dadperwerîyê) tê.

(تاریكی) . tarîtî **: żulumat ظلمـــات**

Tarîtî**:** Ew bi wateya xetera têkçûyî ye. li Qur'ana Pîroz ', Al-An'am (6): 63. binêrin . Ji vê derê peyva zulm (neheqî)ê tête biderxistin, ji ber ku neheqî bi her rengî tarîbûna xirab e.

(پێیان وایە) . gumanan dike **: żenn (kom. żunûn) (ظَنون) ظَنّ**

Guman kirin: Islam ji şopînerên xwe teşwîq dike ku biryarên(darizandinên) lezgîn nedin(pêk neynin).(li Qura-anê, 1 7: 36 û 49: 12 binhêrin). Di prensîbên şerîeta Islamî de, zanyar celeb û astên cihêreng ên "żenn : guman" pêşniyar dikin.

gumanbar **: żennîy ظَنّي**

Pirsbar: Di zanista prensîban de ev bi wateya pêkarînê tê, serî ku mirov dikare wê bi wateyekê din fêmkirin.

(نیوەڕۆ) . nîvroj **: żuhr (aż-) الظُهر**

Dema nîvro: Nimêja ferz a duyemîn a rojê ye. Ew dikare her dem di navbera nîvro û ya navîn û paşîn de nimêj bike. Dema nimêja nîvro piştî nîvro bi çend deqîqan dest pê dike.

(ع)

عابِد (عبّاد) ‘abid (kom. 'ubbad) : olperest (ئايپندار)
Ew Kesekî oldar e ku jiyana xwe bo parastina Xwedê derbas dike.

عاد ‘Ad : Add
Miletek ji miletê kendava Erebîye, Xwedê bo wan Pêxember (Hûd) şandîye. Tê gotin ku ew li Yemenê dijiyan.

عادِل ‘adil: rastdar . dadperwer . (دادپەروەرانە)
Ew kesê ku li ser edaletê sekinîye, ew kesekî dilsoz û pêbawer e ku ew biryarên rast distîne .

عاديات ‘adiyat :
Tiştên dravî ku wekî yekînekan têne pîvandin û ne bi giranî, ne bi dirêjahî an qebareya wan, ango wekî hêk an hinik fêkîyên ku wekî yekînekan hatine firotin (duzdeh an nîvê duzdehan).

سُورَة العاديات (‘adiyat (sûret al-: sûreya hespên rihwalê bezok
Ev sûreya 100-ê ye ji Qurana pîroz, navê wê ji gotina yekemîn a vê ayetê hatîye wergirtin. Ev gotin ji bo îşaretkirina hespên ku di qadên şer de beşdar(dibezin) dibin, hatîye. Ew hoyên xwe li erdê didin(barandin) û tozê ji erdê dertînin, ew di dema şer bêhna tûj dikşînin û kûr dipêjin. Wêneyek diyardar ji van hespan di çar ayetên pêşîn de tê dîtin. Pişt re daxuyanîyek di derheqê taybetmendiyên kesên bêbawer de tê deyîn, yên ku ew li ser çarenûsa wan di roja vejînê de hişyar kirine.

عاريَة ‘ariyeh : dravê deyn kirî
Tiştekî ku ji kesekî hatîye deynkirin. Bi xwezayî, Pêdivî ye ku ew saxlim bête vegerandin.

عاشوراء ‘aşûra' : dehê Muharrem
Dehê meha yekem ji salnameya îslamî ya sunneta rojîyê ye û rojek berî an piştî wê rojîgirtinê. Di wê rojê de Xwedê Mûsa ji Firewn xilas dike(kirîye) û di heman rojê de ji salê Huseyîn bin Ali (nevîyê Pêxember silava Xwedê lê be) li Kerbalayê 'li Iraqê" şehîd dikeve.

عاصٍ (عصاة) ‘aṡ (in) (kom. ‘uṡat) : gunehkar, serhildêr . (گوناهكار)
Li dijî xwedê serî hildide. Berevajîyê kesê guhpêder.

العاقِب ‘aqib (al-) : paşîn
Ev peyv Jibo Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) hatîye bikaranîn, ku ew pêxemberê Xwedê yê dawî ye.

عاقِلة ‘aqileh : dravê xwînê
Dana lihevhatina xwînê ji bo xwîna kesê ku hatîye kuştin tê dayîn, mîna bav û kalên ku berpirsiyarîya kujer didin li ser milên xwe ku dravê xwînê radestî malbata kesê ku hatîye kuştin, bikin.

(hişmend, dadperwer, aqilmend) : **‘aqil عاقِل**

Bi qanûnî, ev bi wateya kesê ku hişmendîya wî berz e tê; loma ew dibe berpirsê kirinên xwe.

di navbera jiyanê de **:‘alem al-berzex عالم البرزخ**

Rewşa navber. Ew demê ku dikeve di navbera giyanan de. Di teolojiya Islamî de, ev têgîn îşaretê bi serdema ku dikeve di navbera mirin û vejînê de, an di navbera jiyana vê dinyayê û jiyanên din de. Di jiyana berzaxê de, dê bihuşt û dojeh xuya bike, û piştî dadgehkirinê çarnivîsa me dê di navbera herduyan(bihuşt û dojeh) bête destnîşan kirin (ango dê cihê herkesî çi li bihuştê û çi li dojehê(cehhnemê) bête diyar kirin .

cîhana xuyang **: ‘aleme ş- şehadeh عالم الشهادة**

Dinya şênberî(ma'adî, fîzîkî) ya heyî, berevajî dinyaya din(exiretê, dawîn) an pêşerojê, ku berevajîyê wê "dinya nedîtinî" tê.

("زانا " زاناكان) zanyar(an) **: ‘alim (kom. ‘ulema')(علماء)عالِم**

Ew pispor e di mijarekî zanistî de. Di navde mijara olî jî heye.

(جيهانىناديار) . cihana nedîtbar : **‘alem al-ẍayb عالم الغيب**

Cîhana nedîtî . Di navde pêşeroj û axîretê hene, ku tenê Xwedê pê dizane.

sala şandiyê **: ‘am al-bu'ûŝ عام البعوث**

Sala nehemîn a koçberîyê wekî sala şandeyan tê gotin, ji ber ku ew şanda ji her çar aliyê Erebistanê bo Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) li Medînê da ku pêbawerbûna xwe bi Islamê ragihînin û jê (ji islamê) fêr bibin.

sala fîlê **: ‘am al-fîl عام الفيل**

Di sala 570ê(piştî zayînê)de serwerê Esîyupiyayê li Yemenê biryar da ku bi ordîyeka leşkerî bi hejmareke mezin ji Fîlan êrîşî Mekkeyê bike û Kebehê bihelwişîne, lê ew hemî bi mirûzî hatin rûxandin. (Binêrin Quranê, 105). Di wê salê de Pêxemberê dayek bûyê.

walî **: ‘amil (kom. 'ummal) (عُمّال) عامِل**

Mezinherêm(Walî) ji hêla xelîfê ve tête destnîşankirin da ku ew herêmeka diyarkirî birêve bibe.

karkerek **: ‘amil عامل**

Ew kesê ku mafê wî heye ku heqdestîya karê xwe bistîne.

xwedawendî, olperestî : **‘ibedat (tek. ‘ibedeh) (عِبادات)عِبادة**

Karên xwedawendiyê bi radestî û berbiçavî û bi hezkirina herî zêde ji bo Xwedayê mezin. Bi gotineka din, terma ku Xwedê bi her tiştê şa dike, evin: bîranîna Xwedê an gotina peyveka baş) û kiryarên (wek nimêjkirin, rojiyê, karên xêrxwazî .

(بت پەرستی) . perizîna pûtên : **‘ibadet al-awŝan عِبادة الأوثان**

"Weseniyeh"ê bibînin.

(كۆيلەكان) . xulamê mêr . kole **: ‘ebd (‘ebîd) (عَبيد)عَبد**

Di warê têkiliya mirov bi Xwedê re, ev peyv bi gelemperî wekî 'xizmetkar' tê wergerandin.

(کۆیلایەتی .کۆیله) . xulamî . koletî **:‘ubûdîyeh عُبوديّة**
Di warê olî de, ev bi gelemperî ji bo têkiliya mirov bi Xwedê re tête bikar anîn . Ew xulamê û xizmekarê Xwedayê xwe ku ew afirînerê gerdûnê ye . Di nav de xwedawendî û bi cihkirina hemû fermanên wî.

‘ibed ullah عبد الله
Xulamên Xwedê ji mêran û jinan pêk tê.

gumerî . ênîqermiçand **: ‘ebese عبس**
Zilamê kor yê ku di vê surê de tête behs kirin, ew Ebdullah ibn Umm Mektum e. Ji Sura 80ê(an) a Qurana Pîroz.

azadkirina xulamekî : **‘itiq reqebeh عِتق رقبة**
Azadkirina kolekî(Xulamekî)wek karekî xêrxwazîyê tê dîtin. Carinan, ew pêwîst dine di betalkirina hin gunehan de. Hevwata wê "fekku reqebeh" e.

malbata Pêxember **: ‘itret an-nebîy عِترة النبي**
Xêzana Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) û nevîyên wî .

: ‘oŝiman عثمان
Yek ji mezintirîn rêhevalên Pêxemberê Xwedê ye. Ew ji Xelîfeyên Rastdar (Al-xulefa' ar-Raşidîn: xelîfeyên Rastgirî) yê sêyemîn bû. Ji 24-ê hicrî heya 36-ê hicrî hukim kirîye. Di dema serwerîya wî de, Qur’an hatîye berhev kirin û berfirehkirina Mizgefta Mezin û hem jî Mizgefta Pêxember hatîye çêkirin. Di dema serdestiya wî de, hejmarek welat hatine vekirin û dewleta Islamî jî hatîye berfireh kirin. Di nav welatên ku di dema xîlafeta wî de hatine vekirin ev in: Ermenîstan, Xorasan, Kerman, Sijistan, Afrîqîya û Qibris bûn. Di dema wî de gemîya deryayî ya yekem a Islamî hatîye damezrandin da ku bejahîyên Islamî ji êrişên Bîzantiyan biparêze.
Di nîvê hukumdarîya wî ya duyemîn de ku donzdeh salan dom kirîye, çend bûyerên fitnê derdikevine holê ku ew di encamê de dibine sedema kuştina wî.

heyama bendewarîyê : **‘iddeh (kom. ‘ided) (عِدد) عدّة**
Dema bendewarîyê. Di wê demê jina berdayî an jinûbî radeweste ta ku dîsa bizewicê .

heyama bendewariyê berdandinê : **‘iddet aţ-ţelaq عِدّة الطلاق**
Di wê denimêjinek divê jina berdayî an jinûbî raweste berî ku ew carek din bizewice. Ew dem jî: sê dewreyên mehane ne, sê mehên heyvan ne, û ta ku ew zaroka xwe bîne dinyayê . (li Quranê, 2: 228 û 65: 4 Binêrin).

heyama bendewariyê jinebiyê : **‘iddet al-wefat عدّة الوفاة**
Ew dema jina jinûbî têde de radeweste berî ku ew carek din bizewice, Ji bo jina ducanî(avis) divê çar mehan û deh rojan raweste, eger ew ducanî be ta zaroka xwe bîne dinyayê.

(دادپەروەری) . dadperwerî . dadmendî **: (al-‘adl) العدل**
Taybetmendîya Xwedayî. Ew kesê ku biryarên xwe qet neheqîye li tikesî nake.

(دادپەروەری) dadmendî, dadperwerî, danûstendinek adîl **: ‘adl عدل**
Dadperwerî û danûstandina adîl: Qur’an musilmanan fêr dike ku ew di danûstandinên xwe de ta bi dijminan re jî dadperwer bin, û dadperwer bin heta ku ew li dijê xizmên we be jî.

mirovê dadperwer (yekrêz) :**‘adl (kom. ‘udûl) (عدول) عدل**

Ev têrm di zanista hedîsê de ji bo bêjer(çîrokbêjan)û wesifkirina şahidan tê bikaranîn, ew bi wateya kesekî ku ji Xwedê ditirse û pêbawer be û (rastdar be) têbikaranîn.

(دادپەروەری) . dad, yekrêzî **: ‘adaleh عدالة**

Di zanistîya hadîseyê de, Wateyê rastiya çîrokbêj dike

(ئازار). êşkence : **‘eẓab عذاب**

(ئەشكەنجەی گۆڕەكە) . êşkencekirina gore **: ‘eẓab al-qabr عذاب القبر**

Kesên kafir dê cezayê tirbê bibînin, ew dê di destpêka cezayê de pirsên "Munkir û Nekir" çewt bipersivînin.

borîn **: ‘uẓren (kom. a‘ẓar) (أعذار) عُذراً**

Sedemeke ji bo nekirina kiryarekî pêwîst. Em gelek caran bi gotina "hinceta rewa" dibihîzin.

bi ser de çû **: ‘ereje (ye‘ruj) (يَعرِج) عرج**

Ku biçin bihuştê.

rêya Xwedê : **‘erş (kom. ‘urûş)(عروش)عرش**

Ew textê behiştê (‘rş ezmanek bêhempa ye)ye ku esmanê wê bê stêrk e ji ber ku gerdûna wê ronakdar e(xuyang), ku ew bi textê kursî tê binavkirin. (Li "كرسي kursî" bihêrîn).

(ئوفەری بازرگانی). tiştên bazirganî **: ‘urûḍ at-tijareh عُروض التِجارة**

Tiştên ku ji bo bazirganîyê hatine amadekirin. Li wir rêgezên taybet bi sedeqatên ku hatine dayîn hene.

adet **:‘urf (kom. a‘eraf) (أعراف) عُرف**

Ew pratîkek hevpar e ku ji hêla mirovên civaka taybetî ve tê kirin. Di zagona (şerîeta) Islamî de, divê adab û nerêt(adet)bi ti fermanên olî re ne nakokbar be.

divîner . dirûvker **: ‘erraf عرّاف**

Ew mirovê ku îdîa dike ku ew bi nezanîn û pêşerojê dizane. Ev yek qedexe ye ji bo musilmanan ku qedexe ye ku ji bo armanca şêwirmendiyê serî li van kesan bide, ji ber ku tenê Xwedayê mezîn bi jiyana nedîtbar û pêşerojê dizane.

(پێشبینی) . pêşbînî : **‘irafeh عرافة**

Kahînan îdîa dikirin ku ew bi nedîtbarîyê dizanin, û Islamê ev yek bi tundî şermezar kirîye.

Arefeh/Arefat **: ‘erefeh / ‘erefat عرفة/ عرفات**

Girê ku 25 km dikeve rojhilatê Mekkeyê. Sekna li ser Arefat-ê li ser neh-ya Zu el-Hiccehê ji nîvê êvarê heya barkirina rojê, ew esasê hewayê ye. Mayîna ji rêûresmên sereke ye ku bêyî wê hec tê betal kirin.

bêgarî **: ‘uzûbeh عُزوبة**

Bêkarî ji hêla Islamê ve nayê pêşniyar kirin, Ji ber ku ew li dijî xwezaya mirovahîyê tê hesibandin.

Ezra **: ‘uzeyr عُزرا**

Uzra: Qur 'an destnîşan dike ku hinik Cihûyan îdîa dikirin ku Ezra kurê Xwedê ye. (9:30).

Izra'eyl : **‘izra'îl** **عزرائيل**

Ew navê melayîketê mirinê ye, li gorî adetên îslamî yên gelerî.

‘ezl عزل

1- Ji desthilatdariyê dûr xistin: Derxistina kesekî ji desthilatê.
2- Têkiliya zayendî : Bi mebesta derxistina(vekişîna) endamê (kîr ji vajînayê) nêrzayî ji endama mêzayî(ji quz)berî avêtinê. Di Hedîseyê de em dibînin ku ev pratîk ji hêla musilmanên destpêkê ve dihat bikaranîn, ku ji wan re ne qedexe bû.

herdem-mindir **:‘ezîz (al-) العزيز**

1. "Al-'Aziz". Xuda. Not û neh taybetmendiyên Xwedayê bilind hene. Ew yê Hêzdar û bilindtir e. Li Qur’ana Pîroz, Al-Hecî ’(22): 40 binêrin.
2. Sernavê mîrekên Misrê di serdema Fîrewnan de. Zulayixa jina 'Azîz bû ku hewl da ku Pêxember Yusuf (silava Xwedê lê be) bixapîne, lê ew têk çûye û ser nakeve. Li Qurana pîroz, Yusuf (12): 23-24 binêr in.

‘ezîmeh (kom. ‘eza'yim) (عزائم) عزيمة

Xwestek an sêwirane (îsrar).

‘uzza (al-) العُزّى

Yek ji xwedakên jinê ku ji hêla Erebên pûtperest ve dihat parastin.

axa palm **: ‘esîb عسيب**

Rûtenkirina şaxên(çiqlên)dara xurmê ji pelên wê. Ereban carinan li ser wan dinvîsandin.

(ئێواران) . danê êvarê , şev : **‘işa' (al-) العشاء**

Derengîya şevê. Di dema ku sorbûn ji asîmanê şevê winda bûye û stêrk xuya bûne, û ew bi şefeqa rojê re bi dawî dibe.

: ‘Uşr العشر

Baca îslamî li ser hilberîna çandinîyê.

‘eşarah (al-) al-mubeşşarûn : العشرة المبشِّرون

ew deh kesên ku bo wan soza bihuştê hatîye dayîn
Ji deh hevalên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) bo wan hatîye xuyakirin ku ew niştecihên buhişta axîretê ne. Ew Ebu Bekir, Umer, Usman, Ali, Abdur Rahman ibn Awf, Abu Ubeydeh ibn al-Jerrah, Telheh ib Ubeydulleh, az-Zubayr ibn al-A‘wwam, Se‘id ibn Abi Waqqas, Se‘id ibn Zayd.

merivên bav û kalan **: ‘uṡebeh عُصبة**

"Xîzmên mêr ji alîyê bav ve mîrasa mayî digirin, heke hebe, piştî ku mîratxwerên xwedanê mafên boz(sabit, hişkeboz)pişka xwe werdigirin.

partîbûn : **‘eṡebiyeh عصبيّة**

Partîtî. Mêla ne adil- di Islamê de qedexe ye, ji ber ku divê Musilman bi dijminan re jî dadmend be.

(دوانیوەڕۆ) piştî nîvro **: ‘eṡir (al-) العصِر**

"Piştînîvroj". nimêja sêyemîn ya ferz.

sûreya demê **: ‘eṡr (sûret al-) سُورَة العَصر**

Ev Sûreya 103ê ya Qur'anê ye, ku behsa dabeşkirina demê dike. Ew ji navê yekem ji ayetê hatîye girtin, û ew bi giştî demê an piştî nîvro destnîşan dike. Di vê sûreyê de, Xwedayê mezin bi rengek teqez ragihandîye ku "mirov winda ye."

Ew tenê dikare xwe bi van her sê tiştên jêrîn xilas bike: (1) bawerî, (2) kiryarên qenc û (3) fermana rast, bîhnfirehî û aramî.

‘eṡur wusţa الوسطى (العصور)

Nimêja navîn behsa nimêja nîvro (sêyemîn ji pênc nimêjên mecbûrî"ferz") dike, ji bo wan ên ku roja xwe bi berbanga sibê ve girêdidin. Lêbelê, hinek dibêjin ew behsa nimêja sibehê dike. Ji ber ku Musilman salnameya heyvê dişopînin: roja yekem ji meha nû ya heyvê ye, tenê heyva nû piştî rojavabûnê diyar dibe. Ji ber vê yekê, roja Islamî Mexreba Erebî dest pê dike, û ew li Mexrebê weka nimêja yekem di wê rojê tê dîtin, wek çêkirina sibeha sêyemîn (navîn).

‘iṡmeh عِصمة

1- Dûrketin ji şaşeyê: Ew parastina ku Xuda ji bo Pexmberan diafrîne da ku ew ji gunehan bêne parastin

2- Mafê jinberdanê: ev têgeh ji bo mafê jinberdanê di vê serdema nûjen de tê bikaranîn, bi gelemperî biryar di destê mêr de ye, lê jin jî dikare wê di peymana zewacê de piştrast bike.

gunehkar, mirovên reben **:‘uṡat (tek. 'aṡî) (عاصٍ) عُصاة**

gunehê kirina : **‘eṡa (ye‘ṡî) (يَعصي) عصى**

pêşîlêgirtina zewacê **:‘eḍil عضل**

Pêşîlêgirtina jinekê ji zewacê bi rêyên cûrbecûr, çi ji hêla welî ve be an ji hêla mêrê wê yê berê ve.

("ووتار "وتارەكان) şîretê olî : **‘iżeh (kom. 'iżat) (عِظة) عِظات**

Xweda xelata we pir bike! **:‘eżżama allahu ajrekum عظَّم الله أجركم**

Ew bi gelemperî axiftineke ku mirov ji bo kesê mirî dibêje ji bo mebesta sersaxîyên pêşkêş bikin .

gelek mezin **: ‘eżîm (al-)العظيم**

Taybetmendîyeka xwedayî ye, ya Xwedayê mezin û bi rûmet e ku ji hêla kesên din ve tê gotin.

(پاک) dilpak . restbûnê : **‘iffeh ‘ifaf (عفاف)عِفّة**

Ev Peyv bi wateya dilpak û restbûnê tê, ango bi wateya ku mirov ji kiryarê çewt dûr bikve, tê.

(پاکی) . dilpak . zelal **:‘efîf عَفيف**

Ev gotin di bin bazkê xwe hem wata dilpakî û hem jî xwe-giramîyê hildigire. Ango mirov ti têkiliyên zayendî yên neqanûnî nake û bi tu awayî kesî na xapîne.

(داوای لێبوردن). lêborîn . lêxşandin . efûkirin **: 'al‘afuww ال عفو**

Ji taybetmendîyên Xweda yê mezin ewe ku gunehan ji tomargehên xwe paqij dike. Ev taybetmendî di ayetên Qur'ana Pîroz de diyar dibe ku bang li hemî "gunehkaran" dike "bêhêvîtîya dilovanîya Xwedê" nekin.

beşdarîya zewacê, zewac kirin **:‘eqd al-qiran عقد القِران**

Ahengên lidarxistina zewacê. Ew dikare bi wateya zewacê jî be.

beşdarî zewacê, zewac kirin **:‘eqd an-nikaḥ عقد النِكاح**

Ahengên lidarxistina zewacê. Ew dikare bi wateya zewacê jî be.

belgeya zewacê . peymana zewacê **: ‘uqdet an-nikaḥ عُقدة النِكاح**

عَقيدة) عقائد) 'eqa'id (tek. 'aqîdeh): baweriya durust. (دۆكترينس)
Mijarên bawerî û olê di rîtuelên girêdayî têkiliya di navbera Xwedê û mirovan de diyar dike.

عُقوق الوالدَين 'uqûq al-walideyn : nerazîbûna dêûbavan . (نارەزايى دايک و باوک)
Nerazîbûna dêûbavan û guhnedana fermanên wan, ew ji gunehên mezin e, ji ber ku ev yek li hemberê fermanên Xwedayî ye . (li Qur'anê, 17: 23 binhêrin).

عقيقة 'eqîqeh : aqêgeh
Merasîma birrîna pora serê zarokê ku di wê rojê de bo zarokê navekî fermî tê dayîn. Ev rêûresm ji bo mebesta pîrozkirina dayikbûna zarokekî ye. Ev Merasîm bi gelemperî di nava heft rojan de piştî dayikbûnê pêk tê. Berxek dikare were serjêkirin û goştê wî were belav kirin, an jî komek mirov beşdarî xwarinê bibe.

عقل (عقول) 'eqil ('uqûl)
Ev jêhatîbûna fikirîn û ramînê nîşan dide.

عَلامات النُبوّة 'elamat an-nubuwweh : nîşanên Pêxemberîtiyê
Nîşanên ku îspat dikin ku ew kes Pêxemberê rastîn ê Xwedê ye.

عَلامات الساعة 'elamat as-sa'eh : nîşanên Roja Vejînê
Nîşanên nêzbûna Roja Qiyametê, yek ji Nîşanên wanên herî mezin hilatina rojê ji Rojavayê.

عِلّة (عِلل) 'illeh (kom. 'ilel) : sedem . (هۆكار)
Sedema ku li pişt ferman an biryareka taybet disekine.

عِلم الأصول 'ilm al-uṡûl : zanistî kokê
Bi gelemperî ev yek behsa " ilm uṡûl al-fiqh "(" Prensîbnasîya dadrêsî ") dike ku ew qadek lêpirsîna taybet e ku prensîbên têgihiştinê û derxistina qaîdeyên têkildarî aliyên cihêreng ên olî, dixwîne.

عِلم التجويد 'ilm at-tejwîd : zanistiya xwendina Quranê / fonetîka Qur 'an
Zanistê ku qaîdeyên xwendina rastîn a Qur'anê lêkolîn dike, tevlî bilêvkirina dengan, dirêjkirina dengdêran.

عِلم التَوحيد 'ilm at-tewḥîd : Xwedênasî
Mijarên ku bi Xwedê û taybetmendiyên Wî re û mijarên din ên baweriyê ve girêdayî ne, şîrove dike wekî bawerîya bi Axretê û nedîtî ... hwd.

عِلم الحَديث 'ilm al-ḥedîŝ : zanistiya hedisê
Zanista ku rêgezên belgekirina nivîsara hedîsê dixwêne, wekî nirxandina vebêjan, zincîra vegotinê, û awayên veguhastinê(lêkolîn dike).

عِلم الفرائض 'ilm al-fera'iḍ : zanista mîrasê
Zanistîya ku bi şêwazên belavkirina mîrasê û hejmartina parve kirina mîratên cûda li gorî Quranê lêkolîn dike.

عِلم الفِقه 'ilm al-fiqh : zanistiya dadrêsiyê
Cihê(cêga, cîsînorkirina)zanînê ku bi mijarên îbadet û danûstendinên wê re mijûl dibe.

عِلم الفِراسة 'ilm al-firaseh
Ew bi wateya dadmendkirina karakterê mirovî bi rêya xwendina taybetmendiyên laşî re.

علم الكلام 'ilm al-kelam : axftinanasî . (زانستى ئاخاوتن)
Di warê mantiq û felsefeyê de Xwedê nasîyê (teolojiyê) dixwînin.

zanîna(bawerîya) piştrast : **‘ilm al-yeqîn عِلم اليَقين**

Mirov dikare xwe bighîne bawerîya piştrast bi rêya çavdêrî û dakêşandina mantiqî re.

(سكۆلاريزم) . zanistî : **‘ilmaniyeh عِلمانية**

Redkirina desthilatdarîya olî di jiyana me de.

‘elayhî uś-śalat was-salam : عليه الصَّلاة والسلام

Nimêj û silavên Xwedê lê be û bereket li wî be

Bi gelemperî ji bo pêxember Muhemmed (Xwedê wî pîroz bike û aramîyê bide wî) tê gotin, wekî gotinka pîrozbûnê.

silava Xwedê li ser wî be **:‘elayhî s-salam عليه السلام**

Ev gotin di dema bîranîna navê melekek ji melekan, an pêxemberek ji pêxemberên Xwedayê mezin, tê gotin.

zana **:‘elîm (al-) العَليم**

Taybetmendîya xwedayî. Ew kesê ku her tiştî dizane.

(بەرزتر) **.** bilind **:‘eliyî (al-)العَليّ**

Taybetmendîya xwedayî. Yê ku ji her kesî û her tiştî bilindtir e.

Umer Ibn Al-xettab عُمَر بن الخطاب

Ew xelifa duyemîn ji çar "xelîfeyên ar- Raşidîn" e.Omer bi edalet û hêza xwe, û redkirina xwe ji tawîzbarkirina hînkirinên Islamê bi her awayî navdar bû. Ew ji sala(13êH heta 23ê H) Xelîfa bû. Wî xwest ji bo Xwedê li Medînê şehîd bibe, û daxwaziya wî hatîye perjrandin ku ew di Mizgefta Pêxember de hatîye kuştin.

heca piçûk **:‘umreh عُمرة**

Heca piçûk tê wê wateyê ku mirov dikare bi cilên hecê "tewafê" li dora Ke'behê bike û mirov dikare vê heca piçûk di navbera Sefa û Merwehê de, di her wextê salê de bike .

kefî . dismal . tûrban : **‘imameh (kom. 'ema'im) (عمائم)عِمامة**

Parçeyekî qumaş e mirov wê li dora serê datîne.

(كار) kar **: ‘emel (kom. ‘emal)(أعمال) عَمل**

Her karê(tiştê) ku yek dike. Ev yek ji bo gotin û ramanên wî jî tê bikaranîn.

karên hestyarî **: ‘emel (kom: ‘amal) aj-jewariḫ الجوارح (أعمال)عمل**

karên bêje **:‘emel al-lisan (kom. ‘amal al-lisan) اللسان (أعمال) عَمل**

Tiştên ku yek wan dibêje.

karên mejî(dil) **:‘emel al-qalb (kom. a'mal al-qulûb) (أعمال القلوب)عَمل القلب**

Wek raman û mebest.

dapîroşk**: ‘enkebût عنكبوت**

Di dema ku Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) û Ebû Bekir (Xwedê jê razî be) xwe ji Qurayşîyan di şikefta Sorê de vedişartin, dapîroşkê(pîrê) torek(tevnek) li ser serê wê (şikefta Sorê) li ser rêçika Medîneyê çêkirîye . li Sura 29-ê a Qurana Pîroz binhêrin.

sûreya dapîroşkê **: ‘enkebût (sûret al-) سُورَة العَنكبوت**

Ev sûreya 29-ê ya Qur'ana pîroz e, ku ew ji tora dapîroşkê tê ku çawa gawer li parastinê li nik hevalbendên (hevparên) xwe bêyî Xwedê digerin. Lê xaniyên herî kevn li nik

wan(gawiran), ew xaniyên ku dapîroşkê(pîrê) tevna(tora) xwe di wan de çêkirîye. Ayet hene ku bingehên diyaloga Islamî bi(digel) Xiristiyan û Cihûyan diyar dikin.

bêhêzî . bêçaretî : **'unneh عُنّة**

Neçarbûna (nekarîna) mêr di têkiliya zayendî de. Mafê jinê heye ku daxwazîya berdanê bike.

bêçare : **'innîn عنين**

Bêçare. Ew zilamê ku nikare têkiliya zayendî(cinsî) bike, nemaze ji ber lawazbûna endamê nêrzayî(kîr), û li vir mafê jinê heye ku bi fermî(şa'arî) berdanê bixwaze.

peyman . soz **: 'ehid (tek. 'uhûd)(عهود) عهد**

Sozek yekta. ew carinan dibe ku bi wateya peymaneka dualî be.

peyman **:'uhûd we mewaŝîq عُهود ومَواثيق**

Soz û peymanên pejirandî, ew bi gelemperî bi nivîskî ne(têne danîn).

kêmasî **: 'ewrat (tek. 'ewreh) (عورة) عورات**

Ew ji bo destnîşankirina kêmasiyan an qelsîya ku kesek ji kesên din vedişêre tê.

(ئۆرا " ئاورات"). parçeyên jirîn **: 'ewreh (kom. 'ewrat)(عورات) عورة**

Parçeyekî laşê ku nabe mirov wî bibîne; Ji ber vê yekê ew divê di nava gel de were veşartin. Ji bo mêrza, ew cih dikeve di navbera navik û çokan (kebok)de. Ji bo mêza(jinan), divê tevaviya laşê wê li pêşberî biyanîyan ji bilî rû û destan, bê veşartin.

serdana nexweşan : **'iyadet al-merîḍ عيادة المريض**

Di dema ku musilmanek serdanîya nexweşkî bike, ew bo wî wekî karekî xêrxwazîyê tê dîtin.

cejn : **'eid العيـــد**

Di Islamê de du cejnên sereke hene: Cejna Remezanê û Cejna Qurbanê.

(جەژنی قوربان) **.** cejna qurbanê **: 'eid al-aḍḥa عيد الأضحى**

Cejneke çar-rojî ye ku rêûresmên Hecê temam dike û di deh û yazdehê Zu al-Hicceh) de pêk tê. 10-ê roja gorandinê ye û 11-ê-13-ê rojên Teşriqê ne. Wateya wê ya rastî "cejnê qurbanê" ye. Ev cejn bi bîr û bawerîya Pêxember Ibrahîm bû ye ku ew ji bo Xwedê amade bû ku kurê xwe yê yekane Ismaîl qurban bike, aşîtî li ser herduyan be. Li Qurana Pîroz binêrin, As-Seffat (37: 100-103).

(جەژنی ڕەمەزان) . cejna remezanê **: 'eid al-fiṭr عيد الفطـــر**

Cejna Remezanê ji hêla musilmanan ve tê piştî meha Remezanê bi pesnkirina Xwedayê mezin tê pîroz kirin. Ew dikeve di roja yekem a meha şewwalê de, meha dehemîn a salnameya heyvê(hicrî). di sê-rojan de tê pîroz kirin.

Îsa kurê Meryem : **'îsa ibn meryem عيسى بن مريم**

Pêxember Îssa (silava Xwedê li ser wî be). Di Qur'anê de gelek nişan hene ku ew wekî mûcîzê ji dayikbûye (3: 45-47; 19: 16-30), (3: 49), û hewla xaçkirinê (4: 157), pêşdîtina wî li ser hatina Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê li ser wî be).

piştrastîya bêkêmasî **: 'eyn al-yeqîn عين اليَقين**

Piştrastbûna mûtleq. Astê piştrastbûnê ye ku dihêle mirov bi rêya nîşanên diyarkirî bawerîya xwe bike di cih de .

(غ)

şikefta Sewr : **ẍar ŝewr غار ثور**

Ew Şikefta ku Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be.) xwe digel hevalê xwe Ebû Bekir di dema koçkirina xwe de ji Mekkê ta Medinê, veşartibû. (li Qur-anê, 9: 40 binihêrin).

şikefta Hira' **: ẍar ḥira' غار حرّاء**

Ev Şikeft dikeve di çiyayê di "jebel an-nur" (= Çiyayê Ronahiyê) de ku Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) berê Islamê seredana wê dikir da ku bifikire.

kesê di deyn de **: ẍarim (kom. ẍarimûn) (غارمون) غارم**

Kesê di deyn de mayî, çi ji ber deyn be an ji ber ku ew mecbûr e ku mûçeyên xwînê bide, wek mînak kesê wusa heq dike ku xêrxwaziyê bistîne.

şerê ji bo sedema ola Xwedê **: ẍaz(in) (kom, ẍuzah) (غُزاة) غاز**

Beşdarîbûn di şerekê pîroz de li dijî dijminên Islamê li ser axa bawermendan.

Roja Qiyametê **: ẍaşiyeh (sûret al-) سُورَة الغاشية**

Ev Sûreya 88ê(an) a Qur'anê ye sernavê xwe ji têgehek di ayeta yekem de digire û behsa Roja Qiyametê dike. Wate "ẍaşiyeh"ê tûnik û sergir (veşartek), ji tirsa bûyer û dîmenên wan. Wêneyek ji rewşên bawermend û kafiran di wê rojê de tê dayîn (Jimar 2-16). Mirov di ayetên 17-20ê de ecêbên afirandina xwe, deveh, asîman, çiya û erdê li bîra xwe tîre.

sûreya bexşînê **: ẍafir (sûret -) سُورَة غافِر**

Ev Sûreya 40ê-(an) a Quranê ye, sernavê wê ji peyva ku di serê ayeta 3ê de hatîye girtin, di vê sûreyê de berhevdana çarenûsa bawermendan mijarek sereke ye bi yên ne bawermend re û dîmen li ser roja vijînê jî hene.

(بێ ئاگا) . nezanîn , bê hemd **: ẍafil (kom. ẍafilûn) (غافلون) غافِل**

Bi gelemperî, kesek ku heyê wî ji derdora wî tûne ye/wê nezan e. Lê bi gelemperî ew ji bo erkên xwe li pêşiya xwedayê xwe paşguh dike tête bikar anîn . (li "ẍefleh" û Quranê binêrin, 7: 205.)

(زیادەڕەوی) . zêdegavkirin **: ẍala (yuẍalî) (يغالي) غالى**

Di derbarê tiştekî de zêde dike, çi bi bawerî be û çi bi çalakîyê be.(li "ẍuluw" binihêrin).

(فریودەر) . xapandin, xapînok **: ẍebn غبن**

Danûstendina sextekar, wek firotina tiştekî sexte(kêm), bêyî razîbûna kirînger. Ji kirînger re tê gotin "meẍbûn".

(خیانەت) . xiyanet **: ẍedr غدر**

Mînak, kuştina kesekî ji pişt wî ve an bêyî ku wî hişyar bike an xayînetê bi kesê ku ji wî bawer dike, bike.

gargilandina mirinê **: ẍerẍerat al-mewt غَرغَرة الموت**

Dema ku giyan ji laş derdikeve. Di wê demê de tobetî ji guneh û kafirê nayê pejirandin.

الغَّرور (al-) ẍerûr : xapandin . (بۆ فریودان)
Di Qur'anê de ew bi gelemperî bi wateya xapandin û sozên derewîn tê. (li Quranê, 4: 120 binêrin).
Xapandin di Qur'anê de ji bo mirovên ku xapandin dikin û sozên derewîn didin tête bikar anîn. Di Quranê de ew ji kesên herî xapînok, şeytan tête vegotin, Ji ber ku ew mirovan bi taybetî bi sozên derewîn ve dixapînin ku ew dihêlin ku mirov gunehan bike û kiryarên çewt bike. (Li Qur'anê binêrin, 31: 33)

غريم(ج: غريمون) : ẍerîm (kom: ẍerîmûn
Deyndarek ku perê wî tûne ye ku deynê xwe bide. Deyndarek yek ji wan heşt koman e ku di Quranê de wekî wergirên ên zekatê hatine destnîşan kirin..

غَزوة ẍezweh : şer . bêşvekirin
Bi gelemperî ev peyv qala kampanîyekî an şerekî ku di bin serokatîya Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) hatîye meşan din, dike. Ev yek berevajî "hemleh: kampanîyê" ye ku kesek din pêşengîya wê bike.

غَزوة الأحزاب ẍezwet al-aḥzab: şerê qebîleyan (hevalbendan)
.Ev şer yek ji şerên herî metirsîdar bû di destpêka dîroka Islamî de, ku di sala pêncemîn de piştî Hicrê pêk hatîye. Qur'an di sûreya bi navê "Al-Ahzab" de behsa vî şerî dike (33: 9-25). Di heman demê de wekî "şerê Xendeqê" jî tê zanîn.

غزوة بدر ẍezwet bedr : şerê bedrê
Yekem şer di dîroka îslamî de di navbera Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be), û musilmanan de (nêzî 300ê) li dijî butperestîyên Mekkê (zêdetirî 1 000î)rûda ye, ku musilman bi serkefetî wî şerî derbas dikin, di wî şerî de gelek serokên Quraiş hatin kuştin û girtin. Vî şerî di roja hevdehem de ji meha Remezanê, sala duyemîn a Hîcrê, dest pê kirîye.

غزوة بني قينقاع ẍezwet benî qeynuqa' : şerê dijî Benî Qeynuqa‘
Bani Qeynuqa eşîrek ji eşîrên Cihûya a herî dawî ye ku ji Medînê hatîye derxistin; ji ber fişara(tacîza) wan a ku li ser Musilmanan çêdikirin û binpêkirina wan a hevpeymana aşîtîyê bi Pêxemberê Islamê re. Ew li cihekî li ser sînorên Bakurê Erebistanê bicîh bûne.

غزوة بني قريظة ẍezawet benî qureyżeh : şerê li dijî Benî Qureyzeh
Ev kampanya li dijî eşîra Cihûyan ya ku razî bû ku Medîneyê bi Musilmanan re li dijî yên derve, biparêze, lê dema ku bajar hate dorpêç kirin, vê eşîrê biryar da ku bi dijmin re li dijî hevalbendên xwe yên berê re, şer bikin(bisekinin). Kampanîya piştî Hijrayê di sala 5ê de pêk hatîye. (li Qur-anê, 33: 9-26-7binihêrin)

غزوة بني نضير ẍezwet benî neḍîr : şerê dijî Benî nedîr
Kampanîya li dijî eşîra Cihûyan a li Medîneyê ku bi pûtparêzan re li dijî Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) û musilmanan komplo dikirin, bi vê yekê wan peymana aşîtîyê binpê kirîye ku ew berevajî bibe. Loma ew ji Medînê têne derxistin.

غَزوة تَبوك ẍezwet tebûk : şerê Tabût
Kampanîya ku di havîna sala nehê ji Hicriyê de hatîye çêkirin ; li ser sînorên başûrê rojavayê Sûrî yê di bin serokatiya Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) de bi rêvê çûye. Wî bihîst ku Bîzantiyan artêşeka mezin kom kirine da ku bi musilmanan re şer

bikin, Ew bi nobedarîyeke mezin ber bi Tabukê ve çûne, lê ew bi awayekî aşîtiyane şûnde vedigerin, ji ber ku hêzên dijmin xuya nekirin, loma wan xwe şûnde vekişandîye.

şerê huneyn : **ẍezwet ḥuneyn غَزوة حُنين**

Şerê ku li Huneynê (nêzîkê Mekkeyê) di navbera musilmanan bi pêşengîya Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) û pûtparêzan de di sala heştemîn a Hicrê de pêk hatîye. Cara yekem, arteşa îslamî ji arteşa dijmin mezintir bû, lê ew dikevin kemîneka danayî de û di destpêkê de ew têk çûne. Lê di dawîyê de ew bi serdikevin. (li Qur 'anê, 9: 25-26 binêrin).

şerê kortikan : **ẍezwet al-xendeq غَزوة الخَندق**

Şerê ku di sala pêncemîn a Hîrce de qewimî ye. Wusa tête gotin ji ber ku cara yekem di dîroka Erebî de xendek ji hêla Muslimanan ve hatine pêşniyar kirin, ev yek li ser pêşnîyara Selman Al-Farisi çê dibe, da ku Medinê ji êrîşa pûtparêzan biparêze, û li pêşketina kafiran biseknîne. Dijmin bi vê taktîkê hatîyê sekinandin. Jê re êrişa (Ahzab: Eşîran) tê gotin. Li Qurana Pîroz binêrin, An-Nur (24): 55, Al-Ahzab (33): 9-20.

şerê Xeyber : **ẍezwet Xeyber غزوة خيبر**

Bajarekî navdara li bakûrê Medînê. Ew cihê ku şer û pevçûneka mezin di navbera musilman û cihûyan de çêbû bû. Serkeftina Musilmanan li Xeybarê hakimdarîya Cihûyan li nîvgirava Erebî bi sedsalan ji holê hildiweşîne (li Qur’ana Pîroz an, Al-A hzab (33): 27 binhêrin).

şerê Mûteh : **ẍezwet mu'teh غَزوة مُؤتة**

Şanda ku ji hêla Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) ve ji bo bakurê rojavayê Erebistanê di sala heştemîn a Hicreh de hatîye şandin, da ku şer bi Bizantiyan re bike; ji ber wan nûner ê musilmanan kuştibû. Dibe ku ev tenê navê kampanîya bi navê "ẍezweh" hildigire, ji ber ev şer ne bi fermandarîya rasterast a Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) pêkhatîye.

(شوشتن) . şuştin : **ẍusl غُسل**

Şuştina tevahîya laş. Ev yek di rewşa necaseta mezind de ("hedes akber") tê xwestin, wek mînak ku mirov piştî têkiliya cinsî an mehane(kince) xwe bişû, ji bo ku yek bikare nimêjê bike.

girtina bi zorê(neqanûnî) : **ẍeṡb غَصب**

Destserkirina ne zegonî ji bo birina tiştekî bi zorê.

(فیڵکردنی خەڵک) . sextekarîya gel : **ẍişş ar-re‘îyeh غِشّ الرعيَّة**

Serwerê xapînok çawa bi mirovên ku di bin serwerîya wî de ye dixapîne.

nizm kirina çav : **ẍeḍḍ al-beśer غَضّ البَصَر**

Bi çavekî kêm, li mirova temaşe neke. Ji bawermendan tê xwestin ku çavên xwe nizm bikin, bi taybetî di hebûna zayenda mêza de. Ji bo şermê. (li Quranê, 24: 30-31 binêrin).

lêborînbarî : **ẍeffar (al-) الغَفّار**

Taybetmendîya xwedayî. Lêborîn û bexşîn li nik Xwedê bê sînorê.

(لێخۆشبوون). herî bexşîn : **ẍefûr (al-) الغفور**

Taybetmendîya xwedayî. Yê ku lêborina gunehkaran qebul dike û bexşîna wî bê sînor e.

(بێ ئاگایی) . nezanîn : **ẍefleh غَفلة**

Xemsarîya bê mebest an jî bîrkirin, Xwedayê mezin li me temaşe dike.

egerîya mezintir : **ẍelbet aż-żenn غَلبة الظَّن**
Nîşanên bi hêztir ji bo bercewendîyên hinik raman an hukim(bihêztir in).

tundrew (tundrês) : **ẍulat غُلاة**
Mirovên ku bi nêrînên tundrew bawer dikin an jî alîkarîya wan dikin, nemaze li ser mijarên olî .

bingehparêzî . tundî : **ẍuluww غلوّ**
Tundbûn di mijarên olî de jî di Islamê de şermezar dikin. Hişyarîya li dijî tundrewîyê di olê de hem di Qur’ana Pîroz de, û hem jî di çend hedîsên Pêxember de hatîye îspat kirin. Ji nav van delîlan .

قال تعالى :(يَا أَهْلَ الْكِتَابِ لاَ تَغْلُواْ فِي دِينِكُمْ وَلاَ تَقُولُواْ عَلَى اللّهِ إِلاَّ الْحَقِّ) [النساء: 171]
Xweda ji Gelê Pirtûkan re her gotîye : di ola xwe tund nebin û li ser Xwedê ji bilî rastîyê.(Sura 4: 11711)nebêjin.
Pêxember(bereket û aştî li ser wî be), her weha hişyarî daye li hemberê zêdegavîyê, û gotîye çarenûsa tundrewan di berê de û her demî de her hilweşandin e.
Gotina Resûlê Xude (silavên Xude lê be) wekî di Hedîsa Îbnî Ebbas de ye:
(إِيَّاكُمْ وَالْغُلُوَّ فِي الدِّينِ؛ فَإِنَّمَا أَهْلَكَ مَنْ كَانَ قَبْلَكُمُ الْغُلُوُّ فِي الدِّينِ) رواه ابن ماجه وصححه الألباني، وذكر عَلَيْهِ الصَّلاة وَالسَّلاَمُ عاقبةَ الغالين في الدينِ: (هَلَكَ الْمُتَنَطِّعُونَ؛ هَلَكَ الْمُتَنَطِّعُونَ؛ هَلَكَ الْمُتَنَطِّعُونَ). (رواه مسلم).

diziya destkeftiyan(xenîmetan) : **ẍulûl غُلول**
Her tiştê ku ji xenîmeta şer tê girtin(derxînin) , berî ku ew bi fermî ji hêla kesê berpirsiyar ve bête belavkirin, ew sûcek mezin tête hesibandin. (li Qur'anê, 3: 151 binêrin).

pozkirin : **ẍunneh غنّة**
Hilberîna deng bi rêya bêvilê(poz) re , wek bilêvkirina /m/,/n/.

xweşbîn . xwe têr kirin : **ẍina an-nefs غِنى النَّفس**
Bi wateya dewlemendîya zatî an têrbûn.

(دەوڵەمەند) . dewlemendî : **ẍenîy (al-) الغَني**
xweseriya xwebawerî . Taybetmendîya Xwedayî. Ew kesê ku pêdevîya wî bi ti kesî tûne ye. (Li Qur'anê binêrin, 6: 133.)

(xenîmet) talankirinê şerê : **ẍenîm (kom. ẍana'im) (غنائم) غَنيمة**
Talanên şer. Talanîya ku di şerekî yasayî de tête qezenc kirin .

nedîtî : **ẍeyb (kom. ẍuyûb) (غُيوب) غَيب**
Nedîtî tiştekî ku nayê dîtin, nemze di paşerojê de. Ango, haya ti mirovî ji nedîtinê tûne ye(nediyar). Tenê Xwedayê mezin bi wê dizane. Li Qurana Pîroz, Al-Beqereh (2): 3 binêrin .

paşgotinî (gotinên di pişt de) : **ẍîbeh غِيبة**
Nabe ku mirov di tunebûna Musilmanekî de tiştekî xirab bêje, her çend rast be jî. Ev yek di Qurana pîroz de qedexe ye. (li 49: 12)binêre.
Heke tiştê ku hatîye gotin derewîn be, ev gunehekî mezin e, ji ber ku ew di wê hingê de dibe dijmînayî .

غَيبَة الإمام **ẍeybet al-'imam :** (windabûn, nebûn, tunebûn) imamê

Bawerîya Şyî ya ku wendabûna îmamê diwanzdehê: El-Mehdî demekî dibînin ku ew di rojên paş de dê xuya bike.

غَيرة **ẍeyreh :** ekêşî . çav neberî

Zikreşî(çavnebarî)ya li hember kesên din û milkê wan. Her weha ev yek ji bo hişmendî an hestê parastinê jî ji bo xizmên tête bikaranîn.

غَيظ **ẍeyż :** hêrs . (تووڕەیی)

Rewşa bi hers.

(ف)

fey' فئ

Talankirina(xenîmet) bêyî şer.

ji bîr kirin : **fate (yefût) فات (يفوت)**

Wî tiştek bêriya kir, derbas kir an winda kir. Bi wata "Min nimêja nîvro winda kir" , tê.

sûreya vekirinê : **fatiḥeh (al-) الفاتحة**

Sûreya yekminê di Qurana Pîroz de . "Fatihet al-kitab" bibînin.

sûreya vekirinê : **fatiḥeh (sûret al-)سُورَة الفاتِحة**

Ev navê sûreya yekem a Quranê ye ku ji heft ayetan pêk tê, Besmelah jî tê de. Sûre bi pesn û spaskirina Xwedê dest pê dike, dûv re tenê parastina Xwedê tê pejirandin û tenê ji wî alîkarîyê dixwaze, dûv re li ser rêya rast rêberiyê dixwaze.

Ev sûreya Qur'anê ya ku herî zêde tê xwendin e, lewra divê Misliman wê di her nimêjê de - rojane herî kêm 17 carî bixwîne - û Musilman bi gelemperî ji bo bereketên wê di rewşên cûrbecûr de dixwînin, di pir caran de, wekî girtina lihevhatinekî(rêkeftinekî)wekî zewacê.

(ليبێرتين) . pîs . puşt : **fajir (kom. fujjar) فاجِر (فُجّار)**

Kesê pîs, ew kesê ku ji tikesî re rêzik û rêgezeka exlaqî nagire.

pîvanok : **farûq (al-) الفاروق**

Ev Paşnav ji bo Omar bin Al-Xettab(Xwedê jê razî be), xelîfeyê duyemîn re hatîye dayîn. Wateya vê peyvê ew e ku kesê qenc û xirab an rast û nerast ji hev cuda dike, û rastîyê û derewê ji hev vediqetîne.

(گەندەڵی). na pak : **fasid فاسِد**

Ne baş e. ji ber ku hin pêdiviyên bingehîn pêk nehatin.

çepal : **fasiq فاسِق**

Gunehkar, bêbawer. Kesê pênebawer. Genîyê(xirabkarê) ku şahidîya wî di dadgeha îslamî de nayê pejirandin.

Fatimeh فاطمة

Keça Pêxemberê pîroz, Xwedê wê pîroz bike û aramiyê bide wê. Ew yek ji wan bawermendên ciyawaze ku Xwedê ew daye(afirandîye).

Faţimiyun(al-) الفاطميون

Komeka îslamîyê ku îdîa dike ku ew ji nijada Fatimayê (keça Pêxember, Xwedê jê razî be, û silavê li ser wî be) .

sûreya afirînerê xuliqî : **faţir (sûret)سُورَة فاطِر**

Ev Sûreya 35emîn a Quranê ye, ku ji ayeta yekemîn ji sernavê wê hatîye wergirtin. Mijara domdar ya vê Sûreyê, sirên afirînerîyê û bextewarîyên mezin e ku mirov di vê dinyayê de kêfê dikin, û tekez dikin ku Xwedê Xwedayê her kesîye(hemûya ye).

pêşbîna baş : **fa'il ḥesen فأل حسن**

Bi wateya xweşbînîyê tê, Islam şopindarên xwe teşwîq dike ku ji mizgînîyê bawer bikin

sûreya serketinê **: feth̩ (sûret al-) سُورَة الفَتح**

Ev Sûrta 48ê ye, navê xwe ji peyva ku du caran (bi formên devkî û navgîneyî) di ayeta yekan de tê, digire, "Bi rastî, me ji we re Serkeftinek eşkere kirîye." Li vir referans li ser "SulH al-Hudaybiyyah" ("Peymana Hudeybiyeh") ye ku di navbera Pêxember Muhemmed (Xwedê wî pîroz bike û aştiyê bide wî) û eşîra Mekkan ya Quraiş de hatîye encamdan. Her çend şertên peymanê ji Mekkiyan re maqûltir xuya dikir, di rastiyê de ew ji bo Islam û musilmanan serketineka eşkere bû.

vekirîya bilind **: fettah̩ (al-) الفَتّاح**

Taybetmendîya Xwedayî. Ya ku deriyên giyanên xwe, dilovanî û serfirazî ji bo xulamên xwe vedike. Ev gotinê dikare bi wateya 'Dadgerê Bilind' jî be. (Li Quranê binihêrin, 34: 26.)

vekirina xeyber **: feth̩ xeyber فَتح خَيبر**

Pêxember Muhemmed(nimêj û silavên Xwedê lê be), û hevalên wî (Xwedê ji wan razî be) ketin keleha xeyber, bakurê Medîneyê.

"serkeftina eşkere(xuyê)**: feth̩ al- mubîn فتح المبين**

Li vir serkeftina aşkera di çerçuva peymanê aşitiyê ya Hudeibiyehê de diyar e. Ew yek ji serfirazîyên herî mezin ên umeta Islamê ya ku di demekî nedûr de peyda bûbû, ye. Di despêkê de dihat diyar kirin ku Musilmanan wî şerî winda dikin, lê di rastîyê de wan li ser daxwazîya Xwedayê mezin karîbûn bi vê wesîleyê xweragirtineka mezin biafirînin. (Li Qurana Pîroz, Sûr Al-Fath 48 binêrin).

vekirina Mekkeyê **: feth̩ Mekkeh فتح مكّة**

Serkeftina Mekkeyê, Hatina Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) û hevalên wî (musliman) li Mekkeyê di sala heştemîn a Hiccrî de./630 z / de Mekkê vedikin.

serkeftinên Islamî **: futûh̩ (at) (tek. feth̩) (فَتح) فُتوح**

Ev term ji bo mebesta tomarkirina dîroka Islamî tête bikaranîn ku behsa şerên cûrbecûr dike ku Musilmanan erdên ne-muslimanan bi dest xwe xistine.

xapînok. xefik. ceribandin **: fiten (tek. fitneh) (فتنة) فِتَن**

1-Tengahîya olî(Şopketin)Ku kesek tengahîyê bike (bi şewitandin) Ji ber baweriyên wî yên olî . (li mînaka. 2: 192 û 193 binihêrin).

2-Ceribandin: Xapandina tiştekî çewt. An jî dibe ku bawermend ji peywirên wî dûr bikevin an wî ber bi gunehan ve bibin. (Li Qur'an, 8: 28 binêrin).

3-Êş, ceribandin: Di dema ku tiştek baş an xirab bi kesekî re diqewime, ew tenê bi di çarçuveya Xwedê de tê ku çawa Xwedê bawermendan di karesatan de ceribandî ye. (Li Quranê, 21: 35 binêrin).

4-Lihevnekirin (veqetandin) û serhildan: (Li Qur'anê, 9: 47 û 48 binêrin).

nêrîna qanûnî **: fetwa فَتوى**

Biryareka qanûnî ye ku li ser bingeha olî li gorî qanûna Islamî ku ji hêla zanyarekî Islamî ve an Desteya Çavdêriya fermî(şe'erî) ve hatîye derxistin. Çavkanîyên ku destura bingeha fîtawî didin, Qur'ana Pîroz, Sahih Buxari û Musilman û hemî Ahadîsyên din, ên ku jê hatine belgekirin, in.

(فەجر) . rojbûn : **fejr (al-) الفَجِر**

Dema ku ronahîya yekem li rojhilatê xuya dike, bi gelemperî li dora saet û nîvê berî hilatina rojê. Dema nimêja yekem a ferzdar e. Mirov dikare di her demê de di navbera ronahî ya yekem a sibehê de û hema berî hilatina rojê nimêje bike. Her weha jê re Subh tê gotin (Qurana Pîroz : 89).

sûreya rojbûnê **: fejr (sûret al-) سُورَة الفجِر**

Ev Sûreya 89ê a Quranê ye, sernavê xwe ji gotina yekem di ayeta yekem de distîne. Di vê surê de, em çarenûsa kesê hejar ji bo hin redkerên baweriyê tînin bîra xwe. (Ayetên 6-14). Di van ayetên jêrîn de (15-20), li derheqê hin bûyerên Roja Vejînê û çarenûsa kafir û bawermendan de dixwênin. Kafir dê poşman bibin ku karên qenc nakin. Lê ruhê kesê bawermend dê bi xweş û razî têkeve bihuştê(21-30)

rojbûna rastîn **: fejr (al-) aṡ-ṡadiq الفَجر الصادق**

Şikstina rastîn a rojê.

rojbûna derewîn **: fejr (al-) al-kaẓib الفَجر الكاذب**

Li rojhilatê hinik ronahî berî ya sibehê xuya dibe.

çepal (wek destavêtin) **:fujûr فُجُور**

şerm, kiryarên pîs **: feḥşa' فَحشاء**

azadkirrîn . (di depo yê da)**: fidyeh فدية**

1- Dayîna drav ji bo serbestberdana girtiyê şer.
2- Tezmînata ji bo kesên winda an pêkanîna îbadetê ferzeka çewt e. Fidya bi gelemperî bi bexşandina drav, xwarin, an qurbanîkirina ajalan çêdibe. (Li Qur'an, 2: 184 & 196. binihêrin).

(دۆشکە) . nivîn **: firaş (kom. furuş) (فُرُش) فِراش**

Ev gotin carinan ji bo xwediyê textê razanê(mêr)tête bikaranîn. Mînak, di hadîseyê de hatîye ku zaroka neqanûnî bi zagonî li ser mêrê dayekê tê hesbandin.

berferehî **: ferej فَرَج**

Berevajî tengahîyê. Piştî tengahîyê ferehî ye.

endemê zayendî **: ferj (kom. furûj)(فروج) فَرج**

Endemê zayendî ya nêrza an mêrza(jinê) ye, ew bi gelemperî ji hêla mêza ve tête bikaranîn .

Xwedê vê tengahîyê fireh bike(rajiyê)**: ferreje Allahu kurbeten فرّجَ الله كُربة**

Ev dua bi gelemperî ji bo kesê ku di rewşeka dijwar tê gotin(dibihîzin). ("Ferej" binihêrin).

bihuşt . cinnet **: firdews فردوَس**

Di hînkirinên Islamî de, firdews bi wateya "bihuştê" tê, ew cihek taybete di bihuştê. Ew peyveka Latînî ye û bi wateya baxçetê. (li Quranê, 18: 107 û 23:11 binihêrin).

fersex (kom. ferasix) (فراسِخ) فرسخ

Pîvaneke xetîye bi qasî 5544 metrî ye. Bi qasî sê mîlan e.

berpirsyarîya kesane **: ferḍ ‘eyn فَرض عَين**

Çalakîyeka şexsî ye. Ew kareka ku divê her musilman bike, wekî mînak rojê pênc caran nimêj bike.

ferz . mecbûrî : **(kom. furûḍ) (ferḍفُروض) فَرض**

Tê xwestin. Tiştekî ku Misliman divê bikin an çavdêrîya wê bikin, wek nimûne pênc nimêja, rojiyên Remezanê.

berdestîya civakê **: ferḍ kifeyeh فَرض كفاية**

Erkek civakî ye. Ew erkeka li ser tevahîya civakê; Lê heke ew ji hêla beşekî civakê ve bê kirin, wê hingê yên mayî pê nemecbûr in. Ger hinek endam wîya bikin, ew ê bes be. Ger yek jî neke wê hingê tevahîya civakê xelet e û gunehkar e. Mînak nimêja cenazê ye; gereka kesek wê bike.

parveya mîratê **: fera'iḍ (tek. ferîḍeh)(فرائض) فَريضة**

Dabeşkirina mecbûrî ya mîrasê. Belavkirina mîrasê di Qur'ana pîroz de hatîye destnîşankirin. Ji bo vê yekê di Islamê de zanistek heye, bi navê "ilm al-fera'iḍ " (zanistîya parvekirina mîrasê)

fer‘ el-'insan فرع الإنسان

Zarokû keça û kur an nijadek ji wan. Ev berevajî pêşdûdahîyê(pêşbazîyê) ye.

("لق " لقهكان). şax (ên)**: furû‘ (feru‘) (فَروع) فرع**

Di zanista prensîban de,ew tişteka ku li ser bingiha yekê din tê avakirin; Wek biryara li dijî bîrrayê li ser bingeha qedexekirina şerabê. Ew pir caran bi "'uśûl" (prensîp, bingih)an re tên berovajîkirin, ku ew bi wateya pirsgirêkên ku li ser wan prensîban têne avakirin, tê.

fir‘ewn فرعون

Di Qur'anê de, ew behsa hevdîtina Feraon bi rûbirûyî Pêxemberê Musa re dike. Ew wek nimûneyeka zordestî û bêbawerîyê tê hesibandin. (li Qur'ana pîroz, 10: 83 binihêrin).

mezheb (kom)**: firqeh (kom. fireq) (فِرَق) فِرقة**

Komeka ji kesên ku di bawerî û pêkanînên olî yên taybet de beşdar in.

pîvan **: furqan (al-) الفُرقان**

Yek ji taybetmendî an navên Qur'an ê ewe ku li gurî pîvanên Qanûnê biryar di derheqa çalakiyên mirovan têne standin. (li Quranê 25: 1 binêrin)

sûreya pîvanê **: furqan (sûret al-) سُورَة الفُرقان**

Ev sûreya 25ê ji Quranê ku sernavê xwe ji peyva "furqan" ('pîvan') di ayeta yekemîn a sûreyê de standîye. Bi zelalî serî li Qur'ana pîroz bidin, daku hun bi pîvanê bikarbin: tiştên çi baş û çi xirab, û rastî û nerastîyê jihev derbixin.

biyanî **: firinj (al-) / al-firinjeh (الفرنج)الفرنجة**

Di dîroka îslamî de, ev term îşaretê ji bo Ewropiyan hatîye bikaranîn.

qedandin, betalkirin . rizgar kirin . paşvexistin **: fesexe (yefsix) (يُفسخ) فسخ**

Betalkirina peymanê, an wekî betal tê hesibandin, ev yek li tiştên ku berî danûstandina peymanê hebbûne, vedigerin. Wekî peymana firotanê, an peymana zewacê.

xapandin an şaşkirin **: fesede (yufsid) (يُفسِد)فَسَد**

Di dema Ku tu bo kesekî xirab bibî an ji bo tiştan an kiryaran nesalih bî

gendelî **: fesad فساد**

Karên xerab dikin.

fesada kar **: fesad al‘-emel فَساد العَمَل**

Li "Fesede (yufsid)" binihêrin.

(خراپکاری) . gunehkarbûn : **fisq فِسق**

Tiştên qedexe kirî.

pîsbûn : **fusûq فُسُوق**

Li Qur'anê binihêrin, 2: 197 û 49: 7.

sûreya ayetên berfireh (ew eşkere ne)**: fuśśilet (sûret -) سُورَة فصِّلَت**

Ev Sûreya 41ê-a Quranê ye, sernavê xwe ji peyveka ku di ayeta 3ê ye de haye, distîne. Ayeta 53ê bi gelemperî bi behsa rastîya vedîtinên pêşerojê di derbarê afirandina mirov û gerdûnê de die(hebûna rast), ya Xwedê û hêzên wî.

cûdahî **: feḍilفَضل**

Tê zanîn ku Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê li wî be)di hedîsa xatirxwestinê gotîye: Ciyawazî di navbera Ereb û Ajaman de tune ye, tenê cudahî di nav wan de li gurî pîvana tirsa wan ji Xwedê.

xwezî û pîroz û spas **: feḍiI (kom. 'afḍal) (أفضال) فَضل**

(هذا من فضل ربي) Ev ji kerema Xwedayê(Rebbê) min e(Pêxember Silêman ev gotin kirîye) Qur'an 27:40). Pir caran tê gotin spasdarî ji bo bereketa taybet a Xwedê ye).

pir zêde **: feḍil (kom. fuḍûl) (فضول)فضل**

Zêdebûn ji hewcedarîya mirov

hêja **: feḍîlah(kom .feḍa'il) (فضائل) فَضيلة**

Qalîteyek baş.

rawestandina şîr **: fiṭam فِطام**

Rawestandina dana şîrê dayikê ji bo zaroka du salî.

hebûna(tevgera) xwezayî **: fiṭreh فِطرة**

Ev têgeh di "hedîsa" pêxemberî de hatîye dîtin ku di bêje her mirov li gurî xwezaya xwe, ji dayikê dibe .

îftarê (taştiya Remeznanê)**: feṭur فطور**

Di meha Remezanê de, xwarina ku mirov piştî rojavabûnê dixwe.

dadrêsîya îslamî **: fiqhفقه**

Fiqh an " ilm al-fiqh " li ser hemî warên jiyanê yên têkildar barwemendî û karûbarên(mua'amelên) jiyanê, dide berxwe. Ew bi wateya têgihiştina qanûna bingehîn ya şerîyayê Xwedê ye . Dibistanên cihêreng ên dadrêsiyê bi demê re di Islamê de pêşve diçin, û van dibistanan bi gelemperî nêrînên cûda di derheqê ka gelo çalakiyek taybetî di şerîyayê de tê destûrdan an na. Xwendin û pêkanîna van dîtinan xwendina fiqh nîşan dide.

dadperwerkirin **: feqqehe (yufeqqih) (يُفقّه) فَقّه**

Ji bo fêrkirin kesekî bike an jî jê re qala fêmkirinê bike, nemaze mijarên olî.

dadperwerîya bazirganî ya Islamî : **fiqih al-mu'emelat فقه المعاملات**

Qaîdeyên danûstendinê yên gencawî bi bendên qanûna îslamî re.

pisporê ramanê olê (dadmend)**: feqîh (fuqaha') (فقهاء) فقيه**

Zanyarekî ku pispore di lêkolînkirina qanûna Islamî de, yê ku bi darazên şerîetê dizane û ew dizane çawa rêzikên bi nivîsên çavkanîyê re yên liserpaldar e girêbide. Ew dikare ramanekî an fermaneka zagonî biderbixe.

(هەژار) . belengaz **feqir فقير**

Kesek hewcedar (belengaz) e nikare hewcedariyên xwe peyda bike.
Ew kesê ku hewcedar (belengaz) e ku nikare hewcedarîyên xwe peyda bike.

azadkirina xulam **: fekku reqebeh فَكُّ رقبة**

Serbestberdana koleyan ji zehmetî an deyn, ev yek ji kiryarên dilsozîya herî pêşniyarkirî ye. Ew Carcaran dibe bingeha lêborîna hin gunehan.

serkeftin . serfirazî **: felaḥ فلاح**

Bikaranîna giştî ya vê peyvê di vegotina banga nimêjê de ye: "Heyî 'ela al-felah حيّ على الفلاح, " ku ew bi wateya' : bi serfirazî bijî," yanî "bilezîne serfirazî tê. '(li vê dinyayê û li dawîya wê). Ji aliyekî olî ve, serfirazî bi wata " vê dinyayê û hermayî (jêr de)" tê. Al-Falih bawerîya xwe bi yek Xwedayî tîne. Serfirazîya rastîn di "emir kirina qencî û qedexekirina tiştê xerab de" ye.

sûreya tarîbûnê **: feleq (sûret al-) سُورَةَ الفَلَق**

Ev sûreya 113 a Qur'anê ye, ku sernavê xwe ji peyva di ayeta yekemîn de digire. Pêxemberê Xwedê (nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) pêşniyar kirîye ku hûn her du Mu`wezetin bixwînin ji bo dermankirin û parastinê ji her xerabîyê.

wenda kirina rekeyê **: fewat ar-rek'eh فوات الرَّكعة**

Di nimêja hevpar de, eger kesek ji "rek'eh"ê bimîne ew divê piştî ku imam "nimêja"xwe biqedîne, wê hingê ew dikare beşdarî komê bibe; piştî ku îmam serê xwe ji çokanê bilind bike.

zînabûn, zînayîn **: faḥişeh (kom. fewaḥiş) (فَاحشة) فَواحش**

1-Karê zayîndî karekî ne yasayê ji aliyê olê ve .
2-Karê şermê an şermezarîyê ye.

destûrkirin (nûner)**: fewweḍe (yufewwiḍ) 'amrehu أمره (يُفوّض) فَوَّض**

Pir caran em guhdarîya gotina: " fewweḍe 'amrehu ila l-lah ", dikin ku ev gotin bi wateya ku kesek doza xwe spartîye Xwedê dike an jî pirsgirêka xwe di destê Xwedê de hiştîye. (Li Qur'anê binêrin, 40: 44.)

ji bo ku (sedema Xuda) **fî sebîli- llah في سَبيل الله**

Ev wateyê di rêya Xuda de ye. Bi gelemperî îfade tê wateya her tiştek ji bo Xuda, bi taybetî "aj-jihad" hatiye kirin.

di tengahîyê û ferehîyê de : **fis-sera'i waḍ-ḍerra' في السرّاء والضرّاء**

Di bin her şert û mercan de. Em vê vegotinê di mînakên wekî bîranîna Xwedê de an peywirên ji bo Wî di bin her şert û mercî de dibînin. Ev tê vê wateyê ku mirov ji bîr nake ku behsa Xwedê bike, çi bextewar be an belengaz be.

sûreya fîl **: fîl (sûret al-) سُورَة الفيل**

Ev Sûreya 105ê ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji peyva di ayeta yekemîn de digire. Ew behsa Abreha al-Aşram, serkarê Yemenî yê Hebeşîstanê dike, ku ew xwedanê zor û fanatîzma olî bû, ku li hember Mekkeyê xwedan ezmûnek mezin bû ku armanca wî tunekirina Kebeyê bû. Lê, wekî ku Abdul-Muttelib bapîrê Pêxember Muhemmed gotibû, "Mala (Ke‘beyê) xwedayê xwe heye ku wî diparêze." Xwedê Mala Pîroz biparêze, û bi rengek baş hêzên dagirker têk dibe. Balkêş e ku mirov bibîne ku di"Sala Fîlan" de(wekî ku Ereb jê re dibêjin 570); ango di heman salê de pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ji dayîk bû ye.

di bin her şeret û mercan de **: fil-menşeţi wel-mekreh في المَنشَطِ والمَكرَه**

Em vê vegotinê di mînakên wekî bîranîna Xwedê an peywirên Wî de di bin her şert û mercî de dibînin. Ev tê vê wateyê ku divê mirov jibîr neke ku behsa Xwedê bike, çi bextewar be û çi belengaz be. Di heman demê de ew di mijara pabendbûna serwerê Musilman de di mijarên hînkirinên Islamê de lihevhatî tê dîtin.

(ق)

bijartin **: qabiḍ (al-) القابِض**
Taybetmendiyek Xwedayî ye .Ew kesê ku dev ji her tiştê ku ew jê hez dike, an yê ku jiyanê digire.

: Qabîl قابيل
Kurê Adem e û birayê Habîl e, yê ku ew kuştîye.

dadmend **: qaḍî (kom. quḍat) (قُضاة) قاض**
Niha, em gotina "qadî şer'iy" dibihîzin, ew bi wateya dadvanek li gorî qanûna îslamîtê. Lê di dîroka îslamî de, peyv bixwe bi wateya dadrêsek tê .

(بەتوانا). karîndar **: qadir (al-) القادِر**
Taybetmendîyek Xwedayî ye. Tiwana (hêzya) mezin a bê sînor.

("خوێنەران" خوێنە) . xwendevan . xwîner **: qari' (kom. qurra') (قُرّاء) قارِئ**
Kesê ku Qur'anê bi rêk û pêk dixwêne, bi gelemperî wê"hafiz"ezber dike (ew Quranê bi dil dizane, li gorî rêgezên tejwîdê).

sûreya bûyera dijwar **: qari‘eh (sûret al-) سُورَة القارِعة**
Ev sûreya 101-ê ya Quranê ye, ku sernavê xwe ji peyva yekem digire, du caran dubare kiryê û behsa Roja Vejînê dike. Di vê sûreyê de em dikarin hin bûyerên wê rojê (ayetên 4-5) pêşbîn bikin (ayetên 4-5). Dûv re em di derheqê du çînên sereke yên mirovan de dixwînin: bawermend (mirovên ku balansa wan girane bi karên wan yên baş) û kafirên (yên ku balansa wan sivik e bi karên baş). Çarenûsa van her du koman dike bi kurtahî di ayetên (6-11ê) de tê vegotin.

cotbûna hec û 'umreh **: qarin قارِن**
Ew di heman demê de umrehe û hecê derbas dikin.

Qarûn قاروون
Kaferek dewlemend ku serhildan bi 250î zilamî li hemberê Pêxember Musa û Harûn (nimêj û silavên Xwedê li ser wan be) pêşeng kirîye. Wek ceza ji Xwedayê mezin hemî tiştên wî bi dirrandina erdê re hatine daqurtandin. Li Qur’ana Pîroz, Al- Qeṡeṡ (28): 76-82, Al-Ankabut (29): 39 binêrin .

temenê piçûk **: qaṡir (kom. quṡṡer) (قُصَر) قاصِر**
Yê / a ku di bin temenê berpirsîyarî ya yasayî de ye; ji ber vê yekê, wekîlek pêwîst (hewce) dike.

qutkirina têkiliyên xîzanîyê **: qaţi r-reḥim قاطِع الرَّحم**
Yê / a ku rêzê li têkiliyên malbatîbûnê nake.

(دزێکی ڕێگا) . dizê rê . cerdevan : **qaţi ţerîq قاطِع طَريق**
Kesê ku rêwîyan disekinîne(digire) da ku wan talan bike.

sûreya qaf **: qaf (sûret -) سُورَة قاف**
Ev Sûreya 50ê ya Qur'anê ye, ku navê wê ji ayeta yekemîn tê girtin. ew li ser înkarkirina kafiran, mijara damezrandina kiryar û gotinan di Roja qiyametê de, û mijarên bi mirinê ve girêdayî radiweste, ew her weha jî bejsa hin bûyerên Roja Vejînê û ravekirinên Bihuşt û Dojehê vedibêje, dike.

dilnizm . bindest : **qanit قانِت**

Ew ji kesê ku di dua û nimêjên xwe de guhpêder û dilnizm e, tê gotin.

quba' : **quba' قُباء**

Ew taxek ji bajarê Medîneyê li Padîşahîya Suadiya Erebî ye, ku ew dikeve li başûrê Medîneyê. Pêxember Mihemed bi hatina xwe ya Medîneyê re "Hîcra" li wir maye. Yekem mizgeft di Islamê de li wir hatîye çêkirin, û ji hêla mêvanên Medîneyê ve pir caran tê ziyaret kirin. (li Quranê 9: 108 binêre). Serdana wê mizgeftê dikeve di roja şemiyê berî nîvroyê de, û nimêjkirina du rekan: li gorî Pêxember yek ji kirina umreyê tête hesibandin.

(گۆڕ) . goristan : **qebr قَبر**

Jiyan di gorê de wekî "berzex" tête zanîn, cîhê ku vê cîhanê û ya hermayî (axiretê) ji hev cuda dik. Goristan wekî cîhê aşitî û ronahiyê ji bo giyanê bawermendê ku di şevê û êvarê de cîhê xwe di Bihuşta de dibîne. Ew ciyekî teng û tarî ye ji bo giyanê nebawermendan, yê ku di sibeh û êvarê de cihê xwe di agir de dibînin. Piştî mirinê, heya demekê di gora giyanî de rojek li bendê ye, da ku zindî û mirî bicivin û her biçin Bihişt an Dojehê bo her demî.

endamê zayendî : **qubul قُبُل**

Zayendê nêrza yan mêza.

rêzeya Ke‘bê : **qibleh قِبلة**

Musilman di dema nimêjê de divê rû xwe bidine Ke‘bê. Di destpêkê de Qibleh ber bi el-Quds (Orşelîmê) bû, Dûv re Xudayê mezin ferman daye Pêxember Muhemmed (Xwedê wî pîroz bike û aramiyê bide wî), ku rûyê Qiblehê bibe El-Ke‘beh-yê el-Mukerremeh-yê. Li Qur'ana Pîroz, Al-Beqera (2): 142-145, 149-150 binêrin .

(قەبووڵکردن) . pejirandin : **qebûl قَبول**

Jibo tekezkirina pejirandinê ne redkirinê.

kûştina na bi mebest : **qetl al-xeṭa' قَتل الخطأ**

Kuştina kesek bêhemdî. Ji bo cezakirina(hukimkirina) vê yekê, li Qur'anê binihêrin, 4: 92.

kûştin bi mebest : **qetl al-‘amd قَتل العمد**

Ev ne tenê tawanek (sûcekî) mezin e, di heman demê de ew wek gunehekî mezin jî tê hesibandin. Dibe ku cezayê kûştinê bidarve kirin(küştin)be an dravkirina "dîyeh" (dravê xwînê) be, ew yek li gurî xwestina malbata qurbanî be.

kûştin : **qetl an-nefs قَتل النَّفس**

Kuştina mirovan, di nav de xwekuştin.

şermezarî : **qedḥ قَدح**

Her peyva şermezarî, heqaretî û girêdana kêmasîyekî, û eger her vegotina ku ne ji hêla kesekî ve hatibe kirin, ew di cihê şermezariyê de ye.

rûmeta bilind : **qedr قَدر**

qeddere (yuqeddir) قَدَّر (يقدِّر)

1- Ji bo pîvandina rast: Ev peyv bi eslê xwe bi wateya hesabkirin an texmînê tê hesbandin.

2- Ji bo fermannameyê, ji bo pêşbînbûnê: Di vê wateyê de, peyv di pêşbînîya Xwedê de ji bo tiştên ku di gerdûnê de diqewimin tê bikaranîn.

şeva çarenûs (hêzanê) **: leylet al-qedr ليلة القَدر**

Di nav zanyaran de hema lihevkirinek heye ku ev şev dikeve di Meha Remezanê de, bi piranî ew dikeve di şevên rojên tekane ên rojên dehane de ji meha paşîn ji mehê.
Ji hêla gel ve, şevê 27-ê meha Remezanê wekî 'şevê qedr an Rewşa Bilind' tê hildan.
Şeva ku têde Gibriyel tê li nik Pêxemberê Muhemmed, (nimêj û silavên Xwedê lê be), ku Quranê vê mehê ji hezar mehan çêtir dibîne. (Li Qurana Pîroz - Al-Qadr (97): 3). 97 binhêre.

sûreya çarenûs e **: qedr (sûret al-) سُورَة القدر**

Ev Sûreya 97ê-(an) a Quranê ye, navê xwe ji gotina ayeta yekem digire. Sûre destnîşan dike ku Qur'an di şeva Hêzê de hatîye daxistin û şevek hatîye vejandin bi hezarê mehan ew tercîh kirîye, û ferîşt(melayîket) û giyan di vê şeva pîroz de daketine, û her wusa, bûyerên salê bi heman şevê re: salek din ên jiyanê, mirin, şadî, bextiyar, û hwd têne texmîn kirin.

bawerî bi vîna azad **: qederiy قدري**

Kesê ku bi vîna azad a mutleq bawer dike; Ji ber vê yekê, ew her şêweyê qedera xwedayî înkar dike. Berevajî determînîzmê(fatalîst e).

ya herî pîroz **: quddûs (al-) القُدّوس**

Taybetmendiyek xwedayî. Yê ku hemî paqij û pak ye.

nimûne **: qudweh قُدوة**

Ew mirovê ku em wî wek nimûnekî di helwest û kesayetîya wî de dibînin(dişopînin).

nawzrandin. qise pêwtin. cwênpêdan, nabûkarî, devavêtin. rûreşkirin**: qeẓf قَذف**
abru berdin , *ناوزڕاندن*

Bêbextî: Di dema ku mirov kesekî bi zinayê(têkiliya zayndî) bêyî zewacê sûcdar dike. (Di Quranê de, 24: 4 tê dîtin).

: Qur'an (al-) القُرآن

Quran bi wateya xwendinê hatîye. Ev jî bi wateya "cûdakirina rast û nerast" e tê.
Qurana Pîroz miraza herî mezin a Pêxemberê paşî ye, ji ber ku ew nikare bixwîne û binivîse û hînî xwendinê nebûye. Cibrayîl Qurana Pîroz wek gotina Xwedê di bîst û sê salan de ji bo pêxember Muhemmed, (nimêj û silavên Xwedê lê be) radest kirîye. (Li Quranê 10: 37-38; 26: 192-5; 17: 88 binêre). Ew ji 114h sûreyan pêk tê.

dema mehana jinan **: qur' (kom. qurû') (قُروء) قُرء**

Şîrovekarên Quranê ciyawaz raman dibin(difikirin) ka gelo wate peyva dewra heyvê(mehanê) an demê di navbera herdu dewrên mehê de: di vegotina wan de di ayeta 228ê ya Sûra 2ê.

(حەوت خوێندنەوە) . heft şêwazên xwendinê **: qira'at (al-) as-seb' القِراءات السبع**

Pisporên Tejwîdê li ser heft û deh awayan ji bo xwendina Qurana Pîroz nîqaş dikin. Ew di vegotina hin peyvan de cûdahiyên piçûk in, li gurî zaravayên cûda.

("خوێنەر"خوێنەران) xwendevan **: qurra' (tek. qari') (قارئ) قُرّاء**
Bi gelemperî, ev yek ji kesên ku Quranê ji dil dizanin(ezberkirine) û wê baş dixwînin û li bîra xwe tînin.

pêşkêşkirin **: qurban (kom. qerabîn) (قرابين) قُربان**
Di Islamê de ew qurbana heywanan e ku tenê di roja Eid Ad- dha"cejna qurbanê" de ji bo Xwedayê mezin xweş bike. Parçek an hemî goşt bi gelemperî ji bo hejar û belengazan re tê dayîn.

karê qenc **: qurbeh (kom. qurubat**) **(قُربات) قُربة**
Ew karê ku musilmanek dike ji bo ku xwe nêzî Xwedê bike.

Karamitan **: qeramiţeh (tek. qurmuţiy) قُرمُطي (قَرامِطة)**
Ew mezhebekî Şîyê ye ku di dema bazdide, wan herdu mizgeftên pîroz li Mekeyê talankirine û kevirê Reş bi xwe dibin, lê piştre ew kevirê Reş li ser fermanên serdarê Fatimîyan li Mekkeyê vedgerînin.

deyn : **qerḍ قَرض**
Dana tiştekî ku xwedanê nirxeka şênberî(materyalê) ye. Ew di Islamê de pêdivî ye ku deyn bê dayîn be. Di bin Şerîya Islamê de du cureyen deynan hene: ya yekem kredîyek(deynê) demkî ye û ya din li gurî daxwazîyê ye .

deynê baş **: qerḍ ḥesen قرض حَسن**
Deyn li gurî rêgezên îslamê; ew deyn divê wek deynekî bê sûd(faîz) bê vegerandin. Ango; Kredîyê bê sûd(faîze). Bi wata " Ji Xwedê re xerc kirin). Li Qur'ana Pîroz ', Al-Beqereh (2): 245, Al-Hedîd (57): 11, 18 binêrin .

pir avêtin **: qur‘eh قُرعة**
Ji bo avêtina lotikan (ji bo tiştên destûrî).

Eşîra Qureyş **: qureyş قُريش**
Ew baştirîn eşîr e di nava eşîrên ereban de ku li Mekeyê dijiyan û wan parêzvanîya Kebeyê dikirin. Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ku bi xwe qureyşî ye ji vê eşîrê tê.

sûreya Qureyş **: Qureyş (sûreya -) سُورَة قُريش**
Ev Sûreya 106ê ya Quranê ye, sernavê xwe ji peyva ayeta yekemîn digire. Qureyş navê qebîla Mekkî ya Pêxember Muhammed (nimêj û silavên Xwedê lê be) e.
Li vir ew bereketên bazirganîya geş a wan a li bakur (havîn) û başûrê (zivistanê) têne bîra wan, qala kerema Xwedê li ser Qureyş dike û qenciya wî bi wan re , da ku ew spasdar xwedê bin û ji wan dixwaze ku ew bi xwediyê vî Xanî yê re girêdayî bin ku ew ji wan re bû ye cihê serbilindahî û rêzgirtinê.

cotbûn **: qiran قُران**

Qern al-Menazil **: qern al-menazil قَرن المنازِل**
Navê cihekî ye ku dikeve nîvgirava Erebî ku divê mirov di vî cihî re derbas bibe, û li wir rewşa "ihram"ê dest pêdike.

hevrêyê domdar **: qerîn (kom. qurena') (قُرناء) قَرين**
1-Hevalê ku tête behs kirin dikare milyaket, mirov û cinek be .
2. Giyanekî serbixwe ku di hundurê mirovekî de dijî. Ew bi gelemperî hevalê hevalê xwe û alîkarîya kesê dike, lê carinan dibe sedema pirsgirêkan.

3-Yê ku hec pêkanîye . (li"hec"ê bibînin).

hevgirêk : **qerîneh (kom. qera'in)** (قَرائن) **قَرينة**

Çerçuva axêftinê: Ew dikare bi zimên be an awakî be (mercên demkî û ciheykî).

sondxwarin : **qesameh قَسَامَة**

Ew sondek e ku xizmên kuştî sonddixwin, û ew bi mebesta tewra mebest an dravê xwînê ye, heq dikin. berevajî wê. Bi şaşîtî wan perê dana xwînê heq kirine.

sond : **qesem قَسَم**

Bi Xwedê sond dixwin.

dabeşbûna demê : **qesm (bayn az-zawjat)** (بين الزوجات) **قَسم**

Dabeşkirina wekhev (bi taybetî di şevê de) di nav hevjinên xwe de.

qeṡṡe (yeqeṡṡu) (يقِصُّ) **قَصَّ**

sûreya çîrokan : **qeṡeṡ (sûret al-)** **سُورَة القَصص**

Ev Sûreya 28emîn a Quranê ye. Ew li ser çîroka Israîliyan û Musa, silava Xwedê lê be, û Firewnan, û li ser Qarun û çarenûsa wî çi qediya, û her weha li ser yekdest û girîngiya Quranê û mijara rêberî û şaşiyê diaxive.

kurtkirin : **qeṡr قَصر**

Kêmkirina nimêjê li du rekan. Ev destûrê dide kesê rêwî.

cezayê heyfê : **qiṡaṡ قِصاص**

Destûrnameyeka yasaya Islamî ye ji bo cezakirina kesên ku ziyanê didin jiyana mirovan, û kesê Kujer li şûna wî tê darvekirin. Li Al Beqereh (2: 178- 179)binêre .

dadwer : **qeḍa' (al-)** **القَضاء**

Mirov an pergala ku elaqedare bi çêkirina darizandinên dadwerî re.

qeḍa (yeqḍî) (يَقضي) **قَضى**

1-ferman : Ku îdare bike. Ji bo Xwedê, bi gelemperî ew bi wateya "ferman kirin/ emirandin " tê . (wek mînak. li Quranê, 17: 23 û ayetên jêrîn binihêrin)

2- lihevanînî : Ji bo çareserkirina nakokîyê di navbera her du aliyan de.

dana dayîn : **qeḍa' ad-deyn قَضاء الدين**

Drav vegerînin li kesê ku jê deyn hatîye kirin. Ew guneh e ji bo wan kesên ku nikarin deyn vegerînin .

çûna destavê : **qeḍa' al-ḥajeh قَضاء الحاجة**

hewcedariyên xwe vale dike : **qeḍa' al-ḥajat (al-ḥewa'ij)** (حوائج) **قضاء الحاجات**

Kirina tiştan, bi gelemperî bi alîkarîya kesên din.

nimêjkirin : **qeḍa' aṡ-ṡelah قَضاء الصَّلاة**

Kirina nimêjê ji sedema nekirina nimêjê di demê destnîşankirî de.

biryarnameya Xwedayî . çarenûs : **qeḍa' we qeder قَضاء وقدر**

Tiştekî ku Xwedayê mezin diyar kirîye, û mirov nikare tiştekî jê re bike. (Qurana Pîroz, Al-Ma'id (5): 19.)

zeviyên diravan dide : **qeṭa'i‘ قطائع**

Bi gelemperî zeviyên ku ji hêla serwer ve ji bo bindestên wî têne dayîn.

şikandina têkiliyên malbatê, xerîbkirina têkiliyên xizman:**qeṭ‘ ar-reḥim قَطع الرَّحم**

Qutkirina têkiliyên malbatî, xerîbketina têkiliyên xizman, danûstandina wekî biyanîyan bi mirovên xwe re, an guhpênedana xizmên xwe, carinan jî kirina neheqîyê bi wan re.

Ev gunehekî mezin e. Ev berevajiyê ("Silet ar-rehim": têkiliya dilovanîyê ne) "malzarok" n.

dizîya li ser rêyan **: qeţ‘ aţ-ţerîq قَطع الطريق**

Dizî sûcekî mezine di qanûna Islamî de. Biryara Qur'anê di derbarê ceza de li Sura (Ṡ) hatîye dayîn: Ṡ .33

qutkirina desta **: qeţ‘ al-yed قَطع اليد**

Cezayê talankirina tiştan ji cîhekî aram bi mebesta dizî an çêkirina pere, Cezayê wê qutkirina destê rastê ye. Lê Ger yek ji şert û mercan pêk neyê, wek mînak: dizî ji bo birçîbûnê be, destê kesê diz naye qutkirin.

dawîn, diyarker **: qeţ‘îy قَطعيّ**

1- "Dravê paşîn", ku nayê vegerandin.
2- "Bersiva kesîn": redkirin û gengeşê napejirîne, û di wir de dudilî nabe.

rûniştin **: qu‘ûd قُعود**

Rewşa rûniştinê.

bilêvkirina sivik **: qelqeleh قَلقَلة**

Yek ji termê(têgehyên) zanista dengên (tecwîda Quranê) ku wateya wê ew tengahîya tewangê di dema ku dengdar têne bilêv kirin de heya ku ew bi dengekî xurt tê bihîstin. Ev pênc tîpeyên qelqelehê ne: Q - T - B - C – D

sûreya pênûsê **: qelem (sûret al-) سُورَة القَلَم**

Ev sûreya 68ê ya Qur'anê ye, ku sernavê wê ji peyva ayeta yekem derdikeve, tê. Çend babet hene, di nav de: hişyarî, tehdîdkirina muşrikan, taybetmendîyên xirab ên wan, Herweha ew behsa Roja Vejînê û êşên kafirên têde, û çîroka xwediyên buhiştê, dike.

lîstika kumarê **: qimar قمار**

Di Islamê de lîstika qumarê qedexe ye û wekî xebata şeytan tê hesibandin. (li Qur'an, 5: 90 binêrin).

sûreya heyv e **: qemer (sûret al-) سُورَة القَمَر**

Ev sûreya 54ê (an) a Qur’anê ye ji peyv ayeta yekem hatîye girtin. Ew behsa mûcîzeya nêzî-çebûna heyvê dike, ku jê re tê gotin (nêzîk bû اقتربت), û ew qala rûdana nêzê roja Vejînê dike, ji ber ku ew qala mirovên ku li dijî fermanên xwedayî serî hildane, wek gelê Nûh, mirovên Ad, gelê Semud û gelê Lût, Işkence cezaya kufr û derewa wan e, dike.

dilnizmî **: qenete (yeqnutu) قَنَت (يَقنُتُ)**

Bi vê ruhîya dilnizmî û radestbûnê xwe nîşan bidin an dua bikin. (Li Quranê binihêrin, 3: 43.)

bêhêvîtî **: qeneţe (yeqnuţ) قَنَط (يَقْنُط)**

Qur'an fermanê dide bawermendan ku ji dilovanî û bexşîna Xwedê bê hêvî ne bin. (li Qur` an, 39: 53 binêrin). Binêrin: Qurana Pîroz, Al-An'am (6): 85, As-Seffat (37): 123-132. Mursalîn bibînin .

: qinţar (kom. qenaţîr) قِنطار (قناطِر)

Pîvaneka ku biqasî 1200 hebî ye ji zêr.

pêbawer **: qena‘eh قَناعة**

Pejirandina ku çi ji yekî tê an jê re tê dayîn.

dilnizmî û radestbûn : **qunût قُنوت**
Ew bi nimêja witr re têkildar e, nimêja dilxwazî ya ku di paşîn di şevê de tê kirin.
herî hêzakar : **qehhar (al-) القهّار**
Taybetmendîya Xwedayî. Her kesê ku xwedîyê hêza herî bilind e.
cezayê heyfê : **qewed قَوَد**
Li "qiṡaṡ " bibînin.
: qiwameh قِوامة
1- parêzgerî , Xizmetkarê parastinê ku ji kesekî an tiştekî peyda dike.
2-Berpirsîyarê malbatê : Ew kesê ku piştgirî û berpirsîyarîya malbatê dike.
hêzdar **: qewîy (al-) القَوي**
Taybetmendîya Xwedayî. Ew yê ku hêza wî tixûbdar nizane.
(پێوانه) . pîvandin **: qiyas قياس**
Ew bi wateya pîvandin an berhevdanê tê. Ango derivatîya yasaya li ser naveroka qanûna heyî be, eger bingeha (Illah) ya herduyan yek be. Ew hêmana çaremîn a şerîatê ye, ku di Qur'an û Sunnetê de nayê dîtin, an jî di nav "Ijma‘: lihevhatinê" de nehatîye dayîn.

pîvandina rewşgiran **: qiyas iqtiraniy قياس اِقتراني**
Pîvana li ser bingeha hevûdubûna(wekhevîya) mercên dozê bi mercên daraza bingehîn.
xuyanga derveyî **: qiyafeh قِيافة**
Peyveke kevnar e ku ji bo destnîşankirina bavparêzîyê li ser bingeha taybetmendîyên laşî ya zarok û bav, tête bikaranîn.
helwesta sekinandinê **: qiyam قيام**
Di nimêjeyên ferz de, helwesta rawestandinê, li hemberî çokdanîn, sexhdan (secdebûn) û rûniştinê.
rabûna (diperizina)şevê **: qiyam al-leyl قيام الليل**
Derbaskirina şevê di nava dilovaniyê de, bi gelemperî nimêjê dike.
vejîn **: qiyameh (al-) القيامة**
Islam balê dikişîne li ser têgîna vejîna laşî, di dema ku tevahîya afirîner(xelk) wê di laş û giyanê de vedigerînin jiyanê. (Li Quranê, 22: 1-7; 75: 1-13; 78: 1 7-40; 80: 33-34, 42 binêrin).
sûretê vejînê **: qiyameh (sûret al-) سُورَة القيامة**
Ev sûreya 75ê a Qur'anê ye, ku bi ayeta yekemîn sernavê wê vedibe. Ew li ser mijarên pêwendîdar di Roja Vejînê de, ji mirinê û derbasbûna li jîna paşîn, diaxive rewşa mirovên baş û xirab diyar dike.

kerat **: qîraţ (kom. qerarîţ) (قراريط) قيراط**
Di nivîsarên îslamî de, ev term pirwate ye: (1) yekîneya giranîya kevirên hêja û zêr (0,195 g.), (2) pîvana hişk û (3) pîvana çaremîn (175.035 metre kat.)
(دەنگۆی) . gotegotan **: qîle we qal قيل وقال**
Musilman têne hişyarkirin ku li pey gotegotan neçin, û tê xwestin ku îdîayên xwe li dijî hevdû verast bikin. (Li Qur'an, 49: 6.binihêrin).

herdemî **: qeyyûm (al-) القيّوم**

Taybetmendîyeka Xwedayî ye. Ew ê ku bi xwe rabûyî, û taybetmendîyên xwe mezin kirî.

cerdevanî **: qeyîm (kom. qeyimûn) (قَيّوم) قَيّم**

"qiwameh" bibînin.

(ك)

nivîskarê peyxamê(wehîyê**) : katib(kom. kuttab) al-weḥy كاتِب (كُتاب) الوحي**
Ew hevalekê Pêxember bû(nimêj û silavên Xwedê lê be) ku nivîsên(wehîya) ayetên Quranê wekî ku ji hêla Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) ve hatîye vedihewandin, nivîsandîye.

bêbawer . gewer **: kafir (kom. kuffar / kafirûn) كافِر(كفّار/كافرون)**
Ew kesê ku ji Islamê û hînkirinên wê bawer nake, û Xwedê û Pêxemberên wî red dike, (Xwedê wan pîroz bike). Gelek awayên cihêreng hene ku mirov bi Xwedê bikufre. Ji bo ravekirina temam: (Kufrê bibînin. Pirjimar: Kuffar).

sûreya bêbaweran **: kafirûn (sûret al-) سُورَة الكافرون**
Ev Sûrta 109ê ya Quranê ye, ku sernavê xwe ji peyva ayeta yekem digire. Gotina "kafir" (pirjimar, kafirûn / yan kuffar), Ev Sure di derbarê êşên Pêxember de(Xwedê aşitiyê li ser wî û malbata wî bike), ji kafiran, diaxife. Ev du caran înkarkirina pejirandina musilmanan li hemberê kafiran dubare dike, pejirandinek bi armanca belavkirina bêhêvîtîyê di dilê kafiran de, ji ber ku wan du caran înkarkirina perestiya kafiran ji Musilmanên ku yek Xwedayî diparêzin, dubare dike. Ev delîla bêtehemulî û lezgînîya wan e. Encama vê yekê veqetîna bîrdozî ya diyarker di navbera rêbaza yekperestîya Xwedayî û muşrikan de.

(قەشە). keşe **: kahin (kom. kuhhan / keheneh) كاهِن(كُهّان/كَهَنَة)**
Pêşbînnas: Yê ku îdîa dike ku ew bi pêşerojê dizane. Ew kesê Musilman hişyar dike ku şîretên wî bipejrîne.

jibo bêje "Allahu 'akber: Xwedê Mezintir e "**: kebbere (yukebbiru) كَبّر(يُكبِّر)**
Bi gotina "Xwedê Mezintir e": Di aslê xwe de, ev peyv bi wateya "tekbîr: mezinkirin"tê.

(خۆبەزلزانی). pozbilindî **: kiber كِبَر**
Ew hestê ku xwe ji kesên din çêtir dibîne. (Li Quranê binihêrin, 40: 56.)

serbilindahî **: kibriya' كِبرياء**
Mezinbûn û rûmeta xwe. Ji bo Xwedê, ew berzahî (mezinahî) jî tê de ye. (Li Quranê, 45: 37binêrin).

(گەورە) . mezinê hergavê **: kebîr (al -) الكَبير**
Yekîtiya giyanî ji ya her hebûnên din wêdetir e.

(گوناهی گەورە). gunehê mezin **: kebîreh (kom. keba'ir) كَبيرة(كَبائِر)**
Gunehên ku ji hêla Hadd ve têne cezakirin ('cezayê diyarkirî') (wek mînak, kuştin, dizî ... hwd.

(بڕیارەکان . فەرمان) biryardan . ferman **: ketebe (yektub) allah كَتَب (يَكتُب) الله**
(خەڵکی کتێبەکە) . gelên pirtûkê **:kitabiy (kom. ahil al-kitab) كتابي (أهل الكتاب)**
Xirîstiyan an Cihû, di Quranê de jê re dibêjin "aihl al-kitab : gelên pirtûkê".

jina xiristiyan an cihû **: kitabiyeh كِتابيّة**
Li gorî yasaya îslamî, zilamê musilman dikare bi jina "kitabiyeh" bizewice. (Li Quranê 5: 5 binêrin).

(کپکردنی ڕاست) . veşêrina rastiyê : **keteme (yektumu) al-ḥeqq كَتَمَ (يَكتِمُ) الحَقَّ**
Agahdariyê diveşêrin ji bo ku rastiyê veşêri. Quran ji me re hişyar dike ku em wê nekin (Quranê binihêrin, 2:42).

(شاردنەوەی شایەتیەکە) . veşartina şahedetê : **ketm / kitman aş-şehadeh كَتَم (كِتمان) الشَّهادة**
Şahedetê nade, dema ku tê xwestin ku ew bide. Ev wekî guneh tê hesibandin, mînakê di Quranê de bibînin (2: 283.)

antimona reş : **kuḥl كُحُل**
Pudera reş di nav welatên musilmanan de ji zêdetirî hezar salan re ji bo çavan tête bikar anîn.

(درۆکردن) . derew kirin : **keẓebe (yekẓibu) كَذَب(يَكذب)**
Rastiyê nabêjin. Die Islamê de derew bi tundî hatîye şermezarkirin, û ew wekî nîşaneya durûtî tê hesibandin . (Li Qur'anê binêrin, 25: 11 û 37.)

çalakiyek serûzayî . karên ser xwezayî : **kerameh (kom. keramat) كَرامة(كَرامات)**
Ev bêje bi wateya 'nîşandana rûmettê 'û ji kirinên serûzayî tê mîna meşa li ser avê. (Ew di hevûdu de ji bo kesên pîroz an jî merivên pabendî Xwedê re ji bilî Pêxemberan, ku ji bo wan peyva "mu'cizeh" (keramet) tête bikar anîn.

Xwedê rûyê wî rûmet bike : **kerreme allahu wejhehu كَرَم الله وجهه**
Ev gotin bi gelemperî li şûna "radiya allahu 'enhu رضي الله عنه " (Xwedê jê razî be) tê bikaranîn, nemaze dema ku Musilman qala Ali, pismam û zavayê Pêxember dikin (nimêj û silavên Xwedê lê be). Tête gotin ku ew yekem kes bû tevlî Islamê bû ye û tu carî serî li ber pûtekê(xodakan) xwar nekirîye, herweha wî îslam di temenek pir piçûk de qebûl kirîye.

ayeta textê : **'ayet al-kursî آية الكرسي**
Ew li ser ayeta 256-ê ji Sura Al-Beqereh "çêlekê" (sura duyem di Qurbana pîroz de) vedibêje. Ew ji deh hevokan ku li ser ravekirina Xwedê radiweste, pêk tê, bîst taybetmendiyên wî û pênc navên wî pêşkêş dike. Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) gelek pêşniyazî kiriyê ku ew piştî "nimêja" birêkûpêk û her weha berî ku mirov bikeve nav nivînê, wekî çavkanîyeke ku Musilman xwe ji Iblîs û xerabîyên din biparêz in, tên.

(بەخشندە) . pir comerdî : **kerîm (al-) كَريم**
Taybetmendiyeka Xwedayî ye ku berekarên wî bê sînor in .

(ڕق) . şermezar . nefret : **keraheh كَراهة**
Dîtin(fikirîn) di nerazîbûn an nerêzdarbûnê de.

cilûbergê Ke'beh : **kuswet al-ke'beh كُسوة الكعبة**
Kincê ku ji bo nixumandina Ke'beyê ye. Ew ji kincê reşikî hatîye çêkirin û bi ayetên Quranê ve bi tixûbên zêrîn hatine xemilandin.

(تووڕەیی کپ دەکات) . tepisandina hêrsa(tora) : **kežim al-ẍeyż كَظِم الغَيظ**
Kesê ku hestên xwe kontrol dike û nahêle ku hêrsa wî bandorê li ser wî bike. (Li Qur'anê binêrin, 3: 134.)

Ke'beh : **ke'beh (al-) الكَعبة**
Ew avahîya kevir kubar e ya ku dikeve di nava (mescid el heram : mizgefta pîroz) de. Ew bi eslê xwe ji hêla Melayîkan ve hatîye çêkirin û ew piştre ji hêla Pêxember Ibrahîm

û kurê wî Ismayîl ve hatîye qedandin. Pêxember Muhemmed (Xwedê wî pîroz bike û aramîyê bide wî), ew ji nû ve ava kirîye. Ew xala navendî ye ya ku hemî musilman di dema nimêjê de berêxwe didine wir. (Li Qur-anê, 2: 127binihêrin)

ji bo bexşînkirin **: keffareh (kom. keffarat) (كَفارات) كَفارة**

Kiryarek ku ji hêla kesê musilman ve ji bo kirina xeletîyekî (wek mînak qetilkirina bi darêzorê) an ji bo bêpabendîyê (wek nimûne rojî negirtin di meha Remezanê de ji hêla hin mirovên xwedan sedem (sedembar/baxşandî) ve tê kirin. Di nav de, tiştên din hene, ku mirovê sedembar dikare di şûna negirtina remezanê de, xwarinê bide hejmarek ji mirovên belengaz an jî rojîgirtin li ser çend rojan.

sondxwarin **: keffareh (kom.kefferat) al-yemîn اليَمين (كَفَّارات)كَفَّارة**

Cezayê ku ji bo binpêkirina sondê ye.

mesogera kesê (garantîyamirovek) **: kefalet an-nefs كَفالة النّفس**

Berpirsîyarîya ku mirovî di dema pêwîst de piştrast dike.

(چاودێری هەتیو). lênêrîna sêwîtîyê **: kefalet al-yetîm كَفالة اليَتيم**

Lênêrîna sêwîtîyê, di warê madî û giyanî de, nimûne, li Qur'anê , 4: 2, 6 û 10 binihêrin .

(گەرەنتی قەرز) . garantîya deyn **: kefalet ad-deyn كَفالة الدَّين**

Mirovê garantor berpirsîyar e ku deyn bi rengekî an awayekî din bê dayîn.

bêbawer **: keffere (yukeffiru) (يُكفِّر) كَفَّر**

1- Ew kesê ku bêbawerîya xwe destnîşdan dike, di çerçeva kiryarên taybet de wekî înkarkirina yekîtiya Xwedê .

2- Tekfîr, ew tişa ku pabende bi şaşîyan re tiştek dikin ku ji gunehek rabikin, an tiştek ku ji wî tê xwestin, wekî negirtina rojîyê di meha Remezanê de.

bê baweriyê **: kefere (yekfur) (يَكفُر)كَفَر**

Ew kesê ku bawerîya xwe bi Xwedê an ji fermanên wî nayînin.

bêbawerî **: kufr كُفر**

Ev gotin bi wateya înkar kirina desteyên Xwedê yan redkirina desthilata Wî.

bêbawerîya zelal **: kufur bewaḥ كُفر بواح**

Ew karê ku berevajîyê hînkirinên Islamî ye.

kefen : **(kom. akfan) (أكفان)كَفَن**

Kincê ku ji bo pêçandina laşê mirovî tê bikaranîn.

قسه . peyivîn **: kelam كَلام**

Her gotinek, çi devkî an nivîskî . Ew dikare bi wateya zimên be.

kelam-al'ilm كلام العِلم

Zanista Xwedayî: Ew di karanîna klasîk de, temsîla zanista ku bi gelemperî bi mijarên têkildar re yên ku bi taybetmendîyên Xwedê û bawerîyên Xwedayî re girêdayî ne, dike. Niha gelek kes peyva "tewhîd" an " ilm at-tewhîd " bikar tînin.

(وشەکانی خودا) . gotinên Xwedê **: kelam allah كَلام الله**

Qur'an ji peyvên Xwedê ye ku ew bi rêya Gabriyel re bo Pêxember Muhmmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) hatîye şandin .

(وشەی یەکخستن) gotina yekdestiyê **: kelimet at-tewḥîd كلمة التَّوحيد**

Ew şahidîyê dike ku ji Xwedê pê ve tu xweda tune ne.

daxuyanîya baweriyê **: kelimet aş-şehadeh كَلمَة الشَّهادة**

Dibêjin: "aşhedu an-la illaha illa-llah we aşhedu anne muhemmeden rasûlu-llah." (Ez şhadim ku ji xwedê pê ve ti xwedayê din tune ne. şahid im ku Muhemmed peyxemberê Xudê ye).

(وشه باشهكه) . gotina xweş **: kelimeh (al-) aţ-ţeyyibeh الكَلمة الطَّيِّبة**

Peyva baş an şîretkirin. (Li Quranê 14:24 binêrin)

(قسهكهر لهگهڵ خودايه) . axaftvan bi Xwedê re **: kelîm allah كليم الله**

Wateya vê yekê ev e ku ji hêla Xweda(Allah) ve hatîye vegotin. Di nivîsarên îslamî de, ew behsa Pêxember Mûsa dike, ku Xwedê bi wî re li çiyayê Sînayê peyivî ye. (Li Quranê 4: 164. binêrin).

pênc gerdûn **:kullîyat-al al-xems كُليّات الخَمْس**

pênc xalên pêwîst .

paş nav **: kunyeh كُنية**

Sernav ji kesekî re tête dayîn.

sûreya şikeftê **: kehf (sûret al-) سُورَة الكَهف**

Ev sûreya 18ê ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji çîroka 'mirovên şikeftê' werdigire (ciwanên ku li şikeftê digerîyan ji ber bawerîyên wan ew ji şikeftê dûrdikevin û bi mûcîze 309h salan razen(radizan)e. Ev bûyer di di(ayetên 9-22)ê de. Gelek tê pêşniyar kirin ku: her Inê vê Sûreyê bixwênin. Bîranîn û xwendina deh ayetan ji destpêkê an jî ji dawîya Sûrê ve ji bo ku yekî ji Mesîshî derew biparêze, li gorî Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be).

dirûvker **: kehaneh كَهانة**

Ew kesê ku îdîya dike ku ew bi pêşerojê dizane. Ew Musilmanan hişyar dike ku ew xwe ji wî bo mebesta şîretbûnê dûr bidin. Li ser Musilmanan hatîye qedexe kirin ku ew serdanîya dirûvkerî(kehaneh) bikin an ku ew bi gotinên wan bawer bikin.

sûreya al-kewşer (pirbûn)**: kewŝer (sûret al-) سُورَة الكوثر**

Ev sûreya 108emîn a Quranê ye, ku sernavê wê ji peyva ayeta yekê tê wergirtin. Kewŝer bi cûrbecûr tête şîrove kirin mîna gotina "pirbûn" û ew navê çemekî taybet e li Bihuştê.

(ل)

Ji xeynî Xuda ti xwedayên din tune ye **: la 'ilahe ill-allah لا إله إلا الله**
Ev înkarkirina hebûna her celebê xwedaka ye ji bilî Xwedê. Ew dirûşma Islamê ye.
la ḥewle we la quwwete illa bi-llah لا حول ولا قوة إلا بالله
Hêz tune lê ji xwedê tene heye.
Ev gotin tîpeka duyê ye ku pir hatîye pêşnîyar kirin. Nemaze di demên dijwar de.
Lat **: Lat (al-) اللات**
Navê pûtekekî ye ku di Erebistanê de dihat parastin.
Xwedê nasî **: Lahût لاهوت**
cilê hecê **: libas al' -iḥram لِباس الإحرام**
Cilên taybetî in ku hacî wanli xwe dikin.
Ez bi dilovanî bersîva te didim, Xudayê me **:lebbeyk allahumma لبيّك اللّهمّ**
Ez bi dilsozî bersîva fermana we (an banga we) didim. Ev gotin pir caran ji hêla hacîyan ve tê dubare kirin.
(گەمژەکان) . pedû (ziman û banê devî) **: leŝewiy لَثوي**
Ev hilberîna dengên ku ji zimên li ser banê dev tê vegotin, an nêzî çira alveolar dibe, wek t, d.
(گۆڕستان) . goristan **: leḥd (kom. luḥûd) (لُحود) لَحْد**
Ev parçeyek kûreyek e ji gorê ya ku kelaş tede tê danîn. Kengê ku gengaz be, kavayiyek ji alîyê goristanê ve tê kolandin.
(گۆشتی بەراز). goştê berezê **: leḥm al-xinzîr لَحم الخِنزير**
Xwarina Goştê berêz û her parçek ji laşê wî (bikaranîna) wî li ser Musilmanan hatîye qedexe kirin.
kevirên spî **: luxuf , lixaf (tek. luxfeh) (لُخاف ، لُخفة) لُخُّف**
Koçên spî carinan di rojên destpêkê yên îslamê de ji bo nivîsînê dihatin bikaranîn.
pêşeşert . tevlêkirin **: luzûm لزوم**
Tevlêbûn şertekî pêşîn e.
(نەرمترین) . herî nerm **: leţîf (al-)اللَّطيف**
Taybetmendîya xwedayî ye. Yê ku pir dilovan, pir nerm û xweşbîn e. Li Qur’ana Pîroz, Al-Hec (22): 63, Şura (42: 19. binihêrin) .
(نەفرەت) . nifir . qefilandin **: le‘neh لَعنة**
Dûrketina ji dilovanî û bereketa Xwedê .
nifirkirin **: li‘an لِعان**
"Mula'enehمُلاعنة " (Li Quranê , 24: 6-9 bibînin).
(بێمانا) . bêwate . gotûbêja bêkêr **: leẍw لَغو**
Di rewşa sondê de, ev tê vê wateyê ku sond bêhemdî hatîye gotin.
Luqman **: Luqman لُقمان**
Zilamek zana ye(zana), dilovane(xwedêtirse). di Quranê de hatîye destnîşan kirin, 31

sûreya Luqman **: luqman (sûret) سُورَة لُقمان**

Ev Sûreya 31ê(an) a Qur'ana Pîroz e, sernavê wê ji navê zilamekî pîroz û şehreza hatîye girtin . Luqman gelek hînkirinên şehrezayiya gerdûnî pêşkêşî kurê xwe kirîye (ayetên 13-19). Di nav ayetên ku bi piranî têne qewirandin ayetên ku dilovaniyê di têkiliya bi dêûbavan re hîn dikin, heke ew nebawer bin û dixwazin di baweriyê de me bixapînin, lê bêyî ku guhdarîya wan di wê de hebe (14-15).

bastard **: leqîţ لَقِيط**

Zarokeke ku dêûbavên wan ne diyar in.

(سلۆور) . derew . îftira **: lemeze (yelmiz) (يَلمز) لَمَز**

Ji bo dîtina xeletîyê bi yên din re an bi neheqî li ser wan bipeyivin, rasterast an bi nîşan, ev ji hêla Qur'anê ve hatîyê tawanbar kirin (49: 11).

gunehên piçûk **: lemem لَمَم**

Sûcên (Çewtiyên) piçûk: Tawanên piçûk ên bêhemdî yên ku bi "keba'ir" û "fewahiş" (gunehên mezin) re berevajî dike.

("گفتوگۆی ناتەوێنراو "بێئاکام) . gotûbêjê bêxêr(vale) **: lehw al-ḥedîŝ لَهو الحَديث**

Islam ji şopindarên xwe re dibeje ku wextê xwe di tiştên bêkêr de wonda nekin, tevî nîqaşên pûç. (li Qur 'an, 31: 61. binihêrin) Di vê wateyê de ew bi " leẍw " re mîna hev e.

tabloya -parastinê **: lewḥ al-meḥfûz اللَّوْح المَحْفوظ**

Daxuyana ku ji hêla Xwedê ve tê parastin. Danîna hemî biryar û rêzikên Xwedê yên ku Xwedê ji destpêka afirandinê ve ferman kirîye. (Li Qur-an, 85: 22 binihêrin).

(هاوڕەگەزباز) . hevzayendker **: lûţîy لوطي**

(هاوڕەگەز) . hevzayendî **: liwaţ لِواط**

Hevzayendî di Islamê de gunehek mezin tête hesibandin. (Li Quranê, 26: 160-1 74 binêrin).

lûţ لوط

Navê Pêxemberê ku xwarziyê Pêxember Ibrahîm (nimêj û silavên Xwedê lê be) bû, tê gotin ku ew ji bo kesên yên hevzayendî dikirin re hatîye şandin, û ji hêla Xwedê ve bi tundî (dijwarî) hatine cezakirin. (Li Qur` an, 26: 160-174 binêrin).

sûreya şavê **: leyl (sûret) سُورَة الليل**

Ev sûrta Qurana 92ê ye, ku sernavê wê ji peyva ayeta yekemîn tê girtin. Ev herdu ayet bi sondê destpêkiriye (bi şev, gava ku wî duniya tarîkir. Û di dema ku roj derdikeve). Di çarçoweya dîmenên gerdûnê û cewherê mirov de, sureh rastiya xebat û xelatê biryar dide, û ev rastî celebek xuya ye, û xuyangên wan du reng in, û du alî ne. Xwedê bi diyarde û rastiyên berevajî mirovên ku sond dixwin e, ku mirov li rê û rêbazên cihê cuda digerin, rêyên wan cuda ne û ji ber vê yekê xelata wan jî cuda ye. ji ber vê yekê kesên qenc ne wek yên xerab in, û rêberî ne mîna xapînokiyê , û rastî ne mîna bi şaşîyê ye, û yê ku dide û dilsoziyê ne mîna kesek e ku derewkar e..... her kar cezayê xwe heye.

nîv dengdêr **: lîn, ḥerf لِين ، حرف**

nîv dengdêr , wek: y . w .

لِين المُعامَلة lîn al-mu‘ameleh : nermbûna danûstendinê . (نەرمبوونی ئاڵوگۆر)
Bi rengek xweş û nerm bi yên din re tevdigerin.

لِين القَلْب lîn al-qelb : nermbûna dil (نەرمبوونی دڵ)
Ew dibe ku dilovaniyê jî destnîşan bike.

لِين القَوْل lîn al-qewl : nermbûna axaftinê (نەرمی قسەکە)
Bi mirovan re bi rênçikên bedew û bi gotinên baş biaxifin.

(م)

sûreta sifrê **: ma'ideh (sûret al-) سُورَة المائدة**

Ev sura pêncemîn e ku dikeve di nava Qurana Pîroz de, ji çîroka Mesîh û şagirtên wî û sifra xwarinê ya ku wan daxwaz kiribûn (Hejmarên 110-120ê, nemaze 112-115ê). Di vê babetê de bi taybetî di vê sûreyê de diyar dibe, kîjan heywan goştên wan ji bo musilmanan tê xwarin (ayeta 3ê). Di ayeta 3ê(an) de. Di vê beşê de, em rêziknameya dadmendî û têgihîştina dadperwerîyê bi yên din re ravedikin, ku ta dijminan jî dide ber xwe(di nav de dibînin) (ayeta 11ê).

Ayetên dawîn ên vê sûrê raporekî li ser Issa (nimêj û silavên Xwedê lê be) eşkere dike û nemaze bangewazîya mirovan a ku wî û dayika wî wekî xweda li kêleka Xwedê di Roja Vejînê de dibîinin. (li Quranê 5: 116-117ê bibînin).

dadmendiya aşitiyê; qeydkar **: ma'ẓûn مَأذون**

Ew behsa zilamekî desthilatdar ku zewacên olî pêk bîne .

hat ragihandin **: ma'ŝûr مَأثور**

Ev peyv bi wateya tiştekî, wek mînak nimêjê an bêjeyê tê, a ku ji berê ve hatibû ragihandin, bi gelemperî ji hêla Musilmanan ve hatîye pejirandin. (li 'aŝer ê binihêrin).

xwerû **: majid (al-) الماجِد**

Taybetmendiyeke xwedayî ye. Ew kesê ku rûmetdayîna(rûmetdariya) rast heq dike.

Marut ماروت

Yek ji wan du milyaketên ku ji aliyê xwedê ve ji bo mebesta dadperwerkirina mirovan hatibûn şandin ku bi rêya destûrdana Harut û Marut wan fêrî sêrbaz bikin. Li Qurana Pîroz, Al-Baqara (2): 102 binêrin .

dewazina Xwedê ! **: ma şa' allah ما شاء الله**

Biwêjî, bi wateya "Xwedê bixwaze" tê, bi gelemperî ji bo vegotina heyranîya tiştekî ku tête bikar anîn, bi nîşankirina sedema rastîn a vê yekê, (Xwedê). Ev pratîkeke baş e ku mirov di her carê de vê vegotinê ji bo kesê Musilman ku ji tiştek hez bike bibêje.

sûreta alîkariyê **: ma‘ûn (sûret al-) سُورَة الماعون**

Ev sûreta 107ê ji Quranê ye ku ji peyva ayeta paşîn hatîye girtin. Peyva ma'ûn bixwe bi wateya alavên xwarinê tê , da ku di xwarinê têde pêşkêş bike.

Di vê sûrê de, balê dikişîne li ser olê di wateya pratîkî de ku alîkarîya sêwî(bêkesan) û belengazan bike .Peydakirina erka olî ye ji bo nimêja xwe bike, û her weha da ku mirovan ji karên xêrxwazîya durûtî dûr bixe, ji bilî vê yekê, alîkarîya hewcedaran di jiyana xwe ya rojane de bike.

(پاره) pere **: mal (kom. 'amwal) (أمْوَال) مَال**

Dirav û Xwedanî. Pir caran wekî mal tê bikar anîn.

(خاوه‌ن) . xwedan **: malik مَالِك**

Peyv ji "malik" ya xwedîtîyê tê. Em vê peyvê bi wateya "sura al-fatiheh" de (Sûreta vekirinê) dibînin û her weha di gelek sûreyên din ên Quranê de jî dibînin.

: malik al-mulk مَالِك المُلْك

1-Taybetmendiyek Xwedanî ye. Mîrê gerdûnê an şah padîşah. (Li Quranê binihêrin, 3: 26.) Car carinan em guhdariya "malik al-mulk we al-melekut" dikin û dibihîzin.

2- Navê cerdevanê (parêzvanê) dojehê. (li Quranê, 43: 77binêrin).
3-Şopandinarên (Peyrewên) Dibistana Malik, yek ji çar damezrênerên dibistanên sereke yên Islamî ye.

Malikî, dibistana Mallikî : **malikîy (kom. malikîyeh)** (**مالكيّة**)**مالكي**

Ramanê vê dibistanê bi gelemperî li Afrîkayê belav dibe.

pereyê destûr: **mal al-muteqewem مال المُتَقوَم**

Tiştên dewlemendîyê yên ku xwedanê nirxê bazirganî ne li gorî şeriyetê. Dibe ku hin mal heye ku nirxê xwe yê bazirganî li Musilmanan tune ye lê ji bo ne-Musilmanan jî qîmeta wan heye. Mînak: şerab û goştê berêz hene.

şopdar **: ma'mûm مَأموم**

Kesê ku li peyî rêberê nimêja civata, nimêjê dike.

(ئاستەنگەکان) . pêşîlêgirtina sedemê, astengî **: mani‘ مَانِع**

Tişteke ku rê li ber pêkanîna îbadetê digire, wekî mînak pêşî lê digire ku Mislimanek nimêja xwe bike an destên xwe bidin Quranê.

parastin an lêxwedîderketin **: mani‘ (al-)المانِع**

Ewe yê ku îbadetên xwe diparêze, an tiştê ku ew dixwaze, paşde dide.

mirin. wêran kirin **: al-mu'tefikat المُؤتفِكات**

Ji gundên gelê Lût re Mutafikat hatîye gotin, ew bi wateya ziviradin û hilweşiyanbûn, an gunehdarîya ku wan cezayê Xwedayê bilind heqkiribûn, tê. Hin zanyar hene ku ew bawer dikin ku Mutafikat, peyvek gelemperî ye, ji bo miletên ku Xwedayê bilind ew ji ber gunehên wan û bêbawerîya wan; ew li ser banga Xwedayê bilind hatine hilweşandin, û di nav wan de gelên Semûd, gelên Mediya, gelên Add û yên din jî hene, û hin ji wan ji hêla Xwedayê bilind ve bi dengekî hatine êşkence kirin û hin ji wan jî bi rêya bayê (stêrîkê)re hatine êşandin(eşkence kirin).

paşxister (derenger) **: mu'exxir (al-) المُؤخِّر**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Ev gotin ji kesê ku tiştan derengî dixe û karên xwe li gorî daxwaza(vîna) dide paş.

(پارەی دواکەوتو) . dravê dereng ketî **: mu'exxer aṡ-ṡedaq مُؤخِّر الصَدَاق**

Di pir rewşan de, zava parçekî ji qelenê ji bo jina xwe, paşînde dike, ku ji dikare di dema veqetandinê vî qelenî bixwze an li ser daxwazîya wê were dayîn.

muezzin (gazîkar) **: mu'eẕẕin مُؤذِّن**

Ew kesê ku banga nimêjê dike da ku mirovan li ser dema nimêjê agahdar bike.

dilê wan berhev dike **: mu'ellefeh (al-) qulûbuhum المُؤّلفة قلوبهم**

Dilên wan bi kerem û dilovaniyê xwe dikşîne Islamê.
Ew yek ji wan heşt kategoriyan e ku Xwedayê bilind di Pirtûka xweya Pîroz de behs kirîye û ew in ku di Islamê de dravê zekatê li wan diçe.
Ew mirovên ku ketine Islamê bêyî ku Islam di dil û giyanên wan de were îsbat kirin, ango wan Islam qebûl kirine, lê Islama wan hîn jî nazik û lawaz e, û bandora wan li ser gelê wan heye, ji ber vê yekê ji wan re zekata dravî tê dayîn heya ku ew di Islamê de bêne qayil kirin û piştrast kirin. Xwedeyê mezin dibêje:

{إِنَّمَا الصَّدَقَاتُ لِلْفُقَرَاءِ وَالْمَسَاكِينِ وَالْعَامِلِينَ عَلَيْهَا وَالْمُؤَلَّفَةِ قُلُوبُهُمْ وَفِي الرِّقَابِ وَالْغَارِمِينَ وَفِي سَبِيلِ اللَّهِ وَابْنِ السَّبِيلِ فَرِيضَةً مِنَ اللَّهِ وَاللَّهُ عَلِيمٌ حَكِيمٌ} At- Tewbe: 9 : 60.

المُؤمِن (al-) mu'min : çavkaniya ewlehiyê

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Yê ku ji xulamên xwe yên perwermend ewlehî peyda dike, û hemî afirandina xwe ji agirê Dojehê diparêze.

مُؤمِن (مُؤمنون) mu'min (kom. mu'minûn) : bawermend . (باوەڕدار "باوەڕداران")

Di wateya Islamî de, bi wateya kesê ku bi temamtî bi îslamê bawerkirîye.

سُورَة المُؤمنون (mu'minûn (sûret al- : sûreta bawermendan

Ev Sûreta 23ê ya Quranê ye. Ewi bi vî navê mezin hatîye destnîşan kirin, ji ber ku ew bi taybetmendiyên bawermendên ku bi serkeftin li vê dunyayê û di ya dawînê de bi dest xistine.

مُباح (مُباحات) mubaḥ (kom. mubaḥat) : destûr (kirin an tişt)

Tişteke ku ji hêla olî ve hatîye destûr kirin, an jî ji hêla wê ve nayê qedexekirin. Rêza gelemperî ev e ku eger tiştên ku bi destûrûne; ta ku ew bi eşkereyî an jî nexşandî di Qur'anê an sunnetên Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be) de ne qedexe bin.

مُبارَك muberek : pîroze . (پیرۆزە)

Kesek an tiştek ku bereketa Xwedayî standbibe. Ji ber vê yekê ew dikare bibe çavkaniyeke bereketê. Ev peyv di pîrozkirina kesên din de tête bikar anîn, wek "zewaj mubarak".

مُباشَرة mubaşereh : têkiliya şexî

Têkiliya fizîkî: Ev yek amaje bi dema ku mêr bi laşê jina xwe kêfxweşî dike; ango ew di dema dewra heyvane de bilî têkiliya zayndî, bi têkiliya fizîkî radibe. Mêr vê yekê di dema mehane de bi jina xwe re dike .

مُباهَلة mubaheleh : daxwaza beramberî hev

Ev peyv ji lêkerê "'ibtihal" tê: ango duakirin an bereket ji bo Xwedê. Ev bêje behsa bûyera ku Xwedê têde fermanê li Resûlê xwe dike, (nimêj û silavên Xwedê lê be). Mebest jê hemberî berameberiya kesayetiyên navdar ên Xiristiyan ên wê serdemê li ser pirsa dîtina wan li hemberê Xwedê di çerçuva dîtina cîhanbîna Islamî de, ye . (Li Quranê binihêrin, 3: 61).

مُبتدَع mubtedi' : afirîner (nûveker) . (دروستکەر . داهێنەر)

Ew kesê ku helwestên(pratîkên/karên) wî ji hêla olî ve naye pejirandin ku ew wan wek parçekî (sûrekî) baweriyê dihesibîne.

المُبدِئ (al-) mubdi' : destpêker . (دەستپێکەر)

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Yê ku her tişt ji netiştekî afirînerdî ye.

مَبرور mebrûr : bêkêmasî . pir baş . xweşkirin

Têgeh bi gelemperî bi "Hac" re tê bikar anîn ku ew bi wateya hecîbûna ku baş hatîye çêkirin tê , bi rêya dûrxistina hemî kiryarên ku wê pûç dikin.

مُبطِل (مُبطِلات) mubţil (kom. mubţilat) : betalkirin

Tişta ku îbadetê an wekî wê betal dike, wekî xwînrijandina ku avdest betal dike, ku ji bo nimêjê hewce dike ku carek din avdestê bike, an jî di dema nimêjê de bi dengekî bilind bikene, ku ew nimêja yekê/î pûç dike.

kêfên cîhanê : **meta‘al-ḥeyat ad-dunya مَتاع الحياة الدُنيا**
Nîşana kêfên demkî di vê jiyanê de, berevajî kêfên herheyî di jiyana dawîn de.
jina bi kincê vekirî yan a ku xwe xemelandiye : **muteberrijeh مُتَبَرِّجة**
Ev têgeh behsa jina ku li ber mêrên xerib rêzê li qaîdeyên cilûbergên Islamî nagire, bi danxûyakirina parçeyên laşê ku diviyabû nixumandîba û zîneta(spehhîtîya) xemlandina li ser laşê xwe nîşan bide. (Li Qura'a 24: 31-60 binhêrin).
(پۆشراو) . jina nuxomandî : **muteḥejjibeh مُتحَجِّبة**
heyfkarî **: munteqim (al-) المُنْتَقِم**
Taybetmendiyeke Xwedayî ye, ku gunehkarên domdar ceza dike.
(ڕاسپاردە). pêşniyaze(**wesêkirî**) **: mendûb (kom. mendûbat) (مَنْدوبات) مَنْدوب**
Çalakiyeke guncawe an wesêkirî ye, lê ji hêla Pêxember ve (Xwedê wî pîroz bike û aştiyê bide wî) ne şert e.

betalkirin **: mensûx مَنْسُوخ**
Biryarek an fermanek ku ji hêla yekî din ve hatiye reşkirin an jî guhertin.
(کردنەوە) . vekirî **: munfetiḫ مُنْفَتِح**
Deng derdikeve, eger dev vekirî be û ziman jî nizm be.
(خەرجکەر) . xercikvan **: munfiq مُنْفِق**
Bi gelemperî ew behsa kesê ku xerçiyê ji bo Xwedê dike.
(کردەوەی شەرمنانە) . kiryarên şermî **: munker (kom. munkerat) (مُنكَرات) مُنكَر**
Tişteke ku ji hêla Islamê ve tête qedexekirin, dibe ku wekî "munkar" bête hesibandin, û ji erkê musilmana ye ku hişyariyê bikin û ji xirabiyan vegerin an wan serrastbikin. Xwedê Mezin dibêje:
{ادْعُ إِلَى سَبِيلِ رَبِّكَ بِالْحِكْمَةِ وَالْمَوْعِظَةِ الْحَسَنَةِ وَجَادِلْهُمْ بِالَّتِي هِيَ أَحْسَنُ} (An-Neḥil :16: 125).
Xwedê Teala dibêje:
{ وَمَنْ أَحْسَنُ قَوْلًا مِمَّنْ دَعَا إِلَى اللَّهِ وَعَمِلَ صَالِحًا وَقَالَ إِنَّنِي مِنَ الْمُسْلِمِينَ }(Fuśśelet: 41: 33).
: Munkir we Nekîr مُنكَر و نكير
Melek hatine erkpêdankirin ku miriyan di goristanên wan de bipirsînin. Ew ji wan dipirsin: " kî Xudayê te ye? Pêxemberê te kî ye? Pirtûka te ya pîroz çi ye? Dînê te çi ye?
semen **: Meny مَني**
Di dema ku musilman avikê tavêje, ew bi cenabe, loma ji wî tê xwestin ku tevahiya laşê xwe paqij bike, ji xwe Semen(avik) ji hêla xwe ve wekî "nejaseh" nayê hesibandin.
Eşkerebûna keremê **: menniyeh مَنيّة**

Eşkerebûna keremê, ji bo rûreşkirina mirov spasiya wî tîne bîra mirov. (Ji bo qedexekirina kiryarek bi vî rengî li Qur'anê, 2: 264 binihêrin.)

(کۆچبەران) . koçber(an) **: muhaj ir (kom. muhajirûn) (مُهاجِرون) مُهاجِر**

Musilmanek ku di dema zordestiya mezin a musilmanan de ji hêla Quriş pagan ve heta Mekkeyê di 8AH de ji alîyê Pêxemberê Muhemmed ve ji Mekkeyê berbi Madînayê ve koçber bû, (Allah wî pîroz bike û aramiyê bide). wekî dijberî "al-ansar".

(مێهر) . mehr **: mehr (kom. muhûr) (مُهور) مَهر**

Ew pere an diyariyek e ku kesek bide jinekê ku ew bizewice. "Sedaq" bibînin.

(مێهری یەکسانی) . mehrê wekhevî **: mehr al-miŝl مَهر المِثل**

Nextê helal ji bo jinan di heman rewşa civakî de.

bê deng **: mehmûs مَهموس**

Têlên dengî yên vekirî; da ku ne hejin. Dengdarên bê deng ev in: t, s, p û k.

(زاڵ) . kontrola(çavderîya) bilind **: muheymin (al-) المُهَيّمِن**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Ewê ku her tiştî di vê gerdûnê kontrol dike û li wan temaşe dike.

dem û cihên destnîşankirî **: mewaqît (tek. mîqat) (ميقات) مَواقِت**

"Mîqat" bibînin.

(پەیوەندی سێکسی) . tevhevkirin **: muwaqe‘eh جِماع .مُواقَعة**

Gihandina zayendî(cinsî) . Têkiliya cinsî heye.

(دڵسۆزی) . dilsozî **: muwalah مُوالاة**

Hevaltî û daxuyakirina dilsoziyê ji bo kesekî an hin kesan.

(هاورێیەتی لەگەڵ دوژمندا) . hevaltîya bi dijmin **: muwalat al-a‘da' مُوالاة الأعداء**

Hevgirtin bi dijmin re, nemaze li dijî musilmanan.

gunehên ku têk diçin **: mûbiqat (al-) (tek. mûbiqeh) (مُوبِقة)المُوبِقات**

Gunehên wêranker: Gunehên mezin ên ku dibin sedema helandina(tunekirina) kesekî ku xerabiyan li dinya û axretê dike.

(هۆکاری پێویستی) . sedema pêwest **: mûjib (kom. mûjibat) (مُوجبات) مُوجِب**

Tiştek (Hoyeke) pêwîst e. Ew tişta ku dihêle tişteke din pêwîst bibe, wek dewra mehane ku jin divê laşê xwe paqij bike, berî ku ew nimêj bike an dest bi Quranê bike.

yekparêz **: muweḥḥid مُوَحِّد**

Kesê ku tenê baweriyê bi yekaniya Xwedê dike.

Mûsa **: Mûsa مُوسى**

Pêxemberê Xwedê ji bo Israîliyan hat şand. Qur'an tijîye bi nîşanên ku amajê bi Pêxember Musa (silava Xwedê lê be) dikin, serpêhatiyên(hevdîtinên) wî bi Far'ûne Misirê û çîroka wî bi Israîlîyan re . (Mînakî: li Qur'ana, 20: 9-98 û 26: 10-66 binihêrin.)

(شڵەژ . فریودان) xapandin . qelpî **: mewḍû‘ مَوضوع**

Ev gotin behsa Hedîsa ku bi nav Pêxember hatiye çêkirin (silava Xwedê lê) dike.

nûnerê **: muweţţa' (al-) المُوطَّأ**

Pirtûka Hedîsên a ku ji hêla imam Malik ibn Anes ê ji Medînê, hatiye berhev kirin.

(ووتار) . gotara şîret **: mew‘iżah (kom. mewa‘iż) (مَواعِظ) مَوعِظة**

Gotinek giştî ye ku di her celeba axftinê de şîretê olî dike.

şer **: mewqi‘eh (kom. mewaqi‘) (مَواقِع) مَوقِعة**

Ev peyv di dîroka îslamî de ji bo hemî şeran tê bikaranîn, hem di rojên Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) û hem jî di demên din de.

(مردن به لێدان) . mirina bi lêdanê **: mewqûẑeh مَوقُوذة**

Bi gelemperî goştê ajalî tê xwarin, lê eger ew ku encama lêdanê de bimire; goştê wî li musilman qedexe ye, ji ber ku ew nayê gurandin(serjêkirin). (Li Qura'ne bibînin, 5: 3).

(نوێنەر) . nûner **: muwekkel مُوكَّل**

Nûnerê wekîl, Keseke ku ji hêla kesekî din ve ji bo nûnertiya wî tê destnîşankirin.

(نوێنەر) . nûner **: muwekkil مُوكِّل**

Ew kesê ku kesekî din li ser navê xwe erkpêdandike(destnîşandike).

(دایکبوونی پێغەمبەر) . rojbûna Pêxember **: mewlid (al-) an-nebewîy المَولِد النَّبوي**

Rojbûna Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) gereke di roja Duşemê, 12ê ya Rabi 'al-Awwal de be. Ew dikeve di sala 570ê z. Ev Peyv ji bo pîrozbahiyê tê bikaranîn.

mewla (kom. mewalî) (مَوالي) مَولى

1- Em vê gotinê gelek caran di Quranê de dibînin ku ji Xwedê re tê gotin.
2- Xizmên bav û kalan: Li gorî hin zanyaran, têgehe "maewalî" ku di Sûreta 4ê-(an) (ayeta 33ê) û 19ê(an) (ayeta 5ê) ya Qur'anê de tê dîtin; ew amajê bi xizmên dêûbavan dike.

(ئاژەڵی مردوو) . ajal/sewalê mirî **: meyteh مَيتة**

Goştê ajalê ku bi awayekî xwezayî dimire, li musilmanan qedexe ye ku wî goştî wusa bixwe, heya ku ew ajal bi rêkûpêk jî were serjêkirin.

peyman, soz **: mîŝaq (kom. mewaŝîq) (مَواثيق) مِيثاق**

Pêkanîna peymana (neşikandin) di nav bawermendan de ye ku wek taybetmendiyeke girîng tê hesibandin. (li Quranê 13:20, binêrin .)

("یارییەکی بەختەوەرە " قومارکردن) . lîstikeke şansaneye **: meyser مَيسر**

Qumarkirin ji hêla Islamê ve qedexe ye. (Li Qur'anê binêrin, 5: 90-91 , 2: 219).

dem û cîh hate destnîşankirin **: mîqat (kom. mewaqît) (مَواقِت) ميقات**

dem û cîhêb destnîşankirî **: mîqat (kom. mewaqît) ميقات (مَواقِت)**

Ji bo "hecacan" bi gelemperî tê wateya ku ew li cihê ku divê ew "ihram" (kevirê hecî) biweşin .

: mîka'yîl ميكائيل

Melake ku berpirsiyarê belavkirina bendan e ku ji hêla Yezdan ve ji bo tevahiya afirînerên curbecur.

mîlana Islamî **: mîl ميل**

Tête gotin ku mîlîsê Islamî nêzikî 1848 metrî ye.

(ن)

koma parastiyê **: najiyeh (al-firqeh an-) (الفِرقة) الناجية**

Ev beş behsa Musilmanên ku dê bên parastin di Roja qiyametê(vejînê) de ji bo şopandina wan ya Qur'anê û hîndariya pêxember Mihemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) dike, berevajî wan komên ku ji rê dûr ketine .

sûreya kişîneran **: nazi'at (sûret an-) سُورَة النازِعات**

Ev sûrta 79-an ji Quranê ye, sernavê wê ji gotina ayeta yekem tê.
Sûre bi şêwaza sondê dest pê kiriye. Ev sûre nimûneyeke ji nimûneyên ku dilê mirovî yê bi rastiya roja dawiyê re; cidiyeta wê, cewhera wê di nirxandina xwedayî de ya koka vê cîhana mirovî, û rêveberiya jorîn a qonaxên vê derketinê û gavên wê li ser rûyê erdê ye û piştre derbasî jiyana heymayî a ku temsîla rastiya Axretê dike, dibe.

sûreya mirovan **: nas (sûret an) (سُورَة) الناس**

Ev Sûrta 114an, Sûrta Dawî ya Quranê ye, ku sernavê wê ji peyva ku sê caran di Sûreyê de derbas dibe. Ew bangî Pêxember (nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) û şopînerên wî dike. Wî bi lêkera fermanê dest pê kiriye (bibêje: Ez xwe bi Xudanê mirovan digerim). Di wê de mirov xwe li Xudanê alemê digire, ku wî ji xerabiya şeytan û arîkarên wî ji cinên mirovan û cinan, ji xerabiyên navxweyî yên mirovan û ji kêmasiyan biparêze.

betalkirin **: nasix (kom. newasix) (نواسِخ) ناسِخ**

Biryarnameyek an wehiyeke ku ya berî wê pûç dike an diguhezîne.

nûnerê diyarî **: nażir al-weqf . ناظِر الوَقف**

Kesê ku ji bo birêvebirina karûbarên weqfê berpirsiyar e.

pêşkêşvanê berjewendiyê **: nafi'(an -) النافِع**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Yekane ye ku dikare feydeyan bide an jî paşde vegerîne.

pratîka vebijarkî **: nafileh (kom. newafil) (نوافِل) نافِلة**

Adeteke di perestiyê de, wek zêdekirina nimêjan an rojîyê.

jina bêserûber(serhildanê) **naşiz ناشِز**

Jineka ku li hemberê zilamê xwe neheqiyê serhildanê (miqerisiyê) dike.

sûreya agahdaran **: neba' (sûret an-) سُورَة النبأ**

Ev sûrta 87 an ye û destpêka sûrta paşîn a (30emîn) ji ayetên Qur'anê ye, ku sernavê xwe ji ayeta duyemîn digire, behsa hatina dema darizandinê dike. Behsa nimûneyên qenciyên Xwedê li ser cîhana derdorê me dike (ayetên 6-16) û piştre amaje bi hatina Roja dadgehê "Qiyametê " û bûyerên tevhev û yên li peyî dike, nemaze cezakirina redkerê baweriyê û xelatên bawermendan.

Pêxembertî **: nubuwweh نُبُوَّة**

Tişta ku tê pêşbîn kirin.

Pêxember **: nebîy (kom. 'anbiya') (أنبياء) نَبي**

Zilameke ku ji hêla Xwedê ve hatîye hilbijartin da ku berê komek mirov bide riya Xwedê li gurî zanyarên cîhanê.

Pêxemberê nexwendî **: nebîy (an-) al-'ummîy النبي الأُمي**

Çavkanî Pêxember Mohemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) e ku ne dikarî bixwîne û ne jî binivîse. Hin zanyar dibîjin ku peyva " 'ummiy" bi wateya gincanî (ne-cihû) jî tê(her du ravekirin rastin).(li Quranê, 7: 157-8 binêrin).

نَجاسة **(نَجاسات) nejaseh (kom. nejasat) :** nepakbûnê . pisî . (پیس)

Tişteke ku divê ji laş û cilê kesê musilman were derxistin berî ku ew nimêj bike.

نجّس **(يُنجّس) nejjese (yunejjis) :** pêsîkirin

Pêsîkirina tiştekî an karekî ku pak bû .

النَّجاشي **(an-) nejaşî :** Nejaşî

Qiralê Etiyopîyê di dema Pêxember Muhemmed de(nimêj û silavên Xwedê lê be) bû. Ew yekem kes bû ku pêşwaziya koçberên musilman li welatê xwe kirîye, û dîrokzanên musilman ragihandine ku wî bi rastî bawerî bi îslamê anîye.

نَجَش **nejeş :** mezinahî ya xapînok

Mezadkirin zêdebez bi mebesta ku buhayek bihatir bi dest bixe. Bi xwezayî, ev tişt di Islamê qedexe ye li gorî Hedîsa Pêxember li ser vê mijarê.

سُورَة النَجم **nejm (sûret an-) :** sûreya stêr

Ev Sûrta 53ê ya Qur'anê ye, ku navê xwe ji ayeta yekemîn digire. Em di vê sûrê de rabûna mucîzeyî ya Pêxember Mihemed dibînin, çawa ew bi pêxemberên berî xwe re civiya(hevdîtin dibînin) ye, û îşaret anîye li ser rewşa Bihuşt û mirovên wê, dojeh û mirovên wê. Di vê rêwîtiya esmanî de, Pêxember(nimêj û silavên Xwedê lê be), rasterast bi Xwedaydê banî re têkildar bûye.(ayetên 1-18).

النَجاة **(an-) nejah :** xelaskirin . rizgarkirin

Rewşeke rizgarîyê ye ji tiştek xirab an ziyandar. Bi gelemperî em peyva ku di vegotinên mîna "an-nejat mine an-nar" (ji agir hatî xelas kirin) dibihîzin.

نَجوى **nejwa :** gotûbêjek . (گفتوگۆیەک)

Gotûbêjeke veşartîye ku di nava koma Kafiran de li dijî Pêxember Muhemmed û şopînerên wî, dihat kirin (nimêj û silavên Xwedê li ser wî û wan be). li 8: Surah al-Mujadeleh (58) binêre.

نَحَر **(يَنحَر) neḥere (yenḥer) :** gorandina/serjêkirina devehê . (سەربرین)

Serjêkirina devê (weşteran), bi gelemperî di dema ku ew di rewşeke(rawestî) sekinî de ye.

سُورَة النَّحِل **neḥI (sûret an-) :** sûreya mêşa hûngivê

Ev Sûrta 16-an a Quranê ye, tê xwestin ku mirov mucîzeya afirîna wî, û bandora hingivê li ser başbûnê daye (Jimarên 68-69). Di vê sûrê de teşeyên din ên qenciya Xwedê yên ku ew bi mirov re dike, di vê sûrê de hatîye..

نِحَلة **(نِحَل) niḥleh (kom. niḥel)**

1-Mezheb û Ola Bawermendîyê: ew behsa mezhebên cihêreng dike, li dijî "olan".

2- Dîyarîya belaş : Ev têgeh di Quranê de heye ku bi wateyeka taybet di yek ayetek de tê dîtin (Sûrta 4: 4.)

نَدب **nedb :** hewar kirin . (هاوارکردن)

Qîrîn di Islamê de qedexe ye, heta di bûyera mirina mirovekî hêja jî de nabe bigirî .

نَذر **(يَنذر. ج: نذور) nezere (yenzur) (kom. nuzûr) :** soz kirin . (بەڵێن دراوە)

Soza ku daye Xwedê ku tiştekî bike, bi gelemperî ew baş be.

(ئاگادارکردنەوە) . hişyarker : **neẕîr نَذير**

Ew kesê ku gunehkaran ji cezayê Xwedê hişyar dike.

dabezîna Qur'anê **: nuzûl al-qur'an نُزول القُرآن**

Pêvajoya ku tê de Qur'an ji Xwedê radestî Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) bû ye ku ew bi rêya serokê Melakan Cibraîl gihîştîye.

Qur’ana Pîroz di sê qonaxan de hatîye dabeşkirin(eşkere kirin):

1. Ew yekem li ser Lauh al-Mahfuz hatîye nivîsandin, ango li ser tabloya parastî ya li ezmana heftemîn hatîye nivîsandin.
2. Li ser Şeva Qadr Xwedayê banî tevahîya Qur’anê şandîye Baitul 'Izza li ezmana yekem.
3. Di meha Remezanê de, Xwedayê banî ferman daye Ruhê Pîroz, melak Cebraîl, silavên Xwedê lê be, dest bi eşkerekirina Qur’ana pîroz ji bo pêxember Muhemmed kirîye, nimêj û silavên Xwedê lê be. Lê ne bi yekcarî. Daxuyaniya tevahîya Qur’ana pîroz bîst û sê salan kişandîye.

sûreya jinan **: nisa' (sûret an-) سُورَةِ النِساء**

Ev sûrta çaran a Quranê ye. Ew navê xwe ji mijara sereke ya serî, bi mijarên ku bi jinan ve girêdayî ne digire.

Ew qala bangkirina bawerîyê, çîrokên miletên berê, sêwiyan, qanûna mîratê, qanûnên gelemperî yên parastina drav, qanûnên têkildarî zewacê.

têkiliya heman xwînê **: neseb (kom. 'ansab) (أنساب) نَسَب**

bapîran.

(داری خێزان) . dara malbatê **: neseb (şejeret an-) شجرة النَسَب**

Dara malbata kesekî; ango navên bav û kalên wî.

qedex kirin **: nesexe (yensexu) نسخ (ينسخ)**

Rakirina hin sûreyên wehyê ji Qur’anê ji hêla kesên din ve.

nesr **: nesr نَسْر**

Navê xwedayekî ye ku ew ji hêla gelê Pêxember Nûh ve dihat perestin. (li Quranê 71: 23 binêrin).

awa **: nusuk (kom. 'ansak) (أنْساك) نُسُك**

Rêûresmên olî yên ku divê li ber çavan bên girtin.

deyn paş xistin **: nesîy'eh نَسيئة**

Deynê taloqkirî: deyneke li ser daxwaza deyndarî tê paşve xistin. Ji sûda (feyda)deynê taloqkirî re "riba an-nesîy'eh" tê gotin.

(ڕۆژی قیامەت) . roja qiyametê **: nuşûr (yawm an-) (يوم الـ) نُشور**

(فەرامۆشکردن) . bêguhdarî (gunehkar in) **: nuşûz نُشوز**

Jin an mêr red dike ku mafê mêr / jinê bicîh bîne, yan jî mafê hevjiyanê binpêk bike. (li Qur-an, 4: 34 û 128)binêrin . (Her weha li "naşiz" binihêrin).

mîqdara baca herî kêm **: niṡab (kom. 'anṡibeh) (أنصِبة) نِصاب**

Hêjeya herî hindik ji bo tiştê ku gerek mirov "zekate" bide. Mînak, çil berx hejmara herî kêm a berxan e ku mirov baca xêrê bide. Ger hejmar ji çilî kêmtir be, wê hingê nayê xwestin ku mirov baca ("zekate ") bide.

sûreya serkeftinê (piştgirîyê) **: neṡir (sûret an-) سُورَة النصر**

Ev sûrta 110 ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji ayeta yekemîn digire, ew behsa piştgirî an arîkarîya kesê hewcedar dike. Ev Sûrê behsa destekdayîna Xwedayê banî ya ku daye Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be), di dema ku jimarek mezin bi dilxwazî û aşîtî, piştî vekirina Mekkeyê tevlî qada Islamê dibin, dike.

xirîstiyan . mesîhparêz **: neṡranîy (kom. neṡara) (نصارى) نصراني**

Piştgirên Pêxember Issa (silava Xwedê lê be).

xirîstiyanî **: neṡranîyeh (an -) النصرانيّة**

Di eslê xwe de, ev ol, ola Issa ye, lê niha ew behsa bawerîyên Xiristiyanan dike.

nusayrê **: nuṡeyrîyeh نُصيريّة**

Komek tundrê ji Şiîyan ne ku xwedêgiravî bi Imam Alî, û bawer dikin ku pêxemberîtî ji bo Imam Alî, pismamê Pêxember, hatîye. Ew piştre bi navê Elawîyan hatine binav kirin. Piştgirên vê komê bi taybetî li Sûrîyê têne dîtin.

(دەق) . nivîstok **: neṡṡ نَصّ**

Nivîsarên zelal ên şerîyetê, wek: Qur-an û Sunneh.

biryara zelal **: neṡṡ (kom. nuṡûṡ) نصّ (نصوص)**

Rêziknameya nivîsê ya eşkere.

paqij . dilrast **: neṡûḥ نَصوح**

Bi gelemperî ev peyv bi "tewbeh" re tê bikar anîn.

(ئامۆژگاری) . şîret **: neṡîḥeh (kom. neṡa'iḥ) (نَصائِح) نَصيحة**

Pêşkêşkirina şîretê.

şîretkirina rêberên musilman **: neṡîḥeh li-a'immet al-muslimîn نَصيحة لأئمةِ المُسلِمين**

Pêşniyarkirina şîreta dilpakî ji bo rêberên musilmanan.

dilsozî bi Xwedayê mezin re **: neṡîḥeh li-llahi te'ela نَصيحة للهِ تَعالى**

Rastebûn ji bo xwedayê bilinde: dilsozî (dirustî) têkliya bi Xwedê re ye.

selwanê mirî bi pihînê **: neţîḥeh نَطيحة**

Ajala ku bi pihîna yekî din mirîye. Kesê Musilman nabe ku goştê heywanekî weha bixwe, ji ber ku ew bi teşê rast nayê gurandin. (Li Qur'anê, 5: 3 binêrin).

zayinî . zayîna zarokan **: nifas نِفاس**

Li "Nufesa' " binêrin.

jina zayînbûnê **: nufesa' نُفساء**

Ev yek ji bo jina ku di dema niha(nû) zarokek anîye dinê de têgotin û ev têgeh bi gelemperî ji bo jina ku piştî zayînê xwîn jibin wê diçe, tê bikaranîn; di dema ku ji wê jinê nayê xwestin ku nimê bike, rojî bigire, an dest bide Quranê Pîroz. Bi gelemperî, ev dikare 40 rojan bidome.

(سروشتی فریودەر) . xweza xapînok **: nefs (an-) al-'ammereh النَّفس الأمّارة**

Ew aliyek ji zatê mirov e ku hewl tête kirin ku ew bête xapandin da ku tiştên xirab bike, bi gelemperî têde kêfa wan tê dîtin. (li "an-nefs allewwameh"binêrin).

(ویژدان) . wijdan **: nefs (an-) al-lewwameh النَّفس اللوَّامة**

Ew bi wateya zatê ku nahêle mirov tiştên çewt bike, berevajî zatê xwe yê xapînok a ku dihêle mirov tiştên xirab bike.

gîyanê arambûyî**: nefs (an-) al-muţme'inneh النَّفس المُطمئِنة**

Giyanê bawermendî . Em di Quranê de, amajê bi vê têrmê dibînin, 89: 27-30.

pêşdeçûna ji 'Arefeh **: nefreh (an--) min 'erefeh النفرة من عرفة**

Hhacî piştî 11 rojan ji rojavabûna roja nehemîn a Hecê, ji deşta Arefatê ber bi Muzdalifeh ve diçin, li wêderê şevekî derbas dikin berî ku ew berê xwe di roja dehêde bidin Monayê.

(دووڕوویی بچووکتر) . durûtîya piçûk **: nifaq aṡẍer نِفاق أصْغَر**

Kiryarên ku dikarin bandora xwe ya neyînî li ser bawermendîya saxlem bike, lê ev helwest têrê nake ku wî bike kafir, wekî kirina derewan û şikandina sozan .

(دووڕوویی گەورەتر) . durûtîyên mezin **: nifaq akber نِفاق أكْبَر**

Ew kesê xwe wek kesekî bawermend dide xûyakirin, lê ew bi xwe ji hendurê ve kafire. Di Qur 'anê de ev celeb bi durûtîyê tête destnîşan kirin. Wek nimûne di Sûrta (20: 2) an de û di Sûrta bi navê "Sûrta munafiqîn = hîpokiyan": (63).

(خەرجی) . lêçûn **: nefeqeh (kom. nefeqat) (نَفَقات) نَفقَة**

Ew pereyên ku bi gelemperî ji aliyê hevserê wê yê berê ve ji bo piştgiriya wê di " dema bendê " tê dayîn an ji bo piştevaniya wê, an jî piştgirîya zarokên xwe dide. Ev Peyv bi giştî bi wateya lêçûn an jî piştgirîya darayî.

(پەردە) . çarşef **: niqab (anqibeh) (أنقِبة) نِقاب**

Dismalsergir tevahiya rûyê jinê ji bîlî çavan diveşerê. Divê jin wê di dema heca Mekeyê de li xwe nake.

birêvebir **: neqîb (kom. nuqaba') (نُقباء) نَقيب**

Ew kesê ku rêveberîya gelek mirovan dike.

: neqḍ نَقض

1-betalkirin: derketina tiştekî, anku serbestberdana destava piçûk(mîzê) an destava mezin. . . hwd.
2-Binpêkirin: peyman û sozan, ev yek bi wateya şikandina sozê an binpêkirina peyman tê.

(نووسراو) . nivîsar **: neql (an-) النَقِل**

Nivîstoka Quranê û Hhedîsên Pêxemberî.

("گواستراوەتەوە " نێردرا) veguhestinî (şandinî) : **neqlîy نقلي**

Bi gelemperî, ev yek amajê bi Qur'an û Hhedîsên Pêxemberê (nimêj û silavên Xwedê lê be) dike.

(هاوسەرگیری) . zewicîn/zewac **: nekeḫe (yenkeḫ) (يَنكح) نَكح**
nikaḫu al-istibḍa، نكاح الاستبضاع

Zewaceke bijartî ya demkîye, ku têde jin bi mêrekî din re bi mebesta ku ew ji wî avis bibe, dimîne, û dûvre ew li mêrê xwe vedigere.

(هاوسەرگیری یەکتر) zewaca hevûdu **: nikaḫ aş-şiẍar نِكاح الشِغار**

Ew zilamê ku desturê dide (keça xwe an xwişka xwe) ku ew bi kesekî din re bizewice, herweha ew zilam jî (keça xwe an xwişka xwe) wek berdêlî bi wî zilamî re dizewicîne beyê " mehir". Di Islamê de ev yek qedexe ye.

(هاوسەرگیری گەندەڵی) . zewaca bêserûber(pûç) : **nikaḥ fasid نِكاح فاسِد**

Ew zewaca ku nederbasdar ku pêdiviyên bingehîn ên zewaca guncan binpê dike, mînak: zewaca bi xizmekî ji pileya(rêzeka) yekem.

("هاوسەرگیری خۆشی " بۆ ماوەیەک). zewaca demekî : **nikaḥ al-mut'eh نِكاح المُتعة**

Ev bi wateya 'zewaca kêfê tê.' Ev zewac bi razîbûna herdu aliyan ji bo demek diyarkirî tê kirin. Ev yek li gorî Islamê qedexe ye.

Nekir : **Nekîr نَكير**

Ew navê yek ji her du milyaketên ku di gorê de pirsan ji mirîyan dike .(Li "munkar wa nakir." Binêr).

sûreya mîrokê (milên) : **nemil (sûret an-) سُورَة النَمل**

Ev Sûrta 27 ya Qur'anê ye, ku sernavê wê ji çîrokên qidreta Pêxember Silêman ku ji zimanê heywanan têdigihîje, tevî mîrok tê(18). Ev sûrê beha gelek keremên taybet yên ku Xwedê dane Sulêman Pêxember dike, di nav de danûstendinên wî bi çûkan re, nemaze ew hudhudê ku ji wî re agahî di derbarê şahbanûya Seba' de berhev dikir. Herweha têkiliyên di navbera wê û Sulêman de, civîna wan û pejirandina wê bi Islamê, ku mislmanbûna wê ji hêla Sulêman ve hatîyê pêşwazî kirin; di vê Sûreta taybet de têne vegotin (15-41), çîrokên din li ser rewşa Pêxemberên din û gelên wan di heman demê de têne dîtin .

Nemrûd : **Nemrûd نَمرود**

Padîşahê pûtperest yê zordar ku ferman dabû ku Pêxember Ibrahîm (nimêj û silavên Xwedê lê be) bavêjin di nav agir de. (2: 258). Di Erebî de ev nav ji bo serhildan û pozbilindîyê tê bikaranîn.

agahdar : **nemmam نَمّام**

Ew Kesê ku gotinên xirab li dijî kesekî din radigihîne.

(گۆسیپ) . gelac, vegotin, gotegot : **nemîmeh نميمة**

Ew kesê ku tiştên xirab ên ku ji hêla kesekî li dijî kesekî din hatîye gotin, digerîne, ev yek bi tundî ji hêla Islamê ve hatîye şermezarkirin.

(ڕۆژ) . roj : **nehar (kom. anhur) (أنهُر) نهار**

Roj, berevajî şevê, ku bi derketina rojê re dest pê dike û bi rojavabûnê re bi dawî dibe.

(خراپە قەدەغەکردن) . qedexe kirina xeletiyê : **nehî 'en al-munker نَهي عن المُنكَر**

Qedexeya çewtîyê. Pêşîlêgirtin an rawestandina kiryarên çewt, tevgerên xirab û axaftina çewt jî tê de. Ango bi gotinî û kirinî.

(کردارە نادروستەکان) . kiryarên betal : **neweqiḍ (tek. neqiḍeh) (ناقِضة) نَواقِض**

Kiryarên xerabûyî: di nav wan de kiryarên devkî jî, ku rewşa taybet (wekî paqijîyê) bêbandor dikin. Ji ber vê yekê em bi kêmasîyê "betalkirina avdestiyê", "betalkirina nimêjê" dibihîzin.

(قەدەغەکردن) . qedexe : **newahî نَواهي**

Karên ku ji hêla Islamê ve hatine qedexekirin.

Nûh : **Nûḥ نُوح**

Pêxembereke ku ji hêla Xwedê ve ji kesên ku xwedak (pûtek)diparastin hatîye şandin, di dema ku ew ji yekîtîya Xweda yê tekane dûr diketin, Xwedayê banî ew bi lehiyê tofanê cizakirin. Lê Xweda Nûh û xwedanê gemîyê ji lehîya tofanê rizgar dike; ev rastî li çend deverên Quranê têne dîtin. (Li Qur-an, 11: 35-48 û 71 binihêrin).

sûreya Nûh **: nûḥ (sûret) سُورَة نوح**

Ev Sûrta 71ê ya Qur'anê ye, ku sernavê wê ji navê Pêxember Nûh yê ku navê wî di ayetên 1, 21 û 26-ê de derbasbûye, hatîye wergirtin ji ber ku tevahîya Sûrta li ser wî û mirovên wî yeku wan bawerî bi wî ne anîne, û wan hînkirinên wî red kiribûn. Loma wî ew di bin lehiyê de xeniqand, carnûsa wan bi agir derbirîbû. ..." (ayeta 26). Agahîyên berfireh di dorbarê Nûh, û mirovên wî û felekê de di Sûreteke din de têne dîtin . (Li Qur'anê binêrin, 11: 25-48).

(ڕوناکی) . ronahî **: nûr (an-) نور**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Çavkanîya tevahîya ronahiyê li ser rûyê vê gerdûnê.

sûreya ronahîyê **: nûr (sûret an-) سُورَة النور**

Ev Sûrta 24ê ya Quranê ye, ku sernavê wê ji ayeta 35 tê, "Xwedê ronahîya ezmanan û erdê ye." Di nav babetên taybet yên vê Sûrê de, mijarên girêdayî bi rêgezên helwetsa têkiliyê re, hene. Têkilîya di navbera mêr û jinan de, wekî zayendê neqanûnî tête dîtin, û cezay gunehkariyê teşhîrkirinê,û tawanbariya zînayê, û wekî kêmkirina awrên mirovî, veşartina xemlandina jinan ji biyanîyan, û destûr xwestin berî ku mirov derbasî(bikeve) maleke bayanî bibe. Di vê Sûrê de jî redkirina şermezariya xirabîya ku ji aliyê mûnafiqan ve li dijî jina Pêxember a pak û paqij 'Ayşê, ku Xwedayê banî Ayşê bêguneh ji vê sûcdarkirinê beraet kir, û agahîyan dide musilmanan û wan di vê mijarê de hişyar dike....". (ayetên 11-19).

: nûn at-tenwîn نون التَّنوين

/ N / aw tîba ku di erebî de tête bilêvkirin lê nehatîye nivîsandin, wekî delîlên ku navdêr ne diyar e (ango nebûna diyarkirina navdêr e), mînaka كُتُبٌ navdêr / kutubun.

bilêvkirina 'n' a rawetandî **: nûn sakineh نون ساكنة**

"N" di tu peyvan de li pey dengdêrekê nayê.

bilêvkirina (n) dengdar **: nûn muteḥerrikeh نون مُتحرِّكة**

/ N / li pey dengdêrekê tê, li dijê "nuna sakin : dengdar" (n. bêbingeh).

(هاوارکردن) . hewar kirin **: niyaḥeh نياحة**

Girîgazî li ser mirovekî mirîye, dibe ku mirov cilûbergên xwe ..hwd diqetîne. Ev êş di Islamê de qedexe ye.

(مەبەست) . mebest **: nîyeh (kom. nîyat) (نيّات) نيّة**

Mebest (Niyet)şertek pêşîn e ji bo her bawermendî an karî. Bi rastî, li gorî Pêxember (nimêj û silavên Xwedê lê be), kiryarên mirovî li gurî mebest û armancên wî têne nirxandin(darizandin).

(هـ)

Habel **: Habîl هابيل**

Kurê Ademê baş bû ku ew ji hêla birayê wî Qabil ve hatîyê kuştin (li Quranê, 5: 31 binhêrin).

Hager **: Hajir هاجِر**

Jina duyemîn a Pêxember Ibrahîm (nimêj û silavên Xwedê li ser wî be) û dayika Pêxember Ismaîl (silava Xwede li ser wî be) bû. Ew bi Pêxember Ibrahîm re û bi kurê xwe yê piçûk Ismaîl re çûbû Mekkê, (silava Xwede li ser wî be). Ew ji rûniştvanên yekem in ê ku li wir bûn niştecî.

(ڕێبەری بەرز) . rêbernameya bilind **: hadî (al-) الهادي**

Taybetmendiyeke Xwedayî ye. Rêbernameya tekane(tenê) û rastîn e.

Harut û Marut **: Harût wa Marût هاروت وماروت**

Navên du milyaketên Babîlê ne ku ew bi sêrbazîyê ve girêdayî bûn. (Li Qur'anê, 2: 102 binêrin).

Harûn **: Harûn هارون**

Ew birayê Pêxember Mûsa bû. Xweda ew bi Mûsa re şandibû li ba Fara'un, li ser daxwaza Mûsa, yê ku digot ku Harûn ji wî bêjetir bû (Li Qur-anê, mînak. 28: 34-35 binêrin).

Haşemî **: Haşimiyî هاشمي**

Endamekî hoza(eşîra) Haşimî ya Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) ye an ew ji nijada wê eşîrê ye.

Hubel **: Hubel هُبَل**

Ev navê xwedakekî(pûtekî) bû ku wî di Ka'beyê de berî hatina îslamê cîh girtibû.

(ئابڕووچوون . دەستدرێژییەکی) . rûreşkirin . destdirêjî **: hetk al-'irḍ هَتك العِرض**

Binpêkirina rûmeta mirovekî an zirar kirina wî, wek mînak: destavêtina jinekê/tecawizkirina jinek.ê

(واز لەقورئان بهێنرێ) . hiştina Qur'anê **: hejr al-qur'an هَجْر القُرآن**

Hiştina Qur'anê an ji hînkirinên wê nezanîn. (Kurman bibînin, 25:30.)

Berdana(hiştina) Qur'anê an piştguhkirina hînkirinên wê. (Li Qur'an bibînin, 25:30.)

(واز هێنان لە ژنەکە) . dûrbûna jinê **:hejir az-zewjeh هَجر الزَّوْجة**

Bi gelemperî di dema ku mêr ji jina xwe dûr dikeve an bi wê re di bin heman nivînê de ne raze.

(بەڕێوەبردن . ڕێنوێنی) . birêvebirî : **hidayeh هِداية**

Nîşandina rêya rast .

(ڕێنوێنی). birêvebir **: huda هُدى**

Şîretkarî. Riya rastîn an rênîşankirina wê ji bo kesekî.

(سەرکردایەتی) . rêberî **: heda (yehdî) هَدى(يَهْدِي)**

Riya rast nîşanî kesekî dike .

(ڕێگەپێدان). rêdan . pêşkêşî : **hedy(un) هَدي**

Ajaleke ku hecî wî dike qurban.

koçberî (koçberbûn) : **hijreh (hijrîyeh) (هجريّة) هجرة**

Pêxember Muhemmed (nimêj û silavên Xwedê lê be) û şopindarên wî ji Mekkê koçberî Medîne di sala 622-an de bûn.

salnameya hîcrî, koçberî : **hijrî هِجري**

Navê salnameya heyve ya îslamî ye. Ev Nav musilmanên destpêkê yên ku ji Mekkê koçberî Medîneyê bûne bi xwe re birine Medîna .

Musilman ji bo erkên xwe yên olî balpiştîya xwe li ser salnameyên rojê(tavê) û heyvê ava dikin. Ya paşîn bi donzdeh rojan ji Rojê kurttir e. Girtina rojîyê di meha Remezanê de, pîrozkirina du cejnên sereke (Cejna Remezan û Cejna Qurbanê), pêkanîna Hecê li Mekkeyê, û çalakiyên din ên olî girêdayî mehên heyvê ne. Navên mehên heyvê ev in: Muherrem, Sefer, Rebi 'a yekem, Rabi' Al-xir, Jumada yekem, Jumada duyam, Rejeb, Şe'ban, Ramazan, Şewwal, Zul-Qe'edeh, û Zul–Hicceh. Demjimêrîna nimêjanê rojane bi pergala rojê ve girêdayî ye.

hellelle (yuhellil) (يُهلّل) هَلّل

Dibêjin: "la 'ilahe illa Allah ". Bi wateyê, "Ji xeynî Xwedê pêve tu xwedayên din tûne ye"tê .

rawestandina gûzê/hemza : **hemzeh هَمزة**

Ew yekem tîpa alfabeya Erebî ye. Ev deng di xwendina tajwîdî ya 'Qura'anê de girîng e, ji ber ku ew bandora xwe li ser dirêjkirina dengên pêşîn ên wê dike.

sûreya paşgotinê : **humezeh (sûret al-) سُورَة الهُمَزة**

Ev Sûrta 104ê ya Qur'anê ye, sernavê xwe ji ayeta yekemîn, werdigire. Ew gef û tirsê li ser kesên ku kêmasiyên mirovan eşkere dikin.

Hûd هود

Navê Pêxemberekî ku ew ji bo hozeke (eşîreke) ku li kendava Erebî dima, hatîye şandin. (Li Quranê, 26: 123-40 binêrin).

sûreya Hûd : **hûd (sûret -) سُورَة هود**

Ev Sûrta 11ê ya Qur'anê ye, ku sernavê wê ji navê Pêxember "Hûd" û gelên wî hatîye wergirtin (ayetên 50 ta 60). Têde çîrokên hin Pêxemberên jî hene. Wek Noh û Hûd. Piştre behsa bûyera hûrgulî ya Pêxember Şu'eyb ji Madyanê dike, û reftara xelet(xirab) a mirovê wî di danûstandinên bazirganî de, têne destnîşan kirin (ayetên 84-95ê).

daxwazên : **hewa (al-) الهَوَى**

Daxwazî û nezwatên mirovî. (Li Qur'anê binêrin, 38: 26.)

(و)

واجِب wajib : pêwîst e. mecbûrî . (پێویسته)
1-Ji hêla dîn ve tê xwestin.
2- Erk, berpirsiyar: Tişteke ku ji hêla olê ve hatîye mecbûr kirin.
واجِب الوجود wajib al-wujûd : bê guman e . (دەبێت بوونی هەبێت)
Ev peyv ji bo Xwedayê banî tête bikaranîn ku hebûna wî bê gumane
واجِد (al-) wajid : dîtbar . (بینراو)
Taybetmendiya xwedayî. Yê ku nayê veşartin û winda nabe.
واحِد (al-) waḥid : Yek . (یەک)
Taybetmendiya xwedayî. Ew kesê bêhempa di yekbûn û yekaneyî de û bê ortax.
وَأد البَنات W'id al- benat: binerdkirina keçan pitika
Binerdkirina keçikên sax, Yek ji dab û nerêtên (adetên) Ereban di serdema berî-Islamî de.
الوارِث (al-) wariŝ : mîratgir . (میراتگرەکە)
Taybetmendiya xwedayî. Mîratvanê rastîn ê tiştan, ji ber ku ew heyîneke tekane herheyî ye.
وارِث (ورثة) wariŝ (kom. wereŝaeh) : mîratgir(an) . (میراتگرەکە)
Kesê ku mîrasê digire. Belavkirina mîratê di Islamê de di Qur’anê de bi zelalî hatîye diyar kirin. Ew ne pirsa peyman an daxwaza viyana miriyan e. (wek nimûne, li Sûreta Çarem a Qur’ana Pîroz, ayetên 11-12 û 176. binêrin. Ji bo vê yekê zanisteke taybet heye, ku jê re dibêjin “ilm al-fera'id : zanista erkan”).
الواسِع (al-) wasi‘ : fereh
Taybetmendiya xwedayî. Yê ku yekane xwadan zanebûn û dilovanîye ku her kesî û her tiştî hembêz bike.
واعِظ (وَعّاظ) wa‘iż (kom. wu‘‘aż)(: şîretvan . (وتاربێژ)
Keseke ku yên din re şîret û hîn dike.
واقِع (يُواقِع) waqe‘e (yuwaqi‘) : berhev kirin . (کۆکردنەوەی " پەیوەندی سێکسی").
Têkiliya zayendîya ku bi kesekî din re dike.
الواقِعة (sûret al-) waqi‘eh : sûreta bûyera neçareser(neçar)
Ev Sûreta 56-an a Qurana Pîroz e, ku ew ji peyva ayeta yekem tê ku saeta dîn(roja qiyametê) destnîşan dike. Mirovên di vê sûrê de li ser sê çeleban dabeş dike ku pabendî jiyana wan a axîretê ye; hevalên destê rastê, hevalên destê çepê û yên girîngtirîn di axîretê de. Xwendina vê sûrê di her êvarê de, parastina mirovan ji feqîrtîye dike.
الوالي (al-) walî : piştgirvan
Taybetmendiyek Xwedayî. Yê ku qenciyan xelat dike û parastina wan ji xirabiyê dike.
والي (ولاة) walî (kom. wulat) : walî
Serwerê ku ji hêla xelîfê an padîşahî ve tê erkpêdan kirin(wezîfedar kirin) ji bo ku hhakimîya herêmeke welat bike.
وِتر witr : hejmara yekane yê . (ژمارەی تاک)
Ji hejmareke yekane, bi gelemperî yek an sê. Gotina "al-witr" dibe di " nimêja witr : Selat al-witr."

Nimêjeke ku xwedan hejmareke rekatên yekane yê . Ev nimêj di dawîya şevê de tê kirin berî ku mirov razê, an jî ew di dawîya nimêja Tehejjudê de dereng dikeve û nimêja dike.

Xûdayê putî : **weŝen (kom. awŝan) (أوثان) وَثن**

Peyker an îkona xwedakan(pûteperestan) ku dua an îbadetê dikin.

(پاگەن) . oldarê xwedakî /pûtî : **weŝenîy وثني**

Kesê ku îbadeta xwedakan dike.

(پاگەن) . pûtparêzî : **weŝenîyeh وَثنية**

Pûteperestî. Pratîka îbadeta xwedakan (pûtan), peykeran, îkonan û yên wekî wan.

wech Allah وَجه الله

1- razîbûna Xwedê : Em vê hevokê di vegotinên mîna "li-wechi-llah" (ji bo Xudê) û "ibtixa' wechillah" (li xweşiya Xwedê digerin) dibînin.
2-rûyê Xwedê : Rêya ku Xuda ji bo we pejirandîye. (Li Quranê , 2: 115 binihêrin).

(ئەرک) . erkdar : **wucûb وجوب**

Ew tişta ku ji hêla olê ve tê xwestin, paşguhkirina wê guneheke.

diravdanî . hilînina tiştêk : **wedî‘eh وَديعة**

Hiştina tiştekî bi kesekî re ji bo hilandina (parastina) wê.

(پارەدان بە گەرەنتی) : **wedi‘eh bid ḍeman(al-) الوَديعة بالضَمان**

Tişt an malê ku di depoyê de bi destûra çavdêrî tête dayîn. Depotkar dibe garantorê dravê li gorî daxwazîyê, an yê her perçeyekê yê ku di hesabên depotkar de vekirî dimîne.

(ڕاستو دروست) rastdar . xwedêgiravî : **were‘ وَرَع**

Yê ku ji gunehan dûr dikeve, ji xezeba Xwedê ditirse, û dixwaze wî razî bike.

Wisq : **wisq (kom. awsaq) (أوساق) وِسق**

Yekînekeke ji bo pîvandina mîqdara ku di xwarinê de tê bikar anîn. Ew 60 "Saa ye"

(چرپە) . pêşniyarê xirab : **weswese (kom. wesawis) (وساوِس) وُسوَس**

Bi gelemperî ev term ji bo pêşniyarên xirab ên ku şeytan wan pêşkêş dike, dike; ji bo xapandina mirovan da ku tiştên qedexe bikin û ew jî bi wateya gumana berdewam tê .

nêzîkatiya Xwedê . rêbaziya Xwedê : **wesîleh وَسيلة**

Tişt û kirinên ku yekî nêzikî Xwedê dike. (mînak, li Qur'ana, 5:35binihêrin)

(بەردەوامبوون) . berdewam : **wiŝal وِصال**

Ji bo ku hûn bi gelek awayan berdewam bikin.

(بەرگریکار. بریکار) parêzvan . wekîl : **weŝîy وَصي**

Ew kesê/ a ku erkpêdankirî ye ji bo ku çavdêriya karûbarên kesekî din bike, bi gelemperî ew ji bo zarokên temen piçûk an ne li gorî temenê qanûnî ne, ye.

pêşnîyaz : **weŝîyeh (kom. weŝaya) (وَصايا) وَصية**

Belgenameke Musilman ye ku bi hûrgulî agahîyan li ser dewlemendiya xwe destnîşan dike,(li Quranê, 4: 7, 10-13 û 176 binêrin). Ew bi awayê ku sêyeka dewlemendiya wî, herî zêde, piştî mirina wî ji bo mebestên xêrxwaziyê tê dayîn eşkere dike. Li gor qanûna mîrata îslamî ya ku di Qur’ana Pîroz de hatiye diyarkirin, divê du-sê para li mîrateyên qanûnî bên belavkirin. Mirov dikare di jiyanê xwe de jî malê xwe ji bo xêrxwaziyê xerc bike weku ew dixwaze, lê divê ew pêdiviyên xwe û malbatê jî li ber çav bigire.
(li Quranê, 4: 7, 10-13 û 176 binêrin). Li Qurana Pîroz, Al-Baqara (2): 180 binêrin) .

avdest : **wuḍû' وضوء**

Şûştina destan, şûştina dev, bêhna avê û şûştina pozan, şûştina rû, şûştina destan heya çongê, serê xwe bi destên xwe şil bike , û şûştina lingan, ev hemî, (ji bilî paqijkirina serî), sê caran tê kirin, pêşî ji aliyê rastê ve dest pê dike. (Qurana pîroz, An-Nisa (4): 43, El-Maîde (5): 7 binihêrin).

Pêdivî ye ku hûn berî destavê bicîh bikin ku perçeyên hundir û cilûberg paqij bin. Şkandina avdestê, angu ye ku avdestiyê disekinîne an dişikîne:

1. Derxistina qirêjiyê ji endamên laş yên taybet: wek mîz, pîsî(gû) an jî hin razên din.
2. Windakirina hişmendiyê: bi gelemperî bi xewê an jî hişcûnê.
3. Têkiliya zaynd di navbera jin û mêr de.
4. Destdana endamê xwe yê zayendî(kîr) bi dest an tiliyan xwe.

(دروستکردنی حەدیس) . çêkirina Hedîsê : **weḍ‘ (fil-ḥedîŝ) (في الحَديث) وضع**

Wateya têgîn, dahênana hedîsê û nisba wê a ku li Pêxember Muhemmed (silava Xwedê lê be) vedigire.

(پەیوەندی سێکسی) tevhevkirin : **weţ' وَطْء**

Têkiliya zayndî .

(ئامۆژگاری). gotara şîret : **we‘ż وَعظ**

Dana Şîret û hişyar kirina kesên din ji bo kirina karên baş.

(هەڕەشە) . gazî . hişyarî : **we‘îd وَعيد**

Hişyarî an tehdît kirin ji bo kirina tiştekî xirab bi kesekî din.

(دڵسۆزی) . dilxewazkirin, dilsoz : **wefa' وَفاء**

Bi bicîh anîna sozê, daxuyakirina dilsozîyê bi kesekî din re.

(دانەوەی قەرز) . dana dayîn : **wefa' ad-deyn وَفاء الدين**

Vegerandina dravî yê ku ji yekê / a din deyn kirîye.

(هێشتنەوەی بەڵێنەکە). destkeftina sozde : **wefa' bin-neẓr وَفاء بِالنَذَر**

Kirina sozdayî, wekî rojîgirtin an xêrxwazî. Lêbelê, eger kesekî soz dabe ku tiştekî xirab bike, divê ew wê neke, û di şûna wê de tekfîra xwe bike. (li "Keffareh" binihêrin).

diyarî . xelat : **weqf (kom. 'awqaf) (أوْقاف) وَقْف**

Pişgirî. Milkê herheyî ve girêdayî ye, li ser wê ti mafên xwedanîyê nayê bikar anîn; helwesteke ji bo armanca xêrxwazî an mirovahî, an ji bo komek taybet ya mirovan mîna her rêxistineke xêrxwazîyê, tête bikar anîn. Bi gelemperî ji bo armancên sazkirina ola Islamê, hînkirina zanîna bikêr, xwarina xizan an dermankirina nexweşan. Di dadrêsiya îslamî de sê
celebên Waqfê hene: Wekfên Olî, Wîlfê xêrxwazî û Waqfê Malbatî. Taybetmendiya Waqfî ewe ku nayê twerîs kirin û ne tê firotin û ne jî tê bexşe kirin.

Heke Waqf ji ber sedemekî bidawî bibe, divê malên wê di xêrxwaziyê de bêne dayîn. Divê ew di esûlê xêrxwazîyê de bimîne. Ew nayê firotin, ew tenê li gorî mercên ku ji hêla xwediyê danebexşê ve hatîye diyar kirin ve tête firotin an jî bi mebesta domandina wê.

rewstendin : **weqfeh (kom. weqfat) (وَقفات) وَقفة**

Di fonetîkên Quranî de, sekna ku di dema xwendina Qur'anê tengijînek dibe, tê rawestandin.

(مانەوە) . mayin **: weqfeh (al-) الوَقفة**

"El-wuqûf bi-'erefeh" bibînin. Hin kes bi vê rojê bikar tînin da ku roja dikeve pêşiya "îdê" tê gotin, ew çi "îd al-adha" ye an "îd alfitêr" be.

(وەستاندن) raweste . sekinî **: wuqûf وقوف**

Rawestandina di nimêjên ferz de ên ku mirov bi gelemperî bi kêmî ve Sura El-Fatiheh (sûreta destpêkê ya Quranê) dixwîne.

(لە عەرەفە وەستاوە) li Erefeyê dimînin **: wuqûf (al-) bi'erefeh الوقوف بعرفة**

Di roja nehemîn a meha Hecê de (Zu al-Hiceh) mayîna li deşta Erefeh yek ji rêûresmên hecê yên herî girîng e. Hecî divê heya rojavabûnê li wir bimînin, piştre derbasî Muzdelifeh bibin.

tewkîl **: wekeleh وَكالة**

Erkpêdankirina(tayînkirina) kesekî ku dikare bi navê wî tevhev bigere, wekaleta wî bigire.

wekîl (al-) الوَكيل

Taybetmendiyeke Xwedayî. Yê ku divê em her gav pê bawer bin, û yê ku guhdarî dide me.

wekîl (kom. wukela') وكيل (وكلاء)

Kesê ku desthilatdariya qanûnî heye ku nûnerîtîya kesekî din bike. Car caran, me "alwakîl aş- şer'îy" (nûnerê qanûnî) heye ku vê xala fermîtîyê (legalîtîyê) tekez dike.

(دڵسۆزی . لایەنگرەکان) dilsoz, nîşana hevgirtinê **: wela' (al-) الولاء**

Daxuyanî kirina hevgirtinê. Ev têgeh carcaran ji bo wateya nîşandana hevgirtina musilmanan û têkilîyên wan bi musilmanên din re tête bikar anîn, wan bira û heval dihesibîne, ew ji yên ne musilman cuda ne.

wilayeh ولاية

1- Parêzgeh : Hêz û / an berpirsiyarî ji bo çavdêrîkirina karên kesekî din . (Wally" bibînin) .

2- Desthilatdarî : walî .

welîmeh (kom. wela'im) وَليمة (وَلائم)

Ji kesê musilman re tête pêşnîyarkirin ku ew şahîya zewacê ragihînin. Ji kesên vexwendiyar tê xwestin ku ew beşdarî wê bibin.

(چاودێریکردن) . patronîzekirin **: welîy (al-) الوَلي**

Taybetmendiya xwedayî. Yê ku qedrê xulamên xwe yên dilsoz digire û wan diparêze.

welîy (kom. awlîya') وَلي (أولياء)

1-Mirovê pîroz, mirovê Xwedê. Eve hevwatîya islamî ye. "Waliyî" mirovek bi rûmet û bilind e û ji bo berjewendîya Xwedayê dilovan dike . Carcaran, xweda tiwanên taybet dide mirovî ku jê re " keramat : rûmet" tê gotin . Gotina "awliya" Allah "di Quranê" de tête dîtin, 10: 62.

2- Hevkar : ew mirovê ku em ji wî bawer dikin û ji bo piştevanîya xwe didine wî ji bo piştgirîyê. (Mînak, li Qur'ana, 60: 1. binihêrin)

parêzger, ew kesê berpirsiyar e**: welîy (kom. 'awlîya') al-'amir ولي (أولياء) الأمر**
Wateya vê peyvê hem ji bo kesê berpirsiyarê civakê û hem ji bo kesekê ku parêzvanîya kesekî dike.

pêşkêşvanê herî mezin **: wehhab (al-) الوهّاب**
Taybetmendiyeke Xwedayî: Yê ku bêsînor dide û li bende xelata kesekî nasekine.

Wehhabî **: wehhabîy (kom. wahhabîyeh) وهّابي (وَهّابيّة)**
Ew merîdê şêx Muhemmed bin Abdul Wahhab ji Najd in, yê ku îslama tûnd di hînkirinên xwe de ava dike ku girîngiyê dide tekoşîna li dijê her celebê "şirkê" (pratîkên polîtolojîk), wek hebandina oldaran û avakirina mizgeftan li ser gorên wan.

Wehhabîyeh (al-) الوَهّابيّة
Xwendinên şêx Muhemmed ibn Abdul-Wehhab ewe in ku îslama tûndrew ava kirîye; ku gerekîya vegera li ser dersên prînsîpên dînî û vejîna hişk a Islamî, ferz dibîne û şer li dijî her cûre kiryarên xurafa û sihrê dike.

weyḩek وَيْحَك

Heyranokeke ku lomeke nerm vedibêje.

wey li we **: weylek وَيْلَك**

Heyranoka ku ji bo şermezarî û hişyarîyê ye.

(ي)

: Ya'jûj we ma'jûj يأجوج ومأجوج

Miletekî xwedan hêzeke pir hilweşînere . (Binêrin Quranê, 18: 94).

(هەتیو) . sêwî **: yetîm (kom. aytam) (أيتام) يَتيم**

Zarokeke ku bi taybetî bavê xwe wenda kirîye. Qur'an û sunnetê wesîyet dikin ku divê mirov bi dilovanî mû'amelê bi wan re bike û xwedîkirina wan pêşniyar dikin. Ew gunehekî mezin e di dema ku mirov zirarê, xirabîyê an xapandinê bi zarokên sêwî bile; bi her awayî. Xwedayê mezin wan kesê ku sêwiyan xwedî dikin, xelat dike. Li Qur’ana Pîroz, Al-Beqera (2): 220, An-Nisa' (4): 2,6,10,127, Al-Isra' (17): 34 binêrin .

Medineh **: Yeŝrib يَثْرِب**

Ew navê kevn ê Medîneyê ye ku piştre nave "Medîneh" bûye" bajarê Pêxember" (silava Xwedê lê be).

(نزیک بوونەوە لە مردن) . nêzîkbûna mirin ê **: yuḥteḍer يُحْتَضَر**

Li ser dûşeka mirinê. Di vê rewşê de, wek Sunnet divê kesê Musilman gotina"şehadetê" bîne bîra da ku ew gotinên wî yên paşîn bin.

Yeḥya يحيى

Yûhennayê imadkar. Kurê Pêxember Zekerîya ye, ku di temenê pîrbûnê ew zarok jê re çêbû ye, ew pismamê Meryema ku dibe diya pêxember Isayî (silava Xwede li ser wan her du'an be). Xwedayê banî wî dişîne da ku rê ji bo Pêxember Isa veke. Pêxember Yehya hate zîndanîkirin, dûv re Hêrodês serê wî jêkir da ku hezkirina xwe ji bo keçik dîlanker re bide îsbat kirin. Mixabin (Xiristiyanan) navê wî kirine John, ji ber ku navê Yehya di dîrokê de xwedanê cihekî taybete. Ew yekem mirovê ku bi navê Yehya bû. Li Qur’ana Pîroz, Al-'Emran (3): 39, Al-An'am (6): 85, Maryam (19): 12-15, Al-Anbiya (2): 90-91 binihêrin.

berdêla lezgîn **: yed bi-yed يَد بيَد**

Di Zagona Islamî de tê xwestin ku hinik tişt yekser werin guheztin da ku danûstandina rast bête kirin.

sûreta Yasîn **: Yasîn (sûret -) سُورَة يس**

Ev sûreta 36 a Quranê ye, sernavê xwe ji ayeta yekemîn digire, ku ji du tîpan pêk tê. Hate ragihandin ku Pêxember (silava Xwedê lê be) vê Sûrê bi navê "dilê Qur 'an" pesin kirîye. Gelek mirov li cîhana musilmanan wê li bîra xwe tînin û di hin deman de bi gelemperî tê dubare kirin. Di hadîseyê de tête şîret kirin ku musilman vê surê li ser mirîyan bixwênin.

Yeqûb **: Ye‘qûb يَعقوب**

Pêxember Yeqûb, navê wî "lsrayîl" jî e. Ew kurê ashaq û nevîyê Pêxember Ibrahîm e. Bi gelemperî ji bo Cihûyên yekem "Zarokên lsrayîl" têne gotin. Her diwanzdeh kurên wî bûn serokên eşîra xwe û ew wekî Dozdeh Eşîrên Israyelî têne nasîn. Niha piranîya Cihûyan ne ji ravikên wan e, lê bi rastî ew ji xezer in.

Ye‘ûq يَعوق

Ev Nav ji hêla gelê Pêxember Nûh ve dihat hebandin(perestin) . (Li Quranê 71: 23 binêrin).

Yeẍûŝ يَغوث

Navê xwedakokî ye ku ji hêla gelê Pêxember Nûh ve dihat hebandin(perestin) . (Li Quranê 71:23 binêrin)

(باوەڕكردن . دڵنیای) bawerbûn **: yeqîn (al-) اليَقين**

Baweriya mutleq. Di Qur’anê de em dikarin çarna hevoka ”Heqq al-yeqîn” (teqezîya rastîn) bibînin. Li Qurana Pîroz, Al-hijr (15): 99 binêrin.

Yelemlem يَلَملَم

Navê bendgeheke ku dikeve li Yemenê, li wir ji hemî heciyên ku ji Yemenê ne an yên ku têre derbas dibin, ji wê re dest bi danîna "Ihram" dikin.

(ڕاست) destê rastê **: yemîn يَمين**

Divê kesê Musilman bi destên xwe yên rastê hemû tiştên girîng û baş bike, wek silav kirin, xwarin û vexwarin bi destê rastê, an jî ewiylî bi lingê rastê gavê bavêje, mîna têketina mizgeftê. Ji bawermendan gotina "aşe'b al-yemîn" (mirovên rastgir) tê gotin, ji ber ku ew di roja qiyametê de tomargehên(qeydên) xwe bi destên xwe yên rastê hildigirin

(سوێند) sond **: yemîn (kom. ayman) (أيمان) يَمين**

Divê di Islamê de tenê sond bi navê Xwedê be; Ango nabe ku kesek ji bilî Xwedê sond bixwe.

(سوێندی درۆ) sonda derew **: yemîn ẍemûs يَمين غَموس**

Sondeke ku guhdarvanan dixapîne û wan bi derewan razî dike.

(سوێندی نەویستراو). sonda bêqesd **: yemîn al-leẍw يَمين اللَّغو**

Sondeke ku di derbazkirinê de bêyî hemdê(mebesta) xwe bi Xwedê sond dixwe, wek gotina, "we-llah". . . tenê ji bo rastîya tiştekî pişt rast bike. Kefaret nayê kirin, eger ev sond bi wefadarnî nebe.

Cihû **: Yehûdîy (kom. Yehûd) (يَهود) يَهودي**

Baweriyeke Cihûyan e. Li gorî îslamê, Cihû ji "Gelê Pirtûkê " ne.

Pêdivî ye ku cûdahiyek di navbera Cihû û Israyelî de (nijada Ye‘qûb) were çêkirin, ji ber ku ne hemû bawermedên Cihûdayê Israyelî ne.

Sê eşîrên Israyelî hene: eşîrên Cihûda, Lêwî û Benjamin û diwanzdeh eşîrên yên hene ku bi Mûsa re, ji Misrê re reviyane, ku ser wî têne hesbandin û li ser Erdê Pîroz bi cih bûne. Herweha, têgeha "cihû" ji bo eşîrên din yên ku ji rojhilatanavîn (ji Kurdistan, Iranê..)tên. Bêgoman, têgeha Israyelî (ku wekî Israîlî dihatin nasîn) ji terma Cihûda cûdane.

Wateya "Cihûyan" ji bo Cihûyên Rojhilata Navîn û Cihûyan tê bi karanîn. Ev yek jî tenê ji bo Cihûyên Aşkenazi ku ji eşîra Xezerên Rûsî-Tirkî ne, ku di sedsala heftemîn de bûn cihû, lê ew eslê xwe de ti têkliyên bi diwanzdeh eşîrên sraîlê re tûne.

Cihûtî **: Yehûdîyeh(al-) اليَهوديّة**
Dîn bi eslê xwe ji hêla Pêxember Musa ve hatîye hîn kirin, lê li pey wî re doza Dînî pir dijwar dibe. Pirtûka wî ya pîroz "at-tewrat" e. Lê tê gotin ku bi rastî ew Talmûd e ku ew wekî çavkanîya bingehîn ya qanûna Cihûyan tête pejrandin.

: Yûsuf يُوسُف
Pêxember Yûsuf, kurê Pêxember Yeqûb e, ew mînakek bû ji bo xweşikbûnê, pakbûnê û zanîna şîrovekirina xewnê(xwenan). li Surê 12-ê Qur'ana Pîroz binhêrin.

sûreta Yûsuf **: Yûsuf (sûret -) سُورَة يوسُف**
Ev Sûreta 12emîn a Qur'anê ye. Ev Sûrê li dora çîroka Pêxember Yûsuf diaxife. Em di derheqê bavê wî (Yeqûb) û birayên wî yên çavnebar de, û jiyana wî li Misrê dixwînin: birayên wî, wî di bîrekê de dihêlin, ew bi awayekî neheqî wek kole tê firotin, ji ber ku li hemberê ceribandina laşî li ber xwe dide, ew tê zindankirin û ew piştre wekî keremeke xwedayî(diyarek xwedayî) jê re hat dayîn dibe serwer, û malbata wî jî tevlî wî bûye da ku li Misrê bimîne.

(" ڕۆژ "ڕۆژەکان) rojek (rojan) **: yewm (kom. ayam) (أيام) يَوم**
Di nivîsên îslamî de, bi gelemperî ev peyv bi wateya rojê tê bikar anîn ku li dijî şev ye. (li "yewm wa leyleh" binihêrin)

(ڕۆژی ڕابردوو). roja dawîn **: yewm (al-) al-'axir اليوم الآخر**
Roja vejînê.

(ڕۆژی قیامەت). roja vejîyandinê **: yewm al-be'ŝ يَوم البَعث**
Roja ku têde hemî afirîner ji nû ve vejîn dibin û têne çêkirin ku ji bo kirinên xwe di vê dinyayê de werin hesab kirin. li "El qiyameh" (Vejîn) binihêrin.

(ڕۆژی ئاودان). roja avkirinê(avdanîn)**: yewm at-terwiyeh يَوم التَّرويّة**
Roja heştemîn ji meha heccê: Dema ku hecî diçin Mina.

(ڕۆژی سزادان). roja cezayê **: yewm al-jeza' يَوم الجَزاء**
Navekî din ji Roja Qiyametê ye, Gava ku hesab ji mirovan li ser hemû kirinên wan yên ku li vê dinyayê rûdane, tête xwestin, dê çarenûsa wî bihuştê an cihneme(dojeh) be.

(ڕۆژی کۆبوونەوەکە) . roja komkirinê **: yewm al-jem' يَوم الجَمع**
Ew roja ku hemî afirîner(mexloqat) ji bo dadgehê têne kom kirin.

(ڕۆژی سزادان). roja cezayê**.** roja hesibê **: yewm al-ḥisab يَوم الحِساب**
Ew roja ku dê her kes tomarên hemî kirinên xwe bibîne. (mînak, li Qur'anê, 38: 49- 64 binihêrin).

(ڕۆژی کۆبوونەوەکە) roja hevdîtinê **: yewm al-ḥeşr يَوم الحَشر**
dê têde hemî afrîner ji bo hisabê werin kom kirin. (li "Al-qiyameh" binihêrin).

(ڕۆژی قیامەتی " ئایینی") roja vejînê(olî) **: yewm ad-dîn يَوم الدِين**
Ew roja ku dê mirov têde li ser kiryarên xwe di jiyanê îroyîn kirin. (mînak, li Qur' anê, 82 binihêrin).

(ڕۆژی ڕابردوو " جیابوونەوە") . roja dawî(veqetandin) **: yewm al-feŝl يَوم الفَصل**
Ew Roja vejînê ya ku têde kiryarên qenc ji karên çewt têne veqetandin.

(ڕۆژی قیامەت) roja qiyametê (vejînê) **: yewm-al-qiyameh يوم القيامة**
Ev roj bi wateya roja rawestînê tê. Ev roja ku em dê ji gorên xwe rabin û li benda biryara(hukm)Xwedayê banî bimînin; li gorî kirinên me em dê bêne dadgeh kirin.

roja qûrbanê **: yewm an-neḥr يَوم النَّحر**
